NIVÎSKARÊ PIRTÛKÊN WÎ PIR TÊN FIROTIN

JOHN BEVERE

# NÊZÎ XWEDA

Jiyaneke nêzî Xweda

Dostê delal,

Pirtûka Pîroz, bi hemû sozên rast û pak û bi gelek sozên mezin ku dikare jiyana me biguherîne dagirtiye. Lêbelê bi rastî jî yek ji wan sozên herî bêhempa yek jê ew e ku Xweda bêriya ku hûn Wî ji nêz ve nas bikin, dike!

Di Nameya Yakûb de em vexwendina herî mezin ya di seranserê dîrokê de dibînin: *"Nêzî Xweda bibin, wê Ew jî nêzî we bibe" (4:8).* Kêliyekê bisekinin û li vê bifikirin: Afirînerê gerdûnê, dinyayê û her tiştê tê de ye; hebûna we dixwaze. Ne tenê hebûna we, dixwaze nêzî we jî bibe ji ber ku di têkiliya mijara ku bi we re datîne de, dibêje ku Xwedayekî jidil û can e.

Vexwendina bêdudulî û bêhempa ya Afirînerê Gerdûnê, ne tenê ew e ku hûn ji dûr ve bi gotin û merasîman Wî bihebînin. Ev vexwendineke wisa ye ku divê hûn bi dilê Wî re têkevin nava têkiliyeke nêz û biwate.

Dostê min, ez teşwîq dikim ku hûn tevlî vê vexwendinê bibin, dest bi rêwitiyeke bêhempa û bikelecan bikin, nêzî Bav bibin û hûn xwe berdin nava kurahiya dilê Xweda.

Birayê we yê di nava dilê Mesîh de,



MessengerX

John
JohnBevere@ymail.com

Messenger INTERNATIONAL

NIVÎSKARÊ PIRTÛKÊN WÎ PIR TÊN FIROTIN

J O H N   B E V E R E

# NÊZÎ XWEDA

## Jiyaneke nêzî Xweda

**Drawing Near** by John P. Bevere, Kurdish Latin
© 2023 Messenger International
MessengerInternational.org
Originally published in English as Drawing Near

Additional resources in Kurdish Latin by John and Lisa Bevere
are available for free download and video streaming at
**MessengerX.com** and on the **MessengerX** App
To contact the Author: JohnBevere@ymail.com

This book is a gift from Messenger International and is
NOT FOR SALE

**Nêzî Xweda**. Nivîskar John Bevere, Kurdî Latinî
© 2023 Messenger International
MessengerInternational.org
Navê wê yê resen yê di Îngîlîzî de Drawing Near e.

Xebatên John û Lisa Bevere yên di nava Kurdî Latinî de çap bûne hûn dikarin
ji malperên **MessengerX.com** û **MessengerX** bi awayekî bêpere daxînin û
online li wan temaşe bikin.
Ji bo têkiliya bi nivîskar re: JohnBevere@ymail.com

Ev pirtûk xelateke xizmeta Navneteweyî ya Messenger'ê ye
û bi pereyan nayê firotin.

Daxîne ji ser App Store

Werbigire ji ser Google Play

App Store, marqeyeke tîcarî ya şîrketa Apple Inc.ê ye ku li Amerîka û welatên din
qeydkiriye.
Google Play û Google Play logo jî marqeyên tîcarî yên şîrketa Google LLC'yê ne.

# NAVEROK

*Destpêk*. . . . . V
*Beş 1:* Vexwendina Herî Mezin ya Hemû Deman . . . . . 1
*Beş 2:* Lêgerîna Xweda . . . . . 13
*Beş 3:* Birçîbûna Xwe Biparêzin . . . . . 31
*Beş 4:* Arezûya ji bo Hebûna Wî. . . . . 51
*Beş 5:* Li Pişt Perdeyê . . . . . 67
*Beş 6:* Dostên Xweda . . . . . 85
*Beş 7:* Çi Rê li ber Nêzîkayiya Heqîqî Digire? . . . . . 109
*Beş 8:* Hebandina Heqîqî . . . . . 137
*Beş 9:* Mirovên ku Xweda bi Wan re Dijî . . . . . 153
*Beş 10:* Nêzîkayiya bi Giyanê Pîroz re . . . . . 169
*Beş 11:* Soza Bav . . . . . 195
*Beş 12:* Zimanê Nêzîkayiyê . . . . . 225
*Beş 13:* Ewlehiya Tam ya ku Bîr û Baweriyê Avakiriye . . . . . 255
*Beş 14:* Nêzî Xweda . . . . . 281
*Pêvek A*... . . . . . 293
*Pêvek B*... . . . . . 299

# DESTPÊK

Di sala 1991ê de Xweda bi zimanekî zelal û eşkere bi dilê min re peyivî: “Kurikê min, ez dixwazim tu binivîsînî.”

Piştî van rojan ez di nava hestên tevlihev de bûm. Ji aliyekî ve tirsê xwe li dilê min dipêça û serê min bi fikra “tu yê bi sernekevî” diçelqiya. Ji aliyê din ve jî ev rewş bi min weke henekan dihat. Dilê min ji nîvîsê dixeliya! Li dibistanê kengî spartekeke kopozîsyonê dispartin me, min û rûpelên vikîvala bi saetan li hev dinêrîn. Pişt re ez di azmûnên zanîngehê de, di beşa dersên pexşanê de bi ser neketim. Ji ber ku min ji hemû tiştên derbarê edebiyatê de nefret dikir. Min berê xwe da endezyariyê.

Îcar aniha Xweda ji min dixwest ku ez binivîsînim. Rê jê re

tuneye! Min digot: "Min xweş nebihîstiye." Û bi vî awayî min dilê xwe xweş dikir. Ji ber vê min gotina Xweda pişt guh kir lê di dawiya deh mehên ku min tu tişt nekir de, Xweda du hefteyan li ser hev ji du eyaletên cuda heman peyam bi du jinan re ji min re şand. Her duyan jî bi awayekî nazik lê pir cidî ez hişyar kirim: "John, eger peyamên Reb ku ji te re şandine tu nenivîsînî, wê vê peywirê bide kesekî din û ji ber ku tu li ber Xweda rabûyî, tu yê bê darizandin."

Gava jinika duduyan peyivî, tirsa Xweda ket dilê min û tirs û dilxelandina min li hemberî nivîsandinê hîs dikir, binpê kir. Gava min biryar da ku li gotina Xweda guhdar bikim, tiştên pêk hatin tên bîra min; ramanên ku berê min nebihîstibûn û ez li wan nefikirîbûm, gava min dest bi nivîsandinê kir bi lez li hev civiyan. Di cih de min fêhm kir ku ev ne peyamên min in yên Xweda ne. Ji wê rojê û heta îro duwazdeh sal derbas bûn. Peyamên ku di forma pirtûkê de dan min aniha li pîst û pênc zimanên cuda hatine wergerandin. Û di ser milyonekê zêdetir re hatine çapkirin.

Piştî ku min pirtûka pêşî nivîsand, min sozeke şexsî da Xweda ku ez ê ne ji bo hema pirtûkeke min ya heyalan hebe ez ê pirtûkê binivîsînim. Tenê gava ji min re got binivîsîne, min ê dest pê bikira. Ev gotina min hat ceribandin. Ji sala 1992yan û heta 1999an, her sal ji bo ez binivîsînim peyamek da min. Lê piştî min pirtûka bi navê Li Pişt Perdeyê (Under Cover) nivîsand, ji aliyê Xweda ve peyvek çi ye nehat ji bo derbasî nivîsê bikim. Weşanger her serê çend rojan li min digeriyan û digotin pirtûka te ya vê carê çi ye û ji min dipirsîn bê gelo ez ê biweşînim an naweşînim. Lê min tu gav nedavêtin. Min hîn ji Xweda tu peyam nestendibûn.

Taliya talî piştî sê salan, Xweda ji bo ez binivîsînim careke din peyamek şand ji min re. Ha hûn vê peyamê aniha di nava destê xwe de digirin. Sedemeke derengbûna wê jî, berî ev pirtûk çap bibe Giyanê Pîroz divê hin tişt di nava min de pêk anîbûna. Ev

pîst û pênc sal in ez bawermend im lêbelê ji bo ez nêzî Wî bim ez tu carî evqasî ne birçî bûm. Ev salek û nîv çêbû ku ez bi Xweda re di nava têkiliyeke kûr de me. Berî niha tu carî ez ewqasî nêzîk nebibûm. Di hemû jiyana xwe de bi qasî van hijdeh mehên dawî, ez bi vî awayî li ber Reb negiriyabûm. Li otelan, di balafiran de, li ofîsa xwe, li malê û li cihên vekirî gava ez lê kûr dibim û duayan dikim, ez di bin bandora mezin ya Giyanê Reb de me. Hebûna Reb tu carî evqasî şênber nebibû û nehatibû hîskirin.

Ez bawer dikim ku ev pirtûk di bin perwerdeya salên ku bi Giyanê Pîroz re derbas bûne hatiye berhevkirin. Û nêzîkahiyeke ku ji dilê Xweda hatiye û ji bo zarokên Xweda yên weke we pêk tê. Berî hûn dest pê bikin ez dixwazim hûn duayan bikin. Bila ev peyv ji dilê we bên û bibêjin û di vê xebata xwe de zanibin ku ji bo we bi deng duayan dikim. "Li ser rûyê erdê ji bo tiştekî ku em dixwazin em li hev bikin, Bavê li asîmanan wê xwesteka me bi cih bîne." Îsa soza vê daye me (Metta 18:19). Em bi hev re duayan bikin û xwesteka xwe jê re bibêjin:

*Bavo, bi navê Îsa, gava ez vê pirtûkê bixwînim ez dixwazim ku tu çavên ku bibînin, guhên bibîhîzin û dilekî ku van hemûyan ji nav hev derxe û wan fêhm bike, bide min. Ez dixwazim nêzî te bimeşim û vê yekê bikim karekî her dem ji xwe re. Ez hêvî dikim ku şîretên te, xwestekên te, sirên te û arezûyên te hîn bibim û di hebûna te de aram bibim. Ev peyam ne tenê ji bo têgihiştinê, di heman demê de ji bo ez bişibim û veguherim Kurikê Te Reb Îsayê Mesîh bila hêzê bide min. Ji ber gava Ew li ser rûyê erdê bû, ji bo nêzî te bû bi awayekî bêhempa mezinbûna te berçav kir. Ez jî bi alîkariya Giyanê Pîroz, nêzî Wî bûm û min mezinbûna Îsa berçav kir. Ez vê demê aniha ji Te re pêşkêş dikim û di vê xebatê de peyvên te ji wan sûd girtiye gava guhê xwe didim wan, ji bo guhertina ku tu yê di min de pêk bîne ez ji*

*niha ve spasdarê te me. Ji bo wê jiyana min tu carî nema bibe weke berê ez minetdarê te me. Ez vê bi xizmetkarê te John Bevere li hev dikim û vê ji te dixwazim. Amîn.*

Îcar aniha duaya ku we ji dil kir, jê bawer bikin ku dibîhîze û ji Reb re spasdar bin ku wê bi cih bîne. Kêfa min tê ji bo ku wê duaya we bi alîkariya Giyanê Pîroz, bi rastî wê dilê we têxe cih û ji niha ve wê we ber bi Xweda ve bibe. Bila Bav, Îsa û Giyanê Pîroz ji her demê zêdetir nêzî we bin!

Bi hemû hestên ji dil…
John Bevere

BEŞ 1

# VEXWENDINA HERÎ MEZIN YA HEMÛ DEMAN

“Nêzîkî Xwedê bibin, ew jî wê nêzîkî we bibe.”
(AQÛB 4:8)*

Bangeke ku ji dilê Xweda diqete û tê heye, na ev qêrînek e û her diçe tîrtir dibe: “Ji ber çi hûn bêyî hebûna min dilxweş dibin, hûn dikarin li nêzî min bin lê ji ber çi hûn li dûr disekinin?”

Gelek heval an jî mirovên ku em heyranê wan in û em dixwazin bêtir nêzî wan bin hene. Ev kes di dilê me de xwedî cihekî taybet in. Ji bo me cihê dilxweşî û kêfxweşiyê ye ku em bi wan re wext derbas bikin. Û bi taybetî gava ew me vexwînin cihekî ev ji bo me serbilindiyek e. Xwesteka bihevrebûneke wisa

* Ayetên di vê pirtûkê de ji malpera bi navê https://www.bible.com/tr/bible/251/GEN.1.KURNT hatine girtin û ayetên ku di vê malperê de wergera wan ya bi kurdî tuneye jî, me ji pirtûka bi navê Kitêba Pîroz “Peymana Kevin û Peymana Nû” (Kitêba Pîroz, Gerçeğe Doğru Kitapları, çapa 1., Temmuz 2008. www.gercegedogru.net) girtine. Di jêgirtina van ayetan de me dest nedaye kurdiya wan, ango di malper û pirtûka me behs kir de ev ayet bi çi awayî hatibin wergerandin û nivîsandin, me bi wî awayî dane.

dihêle em bi hêvî, kêfxweşî û kelecanî bibin. Ji bo em dema xwe guncav bikin û vê vexwendina wan bipejirînin, çi ji me tê em dikin.

Di beşa Yaqûb ya Încîlê de em vexwendina herî mezin ya heta îro dibînin: "Nêzîkî Xwedê bibin, ew jî wê nêzîkî we bibe" (Aqûb 4:8). Kêliyekê bisekinin û li vê bifikirin: afirînerê gerdûnê, erdê û her tiştê di wan de cih digire, dixwaze hûn herin huzûra Wî. Ne tenê dixwaze hûn herin huzûra Wî lêbelê hêvî dike ku bi we re di van têkiliyeke nêz de be. Ji ber ku ew "Xwedayekî hesûd e ku dixwaze bi me re di nava têkiliyeke har debe" (Derketin 34:14).

Ha ev xwesteka Xweda ye ku hew dixwaze biguherîne. Yê ku vê vexwendinê pêk tîne Ew e û dixwaze zarokên wî bêriya naskirina Wî bikin. Ji bo têkiliyeke wisa jidil pêk were, pêwistî pê dîtine ku piştî mirov ketiye gunehê amedekariyê tevlihev yên bi hezar salan hatine kirin û pêwistî pê hatiye ku bedêleke mezin bê dayîn. Yek ji wan hevalên herî nêz yê Îsa, Yûhenna wisa dibêje:

> "Tu caran, tu kesî Xwedê nedîtiye, lê Kurê yekta, Xwedayê ku li ber singê Bav e, wî bi xwe ew da zanîn." (Yûhenna 1:18)

Adem, Reb rasterast didît lê ji ber guneh an jî ji ber ku ji gotina Xweda derket, ji huzûra Xweda hat qewirandin û hemû mirovahî di bin bandora qedera wî de ma. Êdî mirov weke wextekî ku çawa Adem Xweda didît û nas dikir, ne dikarin Wî nas bikin û ne dikarin Wî bibînin. Lêbelê Bav, bi azwerî û dilrehmiya xwe ya mezin ji bo me ji vê veqetandina ecêb rizgar bike, bi bêrîkirinê bi ser ve diçe. Ji ber vê, gava me weke Rebê xwe jê bawer kir, ji me re Îsayê ku em ji tariyê xelas kirin û ji bo me bi Xweda re li hev bîne bedena xwe li ser kir. Ango Xwedayê di bedena mirov de şand ji me re.

Lêbelê ji bo Xweda û mirov bi hev re bibin yek, bi awayekî rêkûpêk çawa ku nehat ragihandin, ev yek pir nehat tecrubekirin

jî. Em li ser xelasiya ji guneh û mirinê sekinîn lê çi kesê ku hat azadkirin em li benda wan neman û me ew îhmal kirin. Bedela vê îhmalkirinê giran e û heta bobeletek e, ji ber ku gelek mirov bêriya xweşikbûna ku Xweda ji nêz ve nas bikin, dikin. Di ber vê trajediyê re û di Peymana Kevin de, di nav kesên ku ji binemala Brahîm tên hatiye dîtin.

## DU MOTÎVASYONÊN CUDA

Helwesta Brahîm û helwest û tevgerên rûniştî yên Îsraîliyên ku dibin neviyên wî, berevajî hev in ku ev yek her dem dihêle ez şaş bimînim. Pirtûka Derketina ji Misrê, bi nalenala bindestiya zor û zehmet ya gelê Îsraîlê ku neviyên Îbrahîm in dest pê dike. Hema bêje bibû çarsed sal ku li Misrê dijiyan. Di destpêkê de Misrê ji wan re nîmetek bû. Lêbelê pir derbas nebû ketin bin koletiyê de û gelek eziyet li wan hat kirin. Ji bo ji êşê xelas bibin xwe avêt Xweda û li ber geriyan.

Reb gilî û gazinên wan bihîstin û weke xelaskerekî Mûsa şand bi hawara wan ve. Mûsa her çiqasî bi eslê xwe Îbranî bû jî ji mirinê xelas bû û weke neviyê Fîrawûn di nava mala wî de mezin bû. Herçiqasî mîrê Misrê bû jî, ji ber ku bi eslê xwe ji gelê Îsraîlê dihat xwe ji êşên wan re ker nekir lê ji bo canê xwe xelas bike mecbûr ma ku bireve beyebanê. Piştî bi salan ji bo gelê Îsraîlê bi hêz û Gotina Xweda ji bindestiyê rizgar bike, vegeriya.

Xelasiya Îsraîliyên ji bindestiya Misrê bi xelasiya me ya ji guneh û koletiyê, bi hev re ye. Welatê Misrê bûye şanîdaneke pergala dinyayê û gelê Îsraîlê jî temsîleke dêrê ye. Gava em ji nû ve çêbûn, em ê ji pergala dinyayê ya bizorê û tepisandinê, bên rizgarkirin.

Ne karekî zor e ku mirov xeyal bike bê Îsraîlî ji aliyê Misiriyan ve çawa bi awayekî tund îstîsmar li wan bûye. Li ser pişta wan

şûnên kûr yên qamçiyên ku ji aliyê kesên konetî di wan de vekirine hebûn. Li xaniyên çewtomewto rûdiniştin û kurtêlên Misiriyan dixwarin. Ji ber weke koleyan mal û milkên efediyên xwe yên Misrî ava kirin, tu hêviya wan tunebû ku bibin xwediyê mîrasekî. Şîna bi hezaran zarokên Îbranî yên ku bi fermana Fîrawûn re bi awayekî hovane hatibûn qetilkirin, digirtin.

Herçiqasî di nava vê zilma giran de êş bikişandana jî zû ji bîr dikirin. Piştî ku ji Misrê xelas bûn jî, kengî gava karên wan ne li gorî dilê wan bimeşiya, poşman dibûn ku ji Misrê derketine û digotin "Em li Misrê vegerin wê ne baştir be ji bo me gelo?" Gotinên weke van dikirin û ew gilî û gazinên ji bo azadiyê dikirin, bi tiştekî nedihesibandin. Heta ewqasî nankor bûn ku gotinên bi vî awayî kirin: *"Em ji xwe re rêberekî hilbijêrin* û li Misrê vegerin" (Hejmara Çolê 14:4, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*).

Lê ji bo Mûsa rewş berevajî vê bû. Di nava wan de tekane kesê ku li Misrê rehet bû û jiyaneke wî ya dewlememd hebû, Mûsa bû. Ya rastî di dinyayê de kes bi qasî wî ne di rewşeke xweş de bû. Ji aliyê kesê li dinyayê herî dewlemend ve hatibû mezinkirin, li cihê herî xweş rûniştibû, xwarinên herî xweş xwaribûn, kincên herî baş li xwe kiribûn û ji mamosteyên herî baş ders stendibûn. Bi hemû pêdivî û xwestekên wî ve xizmetkarên wî dadiketin. Hem ji aliyê serwetê ve û hem ji aliyê rêvebirê ve mîraseke mezin li benda wî bû. Mûsa bi dilê xwe dev ji van hemûyan berda û berevajî Îsraîliyan ne li dawiya xwe nêrî û ne jî bêriya kesên ku li dû xwe hiştine, kir.

Sedema vê yekê çi bû? Bersiva vê ew e ku Mûsa û Xweda li hev rast hatine. Agir dît û çû bi ber de. Bi Xwedayê dijî re li deviyeke ku dişewitî hev dîtin, Îsraîlî ev ne jiyan! Gava Reb bang wî kir ew nêz bû. Pişt re gava ji Îsraîliyan re vexwendike gelekî xweş û baştir li wan hat kirin, li dûr sekinîn (bnr. Derketin 20:18-21).

Gava ji girseyan re dipeyivim gelek caran vê dipirsim: "Piştî

ku Mûsa ji Misrê derket gelê Îsraîl dibe bi kuderê ve?" Di şertên normal de bersiva tê dayîn "Welatê ji Wan re Hatiye Wehdkirin" e. Lêbelê ev tam ne rast e. Ber bi Çiyayê Horev an jî Çiyayê Sîna ve ketin rê. Gotina Xweda ya ku bi rêya Mûsa ji Fîrawûn re got, bînin bîra xwe: "Gelê min berde bila li beyebanê min bihebînin" (Derketin 7:16). Gotina ku anî ziman ne "Gelê min berde, bila welatekî ji xwe re bikin mîrat" bû. Mûsa ji ber çi bi sedan salan e berî ku wan bibe welatê dixwestin, ew birin ku wan bi Kesê Soz Daye wan re bide naskirin? Eger pêşî ew biribûna Welatê ji Wan re Hatiye Wehdkirin, wê demê wê ji "Xwedayê Soz Daye" wan bêtir ji sozê hez bikirina. Mûsa ji bo gelê Îsraîl bibe cihê ku bi Xweda re hev nas kiribûn, sebr û hedana wî nemebû.

Bê guman me jî heman tişt di dêrên xwe de kirin, ji bedêla em bêtir hîn bibin bê Îsa kî ye, me bêtir weke waazan anî ziman bê wê Îsa ji bo me çi bike! Di encama vê de jî ji bedêla kesên ku wê bêtir xizmetê bikin, li şûna van kesên ku li berjewendiyên xwe fikirîn û nêzî Xweda bûn, derketin holê. Em dikarin vê bişibînin jineke ku ji bo pereyan bi mêrekî re zewicî ye, motîvasyona jinê ne naskirina nasnameya mêrê xwe ye, bi tiştên wê mêrê wê jê re bike re girêdayiye. Axx, belkî heta radeyekê jê hez bike lê hemû ji ber sedemên xelet e.

Yên ku li ber binpêkirina têkiliya xwe ya bi Wî re li ser bereketên Xweda radiwestin, li şûna ku ji nasnameya Xweda re hestiyar bin, hewl didin ku xwedekarên ji Xweda hin tiştan bi dest bixin, perwerde dikin. Ew yekta ye û tu kes nikare bi mezinahiya Wî re xwe bide ber hev. Weke çawa Mûsa tecrube kiriye, hemû soz dema ku bi Xweda re dikevin rûyê hev qedir û qiymetê wan zêde dibe. Ew ji her tiştî baştir û qenctir e heta ji bereketên ku dide me jî.

Armaca sereke ya Xweda ya ku gelê Îsraîlê xelas kiriye ew e ku Wî nas bikin û jê hez bikin. Xweda xwest ku xwe bi wan bide naskirin. Ji

wan re wisa got: “We dît ku min bi Misiriyan çi kir û çawa ew li ser baskê teyrên baz siwar kirin û anîn ba xwe” (Derketin 19:4). Lêbelê wan armanca Xweda di ser serê xwe re avêt.

Bêrîkirina Xweda ya ku dixwaze nêzî gelê xwe be, ne kêm bû ne jî hat guhertin. Ji ber ku ev xwesteka Wî di nav gotina Wî de her dem hat qalkirin. Di duaya Pavlûs ya azwer de xwe dide der:

> “Da ku Xwedayê Xudanê me Îsa Mesîh, Bavê rûmetê, ruhê peyxam û şehrezayiyê bide we, ku hûn wî hê çêtir nas bikin.” (Efesî 1:17)

Xweda, hêza xwe daye naskirin. Xweda dixwaze her zaroka ji nû ve çêbûye Wî bi dil û can nas bike! Wey, tu ji xwe re lê binêre, ev yek we bi kelecan nake qey? Eger bersiva we na be, hinekî li ser vê bifikirin û fêhm bikin bê ev çiqasî tiştekî bêhempa ye.

Em ji Xwedayekî dijî re, em ji Bavê Rast yê ku ji bo zarokên xwe jidil êşê dikişîne bawer dikin. Ew, ragihînerek e ku dixwaze bi me re têkiliyê deyne. Pavlûs, Korîntiyên ku tewş bibûn, hewl dida ku vê ji wan re bibêje: “Gava ku hûn pûtperest bûn, hûn dizanin ka çawa bi xirandina hişê we hûn ber bi pûtên bêziman ve birin” (Korîntî I, 12:2). Di gotinên teşwîq yên Pavlûs de, em wesfekî sereke yê Bavê xwe Xwedayê ku wî ji hemû pût û îlahan vediqetîne dibînin. Ew dipeyive!

## EREBEYÊ BIDE QIRAXÊ

Berî bi çendakî gava min erebe diajot Giyanê Pîroz bi dilê min re peyivî: “Tiştek heye divê ez ji te re bibêjim. Erebeyê bide qiraxê.”

Xweda gava tiştekî ji min dixwaze ku divê ez bikim, wê kêliyê her çiqasî weke tiştekî ne li rê û ne girîng bê xuyakirin jî, ez hîn bûm ku divê jê re îteatê bikim. Gava Reb hişt ku Mûsa bala xwe

bidiyê, ma ne li rojavayê beyebanê li ber pezê xwezûrê xwe bû? (Hin rêyên Xweda yên din hene ku dihêle bala me here ser) Xweda hat ber bi deviyekê ve û bêyî ku devî biqede hişt ku hemû bişewite.

Em dixwînin ku Mûsa xwe bi xwe wisa dibêje: “Ka ez herim, li vê ecêbê binêrim çima agirek heye û devî naşewite?” (Derketin 3:3). Peyva çûyînê ya ku hatiye wergerandin di Îbranî de “cuwr” e. Pisporê zimanê resen yê Nivîsên Pîroz James Strong, vê peyvê weke “vegerandin”ê pênase dike. Mûsa, ji bo bersivê bide banga Tişta Pîroz, bi zanebûn ji plana xwe ya çalakiyê vegeriya.

Pişt re em wisa dixwînin: “Gava Reb Xweda dît ku Mûsa nêzîk dibe, ji nav deviyê bang kiriyê û got, Mûsa, Mûsa! Mûsa bersiv dayê û got, Fermo!”

Xweda gava dît ku Mûsa ji rêya xwe vegeriyaye û hatiye nêz bûye, îcar bi navê wî bang lê kiriye. Eger Mûsa wê kêliyê bertek nedabûya deviyê, ez bawer dikim ku wê Reb bang wî nekira. Xweda gava Mûsa di hewşa Yitro de bû bang lê nekir, dema guncav ne ew bû. An Mûsa wisa bifikiriya: Eger ez aniha guhê xwe nedim pezê xwe, wê bi her deverî de belawela bibin û pişt re bi saetan ez nikarim wan bidim ser hev û wê roja min hemû bi wan re here. Ji bo roja min ji hev qut nebe, piştî karên min xelas bibin ez ê herim cem deviyê û lê binêrim. Dibe ku encam heman tişt bûya?

Hinek kesên din dibe bifikirin ku Xweda wê tiştekî hîn dramatîk pêk bîne. Lê ma wê vê bi xwezaya Wî re li hev bikira? Li Samuelê di xortaniya xwe de ku di bin rêveberiya Serkahîn Eli û kurikên wî de xizmeta Xweda dikir, bifikirin (bnr. Samûêl I 3). Şevekê xwe li ser livînên xwe dirêj dike û dengekî ku dibêje: “Samuel! Samuel!” tê wî.

Samuel baz dide cem Eli û dibêje: “Te bang min kir, ha va li vir im fermo.”

Eli jî bersivê dide wî û dibêje: “Min bang te nekiriye, here rakeve.”

Cara duduyan Samuel dibîhîze ku bang wî dikin û dîsa gava diçe cem kahînê xwe, heman bersivê dide wî. Ev rewş sê caran dubare dike û di dawiya dawî de kahîn meseleyê fêhm dike û ji Samuel re dibêje bê wê çawa bersivê bide. Cara çaran gava dengê "Samuel! Samuel!" dibîhîze, edî dizane bê wê çawa bersivê bide: "Kerem bike evdê te li te guhdar dike." Li ser vê REB dipeyive û bi wî re xwesteka xwe û sirên xwe yên ku bi kesî re neaniye ziman, pê re parve dike.

Xweda dikarîbû tiştekî cuda bike. Belkî gava cara duduyan dît ku Samuel fêhm nekiriye, dikarîbû bigota: "Samuel, baz nede cem Eli. Ez Xwedayê te REB im û dixwazim bi te re bipeyivim." Lê ma rêya Xweda ev e? Ew ne tenê dixwaze ku bê naskirin lê ew dixwaze em lê bigerin û Wî ferq jî bikin. Taqateke bi hêz pêwîst be jî li kesên ku dikevin pey Wî û li kesên ku di giyanê xwe de li ber xwe didin, digere.

Gava em li metnên mizgîniyê dinêrin, em mijarên weke vê dibînin. Îsa piştî ku pênc hezar kes bi pênc nanan û du masiyan têr kir, ji xwendekarên xwe dixwaze ku berî wî li qeyiqê siwar bibin û herin aliyê din yê avê. Ji bo bi bavê xwe re wext derbas bike derdikeve serê çiyayan. Gava dibe şev xwedekar hîn jî li hember bayê xurt li ber xwe didin û em wisa dixwînin:

> "Nêzîkî berbanga sibehê, Îsa li ser golê rêve çû û nêzîkî wan bû. Wî xwest ku di ber wan re derbas bibe." (Marqos 6:48)

Bala xwe bidin vê hevokê: "Wî xwest ku di ber wan re derbas bibe." Gava ew dîtin, hemûyan ji tirsan kirin hawar lê Îsa ji wan re got: "Netirsin, bi ceger bin, ez im!" Gava li qeyikê siwar bû û tevlî wan bû, ba sekinî. Eger nekirana hawar, wê meşa xwe bidomanda. Wê di ber wan re bi rêya xwe de biçûya, eger nekirina hawar. Ji bo tevlî wan bibe wê rêya xwe neguherta.

Avêtina gaveke ber bi me ve weke pêkanîna giştî ya Xweda ye û eger em bersivê bidin vê gavavêtinê em ê gaveke din bavêjin û nêzîkayiyê lê bikin. Eger em bersivê nedinê, bi zorê ji xwe re rê venake an jî bi zorê bi aliyê çalakiyên me nakeve. Kî zane, eger Mûsa ji rêya xwe vegeriyaba, Xweda weke di rewşa Samuel de û weke Îsayê ku bi xwendakarên xwe kir, gelo tenê wê bisekiniya? Gelek caran ji bo em bersivê bidin li benda me dimîne heta em têr birçî bibin.

Îcar eger em vegerin ser wî dengê min di erebeyê de bihîst, eger gava peyivî û min erebe nekişanda qiraxê wê çi bibûya? Wê ew fersenda ku me yê hev du rûbirû bidîtaya ji dest min biçûya? Ez baş zanim ku hin caran ji dest min çûye. Lê vê carê pêncsed metre li pêşiya min stasyoneke benzînê hebû. Çawa min erebe îstop kir, min bihîst ku Giyanê Xweda bi dilê min re peyivî: “Ma min negot, bê rawestin dua bikin” (Selanîkî I, 5:17).

Min bersivand û got: “Belê Reb, te got.”

Pirseke din kir: “Dua monolog e an diyalog e?”

“Diyalog e Reb, axaftineke du alî ye.”

Peyvên wî pir xurt dihatin: “Eger min got her dem duayan bikin, ev tê wê wateyê ku ez her dem dixwazim bi we re di nava ragihandinê de bim!”

Pêwistî pê tuneye ku ez bêjim ez kelecanî dibim. Min fersenda bêhempa ya ku danî ber min, min ferq kir. Ev fersend ne tenê ji bo min bû. Ji bo hemû zarokên xwe bû jî.

Aniha hûn dikarin wisa bipirsin: Hûn dibêjin Xweda bênavber wê her dem bipeyive? Tişta ji dilê min re got ne ev bû. Wî anî ziman ku dixwaze her dem di nava ragihandinê de be. Peyv, ji bo gelek rêyên ragihandinê yek ji wan rêyan in. Jina min dikare awirekê di min de vede û di navbera me de tu peyv derbas nebibin jî ez dizanim bê dixwaze çi bibêje. Carina bi nêrîneke xwe bê dixwaze çi ji min re bibêje, ez dikarim li ser vê sê rûpel nivîs

binivîsînim. Çima? Ji ber ku ev zêdeyî bîst salan e em bi hev re ne û ez bi ser rêyên wê yên ragihandin û şêwaza wê vebûme. Dibe ku hûn jî bi me re di heman odeyê de bin lê ji van awiran yek jê jî ji bo neyê tu wateyê. Çima? Ji ber ku hûn weke min wê nas nakin. Ya rastî, di salên pêşî de dibe ku min jî peyamên bi awirên xwe didan, min fêhm nekiribe. Lê aniha piştî ez bi wê re bîst û yek salan mam, ez di derbarê bê çawa ragihandinê ava dike de hînî gelek tiştan bûm.

## BANGA NÊZÎKAYIYÊ

Broşureke vê pirtûkê ya bi navê "çawa tê çêkirin" tuneye. Ez dikarim bibêjim ku armanca me bêtir ew e ku em vê pirtûkê bişibînin nexşeke ku me ber bi dilê Xweda ve dibe an jî kilawûzeke bi vî rengî ye. Eger nexşeyeke min ya ku li giraveke tenha cihê xezîneyekê nîşanî min bida, hebûya; heta ez neçûma girava xalî û min ev girav teftîş nekira wê tu fêdeya vê nexşeyê li min nebûya. Pişt re ji bo ez xwe bigihînim cihê ku xezîne lê veşartiye, divê min hewl bida ku di şiverêyan re derbas bibim, bi serê çiyayan ve hilkişim û di newalan re derbas bibim. Hewldan, enerjî û bedelek li ser navê min hewce bû. Nexşe wê tenê rê nîşanî min bide û wê nehêle ez dema xwe bi hewldanên belasebeb û bi keşfên vikîvala re derbas bikim. Wê min ji hin xefkên veşartî biparêze. Ha ev pirtûk dişibe wê nexşeyê. Vexwendinek e ji bo hûn di vê rêya xweş û kelecan de tevlî min bibin û em bi hev re ber bi dilê Xweda ve herin. Gotinên Xweda yên di van rûpelan de cih digirin, wê we ji talûke, xefk û koncalan ku we ji ser rê vegerîne biparêze. Wê we ji belayên belasebeb û ji hewldanên beyhûde biparêze.

Naxwe eger hûn amade bin em dest pê bikin!

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Di jiyana we de kîjan bûyer an jî tecrubeyê hişt ku hûn vê pirtûkê bixwînin?

2. Li van mînakên vexwendina nêzîkayiya Xweda bifikirin:

- Mûsa deviyekî ku dişewitî dît û ji bo lê binêre rêya xwe guhert. Ji ber wisa kir Xweda bang wî kir.
- Samuelê ciwan berî ku bersiva “Kerem bike evdê te guhdar dike.” bide, çar carî deng bihîst.
- Xwendekaran gava dît ku Îsa li ser avê di ber wan re dimeşe, kirin hawar.

Ji van mînakan kîjan jê herî baş vexwendina Xweda ya ji bo we tîne ziman? We bersiv daye Xweda? Eger bersiva we erê be, xwezaya bersiva we çi bû?

3. Gava em difikirn ku dua diyalog e ango axaftineke dualî ye, ragihandina Xweda ya hem bi gotin û hem jî bêgotin e ku bi we re datîne çi ye?

BEŞ 2

# LÊGERÎNA XWEDA

Reb got: “Min tu di ser xwe re dît.”

Pirtûka Pîroz, bi piranî hin mijarên sereke di xwe de dihewîne, ev rastiyên hanê ji Destpêkê û heta Peyxamê dirêj dibe û diçe. Yek ji van temayan jê jî arezûya Xweda ya li hember mirov e û lêgerîna li mirov. Arezûya nêzîkayiyê ya Xweda ya li hemberî me ji arezûya me ya ku em dixwazin nêzî Wî bibin, pir û pir mezintir e!

Ya rastî bêriya me dike (bnr. Aqûp 4:5). Di vir de îfadeya bêrîkirinê di wateya “hesreteke tîr” de ye. Ji destpêka zemên ve û heta niha, qêrîna ku ji kurahiya dilê Wî derdikeve ev e. Piştî ku Adem guneh kir, gotinên Xweda yên pêşî ne yên darizandinekê bûn. Berevajî vê, pirsî û got: “Tu li kuderê yî?” Dengê qêrîna ku ji dilê Wî derdikeve, tê we gelo? “Tu çima

xwe ji min vedişêrî?" Bêrîkirina Wî ya li hemberî me, em di seranserê dîrokê de lê binêrin.

## NEVÎÇIRÇIRKÊ MEZIN YÊ ADEM

Navê nevîçirçirkê mezin yê Adem, Hanok bû. Ez bawer dikim ku rojekê Hanok çûye cem Adem û demên ku li bihuştê derbas kirine jê pirsiye. Xwestiye hîn bibe bê tiştekî çawa ye gava mirov bi Xwedayê dijî re bimeşe. Dibe ku belkî hûn vê meraq bikin. Çawa çêbû Hanok bi kalikê kalikê xwe yê mezin re peyivî? Bersiva vê ev e: Eger hûn 930 salî li dinyayê bin, hûn ê nevîçirçirkên xwe bibînin. Hanok gava hat dinyayê Adem hîn 622 salî bû.

Li gorî hesabekî arîtmetîkî heta hat Adem, em dikarin bibêjin ku Hanok 65 salî û Adem jî 687 salî ye. Weke di beşa Destpêkê ya Pirtûka Pîroz de dibêje, bi giştî her çiqasî 365 salan jiyabe jî, em tê derdixînin û digihên wê encamê ku Hanok 300 salan di rêya Xweda de meşiyaye.

> "Henox sê sed sal bi Xwedê re meşiya, kur û keçên wî yên din çêbûn. Henox bi tevahî sê sed û şêst û pênc sal kir." (Destpêk 5:22-23)

Ji ber vê ji bo Hanok her tişt gava 65 salî bû û çûbû cem kalikê xwe Adem û piştî ku ji devê wî bereket û kedera dilê wî jê bihîst dibe ku hatibe guhertin.

Helbet ez ji xwe re xeyalan dikim û di destê min de tu metnên ku vê piştrast bike, tuneye. Hanok ji bo li bihuştê bipirse û ji bo karibe here cem kalikê xwe yê bi navûdeng, gelek sal di ser re derbas bûne heta ku sawa xwe jê girtiye û çûye lê pirsiye. Ji ber ku Adem nedixwest behsa vê mijra bi kul û keder bike. Hemû kesên ku ji zuriyeta Adem dihatin bi vê zanîbûn û bêguman hîn ji

biçûkanî ve Hanok hişyar kiribûn ku li ser vê mijarê bi kalikê xwe Adem re nepeyive.

Metnên dîrokî yên Yahûdiyan behsa depresyona Adem ya ku ji ber ji bihuştê hatiye avêtin, dikin. Giraniya vê gunehê pir giran bû û mirov nikarîbû rahişta vî barî. Hin metîn behs dikin ku ji fediyan Adem û Hawa li rûyê hev nikarin binêrin û ji bo vê jî di şikeftên tarî de rûniştine. Mezinbûna Adem têk çûbû. Soza ku mirov li cem Xweda bimeşe bistîne tiştek e lê rûniştina ku mirov li cem wî rûdinişt ji dest derxîne bi temamî tiştekî pir cuda ye. Adem tiştekî ku nayê ziman winda kiribû lê Hanok israr kir û li êşa kevin ya Adem guhdar kir. Pişt re ev yek bi baweriyê li nav hev xist. Nifşên piştî Adem ji ber windabûna Adem gava di nava xwe de bi awayekî xeyalşikestî gilî û gazinên xwe dikirin, Hanok di vir de sozek dît: "Ez ê di rêya Xweda de bimeşim."

Hevdîtina herduyan, ez tenê dikarim di serê xwe de xeyal bikim. Hanok ji tirsan dilerizî lê azweriya wî di dawiya dawî de bi ser tirsa wî ket. Xwe li nava siyên tirsê xist û ji ronahiya sozeke mezintir bawer kir. Di çavên wî de çîroka Adem ne çîrokeke têkçûnê bû, di xwe de gelek tiştên din dihewandin. Wehiya arezûya Xweda ye ya ku dixwest bi mirov re li tenişt hev bimeşin. Gava Adem bereketên xwe yên bêhempa yên di bîranênên xwe yên li bexçeyê bihuştê digotin, gelo ew agirê ku di hundurê Hanok de gur dibû, ferq dikir?

Adem gava çîroka xwe ya dilşewat digot, digiriya: "Hanok, ez bi Xweda re meşiyam... Bi mezinahiya Wî re. Afirînerê gerdûnê, avakarê van hemû tiştê tu dibînî, li tenişt min meşiya! Hemû tiştên kûr û dûr yên di hişê xwe de bi min re parve kir. Stêrkên li gerdûnê bê çawa rast kirin û bi tiliyên xwe cihê wan diyar kiriye, behsa wan kir. Wan tiliyên ku hem ez afirandibûm û hem jî bi destên min girtibûn. Her stêrk bi navê wê bang wê dikir. Demsal û hemû hêlên dinyayê diyar kirin. Behsa bê dinya çawa bi kêşehêz û

qadên elektromanyetîk di dengeyê de maye û çawa demsalên pir xweş avakirine, ji min re kirin. Nepeniya bizir û bê çawa her bizir şîn tê, bi min re parve kir. Û behs kir bê çawa ser rûyê erdê bi avên di bin rûyê erdê de bi awayekî sitratejîk tê avdan, hemû anî ziman. Hanok, Wî peyvira bijartî ya binavkirina hemû ajalan sipart min. Bi milyonan ajalên curbecur! Em bi Wî re peyivîn lê biryara dawî ji min re hişt!”

Her ku Adem peyivî, azweriya Hanok jî lê zêde bû. Weke Adem ew jî divê bi Xweda re bimeşiya û wê nehata redkirin.

Heta Hanok tiştekî ku Adem ne xwediyê wê ye weke mîras lê xwedî derket. Bedena Adem vegeriya axê lê di pirtûka Destpêkê de ji bo Hanok wisa nivîsandiye: “Henox bi Xwedê re diçû û êdî nehat dîtin, çimkî Xwedê ew hilkişandibû” (Destpêk 5:24). Berî ku mirinê bibîne ev dinya terikand.

Hanok pêxemberekî mezin bû. Bi qasî ku ji dema xwe re peyivî ji bo dema me jî peyivî. Di rojên xwe yên dawî de derbarê wan kesên xapîner ku li dêrê weke kesên ku bawer dikin û wisa tevdigerin lê di rastiyê de hêza vê rêyê înkar dikin, pêxembertî kir ku wê ev kes bên darizandin (bnr. Yehûda 1-15). Derbarê darizandina Xweda de hin tişt dîtin û berî ku Reb ji bakîreyê çêbibe bi hezar salan, hatina Wî ya duyem ya ji bo darizandinê îlan kir.

Xweda hîn gava Hanok 365 salî ji bo çi Hanok anî cem xwe? Ji bo vê xizmata pêxemberî ya mezin gelo? Na, ji bo “di rêya Xweda de dimeşiya” û weke ku di nameya Îbraniyan de tê gotin ji bo “Dilê Xweda xweş kir” (Îbranî 11:5).

Min xelet fêhm nekin. Di rêya Xweda de meşiya û xizmeteke bi hêz û bi bandor kir. Lê tişta ku bi rastî dilê Xweda xweş kir, ew arezûya har ya Hanok bû ya ku dixwest Xweda ji nêz ve nas bike. Ji bo em bi Wî re di nava têkiliyeke nêz de bin Xweda dest dabû wî dilê wî yê ji bêrîkirinê bi ser ve diçû.

## QÊRÎNA KU LI SERANSERÊ HEYAMAN JI DILÊ XWEDA BILIND DIBE

Qêrîna ku li seranserê heyaman ji dilê Xweda bilind dibe, ha ev e! Li hemberî arezûya ku ji bo me hîs dike, gelekî ku dixwaze wî nas bike heye! Piştî Hanok nevîçirçirkê din yê ku dilê Xweda xweş kir Nuh e. Li gorî Destpêkê em wisa dixwînin: “Nuh da ser rêya Xweda” (Destpêk 6:9). Nuh bersiv da arezûya hevpar ya Xweda û nêzî Wî bû. Her ku nêzî Xweda bû, Xweda jî nêzî wî bû û bûyerên pêşerojê jê re gotin. Darizandina mezin ya ku ji nişka ve li hemû dinyayê xist, di serê pêşî de sirek bû di navbera Nuh û Xweda de. Têkiliya Nuh ya bi Xweda re ji ber baweriya wî ya mezin bû ku wê Xweda ji ber vê bersivê bide yên ku li Wî digeriyan û yên ku diwêribin bi baweriyê nêzîkî wî bibin da ku bi wî re tevbigerin.

Di jiyana Brahîmê ku ji Xweda vexwendina “Di rêya min de bimeşe!” jê re hatibû kirin jî em heman tiştan dibînin (Destpêk 17:1). Ev vexwendin çend caran dubare bû û ji Îshaq û Yaqûb re jî hat ragihandin. Heta hîn berî ku Yaqûb çê bibe, Xweda got: “Ez ji Yaqûb hez dikim” (Romayî 9:13). Reb hîn berî ku Yaqûb li Xweda bigere, lê geriya û ji bo me hemûyan jî wisa dike. Yaqûb gava ji birayê xwe direviya ferq kir ku Xweda li benda wî ye. Gava Yaqûb kevirek xist bin serê xwe û raket, Xweda di xewna wî de derenceyek nîşanî wî da ku ferîşte pê ve hildikişin û serê wî digihê asîmanan. Di navbera Xweda û mirov de têkiliyeke xwedayî dihat emirkirin.

Piştî çarsed salên bindestiyê, Îsarîlên ku ji zuriyeta Yaqûb hatine; di armanca bingehîn ya ku Xweda ew rizgar kirine de matmayî man. Li gorî fikra wan hemû mesele bi mîrata welatekî re girêdayî bû lê ji vê yekê zêdetir tişt hebûn. Arezûya dawî ya Xweda nêzîkayî bû. Bi gotinên azwer û helbestî hemû niyeta xwe bi awayekî zelal ji gel re ragihand:

> “We dît ku min bi Misriyan çi kir û çawa we li ser baskê teyrên baz siwar kirin *û anîn ba xwe.*” (Derketin 19:4, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Lêbelê arezûya wî di gotinên Îsaraîliyan de cih nedigirt. Hevokên ku saz dikirin motîvasyoneke pir cuda nîşan dida: “Çawa ku te em nebirin ew welatê ku şîr û hingiv jê diherikî, te weke milk erd û rez jî nedan me” (Hejmara Çolê 16:14). Dilên wan ne bi *kesê* wê weke mîrat rahiştanayê ve girêdayî bû, bi *tiştên madî* re girêdayî bû.

Xweda arezûya xwe bi rêya Mûsa çend caran dubare kir û ji zuriyeta Brahîm re anî ziman. Daxuyaniyeke weke vê ev e:

> “Çimkî tê neperizî îlahan. Ez Xudan im û navê min Xîret e. Xwedayekî xîretkêş im.” (Derketin 34:14)

Xweda ji hemû gelê Îsraîlê re got: “Min ji we hez kir.” Lêbelê ji ber nezaniya wan û dilê wan yê kor wisa bersiv da: “Te çawa ji me hez kir?” (Melaxî 1:2). Ji ber ji bêrîkirina Xweda re çavên xwe girtibûn, hewldana Xweda ya ku xwe bigihîne wan weke çalakiyeke belasebeb nirxandin.

Li hemberî bêîteatiya wan ya ku çend caran dubare bû, arezûya Xweda weke xwe ma. Di rojên Yêremyayê de Reb wisa gazinan dike: “Min gelek caran bang we kir lê we guhdar nekir; min bang we kir lê we bersiv neda” (Yêremya 7:13). Ji roja ew ji Misrê derxistin û heta wê kêliyê, ji wan re ragihand ku bê navber li wan digeriya (bnr. Yêremya 7:25).

Di nava van hemûyan de hezkirina Xweda tu carî têk neçû lê delîla herî mezin ya encama arezûya Wî Îsayê Mesîh e. Îsa bi xwe wisa anî ziman: “Ji bo vê yekê Kurê Mirov hatiye ku li yê windabûyî bigere û wî xilas bike” (Lûqa 19:10). Em gava dijminê Wî bûn, Ew ne tenê ji bo xelasiyê ji bo lêgerînê jî hat.

## JI BO ME HEMÛYAN RAMANÊN WÎ YÊN TAYBET HENE

Gava em bêriya kesekî dikin, em her kelî li wî kesî difikirin. Mirov ferq dike ku di nava rojê de ramanên me ber bi wî ve diçin û heta bi şev ramanên me digihêjin wî kesî. Heta em ya dilê xwe tînin ziman û bi kesên din re parve dikin ku me çiqasî bêriya wî kiriye û em her dem li wî kesî difikirin. Xweda ne kêmî vî tiştî ye. Xweda ramanên xwe yên derbarê me de ji Dawid re gotin. Dawid ramanên taybet yên Xweda yên derbarê her yekî ji me de radigihîne:

> "Fikrên te yên ji bo min, çiqas bi rûmet in, ey Xwedê, Tevahiya wan, çiqas pirr in! Eger ez wan bijmêrim, ji sêlakê zêdetir in. Ez hişyar dibim, hê ez bi te re me." (Zebûr 139:17-18)

Fêhmkirin hema bêje ne pêkan e lê ramanên Xweda yên derbarê her yekî ji me de ji libên qûmê yên li ser rûyê erdê zêdetir in! Li vê bifikirin, ji hemû gerestêrkan libeke qûma ku ji wan hatiye danhev xeyal bikin. Li her libên li her plajê, li her beyebanê, li her golê, li her bahrê, li her okyanûsê û helbet li her seheya golfê, bifikirin. Gava tenê li hawizê parqeke zarokan dinêrim, ez nikarim li wî cihê biçûçik libên qûmê xeyal bikim. Lê Xweda behsa her libeke qûmê ya li ser rûyê erdê dike! Aqil di hejmara wan de nagihêje! Di nava van bîst û yek salên derbas bû de, gelek ramanên min yên derbarê hezkirina li hemberî xanima min çêbûn. Lê ew ramanên min hemû weke libên qûmê bûna, qedehek jî tije nedikir. Îcar ka hemû dinya li kuderê ma!

# TU QEDIR Û QIYMETÊ BIDÎ ÇI TU YÊ BIKEVÎ DÛ WÎ TIŞTÎ

Ev ramanên wisa; taybet in ji bo kesên em ji wan hez dikin, bêriya wan dikin û dixwazin nêzî wan bin! Aniha hûn dest pê dikin û dibînin bê Xweda çiqasî ji we hez dike? Gelo hûn fikrîne bê hûn ji bo Xweda tên çi wateyê? Gava em danûstendinê dikin em li dikanên tijê malên ku li ser wan etîketa fiyetê wan heye, digerin. Hin jê erzan in û hin jê jî biha ne. Her yek ji wan li gorî nirxê xwe fiyatek lê tê kirin. Lê eger em mişteriyên bi zana bin herî kêm bi qasî pereyên em didin an jî ji pereyên me dane bi qedirtir em ê ji xwe re mal bikirin.

Di jiyanê de nirxekî her tiştî heye. Ev nirx li gorî nêrîna mişterî tê diyarkirin. Berî bi çend salan gogeke beyzbolê derxistibûn firotinê. Lê ev gog ne gogeke ji rêzê bû. Ew goga ku Mark MacGuire di kariyera xwe de hejmara tûra heftêyî pê lêxistibû. Wê serdemê, di dîroka lîgê de di sezonekê de bi ser rekora hejmaran ya herî zêde ketibû. Gog bi 2.7 milyon dolaran hat firotin! Ewqas pereyê min hebûya jî, ji bo gogekê min tu carî ewqas pere nedidan. Ji bo çi? Ji ber ku ji bo min ewqasî ne bi qedir û qiymet e. Lêbelê eger wan rojan fersend hebûya, tê bîra min kesên ku wê ji van pereyan zêdetir bidana hebûn. Lê êdî ji ber ku ew rekor derbas kirine, ew goga ku wê demê bi çavekî mezin lê dihat nêrîn êdî tu kes wî fiyetî lê nake û ez bi guman im ku tu kes ji deh bahran bahrekê nade pê. Nirxê wê ketiye.

Naxwe pirsa em ê bikin ne ev e: Ji bo civakê nirxê me çi ye? Ev li gorî rewşê tê guhertin. Nirxê jiyana mirov jî di nava mirovan de jî guherbar e. Ji ber ku bi milyonan mirovên ku hîn zarokên wan çênebûne bi kurtajê wan ji ber xwe dikin û dikujin, hene. Jiyana pitik ne hêjaye wê “aciziya” dide wan. Zilamên ku dev ji jin û zarokên xwe berdidin hene. Ji ber ku bawer dikin ku ev têkilî ne

hêjayî wî wext û enerjiya di ber wan de xerc dikin. Rehetî û kêfa wan ji bo wan ji jiyana jin û zarokên wan pir bi qedir û qiymettir e. Kesên orispîtiyê dikin û bedena xwe difiroşin hene. Lîste bi vî awayî dirêj dibe û diçe û di civaka me de bi milyonan mirovên birîndar derdikevin holê. Ji ber ku bi çavên kesên din li qedir û qiymetê xwe dinêrin, kesên hîs dikin ku tu kes ji wan hez nakin û tu kes wan naxwazin, hene.

## QEDIR Û QIYMETA ME YA DI ÇAVÊN XWEDA DE

Ji bo Xweda nirxê me çi ye? Ha em nirxê xwe yê bi rastî di wir de dibînin. Li vê gerdûnê yên ku sitandarta nirxê diyar dikin ne mirov in, Xweda ye. Ji ber ku "çi tiştên ku mirov bi wan xwe bi xurûr dikin, ji bo Xweda ne tu tişt in" (Lûqa 16:15).

Îsa wisa got: "Mirovek hemû dinyayê bi dest bixe jî, lê jiyana xwe winda bike, çi feyda wî heye? An dikare çi di ber jiyana xwe de bide?" (Metta 16:26). Kêliyekê li hemû dewlemediya li vê dinyayê bifikirin. Li qesr û qonaxên bi milyon dolaran, hemû cewahîr û madenên hêja, erebeyên pir biha, balafir û keştiyên şexsî, alavên elektronîk yên modelên dawî bifikirin û ev hemû ji wan tiştên "xweşik" tenê hinek in. Li vê dinyayê hema bêje gelek xezîneyên pir mezin yên ku mirov nikare wan xeyal bike hene. Li gorî xebatên dawî mezinahiya aborî ya ku hemû dinya hildiberîne, bi texmînî 35.8 tirîlyon dolar e. Eger em bi reqeman vê nîşan bidin 35.800.000.000.000.00 e. Ev serweteke ku aqlê mirov nikare ji nav derkeve, bi ser halan de fiyetê milkan ne di nav vî pereyî de ye. Lêbelê Îsa dibêje ku mirovek ji bedêla canê xwe eger vê dewlemendiyê hilbijêre ev fikreke pir beradayî ye!

Eger nirxê me yê bi rastî yê ku Xweda dide me, ji hemû xezîneyên vê dinyayê mezintir be, naxwe ji bo Xweda nirxê me çi ye? Em wisa dixwînin: "Çimkî Xwedê wisa ji dinyayê hez kir

ku Kurê xwe yê yekta da" (Yûhenna 3:16). Piştî ku ji aliyê Adem ve têk çû, em di bin bindestiya Şeytanê pîs de bûn (bnr. Lûqa 4:6). Gunehê Adem li her kesî belav bû û Şeytanê ku weke îlah ev dinyaya xerabe bi rêve dibir, em hemû bûn koleyê gunehê. Ji ber ku digot li ser we mafê min heye, em serbest bernedidan. Encama dawî ya li benda me bû, bêyî hêviya xelasiyê heta hetayê tarî bû. Tekane rêya ji bo em azad bibin ew bû ku em dihatin kirîn. Lê bedêla vê ewqasî giran bû ku tu mirovên li vê dinyayê nikarîbû bikiriya.

Xweda ji bo bedêla me Îsa da. Tu tişt û tu kesê din nikarîbû em bikiriyana ji ber ku Xweda dibêje: "Ji ber ku biha ye fîdya can, Kes wê nade ber çavan" (Zebûr 49:8). Xweda ewqasî qedir û qiymetê dide jiyana me ku em bi rêya Îsayê Mesîh kirîn. Pavlûs wisa dinivîsîne: "Çimkî hûn bi bihayekî hatin kirrîn" (Korîntî I, 6:20). Di nameyeka xwe ya din de jî Bav dibêje: "Bi saya wî em bi berdêla xwîna wî rizgar bûne, me lêbihûrtina neheqiyên xwe standiye" (Efesî 1:7).

Li vê gerdûnê ji bo Bav Xweda tu kes û tu tişt ji Kurikê Wî Îsa bi qedir û qiymettir tiştek tuneye. Lêbelê bi kirîna me re Xweda îlan kir ku xezîneya herî mezin ya nirxê me beramberî vê ye. Ha va ye tespîteke bêhempa: Eger ji bo Xweda nirxê me ji nirxê Îsa bi qurûşekî kêmtir bûya, Bav tu carî Ew nedida ji ber ku Xweda tu carî peymanên bêkar nake! Ji bo tiştekî bê qedir û qiymet, gava we tiştekî bi qedir û qiymettir da, ev dibe danûstendineke nebaş an jî dibe karê serbiserke nebaş. Tu ji xwe re lê binêre! Hûn dibînin bê hûn ji bo Bav çiqasî bi qedir û qiymet in? Îsa bi vê gotina xwe vî tiştî pesend dike: "Rûmeta ku te da min, min da wan, da ku ew bibin yek, wek ku em yek in: Ez bi wan re, tu jî bi min re, da ku ew bigihîjin yekîtiyeke temam û dinya bizane ku te ez şandime û çawa ku tu ji min hez dikî, tu ji wan jî hez dikî. Ya Bavo, ez dixwazim yên ku te dane min, li cihê ku ez lê me bi

min re bin, da ku rûmeta ku te daye min bibînin. Çimkî te beriya damezrandina dinyayê ji min hez kir” (Yûhenna 17:22-24). Îsa bi awayekî zelal, çawa ku Bav jê hez dike, tîne ziman ku ji me jî hez dike! We ev bihîstiye? Hûn nirxên xwe yên bi rastî dibînin? Hûn fêhm dikin bê ji bo çi li we digere?

## BELÊ, LÊ EZ JÎ JI GELEK MIROVAN TENÊ YEK JÊ ME

Dibe ku hinek jê vê derxînin pêş: “Belê, Xweda ev bi giştî ji bo hemû mirovahiyê kir lê di nava evqas mirovan de ma ez çi me?” Bersiva vê ev e: Eger tenê hûn bûna, wê Ew dîsa li we bigeriya û ev bedela mezin bi we bidaya û wê hûn bi fîdyeyê xelas bikirina. Ev di xizmeta Îsa de bi zelalî xuya dike. Rojên xwe ji bo hînkirina serdestiya Xweda nîşanî girseyan bike, derbas dikirin. Diwestiya lêbelê tiştekî ku nikarîbû bisekine hebû. Bi saya rêliberxistina Giyanê Pîroz, Îsa ji xwendekarên xwe re got, li qeyikê siwar bibin û herin aliyê din yê Gola Celîle’yê. Tam gava digihên orta golê firtone li wan radibe û bi mirinê re dikevin rûyê hev lê ji ber Îsa pir westiyaye, di qeyikê de dikeve xew. Xwendekar ji tirsan wî şiyar dikin, li ser vê Îsa emir dide ba û golê û firtoneyê disekinîne.

Di piraniya şevê de bi firtoneyê re li ber xwe dabûn. Êdî gîhabûn aliyê din yê avê û di dawiyê de belkî hinekî bêhna xwe berdabin. Lê çawa gava xwe avêtin ser rûyê erdê bi zilamekî ku xwe teslîmî giyanên ne baş kiriye, li hev rast hatin. Ev zilam li şikeftên goristanan dijiya û bi zincîran jî nedihat zeftkirin. Bi şev û roj li nav goristanan, li çiyayan dikir qêrîn û hawar, û xwe bi keviran birîndar dikir (bnr. Marqos 5:3-5).

Eger ew aniha di roja me de bijiya, wê ev zilam têxistana nexweşxaneyeke dînan û bêguman wê ew di hucreyê de tecrîd bikirina. Wê dermanên ew ji ser hişê wî bixistina bidanayê û wê ew di halê xwe de bihiştana. Gelek kes vî zilamî bi tu

tiştî nahesibînin û tenê ji ber ku qanûnan destûr nedida ew nedikuştin. Weke kurtêlekî civakê dihat dîtin û tu qedir û qîmetê wî tunebû. Hema bêje tu kes bi wî danediket û ew nedixist şûna zilaman.

Lêbelê ev zilamê ku xwe bi giyanê nebaş girtibû, qedir û qiymeteke wî yê mezin hebû di çavên Bav, Îsa û Giyanê Xweda de. Îsa ji bo wî karekî zor û zehmet kir. Karekî pir zehmet bû ji bo zilam ji giyanên pîs xelas bibe. Berî roj here ava kincên xwe li xwe kiribûn û bi awayekî ku hişê wî hatiye serê wî li tenişta Îsa rûniştibû. Aliyê vê çîrokê ku mirov matmayî dihêle ev e: Piştî Îsa zilam ji giyanên pîs xelas kir, “bi qeyikê vegeriya aliyê din yê avê” (Marqos 5:21). Ez wê roja ku Xweda ev kîtekît nîşanî min da qet ji bîr nakim. Ez matmayî mabûm. Piştî rojeke pir mijûl ku Îsa pir westiyabû, sirf ji bo mirovekî xwedî giyanekî xerab ku ji aliyê civakê ve hatibû qewitandin û tu kesî ew bi tu tiştî hesap nedikir, xelas bike gola bi firtone derbas kir û dîsa piştî wê li qeyika xwe siwar bû û rêya ku çûbû dîsa vegeriya û hat aliyê berê yê golê. Ez li hemberî vê ji hev de ketim. Ev hemû ji bo zilamekî tenê kiribûn!

Gava min ev dît, eger li dinyayê ez bi tenê weke mirov mabûma jî, dîsa jî ji bo bi Wî re parvekirina me hebûya, min baş fêhm kir ku wê li min bigeriya û wê bedêla min bidaya. Ji ber vê şeva ku Îsa çêbûye divê mirov şaş nemîne ku ferîşteyên li bihuştê ji bo başî û qenciyê ji mirovên li ser rûyê erdê re hatina wî pîroz bikin îlahî xwendine! Lêgerîna Xweda ya ku li me digeriya li ber çavên mirovan xuya dibû!

## ÎSA HER YEKÎ JI ME ÇAWA DIBÎNE?

Yek ji wan wehiyên herî mezin ya ku Reb da min, piştî xelasiya min di demeke kurt de bû. Gava min erebe diajot û dua dikirin di heman demê de min bi Xweda re parvekirin dikirin û ji nişka

ve tiştekî ku di ramanên min de şoreşekê çêbike dest pê kir. Min bihîst ku ji dilê min re wisa kire pistepist: "John, te zanîbû ku ez te di ser xwe re dibînim?"

Çawa min ev hevok bihîst, ez fikirîm ku ev weke sixêfekê ye û ji ber dojehê pêk tê. Ez fikirîm ku ev qebhet û bêhurmetiyeke li hemberî Xweda ye. Hindik mabû min bigota: "Bicehime here Şeytan!" Lêbelê di kûrahiya dilê xwe de min hîs kir ku dengê Reb e. Ji ber wê min tiştekî ku ez jê piştrast bûm kir. Min wisa bersiv dayê: "Reb, ji bo bawer bikim ev di ser qeweta min re ye. Erd û asîmanê ku Te Reb Îsa ava kiriye, kesekî weke min biçûk ku tu ji xwe mezintir dibînî, bi min weke mirov sixêfekê ji Xweda re bike, tê. Rêyekê tenê bide ber min ji bo ez vê bipejirînim. Ew jî ew e ku tu ji Peymana Nû sê ayetan bide ji bo ev yek îspat bibe."

Piştî min ev got, min hîs kir ku kêfa Xweda jî hat û min di dilê xwe de ev ev bihîst: "Filîpî 2:3 çi dibêje?"

Ji ber min ev ayet zanîbû min bi deng got: "Tu tiştî bi hevrikiyê an bi pesindana pûç nekin. Lê bila bi nefsbiçûkî her yek ji we yên din di ser xwe re bigire" (Filîpî 2:3).

Reb got: "Ha ev ayeta te ya pêşî bû!"

Ez li ber derketim: "Reb, li vir Pavlûs ji bawermendên Filîpî re dibêje divê hûn hevdu di ser hev re bibînin. Derbarê têkiliya min û te de tu tiştî nabêje."

Hema pişt re min ev bihîst: "Kurikê min, tiştekî ku min nekiriye ez naxwazim zarokên min tu carî bikin!" Pişt re nîşanî min da ku ev li gelek malan pirsgirêgek e. Dê û bavên ku hin tevgeran nakin îcar dixwazin ku zarokên wan, wan tevgeran bi cih bînin. Îcar Reb eger ew bi xwe ji me re nebe weke mînak, tu tevgeran ji me hêvî nake.

Min ev pejirand lê ji ber ez di ser xwe re didîtim, hîn dilê min tam neketibû cih. Min wisa got: "Rebê min, ev tenê ayetek e, ji kerema xwe re du ayetên din nîşanî min bide." Min bêhurmetî nedikir, ez bi baldarî tev digeriyam.

Pişt re pirseke ku agir berda kezeba min lê zêde kir: “John, kî bi çarmîxê ve daliqandin, tu an ez?

Jixwe min zanîbû lê aniha ew rastiya şênber bêtir xuya bû û ez şaş mam û bersiva min zelal bû: “Tu bû, Reb Îsa.”

Reb berdewam kir: “Divê li wê çarmîxê tu bihata daliqandin lê guneh, lanet, nexweşî, êş û xizaniyên te min hilgirtin. Min ev kir ji ber min tu di ser xwe re dît.”

Gava min gotinên Wî bihîstin ez sewsî bûm. Bi xêra gotinên wî hemû gumanên min zelal bûn. Min bi awayekî zelal dît ku ew êşên kişandin yek jê jî heq nedikir. Ew rast bû, ew dilpak bû. Ayeta Petrûsê 1em ya 2:24an hat ji min re: “Wî li ser xaçê, gunehên me di bedena xwe de hilgirtin, da ku em li hember gunehan mirî bin û ji bo rastdariyê bijîn. We bi birînên wî şîfa dît” (Petrûs I, 2:24).

Bi rastî jî min fêhm kir ku min di ser xwe re dibîne. Dilê min şikest û min dest bi hebandinê kir. Lêbelê min zanîbû wê ayeta sisêyan jî bê û bi rastî jî Reb ji dilê min re peyivî: “Romayî ayeta 12:10an çi dibêje?”

Dîsa ayeteke ku min berê zanîbû û min bi deng got: “Di biraheziyê de, bi dilovanî ji hevdu hez bikin. Di hurmetgirtinê de ji xwe bêtir hurmeta hevdu bigirin.”

Min bihîst ku wisa got: “Di nava gelek birayan de yê pêşî çêbû ma ne ez im? (Romayî 8:29). Ez birayên xwe tercîh dikim û wan di ser xwe re dibînim.”

Min gelek caran bihîstibû bê Îsa çawa ji me hez dike. Lê gava ev gotin ji dilê min re gotin, weke şexs diyar û zelal bû bê em ji bo Wî çiqasî taybet in. Ya rastî, Rebê me kesên ji malbata xwe weke xezîneya xwe bi nav dike. Ji me re dibêje ku em taybet in. Tîne ziman ku em roniya çavên Wî ne. Vê baş fêhm bikin: Ew ji bo me kêfa xwe tîne! Ax erê, guhê xwe bidin van gotinên rast û xweşik: “Xwedayê te Xudan Rizgarkarekî hêzdar e Û di nav te de ye! Wê ji

bo te şa û kêfxweş bibe. Wê bi hezkirina xwe te nû bike, Ji bo te wê bi stranan dilgeş bibe” (Sefanya 3:17).

## MA MIROV ÇI YE?

Ferîşte, bi çavên meraqdar li Xwedayê pîroz û bilind bê çawa qedir û qiymetê dide mirovên ji rêzê, temaşe dikin. Em wisa dixwînin: “Gava ku ez dinêrim li ezman, Karê destê te, heyv û stêran, Hingê dipirsim ez ji xwe: Mirov çi ye ku tu wî bibîr bînî, Kurê mirov çi ye ku tu wî bibînî?” (Zebûr 8:3-4). Ev gotin ji aliyê Dawid ve hatibe nivîsandin jî, ez bawer dikim ku ramanên hebûna hêzên asîmanî yên li dora textê Xweda, hiştine Dawid van bibîhîze. Van ferîşteyan li “Xwedayê Hêza Wî Digihêje Her Tiştî” yê bi destên xwe şikil da gerdûnê, temaşe kirin. Li huzûra Xweda ewqasî nefsbiçûk in ku her kêlî bang hev dikin û ji hev re dibêjin: “Pîroz, Pîroz, Pîroz.” Ji ber ku her kêliya diçe û derbas dibe aliyekî din yê mezinbûna Wî derdikeve holê. Û hemû tiştên dikarin bikin heta hetayê pîrozbûna wî îlan bikin. Ewqasî bi dengekî bilind bang dikin ku odeya text tê de ye çerçoveya deriyên wê dihejin. Lêbelê ev Xwedayê bêhempa ku evqasî bi me dadikeve lê ecêbmayî dimînin. Fêhm dikin ku hezkirina wî ya li hember me û ramanên wî yên baş ji hemû libên qûmê zêdetir in. Ev yek dihêle ecêbmayî bimînin!

Em xezîneyên wî yên bi qedir û qiymet in. Em cewahîrên ku Wî kifş kirine û şikefta ku dixwaze tê de bijî, em ew kevirên zindî ne ku me ev şikeft avakiriye. Xweda li hemberî me çima wisa hîs dike? Ji bo em hezkirineke wisa heq bikin me çi kiriye? Ha ji rastiyan ya herî mezin ev e. Ji bo em hezkirina Wî û lêgerîna Wî ya har ya ku li me digere, heq bikin me tu tişt nekir. Ji ber hîn gava em di nava qelsiyê de guhekarên windabûyîbûn û em dijminên Wî bûn, li me geriya û em pêde kirin. Di nava me de tiştê ku

tenê hezkirina Wî dikare bibîne, dît. Di nava çilvirîbûn, guneh û bêçaretiyê de xezîne dîtin. Gelek kesên ku tiştek bênirx didîtin an jî kêm qedir û qiymet didanê, ew tişt bi qedir û qiymet kir û ew kirî. Li derveyî rewşa em di nava wê de ne dît û tenê wî tiştê ku xweşikbûna Wî dikare hilberîne, dît.

Îcar aniha em dikarin vê ayetê bi zelaliyeke mezin fêhm bikin: “Hûn bi bihayekî hatin kirrîn, nebin xulamên mirovan” (Korîntî I, 7:23). Kesekî ku evqasî tê hezkirin û qedir û qiymet jê re tê girtin, çima dixwaze li pergaleke ku demekê ew kiribû kole û tu qedir û qiymet nedidaye, vegere? Her çiqasî Xweda li hemû gerdûnê hebûneke herî mezin û bala be jî, gava me fêhm kir ku dixwaze têkiliyeke şexsî bi me re deyne û arezûyeke har bi rastî li me digere, îcar em çawa dikarin xwe ji vexwendina nêzîkayiyeke wisa bêhempa re ker bikin? Êdî em hew dikarin zêdetir Wî red bikin ji ber ku tenê nezanî dikare rê li ber tevgereke wisa trajîk veke.

*(Noteke girîng: Di Nivîsên Pîroz de her çiqasî Xweda li me bigere jî, tê ziman ku ji bo em bi Wî re têkiliyekê deynin divê em bi îteatê bersivê bidinê. Eger hîn jî we Îsayê Mesîh weke Rebê xwe û xelaskerê xwe ne pejirandibe, aniha vê kêlîkê tiştekî pir girîng e ku hûn herin dawiya vê pirtûkê û li Pêveka A'yê binêrin).*

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Îsraîlên ku ji bindestiya Misrê ya çarsed salî rizgar bûn, armanca sereke ya ku Xweda ew azad kirin bi temamî fêhm nedikirin. Reb wisa diyar kir: “Min… hûn anîn cem xwe,” lêbelê wan anî ziman û fikirîn ku qey hemû mesele mîrateya welatekî ye û ji halê xwe gilî û gazin kirin. Weke nivîskar diyar kiriye, dilê wan ne bi Kesê ku wê li mîratê xwedî derketaya ve girêdayî bû, dilê wan bi tiştên madî re girêdayîbû. Xweda bi xwestina ku we bîne cem xwe re,

hûn ji bindestiya gunehê azad kirin. Hûn jî weke wan gilî û gazinan dikin an jî ji halê xwe ne razîne gelo? We li şûna Kes tiştên madî bi cih kirin qey?

2. Di bêşê de ev pirs hat pirsîn: “Kesekî ku evqasî jê tê hezkirin û qedir û qiymet jê re tê girtin, çima û ji ber çi dixwaze li pergala ku demekê ew weke kole êsîr girtibû, vegere?” Hûn ê bersiveke çawa bidin vê pirsê?

3. Nivîskar, piştî xelasiyê bi demeke kin di mijara bê di çavê Reb de çiqasî mezin e, diyalogeke ku di navbera wî û Xweda de derbas dibe, parve kir. Agahiya ku hûn “cewahîreke tê kifşkirin” in, jiyana we û têkiliyên we çawa diguherîne an jî divê çawa biguherîne?

BEŞ 3

# BIRÇÎBÛNA XWE BIPARÊZIN

"Em xwe bi çi têr bikin, em birçiyê wê ne."

Mirovekî ku xelas nebibe ji bo nêzî Xwedayê dijî bibe, divê serê pêşî Reb wî ber bi xwe ve bikişîne. A.W. Tozer wisa dinivîsîne: "Mirovekî gunehkar ji bo derbarê Xweda de rast bifikire, divê pêşî di nava wî de karekî roniyê bê kirin" (Lêgerîna Xweda, r.11). Îsa ji me re wisa dibêje: "Tu kes nikare bê ba min, heta Bavê ku ez şandime wî ber bi min ve nekişîne" (Yûhenna 6:44). Ji ber vê kesên bi rêya Îsa bi Xweda re ne di nava têkiliyê de bin, ji bo kesên wisa rêliberxistin pir girîng e. Xweda "dixwaze ku hemû mirov xilas bibin û bigihîjin zanîna rastiyê" (Tîmotêyos I, 2:4). Û di seranserê dîrokê de her dem her çiqasî ev kiribe armanc jî, dîsa jî dixwaze ku zarokên wî ji bo kesên windabûyî arezûya xwe parve bikin û li ser navê wî li ber wan bigerin. Ji ber

vê Îsa wisa got: “Hingê wî ji şagirtên xwe re got: Dexil gelek e, lê pale hindik in. Loma lava ji Xudanê dexlê bikin, da ku ji bo dexla xwe paleyan bişîne” (Metta 9:37-38).

Piştî ku Îsa bi wehiya Xweda xelas bû, îcar em ji Xweda vexwendineke eşkere distînin. Ji zarokên xwe re wisa dibêje: “Nêzî min bibin.” Xweda bi vê vexwendina ku li hemû dewr û dewranan derbasdar e, gava pêşî avêtiye. Devî dişewite… Bi navê me bang me dike… Li qiraxa qeyikê sekiniye! Li benda me ye ku em bersivê bidinê!

Berî bi çendakî bawermendekî ji min re wisa got: “John, her ku mirov pîr dibe û xizmetê ji Xweda re dike, nêzîkayiya me ya li Wî; ez fêhm dikim ku ev bi hewldana Wî ya ku me ber bi xwe ve dikişîne ve girêdayiye.”

Ez li hemberî vê gotinê derketim: “Na, ev ne rast e.”

Li ser vê yekê ayeta ku Îsa digot, eger Bav kesekî ber bi xwe ve nekişîne, tu kes nikare ber bi Wî ve were, anî bîra min.

Min wisa bersivand: “Belê, ev ji bo kesên bawer nake rast e. Lê Xweda ji kesên aîdî Wî ne re dibêje: ‘Nêzî min bibin, Ez ê jî nêzî we bibim.’ Bi awayekî zelal vê gavê her kêlî tîne ziman ku em dikarin biavêjin.”

Belê, hin dem hene ku Xweda dixwaze me bibîne û vê hevdîtinê ew bi xwe dixwaze bide destpêkirin. Lêbelê ev nayê wê wateyê ku gava pêşî ne em ê biavêjin. Bi Wî re têkiliyeke me heye û weke têkiliya her bav û kur ya normal, çawa demên ku kurik dest bi têkiliyê bike heye di heman demê de dibe ku heman tiştî bav jî bide destpêkirin.

## ÇIMA ZÊDETIR KES VEXWENDINA WÎ NAPEJIRÎNIN?

Pirsa ku serî tevlihev dike ev e: Ji ber çi têkiliya gelek mirovan bi Xweda re qels e? Ji ber çi bi Wî re ji bo têkiliyeke kûrtir û yeka

bi îstîkrar ava bibe, gava navêjin? Tişta ku wan li dawî dihêle çi ye? Tişta ku dibe sedema banga Wî ya nêzîkayiyê çi ye? Bersiva vê pir hêsan e: Divê em tî û birçiyê naskirina Wî bin. Dawid wisa gilî û gazin kirin:

> "Canê min ji Xwedê re, ji Xwedayê jîndar re tî bûye; Ezê kîngê vegerim û li pêş Xwedê bêm dîtin? Ji bo ku her roj ji min re gotin «Xwedayê te li ku ye?» Bi şev û bi roj hêstirên çavê min, bûn xwarina min. Gava ku tê bîra min, dilê min dike kizirîn, Çawa ez bi civatê re dimeşîm, Bi şahî û dengê spasî, Bi qelebalixa ku dike ceng, Bi wan re heta mala Xwedê dimeşîm." (Zebûr 42:2-4)

Berî hûn bidomînin van ayetan careke din bi hêdîka bixwînin û her peyvê di nava xwe de baş biserifînin. Bala xwe baş bidin vê hevoka Dawid: "Her ku tê bîra min ez dikim xwe bixwim." Peyva Îbranî ya ku weke "bîranînê" wergerandine "zakar" e. W.E Vines dibêje ku wateya vê peyva Grekî tenê nayê wateya "bîranînê" tê wateya "girtina di dil de" jî. Ev wate di vir de pir lê hatiye. Dawid di rastiyê de vê dibêje: "Gava *ez arezûya li hember Xweda di dilê xwe de* digirim, nava min hevdu dixwe." Bi vî awayî birçîbûneke ku qet têr nabe ya li hemberî Xweda di nava min de diwelide! Ev birçîbûn li hemberî hemû bertekên giyanî, hişmendî an jî fizîkî, me ber bi nêzîkayiya Xweda ve dibe. Ji ber vê birçîbûna em ji bo Wî hîs dikin, girîng e mirov biparêze û gur bike!

## REB, BIRÇÎBÛNA MIN ZÊDE BIKE!

Gelek kes wisa duayan dikin: "Reb, birçîbûna min ya ji bo Te zêde bike." Lêbelê ev nêzîkayî ne rast e. Tişta birçîbûna me diyar dike ne Ew e, em bi xwe ne. Li Amerîkayê em xwedî derfetên madî, kêfxweşî, dewlemendî û xwedî zewqan in. Tenê rêya ku em

dikarin li hemberî Xweda birçîbûnê ava bikin û vê yekê biparêzin, hilbijartina ku em ê canê xwe bi çi dagirin. Di ayeta Şîretên Silêman 27:7an de wisa dibêje: “Kesê têr hingivê jî naxwaze.” Bi awayekî din, eger dilê we bi xem, zewq, hezkirina pereyan û bi xwestekên vê dinyayê re tije be, hûn ê têr bibin û wê dilê we tu carî naçe hevpariya hingivîn a bi Xweda re.

Li Roja Spasdariyê bifikirin. Malbatên Amerîkayî di vê roja betlaneyê de li hev kom dibin û bi hev re li ser heman sifreyê rûdinên. Gelek kes ji bo wê rojê ji tiştên ku wê bixwin re rê vekin taştê naxwin. Mazûvanî dest pê dike: Elokeke xeşandî, paste û şêranî, fêkî, sosa tûşembî û hwd. datînin ser sifreyê. Em pir xwarinên curbecur dixwin ji ber ku dilê me lê vebûye. Piştî xwarin xelas dibe, ji ber me pir xwarin xwariye em dest bi ayayan dikin. Edî em têr in! Pişt re piştî çend saetan em diçim serdana dostekî xwe. Xwerinên bi hemû xweşikbûna xwe careke din tên ber me! Vê carê menuya tê pêşkêşkirin bêtir pisporî ne lê vê carê ji bedêla me, em xwe bavêjin wan, em ji wan direvin. Ji ber ku mîdeya me bi xwarinên berî van tije ye. Em çavekî li sifreyê dixin lê êdî em dizanin ku em nema dikarin zêdetir bixwin. Ferq nake ku ev xwarin ji yên berê xweştir be. Ji ber ku dilê me qet naçe wan. Wateya ayeta Şîretên Silêman ev e.

Ji bo em vê rastiyê gaveke din bibin bi pêş de, divê em fêhm bikin ku ev tiştekî hevseng e. Eger dilê we bi arezûyên vê jiyanê re giran bibe, hûn ji mazûvaniyeke ku tê pêşkêşkirin nerevin jî herî kêm hûn dikarin bi çavekî sivik lê binêrin. Eger mîdeya we ne tije be û du saet berê piştî we xwarineke normal xwaribe îcar mazûvaniyek li we bê pêşkêşkirin, belkî hûn karibin hinekî bixwin an jî qet destê xwe nedinê. Gava ez diçim serdana bajarekî gelek caran ji bo xwarinê min vedixwînin restorantên pir bi navûdeng. Lê ji ber berî bi çend saetan min xwariye ez ne birçî me û bi awayekî kubar ez vexwendina wan napejirînim. Ramana xwarinê,

weke senaryoya Roja Spasdariyê ya li jor bi min weke tiştekî nexweş neyê jî, bi min xweş nayê. Lê ji bo kesekî ku rojekê an du rojan birçî maye mirov jê re heman teklîfê bike, wê bi temamî bersiveke cuda bê dayîn. Kesekî wisa wê ji bo xwarinên hûn nikarin bixwin, av bi devê wî bikeve. Ango rastî ev e, bersiva ku hûn ê bidin banga Xweda, bi tiştên jiyanê re bê hûn çiqasî ji wan têr in, girêdayiye û ev yek vê diyar dike.

Mirovên li dêrê ji bo arezûya tiştên xwedayî, gelek caran tiştekî li xwe çênakin. Gelek jê ji hebûna Xweda narevin lê gava mirov wan û kesê birçî dide ber hev, ji sifreya li ber wan vekiriye direvin û bi tiştekî nahesibînin. Ma ne ji xwe berî bi çend saetan ji ser sifreya dinyayê têr xwarine û zikê xwe têr kirine. Ez li wan dinêrim bê ma gelo xwestina Wî tînin ziman lê tevgera wan gotinên wan piştrast nake. Sedema ku hûn vê pirtûkê di nav destên xwe de digirin, ez bawer dikim ku hûn Xweda hîn bêtir dixwazin lê ma dilê we bêriya Wî dike gelo? Ma gelo hûn weke wan kesan in ew kesên ku bi rojan li ber Xweda birçî mane an jî weke alkolîkekî ku ji eraqê mahrûm mabe an jî hûn weke bengiyekî ku pêdiviya wî bi eroînê heye? Ji bo em bigihên kamiltiyê divê em birçîbûneke bi vî rengî ava bikin.

## DÊREKE TIŞTEKÎ LI XWE ÇÊNAKE

Di pirtûka Peyxamê de gotinên Îsa yên ji dêra dawî re gotine gava hûn bi baldarî bala xwe didin wan, hûn rastiyeke ecêb di wan de kifş dikin. Berî her tiştî divê em fêhm bikin ku Îsa ji heft dêrên Asyayê re name şandine lê ev peyam ne tenê ji van dêrên dîrokî re, ji bo me hemûyan şandine, eger ne wisa bûya me nikarîbû ev di Nivîsên Pîroz de bixwendina. Hebûna van peyaman a di nav Nivîsên Pîroz de, tê wateya ku xwedî wesfekî pêxemberî an jî tê wateya ku di roja me de ji me re dipeyivin.

Peyamên pêxemberî gelek caran di xwe de pratîk, wate û pêkhatinan dihewînin. Nameyên ji bo hîtabî dêran bikin hatine nivîsandin, di roja me de ji me re ne tenê ji bo peyamekê ragihînin, di heman demê de gava ev peyam di dawiyê de cih digirin, dibe ku berî vegera Wî bê wateya ku ji dêra berî wê re be. Ev fikir bi mantiq e. Ji ber ku piştî Yûhenna ev name xelas kir wisa nivîsand: "Piştî van tiştan min dît ku va ye, li ezmên deriyekî vekirî heye. Ew dengê ku min pêşî bihîstibû û wek dengê *boriyê* bû, ji min re got: Hilkişe vir û ezê wan tiştên ku divê ji niha û pê ve çêbin, nîşanî te bidim" (Peyxam 4:1). Bala xwe bidin peyva "boriyê". Em dizanin ku di rojên dawî de: "Çimkî Xudan bi xwe wê bi gazîkirineke fermanî, bi dengê serekmilyaket û bi lêxistina boriya Xwedê ji ezmên bê xwar…" (Selanîkî I, 4:16-17). Peyama ji vê dêrê re hatiye ragihandin, ez bawer dikim ku ji heyama me ya em lê dijîn re derbeke taybet e.

Îsa diyar kir ku wê ev dêr ji aliyê giyanî ve cihekî şîrgerm be, bi îfadeyeke modern di arezûyê de wê kêm bin û kesên ji bo Xweda girîng in wê bi awayekî xwezayî nêzî wan bibin. Ji bo dilê Xweda xweş bikin wê carcaran ji dev ji rêya xwe berdin. Sedema vê tevgerê çi ye? Ji bîr nekin, ev civat ne dêreke ji rêzê ya ku Xweda nas nake -Îsa bi xwe vê dêrê pênase dike. Bersiva vê di jiyana wan ya xuyayî de xwe dide der. Îsa dibêje: "Tu dibêjî: Ez dewlemend im, ez gelek dewlemend bûme û qet hewcedariya min tune" (Peyxam 3:17). Ev peyv tînin ziman ku mixabin canê wan ne bi Xweda re lê bi tiştên madî re girêdayiye û ji bo Xweda ne azwer in.

## TEŞXÎSEKE TENG

Hinek jê wê bibêjin ku pirsgirêkên wan pir pereyan dikin an jî hebûneke madî ye. Ev incex dibe nirxandineke teng ya tiştên ku Îsa dibêje. Em li Dawid bifikirin, em dizanin ku xwedî gelek

xizmetkaran û xwedî serweteke mezin e. Hûn li eslê wê binêrin, em dixwînin ku ji bo Reb dihebîne ji Silêman re: “sed hezar talant zêr û hezar car hezar talant zîv û bêyî wezin tûnc û hesin amade kirim” (1. Dîrokan 22:14). Lêbelê gava ew bi xwe li ber Xweda digere, dibêje: “ez bindest û belengaz im” (Zebûr 86:1). Xwe weke kesekî mazlûm û feqîr dide naskirin! Em dizanin ku di vir de li gorî siyasetê bi helwesteke ne xweş tevdigere. Ji ber ku gava hûn ji Xweda wehiyê bistînin hûn nikarin tu kesî bixapînin. Herçiqasî ewqas zêr û zîvên wî hebûn jî xwe bi rastî jî weke mazlûm û feqîrekî didît! Tenê pêdiviya wî bi Xweda hebû û birçîbûneke xwedayî hîs dikir. Libergerîna wî guhdar bikin: “Guh bide min ya REB, bersivê bide min…” Dawid mihtacî bersiva Xweda ye. Tî û birçiyê nêzîkbûna Wî ye! Ji ber vê di vê astê de azwer e: “Ji bo ku her roj ji min re gotin Xwedayê te li ku ye? Bi şev û bi roj hêstirên çavê min, bûn xwarina min” (Zebûr 42:3).

Pirsgirêka Dêra Laodîkyayê ne tiştên madî bûn, pirsgirêk ew bû ku dihiştin tiştên madî canê wan kêfxweş bike. Dawid tu carî destûr neda vê. Tu carî nehişt ku serweta wî ya mezin birçîbûna canê wî têr bike. Bêguman endamên vê dêrê ji Dawid kêmtir xwediyê mal û milk in lê dêsa jî xwe bi mal û milkên xwediyê wan in xwedî kirin û ji vê yekê kêfxweş bûn. Kirina vî tiştî hişt ku arezûya wan ya ji bo hebûn û hevpariya Xweda qels bike.

## DIJBERIYEKE TÛJ

Di nav van bîst salên dawî de ez gelek caran bi vê rewşê re rûbirû mam. Careke jê min geşta niştecihên Cree’yê yên ku li bakurê Kanadayê dijiyan, kir. Ev qebîleya dawî ya Bakurê Amerîkayê bû ji wan re cihekî taybet hatibû veqetandin. Ya rastî ev gelê bi esil hîn berî bîst salan didan dû şopa koça xezalan û di konan de dijiyan. Mal û milkên wan hindik bû û mirovên pir

sade bûn. Di deh salên dawî de li malên wan yê pir sade tenê televîzyon zêde bibû.

Kêmzêde hezar kesên xwecih tevlî civînan bûn. Ez li wir çend rojan mam û min tiştekî xerîb ferq kir. Hema bêje bê îstîsna her kesê di ser bîst salî re heta tu bêjî bes birçiyê Xweda bûn. Ji gelek mirovên li Bakurê Amarîkayê dijiyan pir bêtir dilxwaz bûn. Hewcadarî naskirina Xweda bûn. Lêbelê yên di bin bîst salî re ne xema wan bû û tu birçîbûna wan xwe nedida der.

Di civînekê de ji bo waaz û hînkirinê mesihkirineke pir bi hêz hebû. Mirovên di konê mezin de li hev kom bibûn, bi rastî jî bereket ji wan dibariya. Di cihekî de çavên min çûn derveyî kon û xortên li dawî heta tu bêjî bes aciz bibûn û bê baldarî xuya dikirin. Ez bi wan kêliyên ku waaz bi mirov nexweş tên dizanim lê rewş ne ev bû. Ji bo îlankirina Gotina Xweda hêza Giyanê Pîroz bi awayekî pêhempa çalak bû. Min hîn nizanîbû bê ez çi dikim carekê min dît ku min xwe li nava mirovan xistiye û ez ber bi xortên ku li ber devê deriyê kon sekinîne, baz didim. Ez li ber wan geriyam û min ji wan rîca kir ku bên hundur guhdar bikin. Lêbelê bi awirên vikîvala ku te digot qey ez dînek im û derbarê jiyanê de tu tiştî ji hev dernaxim, li min nêrîn.

Ha wê kêliyê min tîşortên wan şivqeyên wan yên beyzbolê ferq kirin. Nivîsa li ser wan te digot qey şewq dan û derketin pêş. Logoyên curbecur yên tîmên fitbol û basketbolê li ser wan bûn. Giyanê Pîroz nîşanî min da ku ev ciwan bi tiştên di televîzyonê de li wan dinêrin tên jahrkirin û canê wan bi van tiştan tije ye. Mixabin, birçîbûna canên xwe bi van tiştên ku bi kêrî wan nayên re têr kirine! Min fêhm kir ku mirovên ji wan pîrtir bi televîzyonê re mezin nebûne. Bi vî awayî nelihevkirina di navbera kesên di bin bîst salî û yên di ser bîst salî re, diyar bû û şaşmayîna min jî çareser bû.

Ez rîca dikim, rast fêhm bikin bê ez dibêjim çi. Televîzyon her dem ji bo mezinbûn û birçîbûna me ne bi zerar e. Lê bikaranîna wê

girîng e. Gava em zewicîn pêşî bi salan me televîzyon nekirî, îcar aniha li mala me televîzyoneke me heye. Min gelek bernameyên ku îlham ji wan sitend û xwe bi alîkariya wan hîn kir, temaşe kirin. Bi xêra televîzyonê haya min ji bûyerên li dinyayê diqewimin çê dibin. Lêbelê ne tiştekî ku min têr dike an jî dilê min dixe cih. Ne bengîtiya min e. Ez dikarim li televîzyonê temaşe bikim lê dîsa jî ez dikarim bêriya tiştên xwedayî bikim û hevpariya xwe ya bi Giyanê Pîroz re biparêzim.  Her çiqasî feqîr bûn jî, van xortan birçîbûna xwe bi tiştên ku bi kêrî wan nayên têr dikirin.

Piştî vê rêwitiya xwe bi demeke kin ez çûm Bakurrojavayê Amerîkayê. Ji min xwestin ku ez êvareke Înê waazan bidim. Civîn ji hemû dêrê re vekirîbû lê gava min dît ji hefsed kesên ku tevlî civînê bûne, ji pêncsed kesî zêdetirî wan ciwan in ez şaş mam. Piştî civîn xelas bû, gelek xortên ji bo pirsên giyanî bikin li dora min kom bûn. Min li saeta xwe nêrî hema bêje bibû nîvê şevê. Piştî civîn xelas bû demeke dirêj em li ser meseleyên Xweda peyivîn. Di dawiyê de min xwe negirt û min got: “Ez dikim ji kêfan bimirim! Hûn pir birçiyê Xweda ne!”

Roja din berî ji bajêr veqetim, ez vexwendim firavînê. Helbet min nikarîbû bigota na. Li ser vê yekê qata jor a solaneke fireh a restorantekê dora xwe li ser danîn û pişt re sohbeta me li wir berdewam kir. Tecrubeyeke taze û bêhempa bû! Di navbera van her du komên xortan de bi qasî çiyayan ferq hebû û xortên Bakurrojavayî li gorî xortên din yên xwecihî her çiqasî bêtir halxweş bûn jî ji bo Xweda birçî û dilxwaz bûn.

Kesên di ser bîst salî re yên dêra Bakurrojava bi awayekî ecêb weke xortan ne dildar bûn. Yên yextiyar çima li dora min kom nebûn? Di dema xizmetê de çima hejmara xortan ji tevahiya kesên din yên emrê wan di ser bîstî re çend katan derbas kir? Ez bawer dikim ku canê kesên mezin bi xem û zewqên jiyanê giran bûye. Mijarên xwedayî perçeyek ji jiyana wan bû lê her çiqasî

gava înkar dikirin ku Îsa ne Reb e, ev ne dilxwaziyeke wan bû.

Piştî ku hem min û serokpastorê vê dêrê û hem jî pastorê ciwanan yê heman dêrê hev nas kir, ya rastî çavdêriya ku herduyan jî kiribû xwe diyar kir ku di mirovan de xwe zêde kiribûn. Ayeta Hoşêya 4:9an ji bo min bû xwedî wesfekê: "Tiştên hatine serê gel, wê bên serê kahinan jî..." Ev ayet bi awayekî hêsan dikare wisa jî bê şîrovekirin: "Tiştên bê serê pastoran wê bê serê gel jî -eger dilxwaziya pastor kêm be wê civat jî bê baldar be." Xweda, ev pastorê ciwanan yê bi vîzyon û dilxwaziyê di ser re diçû, ew di karê xwe de bi kar anî û aniha li bajarekî din bi awayekî hêztir xizmetê dike.

## ÇAREYA DÊRA TIŞTEKÎ LI XWE ÇÊNAKE

Ev rewşa bêeleqe ya berbelav a li dêrê, bingeha peyama ku Îsa dida vê dêra li bajarê Asyayê, pêk dianî. Li gotinên wî guhdar bikin:

> "Va ye, ez li ber derî radiwestim û lê dixim. Eger yek dengê min bibihîze û derî veke, ezê herim ba wî û ez bi wî re û ew bi min re, emê şîvê bixwin." (Peyxam 3:20)

Xizmetkarên dêrê vê ayetê ji bo kesên xelas nebûye weke bangekê gava pir bi kar tînin min şaş dike, lê tişta ku Îsa behs dike ne ev e. Vê bangê ev dêr dike. Ji bo kesên baweriya wan qels e dipeyive. Bala xwe bidin ku wisa dibêje: "Wê yek dengê min bibîhîze..." Tiştê ku me ji bihîstinê qut dike çi ye? Tişta ku nahêle dengê Wî bê me di halîhazir de canê me yê kêfxweş bûye. Xweda ji bo bala Mûsa bide ser xwe, ew ji kêfxweşiyên Misrê bi dûr xist ango berê wî da beyebanê. Xweda bi hevdîtinekê re bala Mûsa kişand û here kuderê bila here, careke din bala wî belav nebû -heta gava li Misirê vegeriya jî!

Îsa got; eger kesek dengê wî bibihîze û eger deriyê dilê wî veke, wê têkeve hundur û wê bi wî re xwarinê bixwe. Wê ew ji canê we re "Nanê Jiyanê" pêşkêş bike. Ew "Nanê Jiyana" we ye. Di wergereke din de wisa dibêje: "Eger hûn dengê min bibîhîzin û derî vekin, ez ê têkevim hundur û em ê xwerina xwe bi dostayî li hev parve bikin." Ez ji vê hez dikim ji ber ku wê heyamê parvekirina xwarinê li gorî roja me nêzîkayiyeke mezin ya wê civakê nîşan dida. Gava ez rêwitiyê dikim, ez pir hez dikim ku bi rêberê konferansa ku ez vexwendime an jî bi pastorê dêrê re herî kêm carekê xwerinê bixwim. Ji ber ku bi xêra vê parvekirinê re bi rastî jî em fersenda ku hevdu nas bikin bi dest dixin. Di dema xwarinê de li gorî cihên din têkiliyeke mezintir ava dibe. Ha ji ber vê Pavlûs dibêje; her çiqasî kesek bibêje ku ez bawermend im jî eger guneh ji xwe re kiribe tebîet divê em pê re xwarinê nexwin (bnr. Korîntî I 5:11). Gava em bi hev re xwarinê dixwin em dilê xwe ji hev re vedikin û nêzî hev dibin û eger em bi kesekî ku di nava îsyanan de dijî re bixwin, ragihandin ji aliyê giyanî ve bi tenduristî nabe.

## EM BI ÇI XWE TÊR BIKIN EM BIRÇIYÊ WÊ NE

Birçîbûn ew hêmana diyarde ye bê em ê nêzîkayiya li Xweda ji xwe re bikin armanc an em ê ji xwe re nekin armanc. Ji ber vê divê em ji bîra xwe dernexin ku kontrola birçîbûna me di destê me de ye. Pirs ev e: Em ê kîjan birçîbûnan û bêrîkirinan ava bikin? Rêgezeke giyanî heye ku tu carî nayê guhertin:

*"Em bi çi xwe têr bikin, em birçiyê wê ne."*

Di sala 1979an de li zanîngehê gava ez di yûrdê de weke xwedekar dimam, ez ji nûve çêbûm. Şevekê gava ez li mitbexa yûrdê li tiştekî xwarinê digeriyam, min bihîst ku Reb wisa got:

“Bedena te perestgeha min e, baş li wê binêre!” Wan deman “ez mubtelayê xwarina li ser lingan bûm.” Ez bê hema ji ber ku peyva “mubtela”yê bengîtî an jî dîlgirtina tiştekî tîne ziman, li gorî rewşa min e. Sirf ji ber ku dilê min wisa dixwest min xwarinên ne baş dixwarin. Min ji vexwarinên bixaz, yên bi şekir, yên li ser lingan, yên bûz girtî, çi tiştên qelandî û min ji tiştên hevîrî hez dikir -hûn bi lîsteyê dizanin. Her xwarina ji bo tenduristiyê ne baş û ya ku li gorî tahma devê min bû, dilê min diçûyê. Xwarina xweş ya ku min jê fêhm dikir hambûrger, kola û petatên qelandî bû.

Gava Xweda ji min re wisa got, bedena min bi qasî yê min ji bo Giyanê Wî jî ferq kir ku qadeke jiyanî tê de heye. Hat bîra min ku eger erebeyeke min ya biha hebûya min tu carî benzîna bê qalîte û ne paqij nedixistê an jî min yaxa motor ya ku dîsa li safokê xistinê, bernedidayê. Min ê tenê benzîn û yaxa herî baş berdayê, ji bo baştir bişixuliya û bêtir bi qewet bûya. Min ferq kir ku bedeneke min tenê heye û ez nikarim bi ya nû biguherim lê mirov dikare erebeya herî biha bi ya nû biguhere. Bi vî awayî min xwarin û vexwarina xwe ji nişka ve guherand. Ji bo bedena min di asta herî baş de bişixule û bi salan li ser xwe bimîne û ji bo hîn bibim bê pêdiviya bedena min bi çi heye, min dest bi xwendinê kir û pirs pirsîn. Pêvajoyekê dest pê kir lê piştî çend salan hemû çanda xwarin û vexwarina min guherî.

Ev hemû pir baş bûn lê fêdeyeke zêde ya ku hîn min ferq nekiribû hebû. Gava pêşî min dest bi xwarinên baş kir, min tahma wan neeciband lê ji ber min zanîbû ku ji bo min baş in, min xwarina wan berdewam kir. Piştî demekê xwarin û vexwarina min guherî. Berê eger ji min re bigotana tu yê ji menuya hambûrger an jî ji menuya masî, zelateyê û nanê genimî kîjanê hilbijêre, ez qet nedifikirîm û min ê rahişta hambûrgerê û min ê henekê xwe bi tahma masî û zelateyê bikira. Lê îro roj gava her du menu tên ber min, ez xwarina bi tenduristî hildibijêrim û ya ne tenduristî

nayinim bîra xwe jî. Ya rastî gava rêwitiyê dikim eger tenê tiştên li ser lingan hebin ez naxwim û birçî bi rêya xwe de diçim. Li şûna xwarinên ku berê min pir bêriya min dikir, ez birçîbûnê hildibijêrim. Êdî ne dilê min diçe wan xwarinan û ne jî tahma wan li ser zimanê min maye! Bi rastî jî hew kêfa min ji wan re tê!

Heman rêgez ji bo canê me jî derbasdar e. Em canê xwe bi çi têr bikin, dîsa wî tiştî dixwaze. Eger tebîeteke we ya sporê ya bi rêkûpêk hebe, dilê we dixwaze ku li ber qanaleke sporê bimîne. Eger hûn bi rêkûpêk li fîlman temaşe dikin û temaşekirina we ya bi rêkûpêk ya galgalên Hollywood'ê hebe, wê demê wê canê we bixwaze ku li ber qanalên sînemayê, kovaran û nivîsên derbarê vê mijarê de bala we bikişîne. Eger her dem em bi bûyerên dinyayê re û bi yê kar û barên dinyayê re dakevin, tiştên ku em ê bêriya wan bikin wê ev bin. Eger em di mal, erebe, kinc û hwd. di van tiştan de kêfxweş bibin; wê demê gava em li ser danûstendin, erebeyên nû an jî fikrên dekorasyonê peyivîn, wê xwesteka me gur bibe û em ê ji sohbetên giyanî aciz bibin. Wê bi me zor bê ku em Nivîsên Pîroz bixwînin û bi duayan re wext derbas bikin. Lêbelê eger em bi Gotina Xweda re bi rêkûpêk xwe têr bikin, ji bo duakirinê wê pir hêsan be ku em wext veqetînin. Û axaftina li ser mijarên giyanî wê bêtir rehet bibe û wê jixweber biherike. Em ê bêriya hebûna Xweda bikin û em ê hewl bidin ku nêzî wî bin.

## SERIKEKÎ DÛR Û KÛR YÊ BÊTENDURISTÎ

Ev rewş dikare bê veguhestin ber bi serikekî dûr û kûr ve yê bêtenduristî. Em di bedeneke fizîkî de dijîn. Pêdiviya me bi kefxweşî û nûkirineke tenduristî ya bi rêkûpêk heye. Gava min di dibistana Pirtûka Pîroz de gelek ders distandin, ji alîyekî ve jî ez heftê çil saetan di karekî de dixebitîm. Carekê dawiya hefteyê hevalê min yê odeyê ez vexwendim ku em bi komeke havalên

xwe re bi gogê bilîzin. Ji bo li ser Nivîsên Pîroz bixebitim min vexwendina wî nepejirand. Çawa ji cem min çû ji bo bixwînim û duayan bikim, min Pirtûka Pîroz xist nava destên xwe lê te digot qey her tişt girtî ye. Min Xweda nedibîhîst. Te di digot qey ez gotinên bê wate dixwînim. Saetek bi ser çûna hevalê min yê odeyê ketibû û min xwe avêt Xweda: "Reb, çima wisa li min zor tê ku ez ji Pirtûka Pîroz bereketê nastînim û dengê te nabîhîzim? Pirsgirêk çi ye? Gelo tiştekî ku kêfa te jê re nayê min kiriye, min gunehek kiriye?"

Weke bersiv min ev bihîst: "Here û bi gogê bilîze."

Ez veciniqîm û min pirsî: "Çi! Te got ez bi gogê bilîzim? Ev tişt baweriya min ava nake û min nêzî te nake! Tu çima dixwazî ez vî tiştî bikim?"

Reb ji nişka ve ayeteke bi can dibe xiste dilê min: "Gelek nivîs hatin nivîsandin, dawiya vê tuneye. Xwendina zêde bedenê diwestîne" (Waiz 12:12). Wisa got: "Kurikê min, tu di bedeneke fizîkî de dijî (mêjî jî pereçeyek ji vê bedenê ye) û ji bo beden bêhna xwe berde pêdiviyên wê yên curbecur hene. Eger tu nehêlî li gorî dilê xwe bêhna xwe berde, tu yê kabîliyeta xwe ya mezinbûn û guhdarkirina li min asteng bike." Pişt re piştî xizmeta xwendekaran ya ji bo gelek mirovan, nîşan da û got: "Hûn bi serê xwe werin cihekî bêpêjin û piçekî bîhna xwe vedin" (Marqos 6:31). Bi zimanekî hêsan Îsa ev digot: "Xwe bidin hev ji bo ku hûn ji hev belawela nebin."

Ez di cih de bazdam derve û min bi gogê lîst. Wê rojê piştî nîvroyê ez rûniştim û ji nû ve min rahişt Pirtûka Pîroz. Vê carê bi alîkariya Gotina Xweda min bi Giyanê Pîroz re hevparî kir û min hîs kir ku jiyana Xweda xwe bera nav canê min da.

## PIR MIJÛL

Ji bo xebatê ku dihêle mirov gelek wext bide û bêhnvedana can û bedena xwe pişt guh bike, ev ne xeteyek e ku di roja me de gelek mirov vê yekê dikin. Di esasê xwe de dizê herî mezin yê ku birçîbûna me ya li hemberî Xweda ji me didize, ew tarza jiyana me ye ya di nav mijûlbûnê de derbas dibe. Gelek bawermendên xwedî niyeteke baş ketine vê xefkê û dema ku wê bi Xweda re derbas bikin, bi tarza jiyana Xirîstiyanekî mijûl re guhertine. Ev tarza jiyanê xapînok e û dibe ku karên xizmetê yên her dem jî têxe nav xwe de.

Em pirseke hêsan ya ku me ronî bike bipirsin: Weke fizîkî em çawa xwe têr dikin? Ez hêvî dikim ku hûn bi awayekî tenduristî û ya ku hêzê dide bedena we hûn dixwin û vedixwin. Hûn dikarin weke hûn qet xwarinê naxwin lê hûn jiyana xwe bi heman awayî didomînin, xeyal bikin? Weke ceribandinekê eger em çend rojan xwarinê nexwin lê bi ser de jî em bi saetan ranezên û tempoyan xwe ya fizîkî ya xebatê bidomînin, wê çi bibe gelo? Kêliyekê li vê bifikirin. Em ê li erdê rast bibin!

Lêbelê heman tiştî weke giyanî em çawa bi hêsanî dikin ne wisa, ji bo vê rewşê ne weke fizîkî lê weke giyanî sedemeke wê heye ku em tehemul dikin. Eger em demeke dirêj bê xwarin bimînin, wê mîdeya me gilî gazinan bike û ne tenê carekê. Her ku dem derbas bibe wê golinc û pê re jî deng jê bê û wê dest bi qurqirê bike. Wê hemû bedena me bike hawar: “Ez birçî me, min têr bike!” Lê giyanê me wisa nake hawar. Berevajiya vê weke ku rast e xuya dibe, dengê kesê di nava me de her diçe kêm dibe. Em wî nabîhîzin. Giyanê me qels dibe û kesayetiya me hîn girantir tê.

Demeke gelekî dirêj gava em xwarinê nexwin hew dilê me diçe xwarinê. Eger em ji pênc rojan zêdetir birçî bimînin, dengê hawara fizîkî ya birçîbûnê qut dibe. Xwarin êdî avê bi devê me

naxe û perçeyek goştê sor weke alavekê xuya dike. Birçîbûna we winda bûye û heta ku hemû qûtên we yên di nava we de neqedin, nema xuya dibe.

Gava min destûr da ku li şûna dema ez bi Reb re derbas dikim, tarza jiyaneke mijûl cih bigire, min ferq kir ku heman tişt dibe. Pêşî meraqa min ya derbarê Nivîsên Pîroz de kêm dibe û pişt re xwesteka min ya duakirinê vedimire. Eger carcaran ez duayan bikim an jî bixwînim, ez hîs dikim ku jiyan ber bi nava min ve diherike. Pirtûka Pîroz, berevajî demên ku ez bi rêkûpêk bi Nivîsên Pîroz re derbas dikim, bi min re napeyive.

Heta ku birçîbûna min nema ez ji xwarin û vexwarina fizîkî dûr mam û min kifş kir ku tekane rêya ez vegerim ew bû ku ez zorê bidim xwe. Ji aliyê giyanî ve jî heman tişt rast bû. Eger min birçîbûna xwe winda kiribe, ez Pirtûka xwe ya Pîroz vedikim, ji bo tembeliya xwe tobe dikim û ji bo dengê Xweda bibîhîzim bi bendemayînê dest bi lêgerînê dikim. Heta ku tiştek ji min re dipeyive ez xwendina xwe didomînim! Bi piranî pir nadome, her ku ez didomînim Ew her dem bi dilsozî dipeyive. Rêyeke din ya ji nû ve ragihandinê, rojekê an jî du rojan mirov ji hev dûr bikeve û heta mirov têr bibe tenê bixwîne û duayan bike.

## BAROMETREYA GIYANÎ

Ev disîplenek e ku divê em hemû xwediyê wê bin. Ev bi kesekî ku dev ji baweriyê berdaye û bi jineke biyanî re razaye an jî li alkol û pornografiyê dîsa vegeriyaye, ango bi bêrîkirineke wisa ku ji nû ve kifş kiriye dest pê nake. Bi kêm dîtina hezkirinên xwe. Û îhmalkirina zarokên xwe dest pê nake û lîste wisa dirêj dibe û diçe. Na, devjêberdana baweriyê ew tişt e ku em ji mijarên xwedayî û Nivîsên Pîroz dûr bikevin, dest pê dike. Hin dem hene mirov ferq dike ku tiştên xwezayî ji karên Xweda bêtir mirov bi kelecan dike.

Birçîbûn barometreya me ya giyanî ye. Vêya weke fizîkî bifikirin. Kesek gava nexweş dikeve ew kes pêşî çi winda dike? Dilê wî nema diçe tiştekî. Gava hûn sermê dixwin an jî gava hûn bi şewbê dikevin bînin bîra xwe. Dilê we naçe xwarinê. Li nexweşên ku bi nexweşiya nebaş ketine binêrin, dihilin û dibin sîh-çil kîlo û mecbûr dimînin ku tenê bi rêya damaran xwe xwedî bikin. Hema bêje dilê nexweşan naçe tu tiştî. We ev gotin bihîstiye: "Li xwarin û vexwarinê vebû." Ji aliyê giyanî ve jî tu ferq di navbera wan de tuneye. Nîşaneyeke tenduristiya giyanî yek jê ew e ku mirov birçiyê Gotina Xweda be. Nîşaneyeke nexweşiya giyanî jî ew e ku mirov hew bala xwe bide meseleyên xwedayî.

Min xizmetkarên ku malên xwe, erebeyên xwe yên nû, tîmên futbolê yên ku piştgiriya wan dikin û tiştên weke van ku li ser van tiştan ji tiştên xwedayî bêtir bi kelecanî dipeyivin, nas kirin. Gava hûn behsa mijarên derbarê Reb de dikin an jî hûn behsa tiştên ku Xweda ji dilê we re gotiye, dikin; dibêjin qey hûn behsa karekî ji wan re dikin û bi vî awayî tevdigerin. Gava behsa xaniyên xwe yên ku nû çêkirine dikin, rûyê wan geş dibe. Gava Xweda dihebînin ez li wan dinêrim; ji bedêla ku destên xwe rakin û li wî Kesê ku ji bo wan heta tu bêjî bes bi qedir û qiymet e zîq bibin, li derdora xwe dinêrin, bi kesên din re dipeyivin an jî li notên waaza xwe ya ku wê bîstikê din bidin, di ber çavan re derbas dikin. Ev tenê nîşeteke pirsgirkeke ku koka wê pir kûr e nîşan dide.

Min ferq kir ku li van dêran hebûna Xweda ne bi hêz e. Gava ez banga tobeyê dikim û gava ez wan vedixwînim ku nêzî Xweda bibin, Giyanê Pîroz tê û ecêbmayî dimînin. An tînin bîra xwe bê ji kuderê ketine an jî weke xelateke taybet ya xizmeta me dibînin û li ser nasekinin. Heta hinek jê li ber wan derdikevin. Di her şert û mercan de eger di nava wan de arezûyeke biçûk jî hebe, li hebûna Xweda birçîbûna xwe ji nû ve şiyar dikin.

Îşaya wisa dibêje: "Fitîla diçirise netefîne" (Îşaya 42:3). Ev

îfade, lempeyeke ku hema bêje dohnê wê li ber xelasiyê ye û dike ku fitîla wê biqede û agirê wê yê qels ku hêdî bi hêdî ber bi tixanê ve diçe, dinexşîne. Ya zeîf, biçûk, bêqewet, dilşikestî û hesas tîne ziman. Pizotên dikin vemirin wê netefîne, berevajî vê ji bo tîna wan gur bike wê wan har bike. Eger em ji bilî pizotekî pêketî nebin tiştekî din jî, ji bîr nekin ku li dû me her dem tê. Naxwe eger em bi Xweda re hevkariyê bikin û jê re îteatê bikin wê ji bo me pir baş çêbibe, ji ber ku me naxe nav rewşeke zor û zehmet!

Ez vê her dem dibînim. Min bi van çavên serê xwe dît bê Xweda çawa gelek mirovên li ber vemirandinê bûn, agirê jiyana wan gur kir. Min li dêr û konferansan gelek mirovên ku digotin; heta ji nû ve pêneket û lêgerîna xwesteka me ya li Xweda gur nebû, me ferq nekir bê em çiqasî ji Xweda dûr ketine. Anîn bîra xwe ku dilê xwe neparastine û birçîbûna xwe ya ku hevaltiya dilekî bi tenduristî dike, têk çûye.

## YA HERÎ BI QEDIR Û QIYMET BIPARÊZIN

Pirtûka Pîroz ji me re dibêje: “Ji her tiştî bêtir, dilê xwe biparêze” (Şîretên Silêman 4:23). Tiştekî din yê girîngtir ku em ê biparêzin, çavdêriya wê bikin an jî em ê bistirînin, tuneye! Gava ez li vê gotinê difikirim, tê bîra min bê mirov çawa mal û milkên xwe yên biha diparêzin. Me hemûyan ew kevirên biha yên ku di nava wan camên nayên şkerandin de tên parastin dîtine. Her dem di bin çavdêriyê de ne û di odeyên girtî de tên parastin û gava tiştekî biçûk di wan de dibe di cih de li alarmê dixin. Ev ode bi tîrêjên lazerê tên parastin her dem û gava kêliyekê tîrêjên lazerê ji ser wan qut dibe, parastvanên bi çek dikevin hundurê wan. Ji bo van alavan rojê 24 saetan biparêzin pereyan didin parastvanên ewlehiyê. Sirf ji bo pereçeyekî kevir biparêzin û nehêlin tişt bi wan bê, bi deh hezaran dolaran xerc dikin!

Xweda dibêje li ser rûyê erdê hebûna me ya herî bi qedir û qiymet ne kevir in, dilê me bi xwe ye. Lêbelê bawermend dilên xwe ne tenê bi tiştên ku bi kêrî tiştekî nayên, heta dilê xwe teslîmî tiştên ku zerarê didin me jî dikin. Her tiştên ku di wan de tiştên pir vekirî an jî sixêf tunebin, em temaşe dikin an jî dixwînin. Em giyanê dinyaya ku dijminiya Giyanê Xweda dike, ferq nakin. Lêbelê mirovên vê dinyayê di vê mijarê de pir bi awayekî hikmet tev digerin. Ji ber ku tiştên herî ku qedir û qiymetê didinê, bi hewldaneke mezin diparêzin. Ji aliyê din ve, bawermend xemsar in ku dilê xwe ji şehwet û daxwazên bedenî biparêzin, yên ku hewesa wan ji Xwedayê yekta yê ku bi rastî dikare wan têr bike, didizin û di jiyana xwe ya baweriyê de têk diçin.

Ji bo Reb dibêjin: "Çimkî ew tiyan têr dike, Canê birçî bi qenciyê tije dike" (Zebûr 107:9). Ew li benda me ye ku tîbûna me bişkîne lêbelê eger em di halîhazir de bi tiştên din dagirtî bin qenciya Wî me têr nake. Divê em dilên xwe birçî bihêlin û divê em banga Wî kêm nebînin. Ji ber ku gava em nêzî wî dibin, Wî jî soz daye ku wê nêzî me bibe!

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Şîretên Silêman 27:7 dibêje: "Kesê têr hingivê jî naxwaze." Gava mirov li ser vê ayetê difikire, hûn herî pir li hemberî kîjan xeman, arezûyan û zewqan qels in? Ev tişt çawa dikare birçîbûna we ya "hingivîn" ya hevpar ya bi Xweda re têk bibe?

2. Di vê beşê de nivîskar; çavdêriyên xwe yên li ser kesên di ser bîst salî re û yên di bin bîst salî re li du dêrên cuda, li gorî azweriya wan an birçîbûna Xweda parve dike. Gava hûn li jiyana dêra xwe dinêrin, hûn ê çawa birçîbûna (têr, birçî, bêxem) malbata xwe pênase bikin?

3. Di bin roniya gotina “Ji her tiştî bêtir, dilê xwe biparêze.” ya Şîretên Silêman 4:23yan de, ji bo hûn dilê xwe biparêzin hûn îro dikarin gavên çawa bavêjin? “Xwarineke li ser lingan” ya giyanî ku divê hûn ji parêza xwe rakin an jî biguherin he

BEŞ 4

# AREZÛYA JI BO HEBÛNA WÎ

"Di hebûna wî de gotina wî tê bihîstin."

Di jiyana xwe ya xizmetiya bîst salan de, ji bo Gotina Xweda hem li dêran û hem jî li konferansan hîn bikim, ji bilî Antarktîkayê ez çûme her parzemînê. Berî ku bi temamî rêwitiyê bikim, bi giştî heft salan seranser di nava qadroya du dêrên cuda de min xizmet dikir. Di vê demê de li dêrê min kifş kir ku du komên sereke hene û li gorî dihat dîtin her ku hatina Reb nêz dibû cudahiya ramanî ya di navbera wan de her diçû mezin dibû. Koma pêşî ji bo tiştên ku wê Xweda bike lê digeriyan û koma duduyan jî bi nasnameya Wî lê digeriyan.

## MOTÎVASYONA BINGEHÎN YA ÎSRAÎLÊ

Ev nakokî di navbera Mûsa û Îsraîliyan de xuya dibe. Em li vê mijarê hîn kûrtir bikolin. Gelê Îsarîlê xwest ji bindestiyê rizgar bibe û Xweda weke xelaskerê xwe pejirandin û xwe avêtin Wî. Ev mirovên ku ji zuriyeta Brahîm hatine, mirov dikare wan bişibîne koma lêgerinê ya ji bo tiştên wê Xweda ji wan re bike. Li dêrê kesên ku naxwazin têkevin bin bindestiya ku alîkariya pergala dinyayê dikin, hene; lêbelê bi nezanî dîsa jî bindest in. Îsa weke Reb îlan dikin, dipejirînin û ji bo xelasî û bi destxistinê li Wî dinêrin. Lêbelê weke Îsaraîliyan arezû, çalakî, gotin û gerdûniyên wan, rewşa dilê xwe berçav dikin.

Îsraîlî bi sedan salan ji bo Xweda wan rizgar bike xwe avêtin Xweda. Pişt re Xweda, xwe nîşanî Mûsa da û got dema ku Soza xwe pêk bîne, hatiye. Mûsa berî here cem Fîrawûn bi rihspiyên Îsaraîlî re peyivî û soza xelasiya Xweda îlan kir. Gava nûçeya baş bihîstin “Gel bawer kir. Gava gelê Îsraîl bihîst ku Xudan bala xwe da tengasiyên wan, deverû çûn erdê û perizîn” (Derketin 4:31).

Hesta vê civînê xeyal bikin! Van rihspiyan di seranserê jiyana xwe de xelasiya Xweda ya ku nêz dibû, bihîstine. Hêviya gihîştina welatekî azad ku di nav wî de şîr û hingiv diherike, ji bav û kalên wan ji wan re mîras mabû. Dîtibûn ku bav û kalên wan ev hêviya wan pêk nehatibû û miribûn. Ev rihspiyên wan bi heman pirsê re ketibûn nav xirûcirê: “Gelo wê emrê me têra vê sozê bike ku em bibînin an em ê jî bi vê kulê re herin?” Îcar aniha li ber serokekî perwerdekirî, mîrekî kevin yê Misrê ku xwe li ser destê Xweda bi mûcîzeyan îspat kiriye, sekinîne. Kesê ku divê ew bi destên hesinî bi rêve biribûna, aniha wê bibe xelaskerê wan. Tenê Xweda dikare mûcîzeyeke wisa bike! Dilê wan bi nefsbiçûkî û kêfxweşiyê bi ser ve diçe. Ji bilî ku Xweda bihebînin û spasiya xwe jê re bikin pê ve tu tişt di destê wan de tuneye.

Mûsa ji wan vediqete û derdikeve hemberî Firawûn. Lê serokê Misrê di bin soza xelasiyê ya Xweda de qet namîne. Henekê xwe bi Mûsa û Îbraniyan dike û ji bo tahdeya wan zêde bike, barê wan derdixîne astekê ku hew dikarin xwe di bin de bigirin. Li ser vê yekê her tişt çawa pir xurt tê guhertin. Heman rihspî li ber Mûsa derdikevin û bi wî re dengê xwe bilind dikin. Hebandin hatiye ji bîrkirin, gava wêrekbûna wan têk diçe ji Mûsa pir aciz dibin û dixwazin ji aliyê REB ve Mûsa bê cezakirin! (Bnr. Derketin 5:21).

Lêbelê bi demê re û bi xêra dilovaniya Xweda, gelek diyarî û tiştên baş nîşan dan û ew xelas kirin. Di dawiya dawî de gava firawûn ferman da ku derkevin, di tevgerên wan de dîsa guhertineke dramatîk çêbû. Bi kêfxweşiyê şa bûn û bi mezinbûneke berz û bala û di nava pîroziyê de ji Misrê derketin. Bi zewqa ji başî û sedaqeta Xweda bihîstin re, ji Misrê dans kirin û derketin qada azadiyê. Îcar ka vê rewşê xeyal bikin. Ne tenê azad bûn lê di heman demê de bi xezîneyên zêr û zîv re ku bi ser xwe dakirin û bi Berxa Fisihê ya ku xwarin re bûn xwediyê hêz û qewetê. Ev koleyên kevin minêkarê Xweda bûn û baweriya wan ya ji Mûsa di ser hemû dem û dewranan re bû.

Piştî ji Misrê derketin Xweda ew birin ber bi berava Behrasor ve. Gava li dawiya xwe zîvirîn dîtin ku Firawûn bi artêşa xwe tê bi ser wan ve û sawê ew girtin. Careke din tevgera guhertineke mezin pêk hat. Li hemberî Mûsa derketin û pê re kirin hawar hawar. “Wan ji Mûsa re got: Ma li Misrê gor tunebûn ku te em anîn beriyê ku li vir bimirin?! Te dît te em ji Misrê deranîn û çi anî serê me! Li Misrê me ji te re got: Dev ji me berde! Em ji Misriyan re xulamiyê bikin. Di şûna ku emê li beriyê bimirin, xulamtiya ji Misriyan re ji me re çêtir e” (Derketin 14:11-12). Gava li Misrê kar û barê wan ne baş çû, ji Mûsa re gotin dev ji me berde me tenê bihêle, aniha carekê serokê xwe kêm didîtin û jê ne razî bûn û gilî û gazinên xwe dubare dikirin. Wan digot qey Mûsa û

Harûn rexne dikin û gotinan ji wan re dibêjin lê Mûsa ew wisa bersivandin: “Gazina we ne ji me, ji Xudan e” (Derketin 16:8). Ji bo berjewendiyên xwe xwestina herî baş, ji arezûya ku wê Xweda her tiştî bi cih bike, mezintir derket. Bala xwe bidin hevoka “wê ji bo me baştir bûye.” Ji bo dilê Xweda ne xwedî xwestineke har bûn lê ji bo hezkirina canê xwe dîn û har dibûn.

Xweda careke din Behrasor dike du felqe û dilovaniya xwe nişanî wan dike û wan di ser axa ziwa re derbas dike. Pişt re hêza herî xurt ya leşkerî ku çarsed salî zilm li Îsaraîliyan kir, di nava avê de fetisand. Aniha kêf kêfa wan bû! Li ber Xweda kêf kirin û lîstin. Em wisa dixwînin: “Xwişka Harûn, Mîryama Pêxember def da destê xwe û hemû jin bi reqs û bi defan li pey wê çûn” (Derketin 15:20). Hûn dikarin sahneya ku di navbera heysed û milyoneke jin de dasn dikin û li defê dixin, xeyal bikin? Heylooo çawa demeke xweş ya hebandinê ye! Kêfxweşiyeke wisa qet tahm nekiribûn. Lê gava piştî sê rojan tîbûn, kêfxweşiya wan kin ajot. Dîsa ji Xweda gilî û gazin kirin û Xweda careke din ji wa re ava kir.

Di navberê re çend roj derbas bûn û îcar meseleya xwarinê dest pê kir. Dîsa gilî û gazinan dest pê kir: “Xwezî Xudan hê gava em li welatê Misrê bûn, em bikuştana! Qet nebe em li ser sîtilên goşt rûdiniştin û me têra xwe dixwar. Lê belê hûn, ji bo hûn tevahiya civatê ji birçiya bikujin, we em anîn beriyê” (Derketin 16:3).

Hûn çiqoberika gel dibînin ne wisa? Gava ku Xweda tiştên wan dixwest di wextê wê de dikir ji Xweda razî û bextewar bûn. Lê gava tiştên ku ji Xweda dixwestin di wextê wê de pêk nedihat, ne bextewar bûn. Motîvasyona wan ya bingehîn di tevger û gotinên wan yên di bin bindestiyê de ne derdikeve holê. Her tişt bi wan ve girêdayiye. Arezûyên xwe di ser dil an jî hebûna Xweda re dibînin.

## MOTÎVASYONA BINGEHÎN YA MÛSA

Ev çerx her dem xwe dubare dike û di dawiya dawî de Xweda jî êdî ji vê rewşê aciz dibe. Mûsa wisa dibêje:

> "Xudan ji Mûsa re got: Rabe ji vî cihî derkeve. Tu û gelê ku te ji welatê Misrê deraniye, herin welatê ku min ji Îbrahîm, Îshaq û Aqûb re sond xwar û got: Ezê wê derê bidim zuriyeta te. Ezê milyaketekî li pêş te bişînim û Kenanî, Amorî, Hîtîtî, Perîzzî, Hîwî û Yevûsiyan biqewirînim. Herin welatê ku şîr û hingiv jê diherike. Lê ezê bi we re neyêm ku di rê de we tune nekim. Çimkî hûn miletekî serhişk in" (Derketin 33:1-3)

Xweda ji Mûsa re got; ew dikare gelê wî bibe ew welatê ku ji zûde soza wê ji wan re dabû û ew dikare ji bo heta welatê wan bibe cihekî ewle, wê ferîşteyekê li pêşiya wan bişîne ji bo bera dû dijminên wan bide. Lêbelê wê Ew (hebûna Wî) bi wan re neyê!

Baş çêbû ku Xweda ev ji Mûsa re got, ji ber ku eger ev pêşniyaz rasterast li Îsraîliyan bikira wê wan bi kêfxweşî bipejirandina, wê şahî li dar bixistina, pişt re jî wê xwe bidana hev û derketina ser rê! Ji ber çi ez wisa difikirim? Ka kêliyekê bifikirin -sirf ji bo ji zehmetiyên beyebanê birevin eger bêyî ferîşteyekê an jî bêyî Xweda meyildar bin ku li Misrê vegerin, ez bawer im wê bi ferîşteyekê re li welatê ji wan re soz dabûn, bêşitexalî vegerin û vê bipejirînin. Lêbelê li bersiva Mûsa ya ku ji pêşniyaza Wî re da bû guhdar bikin:

> "Mûsa got: Heger huzûra te neyê, me ji vir dernexe." (Derketin 33:15)

Divê em bînin bîra xwe bê "ev dever" kuderê ye. Ev dever

beyeban bû, cihê zehmetiyan, ev cih cihekî zewq an jî rehetî lê tunebû! Boşahî lê tunebû tenê pêdiviyên rojane dihatin cih û ev gelek caran bi destê xwezayê pêk dihat. Li vî welatî bexçe, çavkaniyên xwezayî an jî ewlehî tunebûn. Mal, çem, rez, erd an jî darên fêkiyan tunebûn. Danûstendin, kêfxweşî an jî derfetên bêhnvedanê tunebûn. (Eger kesên hûn ji wan hez dikin gava mar bi wan vedidin, eger we kêfxweş bike ew tiştekî din e). Dora we bi ziwahiyê û ji tiştên rêzê hatiye dorpêçkirin. Li vî cihî tu xweşikbûn tunebû lêbelê Mûsa vê tîne ziman: "Boşahiyeke ji hebûna te qut be û ji bedêla ez li welatê xweşiyê bim, ez dixwazim li cihekî ne xweşik û ne rehet ku hebûna Te lê hebe, bijîm!"

Gilî û gazina ji dilê Mûsa dihat çi bû? Hebûna Xweda! Hebûna Reb ji bereketên jê re soz dabûn bêtir xwest. Nêzîkayiya li Xweda, ji hemû xezîneyên ku wê Xweda jê re bîne ber lingê wî, bêtir bi qedir û qiymet dît. Ev helwesta wî, Mûsa ji Îsraîliyan cuda dikir. Mûsa Xweda ji bo nasnameya Wî lêdigeriya lê Îsraîlî ji bo tiştên dida wan lê digeriyan! Ev motîvasyon îro roj jî bawermendan dike du kom. Parçebûyîn di ser sînorê mezheban re ye. Kesên nizanin Xweda ji bilî parastin, avakirin û bereketên ji bo wan avakiriye, lê bigerin hene. Lêbelê dikarin ji ber nasnameya Xweda wî hembêz bikin û ji nêz ve Wî nas bikin. Tu ferq di navbera vê ew jineka ku ji bo pereyên zilam pê re zewiciye, heye gelo? Ne ji bo zanibe bê mêrê wê kî ye, ji ber tiştên ku wê ji bo wê bike, dizewice. Di peymaneke wisa de her du alî jî tişta lê digerin ji dest berdidin, ji ber ku li cihekî ku motîvasyoneke wisa lê hebe, nêzîkayî lê ava nabe.

## XELAT

Min serdana hin cihên xweş yên dinyayê kirin û heta tu bêjî bes min mal û avahiyên xweş dîtin lê ji ber ku ji hebûna Xweda bêpar bûn, tu qedir û qiymetê van li ber dilê min tunebû. Lêbelê

ez li zindanan, li malfeqîran, welatên li paş mayî yên nexweş û ji aliyê dîtbarî ve qirêj lê li cihên bi hebûna Xweda ve bi ser ve diçûn jî mam. Ez dikarim ji dilê safî bibêjim ku ez van cihên zor û ne rehet ku bi Giyanê Xweda tije bûn, tercîhî wan cihên xweş û paqij lê ji hebûna Xweda bêpar bikim.

Li salên zanîngehê, li tûrnûvaya neteweyî ya Amerîkayê, di Kûpaya Davis ya xortan de û di lîga zanîngehê de min bi tenîsê dilîst û ez bûm şampiyonê eyaletê. Xelatên spor û perwerdehiyê, statuya sosyal; hişt ku hevsalên min, rêberên min û rêvebirên min yên kar li hemberî min bi awayekî hurmetî tev bigerin. Ez bi keçikên xweşik û populer re bûm heval. Ev hemû ne tenê gelek mirov van dixwazin lê tiştên ku bi dil û can didin dû wan, berçav dike. Ya rastî gava hûn lê binêrin, mezinbûn û zewqa van hemûyan, ne hemberî sih saniyeyên ku mirov li huzûra Xweda derbas dike. Ango nikare nêzîkayiyê jî li vê rewşê bike. Ev bi berhevkirinê ne pêkan e! Bala xwe bidin Nivîsên Pîroz bê çawa Mûsa pênase dikin:

> "Gava ku Mûsa mezin bû, bi baweriyê red kir ku jê re kurê keça Firewn bê gotin. Ji dêla ku ew demekê kêfa guneh bike, wî bi gelê Xwedê re cefakişandin bijart û şermezariya di ber Mesîh de ji xezîneyên Misrê dewlemendiyeke mezintir hesab kir. Çimkî wî li xelata ku wê bistanda dinêrî. Bi baweriyê, ew ji Misrê derket û ji hêrsa padîşah netirsiya. Çimkî wî, wek yê ku nayê dîtin dîtibe, tengahî radigirt." (Îbranî 11:24-27)

Bala xwe bidinê ku ew tundiya li ser serê xwe dipejirîne. Ew li gorî gelê Îsraîlê di asteke cuda de bû. Tu rêyeke din ya gel tunebû. Lêbelê dîsa wan gilî û gazin kirin lê Mûsa nekir. Wî tiştên herî baş yê ku dinyayê karîbûn bidin kesekî, heta mirovekî ku dikare bigihê rutbeya herî bilind, bi xwesteka xwe red kir. Çima? Li xelateke

din digeriya. Xelata wî ne ew welatê jê re soza wî hatibû dayîn lê soza hebûna Xweda bû. Ji hevnasîna li cem ew deviyê dişewitî ve, tekane xwesteka wî ew bû ku Xweda ji nêz ve nas bike.

Li konferans û dêran min waaz dan bi hezaran mirovan, bi rêya televîzyon û pirtûkan min xizmet ji milyonan mirovan re kir. Xweda, bi rêyên ku hişê min ji serê min bir ez bi bereketa xwe xelat kirim. Lêbelê eger pêdivî bi hilbijartinê hebûya, ez qet li tiştên madî nedifikirîm min ê di cih de hebûna Wî hilbijarta û hew. Tu tişt cihê hebûna wî danagre. Hîskirina nêzîkayiya li Wî û bihîstina tiştên ez nizanim gava di guhê min de dike pistepist, ji axaftina bi girseyan re an jî ji firotina bi milyonan pirtûkan pir û pir bilindtir e li ber dilê min. Mezinahiya hebûna Wî ji her tiştî pir xweştir û baştir e!

Dilê min pir diêşîne gava ez dibînim ku xizmetkar ji bo dilê xwe têxin cih û kêfxweş bibin, didin dû serkeftinên biçûk. Ji aliyê kesên din ve hurmet ji bo wan bê dayîn û bên naskirin, ew armancên wan in ku nayînin ziman. Kesên ku têrbûn û girîngiya xwe di serkeftinên xizmeta xwe de lê digerin; min dît ku ketin nav xefkên bêgaviyê û heta ketin ber diranên tariyê. Organîzasyonên pir mezin yên xizmetê li dar dixin lê heta bi rastî fêhm dikin ku ev hemû belasebeb in, tevlî bêehlaqiyê dibin an jî dibin êsîrên çavbirçîtiyê.

Gelek kesên ku negîhabin serkeftinên kesên din jî heman dawiya trajîk ku parve dikin, min nas kirin. Van kesan ji ber ku civata dêreke ku ji dused, pêncsed, hezar, pênc hezar an jî ew girseya di dilê wan de derbas dibû ava nekirin, ji ceslanî ketin. Firotina pirtûkên wan tu carî dilê wan nexist cih û ew venexwendin wan konferansên “mezin” ku dixwestin li wan bipeyivin. Li cihên ku nikaribin lê bibin mêvan xwestin dilê xwe têxin cih. Ev rewş li piyaseya sekuler ku lê li statu û serkeftinê digeriyan ne cudatir e. Ev bawermend di ber armaca ku di rastiya

xwe de ji bo wê hatine afirandin re derbas dibin.

Ji aliyê din ve, min jin û mêrên ku rêbertiya organîzasyonên xizmetê yên pir mezin dikin û tê de bi serketine lêbelê dilê wan bêtir bêriya Xweda dike, nas kirin. Eger xwesteka Xweda ev be, parve kirin ku wê bi kêfxweşî dev ji van hemûyan berdin û wê xizmeteke din an jî tiştekî din bikin. Gelek ji wan aniha peywira ku emanetî wan bûye biçûk nabînin. Tînin ziman ku Xweda ew di vê peywirê de bi cih kirine û hemû xwesteka wan ew e ku dilê Xweda xweş bikin. Di nav sohbetên me de min qêrîna dilê wan bihîst û di tevgerên wan de min çavdêriya vê kir. Tu ferqa wan ji Dawidê ku ji xwe re digot ez mazlûm û feqîr im ku bi vî awayî serkeftinên mezin bi dest xistibûn, tunebû.

Ya din jî herçiqasî xwediyê xizmetên biçûk bin jî, ji ber gava bang li wan tê kirin dizanin wî karî bikin; min xizmetkarên di nava bereket û kêfxweşiyê de dijîn, nas kirin. Arezûya wan ne bi hejmar an jî serkeftinên derveyî re girêdayiye. Arezûya wan ew e ku dixwazin Xweda hîn bêtir ji nêz ve nas bikin û di nava hebûna Wî ya xuya de bijîn. Divê ev ji bo her kesî derbasdar be. Em ji bo Xweda hatin afirandin û tu kes ji me ji bilî naskirin û meşa di hebûna Wî de, wê tu carî dilxweşiya birastî pêde neke. Hemû rastiya kêfxweşî û têrbûnê di vir de ye.

## DU CUREYÊN HEBÛNA XWEDA

Di vê xalê de li gorî Nivîsên Pîroz divê em du cureyên hebûna Xweda nas bikin. Ya pêşî hebûna Wî ya li her deverê heye. Dawid behsa vê rengdêra Xweda dike: “Ez dikarim herim kuderê ji ber ruhê te, Birevim kuderê ji ber te?” (Zebûr 139:7). Hebûna Xweda ya li her deverê tîne ziman ku Ew her kêliyê li her deverê heye. Dawid pişt re berdewam dike: “Eger ez derkevim ezman, tu li wê derê yî, Nivîna xwe raxim li diyarê miriyan, tu li wê derê yî. Eger ez

bêjim, Wê tariya rastîn min rapêçe, Ronahiya li dora min bibe şev, Tarî jî ji bo te ne tarî ye, Şev, wek rojê dibiriqe, Tarî û ronahî ji bo te yek e" (Zebûr 139:8, 11-12). Ev bi vê soza Xweda re têkildar e: "Ez tu caran te nahêlim, Ez tu caran te bernadim" (Îbranî 13:5). Eger li cihekî em vê hebûna Wî hîs nekin jî ev nayê wê wateyê ku Ew ne li wir e. Tenê em hebûna Wî ferq nakin.

Li gorî pênasekirina Nivîsên Pîroz ku cureya hebûna duyem ya Xweda pênase dikin, hebûna Wî ya xuyayî ye. Peyva xuyayî, tiştên naxuyîn, nayên bihîstin an jî nayên zanîn; di wateya rewşa xuya dibe, tê bihîstin an jî tê zanîn de ye. Hebûna xuyayî ya Reb, ew tişta ku Mûsa bi dil û can dixwest. Gava me ev hebûn hîs kir, Xweda tenê xwe ji giyanên me re diyar nake, di heman demê de hiş û hîsên me jî dikevin ferqa nêzîkayiya Wî. Dem ew dem e ku zanebûna Wî ji hişê me re daxuyaniyê dike. Gava Îsa ev gotin kirin, hebûna dixwest berçav bike ev e:

> "Ez jî, ezê ji wî hez bikim û xwe ji wî re eşkere bikim."
> (Yûhenna 14:21)

Nivîskarê Zebûrê jî wisa dibêje: "Xwezî bi wî gelî ku dizane bi şahî biqîre! Û di ronahiya rûyê te de dimeşe, ya Xudan" (Zebûr 89:15). Di Roja Petrûs Pentîkost de kesên ji dil û can di nava lêgerînê de ne wisa teşfîk kirin: "Loma tobe bikin û li Xwedê bizivirin, da ku gunehên we bên xîşkirin" (Karên Şandiyan 3:19).

Xweda bi gelek rêyan dikare hebûna xwe nîşan bide. Di Nivîsên Pîroz de hinekan Ew dît, yên din bêyî Wî bibînin dengê Wî bihîstin û hineke din jî nêzîkayiya Wî hîs kirin û bi xêra wehiya da tiştên ku berê nizanîbûn di cih de hîn bûn. Lê tiştek teqez e gava Ew hat hûn ê fêhm bikin. Di dilê xwe de hûn ê Wî hîs bikin û hûn ê zanibin li wê deverê ye.

## HÛN LI REB DIGERIN AN LI ELAMETÊN WÎ?

Mirovên ku dixwazin hebûna Xweda bi awayekî bêçare tecrube bikin, min dît ku ev mirov didin ser rêyeke xelet. Ji bedêla ku weke şexs li Reb bigerin li elametekê digerin. Xweda di ber Ilyas re derbas bû û gelek elametên mezin dan wî. Pêşî bayekî pir xurt rabû lê Reb ne di nav ba de bû. Pişt re zelzeleyek rabû lê Nivîsên Pîroz dibêjin ku Reb ne di nava zelzeleyê de bû jî. Pişt re agirek derket û Reb dîsa ne di nava agir de bû. Piştî agir dengekî ziravî nerm hat bihîstin. Ha wê demê Ilyas fêhm kir ku weke şexs li hebûna Xweda rast hatiye.

Li şûna ku mirov di dilê xwe de li Reb bigerin û bi vî awayî hebûna wî ya xuyayî tecrube bikin, min lêgerîna elametên wan ku difikirîn wê bi Xweda re hev bibînin, temaşe kir. Piştî min peyameke ku dilê mirov îkna dike û besta xwe ji Xweda distîne waaz kir, îcar ez mirovan bi piranî derdixim pêş ji bo bi Xweda re hev bibînin. Hin deman hinek jê bi awayekî ku mirov jê aciz bibe û bala mirov xera bibe duayan dikin û bi herikîna bûyerê re li hev nakin. Hineke din dikenin, dihejin an jî bi awayekî din tevgerê dikin. Ya rastî di demeke paşerojê de ji ber ku li Xweda digeriyan û di hebûna Wî de dihejiyan, digiriyan an jî ji ber vê dikeniyan, bi hêviya ku wê Xweda di van elametan de xuya bike, di binhişê xwe de van tiştan dikin. Lê Ew ne di nava van elametan de ye. Gelek caran ez mirovan sakîn dikim û dibêjim tu tiştî nekin tenê sakîn bisekinin û ji bo hûn weke şexs li Îsa bigerin dilê xwe bidin wî. Eger elametek xuya bibe ev tiştekî bêhempa ye! Lê em bi rêya elametan li Wî nagerin. Divê em li şexsê Reb bi xwe bigerin!

Civîneke ku gelek mirovan guh dabû banga wê ya tobekirinê ya li welatê Asyayê tê bîra min. Ji ber kesên li salonê hemûyan destê xwe rakir, lê cih teng bû ji bo ku ez bang hemûyan bikim ku bên bi pêş de. Ji ber vê min ji wan xwest ku her kes li cihê xwe

duayan bike û li Wî bigerin. Piştî duayê ji bo li Reb vegerin min ew teşfîq kirin. Hebûna Xweda bi awayekî bêhempa salon bi ser ve bir. Tiştekî pir û pir xweş e gava Xweda rêveberiyê dixe destê xwe û hebûna xwe nîşan dide. Ev bi sedan caran hatibû serê min lê tu carî weke tiştekî ji rêzê an jî asayî nayê. Gelek caran hûn dikarin Wî ji kesên li derdora xwe zêdetir hîs bikin. Gava hebûna Wî hat, bû tîqetîqa hin mirovan lê ê min kederekê xwe li canê min girt û ev hîsa min piştrast bû; çawa hebûna Xweda kete hundur hema min dît revîrevî ji wir bi dûr ket. Lêbelê mirovan weke ku hebûna Xweda li wir e dîsa keniyan û dengê xwe bilind kirin.

Min ew sekinandin û min ferq kir ku berî bi çend mehan gava di dema xizmeta mijgînxêrekî ku hatibû welatê wan elametên pêk hatibûn dîsa dubare dikirin, ji ber vê min erza wan şikerand. Xizmeta vî mizgînerî weke gelek kesên ku navê "bişirîna pîroz" lê kiribûn, elameteke pir bi hêz di xwe de dihewîne. Gava hebûna Xweda tê ez bawer dikim ku wê dema mirovan çêbibe ku bikenin. Ya rastî ev hatiye serê şexsê min jî û di nava civînên me de jî me dîtiye. Carekê gava li Endonezyayê min xizmet dikir, rojekê giyanê Xweda bi ser civîna me de dabû û bi wergêrê xwe re me li mirovên ku tam du saetan bû tîqetîqa wan û ji kenan li erdê dirêj bûn temaşe kir. Her tişt bi wan pênc jinên ku dest bi girî kirin dest pê kir û giriyê van jinan veguherî tîqetîqeke ku xwe li hemû civatê veda. Heta wê rojê tiştekî wisa nehatibû serê min. Li Xweda digeriyan!

Lêbelê vê carê cuda bû. Çavên wî ji bedêla ku li Xweda zîq bibin, xwe li elametan zîq kiribûn. Gîhabûn wê encamê ku eger tu elametên tîqetîqê tunebin wê hebûna Xweda jî xuya neke. Gelek caran ez di hebûna Xweda de mam û min Ew bi awayekî pir bi hêz hîs kir lêbelê elameteke ji derve de nehatibû serê min. Di hebûna wî de bi awayekî bê kontrol min xwe li girî berdaye lêbelê ez fêhm dikim ku ev elamet encameke lêgerîna Wî û tevlîbûna li hebûna Wî ye.

Ji bo hinekî din zelal bibe weke mînakekê em bifikirin ku hûn pantor li xwe dikin. Piştî hûn pantor li xwe dikin ji bo rast bibin hûn destên xwe dixin bêrîkên wî û bifikirin ku hûn di bêrîka pantor de sed dolarî dibînin. Ne ji bo hûn pereyan bibînin we pantor li xwe kir lê di dema we pantor li xwe dikir de, we pere ferq kir. Armanca min li xwe kirina pantor bû û gava min ev kir min pere ferq kirin û min ji vê sûd wergirt. Em ne li elametê digerin em weke şexs li Reb bi xwe digerin. Û di vê pêvajoyê de her tiştên din fêdeyek e.

Piştî min erza civata Asyayî şikerand, min got; ez birçîbûna we ya li hemberî hebûna Xweda fêhm dikim û min ew hişyar kirin ji bo ku Xweda bi serpêhatinekê neguherînin. Piştî vê teşwîqê, hebûna Xweda di nava nefsbiçûkiyeke pîroz de vegeriya. Vê carê gelek mirovan li şûna ku bikenin îcar dest bi girî kirin lêbelê wê rojê her yekî ji me yê ku di nava lêgerînê de bû -em bigirîn an jî negirîn- pir di bin bandora hebûna Wî ya bêhempa de ma.

## ELAMET DILÊ MIROV NAXIN CIH

Qet ji bîr nekin, Nanê Man tu carî dilê Îsraîliyan nexist cih. Xweda, ji bo pêdiviya wan î teqez ya ji vê pirtir bi awayekî piratîk nîşan bide, li beyebanê Nanê Man da wan. Ev pêdivî hebûna Xweda bû. Mûsa wisa got:

> “Wê rêwîtiya dirêj a ku Xwedayê we Xudan çil salan hûn li beriyê gerandî bînin bîra xwe. Wî hûn xistin tengasiyê û ceribandin ku ya di dilê we de heye û ka hûn emrên wî pêk tînin an na, xuya bibe. Wî hûn xistin tengasiyê, birçî hiştin û paşê manya ku ne we û ne jî bav û kalên we pê zanibû bi we da xwarin ku hûn bizanibin mirov tenê bi nên najî, lê bi her peyva ji devê Xudan derdikeve dijî.” (Dubarekirina Şerîetê 8:2-3)

Li îfadeya “derdikeve” bi baldarî bikolin. Li vir nabêje “tişta derketiye” dibêje “derdikeve.” Lêkera di vê hevokê de ne ya dema borî ye, di dema diha de hatiye avakirin. Gotina Xweda ku pê dipeyive, gava em di hebûna wî de bin tê bihîstin! Ilyas li elametên Xwedayê ku di ber wî re derbas bû nenêrî, ji bedêla vê berî bersivê bide li benda dengê nerm û zirav yê hebûna Wî ma. Li civîna Asyayê di elameta Xweda ya ku berê derbas bibû û hatibû xuyakirin de xitimîbûn. Lê Xweda bi ser rêya xwe de çûbû û êdî ne li wir bû. Çûbû cihekî nû lê wan ji bo Wî li cihê berê lê bû bibînin, li dawiyê mabûn.

Weke Nanê Man ku çawa dilê Îsraîliyan nexistibû cih, elamet jî ji bo bêrîkirinên me yên di kurahiya nava me de ne, tu carî dilê me naxin cih. Ew di nava xwe de ne armancak in. Çûyîna bi dû wan de me ber bi rêya ku dilê me nakeve cih de dibe. Heta ku em ji tiştên dilê me naxin cih vedigerin û li nêzîkayiya Wî ya ku avakiriye, digerin ev wisa ye.

## QÎMPÊANÎNA BI TÊKILIYEKE HIŞÎ

Bawermend ji bedêla li Reb bi xwe bigerin, îcar gava elametan mezin dikin tiştekî din ku mirov pê aciz dibe derdikeve holê. Ev helwest dihêle ku gelek mirov ji hebûna rastî ya Xweda dûr bikevin. Bawermendên ku bi tevgerên xerîb û nelihevkirî yên kesên li elametan digerin, dixapin; xwe diparêzin û qîma xwe pê tînin ku bi Xweda re têkiliyeke hişî ava bikin. Ji ber ku em ji bo tiştên ji vê zêdetir hatine afirandin, ev helwest trajîk e. A. W. Tozer pakbûna doktrîna bi baweriyê, bê di van rojên dawî de çawa tê şîrovekirin wisa tîne ziman:

> “…ji aliyê gelek kesan ve weke ku Xweda zanebûna xwe li mirovan qedexe kiriye tê şîrove kirin. Hemû pêvajoya veguherîna olî, hatiye mekanîkkirin û giyanê wê hatiye

> qusandin… Mirov ‘xelas dibe’ lê ji bo Xweda ne birçî ye û ne jî tî ye. Ya rastî, bi taybetî mirov hînî ku dilê wî tekeve cih dikin û ji bo bi qîma xwe bi kêmaniyê bîne wî teşwîq dikin.” (*The Pursuit of God,* Li Pey Xweda, r. 12-13)

Têkiliyeke hişî ya bi Xweda re mekanîk û bêgiyan e. Em bi Wî ne tenê di teoriyê de, ji bo em bi rastî pê re bijîn hatine afirandin. Heta ku em bi serveçûna vê tecrube nekin divê tu carî dilê me nekeve cih. Îsa ji bo perdeya ku di navbera me û Xweda de cih digire û me ji hebûna Wî ya bingehîn qut dike, ji holê rake mir. Ha ji ber vê yekê nivîskarê Zebûrê wisa gilî û gazinan dike:

> “Ey Xwedayê ordiyan,
> Çiqas xweş e ciyê te.
> Canê min bêriya hewşên
> Xudan dike, Jê re dixeriqe,
> Dilê min û bedena min,
> Xwedayê jîndar bi şahî bibîr tîne.
> Di gorîgehên te de,
> Heta beytikê ji xwe re malek, hechecikê jî,
> Ji bo danîna ferxikên xwe, ji xwe re hêlînek dît.
> Ey Xudanê ordiyan, padîşah û Xwedayê min!
> Xwezî bi wan ku li mala te rûdinên,
> Ew hergav spasdarên te ne.” (Zebûr 84:1-4)

Di wergera Qiral Jamesê Nû de ayeta duyem wisa ye: “Dil û bedena min ji bo Xwedayê dijî diqîre.” Nivîskar pişt re dibêje, çivîk û hechecîk bi ser hêlîna xwe vedibin lê ew bi xwe bêmal e. Ji ber ku ew bêriya mala Xweda dike. Radigihîne ku ew mala bêriya wê dike ew mala ku Xweda lê bi cih dibe. Bala xwe bidênê ku dibêje: “Xwezî bi dilê wan, ew kesên ku di mala te de rûdinên.” Armanc û hedefa kesên ji Xweda hez dikin ev e! Birçiyê hebûna Wî ya xuyayî

ne. Em çiqasî nêzî wî bibin, em ê ewaqasî bi hêz bibin û em ê ewqasî di bin bandora wî de bimînin.

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Di serê vê beşê de nivîskar wisa dibêje: "Di vê demê de li dêrê min kifş kir ku du komên sereke hene... Koma pêşî ji bo tiştên ku wê Xweda bike lê digerin û koma duduyan jî ji bi nasnameya Wî lê digerin." Rast bibêjin hûn xwe di kîjan komê de dibînin?

2. Îsraîliyên piştî ku ji bindestiya Misrê rizgar bûn, ji bo avakirinê rojekê Xweda berz û bala dikirin, roja din ji bo ku avakirin ji wan re nedikir, te didît ku îcar gilî û gazin jê dikirin. Gava ku di jiyana xwe de hûn "serpêhatiyên xwe yên beyebanê" tînin bîra xwe, di navbera tevgerên we û yên Îsraîliyan de çi tiştên dişibin hev hene?

3. Dibe ku aniha hûn vê pirtûkê ji ber hûn di nava "serpêhatiyeke beyebanê" re derbas dibin, dixwînin. Eger wisa be, hûn dikarin çi hîn bibin ji ber elametên ba, zelzele û agirê ku hatiye serê Ilyas?

BEŞ 5

# LI PIŞT PERDEYÊ

“Hebûna Xweda me ji hemû kesên din yên li dinyayê vediqetîne.”

Hebûna Xweda her dem derbarê nasnameya Wî de wehiyeke hîn mezintir ava dike û bi hevrasthatinê re heta hetayê em tên guhertin. Gava em li Pirtûka Pîroz dikolin, em li kesên bi fêhmbariyeke pir mezintir li ser rêya Xweda dimeşin, rast tên û em dibînin ku ev kes yên li hebûna Wî digerin û yên ku hebûna Wî tecrube kirine.

## FAKTORA VEQETÎNER

Di beşa dawî de me dît ku Mûsa pêşniyazeke ku Xweda lê kir nepejirand. Reb, sozên xwe bêyî hebûna xwe pêşkêş kirin. Mûsa di cih de wisa bersiv dayê: “Heger huzûra te neyê, me ji vir

dernexe” (Derketin 33:15). Mûsa ragihand ku nêzîkayiya li Xweda, di ser sozên Wî yên ku wê bi hebûna Wî re nemeşe dît û mînakek ava kir. Li sedema Mûsa ya ku nehişt ferîşte bi gel re bimeşe û here, guhdar bikin:

> “Heger huzûra te neyê, me ji vir dernexe. Çimkî, heta tu bi me re neyî wê çawa bê zanîn ku tu ji min û ji gelê xwe razî mayî? *Bi vî awayî ez û gelê te, emê ji hemû miletên li ser rûyê erdê cudatir bin.”* (Derketin 33:15-16, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Bi bersiva dayî re rastiyeke bi hêz derdikeve holê. Tişta ku me ji her kesên li ser rûyê erdê cuda dike hebûna Xweda ye. Ragihandina ku em Xirîstiyan in, tevlîbûna me ya dêrên ku ji Pirtûka Pîroz bawer dikin an jî banga li me dibe ji bo tobeyê, ev nayê wê wateyê ku em mirovekî baş in yê ku serdemekê duaya baweriyê kiriye. Tiştê ku me cuda û pîroz (ji Wî re hetiye veqetandin) dike, hebûna Wî ye. Hebûna Xweda ew tişta ku vê ya ji kesên li ser rûyê erdê re diyar dike.

Naxwe wê demê çima gelek kesan bi Xweda re têkiliyeke rewşenbîrî pejirandiye? Em çima bi Xirîstiyaniyeke ku ji hebûna Mesîh kêm e, îdare dikin? Bêyî ku em nêzî Xweda bin em çawa hîn bûn 1ku ji halê xwe xweş bin? Me baweriya Xirîstiyaniyê çima ji bo em nêzî hebûna Xweda bibin û li wir bi cih bibin weke tarzeke ku di nava mirovan de arezûyê ava nake, bi wan da hînkirin? A. W. Tozer weke bersivekê ji bo vê wisa dinivîsîne:

> “Xweda dixwaze em tevlî hebûna Wî bibin û hemû jiyana xwe li wir derbas bikin. Divê em vê bi serpêhatiyeke têgihiştî nas bikin. Ev ji doktirînekê berçav zêdetir e, jiyaneke ku mirov her roj û her kêlî dikare zewqê jî bistîne.” (*The Pursuit of God,* Li Pey Xweda, r. 34)

Gelek kesan weke rewşenbîran qîma xwe bi agahiya aîdî Xweda re aniye ku rastiya kêlîkî ya bi Xweda re tu carî ji xwe re nakin armanc. Têgeha xelasiyê ewqasî xwe berdaye kûr ku kêm kes ji wan diçin hîn bi pêştir de. Duayên xwe kirine û rojekê wê bimirin û wê herin cem Wî. Lêbelê rastiya Mesîh ji dest diçe û wehiya bi hêz ya arezûya ku Xweda dixwaze bi me re bimeşe, tîne ziman tê windakirin. Ev ne carekê ye an jî serpêhatiyeke li dûr e. Arezûya Xweda ya parvekirina mayînde ye. Ji bo lêkolînê em bi hev re derkevin ser rêya Nivîsên Pîroz.

## HEBÛNA WÎ KÊ TECRUBE KIRIYE?

Hebûna Wî ya xuyayî di seranserê Pirtûka Pîroz de weke mijarekê hatiye honandin. Adem û Hewa li bexçeyê Adenê bi Xweda re dimeşiyan, lê ji ber bêîteatiya xwe “ji huzûra Xwedê Xudan, xwe di nav darên bexçe de veşartin” (Destpêk 3:8). Tam di vir de mirov xwe ji hebûna Xweda veqetand. Kurikê wan Kayîn; ji ber dilhişkiya xwe, xwe ji hebûna Xweda hîn bi dûrtir xist.

Lêbelê Xweda dev jê berneda û arezûya xwe ya ku dixwest nêzî mirovên ji wan hez dike, her dem berdewam kir. Di dawiyê de zilamên weke Hanok û Nûh berê xwe dan Xweda û ew lêgerîna wan ya ji dil û can bandor li dilê Xweda jî kir. Di encama vê de, ji berdana Adem ku ji Bexçeyê Adenê hat avêtin, di serdema xwe de ji her kesî bêtir nêzî Xweda meşiyan.

Brahîm, di seransera jiyana xwe de gelek caran hebûna Xweda ya xuyayî tecrube kir. Carekê Xweda ji bo tiştên wê ben serê Sodom û Gomorayê pê re bipeyive, hat cem wî. Piştî darizandina van bajaran em wisa dixwînin: “Serê sibê zû Brahîm rabû û vegeriya cihê ku li ber Xudan sekinîbû” (Destpêk 19:27). Ev bûyer tenê serpêhatiyek bû ku Brahîm bi vê re digihiya zewqa parvekirina bi Xweda re. Ya rastî, Brahîm di pîrbûna xwe de ji

xulamê xwe re wisa got: “Xudanê ku ez pê re diçim, wê milyaketê xwe bi te re bişîne û rê li ber te veke…” (Destpêk 24:40).

Yeka din jî em dixwînin: “Samûêl mezin dibû û Xudan jî pê re bû. Hemû sozên Xudan pêk hatin. Gotinên wî vala derneketin” (Samûêl I, 3:19). Hemû sozên ku dan vî zilamî çawa pêkan e ku yek jê jî vala dernekeve? Bersiva vê di ayeta piştî vê de cih digire: “Xudan bi Hannayê re qencî kir û Hanna bi zaro ma. Sê kur û du keçên din anîn. Samûêlê biçûk di bin xizmeta Xudan de mezin bû” (Samûêl I, 2:21). Careke din em dibînin ku di hebûna Xweda de, gotinên Wî derdikevin holê. Gava em Wî nas bikin, em ê gotinên Wî bibêjin û gotinên me bi avê de naçin.

Di Peymana Kevin de; bêguman Mûsa ne tê de, Dawidê ku herî pir ji hebûna Xweda hez dike û herî pir hebûna Wî tecrube kiriye, wisa diqîre: “...û mala xulamê te Dawid jî li ber çavê te xurt bibe” (Samûêl II, 7:26). Weke Mûsa wî nexwest hebûna Xweda li ser bike û bi ser bikeve. Ya rastî piştî ku wî zîna û qetla mirovan xist sitûyê xwe, qêrîna tobeya di dilê wî de wisa bû: “Min ji huzûra xwe navêje, Ruhê xwe yê pîroz ji min nestîne” (Zebûr 51:11). Baş zanîbû ku hebûna Xweda tunebe wê jiyan cihekî bê wate û valahiyeke mezin be! Ev gotin nivîsandin: “Tu min haydar dikî ji riya jînê, Têr şahî heye li pêşberî te, Kêm nabe şahî li rastê te” (Zebûr 16:11).

Zanista derûnnasiyê tîne ziman ku têkiliyên me yên pênc salên dawî, nasnameya me bi şikil û şemal dike. Ez ji vê bawer dikim ji ber ku Nivîsên Pîroz wisa dibêjin: “Neyên xapandin, Hevaltiya xerab exlaqê spehî xera dike” (Korîntî I, 15:33) û careke din, “Kesê bi şehrezayan re digere şehreza dibe” (Şîretên Silêman 13:20). Baş e, îcar rewşa Dawid çawa bû? “Her kesekî di tengasiyê de, deyndar û nexweş li dora Dawid kom bû. Dawid ji nêzîkî çar sed kesî re rêbertî kir” (Samûêl I, 22:2). Tu ji xwe re lê binêre, ji bo mirov bi hev re ji deh salan zêdetir wext derbas

bike çi qelebalixike nexweş û fahş! Mirovên ku tengasî, deny û dilnexweşiyên wan hene! Hêrsokî ne, sil in û bêguman qebe û xemsar in. Van kesan şexsiyeta Dawid fesiland? Na! Çima? Ji ber ku Dawid di hebûna Xweda de pir dem derbas kir û sekna xwe ya esîl parast û di dawiya dawî de ji qelebalixiya li tenişta xwe serokên mezin yên ku wê di nava gelek nifşan de bên naskirin, ava kirin!

Yek ji wan ayetên ku ez herî pir jê hez dikim, ew ayeta ku Dawid bersiv daye vexwendina mezin ya Xweda ye. Wisa nivîsandiye:

> "Ya Xudan, te got, Li rûyê min bigerin. Dilê min ji te re got,
> Ez li rûyê te digerim." (Zebûr 27:8)

Jiyana wî ev bû. Bi Reb re ewqas dem derbas kir ku ne tenê çersed zilamên hêrsbûyî, bandor li hemû neteweyê kir. Zilamekî mezin yê bandorger bû ji ber ku çavkaniya têgihiştinê, zanînê û zanyariyê re dem derbas kir. Lêbelê Dawid ev ne ji bo zanyariya Xweda "di dest xwe de" bigire, kir. Ji ber ku bêriya dilê Wî kir hewl da. Ji her tiştî û ji her kesî bêtir ji Xweda hez kir û sedema vê jî ew bû ji ber ku bi Wî re pir dem derbas kiribû.

Xwezî Silêmanê kurê Dawid ev arezû weke mîratê ji bavê xwe girtibûya. Xwedayê Îsraîlê du caran dît û ji kesên berî wî û piştî wî hatin re xwediyê zanebûneke pir mezintir bû. Lê girîngiya ku di hebûna Wî de bimîne fêhm nekir. Di dawiya jiyana xwe de bi poşmaniyeke mezin pirtûka Peyxamê nivîsand. Her çiqasî xwediyê zanebûn, dewlemendiyeke pir mezin, jinên dinyayê yên herî pir xweşik, li her deverê dinyayê bi navûdeng û xwedî bandorekê bûya jî, hemû tiştê kir qêriye û got: "Pûç e, pûçî vala ye!" Eger xwediyê dilê bavê Dawid bûya, wê dîroka Îsraîlê bi awayekî pir cuda derketa holê.

Ya rastî eger gelek kesan girîngiya li dû hebûna Xweda fêhm kiribûya, wê dîroka Pirtûka Pîroz pir cuda bûya. Weke tiştekî trajîk, gelek kesan heta astekê hebûna Wî tecrube kirin lê pişt re bi awayekî qedrê tahma ku ji hebûna wî digirtin, fêhm nekirin. Fêhm nekirin ku têrbûna mayînde di hebûna wî de ye û qewînbûn tenê bi lêgerîna li Wî re peyda dibe. Yek ji van zilaman neviyê Dawid Qiral Uzziya bû. Di salên pêşîn yên jiyana xwe de li Xweda geriya û di encamê de serkeftineke mezin bi dest xist lêbelê pişt re çavkaniya serkeftina xwe bê ji kuderê derdikeve, ji bîr kir. Bi helwesteke pozbilindî neda dû Xweda û di dawiya jiyana xwe de bi nexweşiyeke çermî ket û bi tena serê xwe mir (bnr. Dîrok 2, 26).

## TRAJEDIYA HERÎ MEZIN

Bi Peymana Kevin re em dikarin berdewam bikin lê yek ji trajediyên herî mezin, berî Dawid bi sedan salan gava bavikên wî ji Misrê derketin hatiye dîtin. Di beşa berî vê de em hîn bûn ku arezûya Xweda ew e ku dixwaze ji bo wan xelas bike, wan bîne cem xwe. Ji bo hebûna xwe nîşan bide xwest nêz bibe lê gava wisa dike em tiştekî ku me xemgîn dike, dixwînin: “Wî çaxî gel dûr sekinî lê Mûsa xwe nêzîkî wê dera tarî kir ku Xwedê lê bû” (Derketin 20:21). Çawa trajîk e. Xweda xwe pêş wan dike û ew bi paş de vedigerin! Tenê arezûya Mûsa ya bi israr ku dixwest nêz bibe hebû. Ji ber berteka nîşan dan Xweda, li ser navê gel kahînekî ku dikare di huzûra Wî de bisekine ava kir. Hebûna Xweda ya bi perdeyê nuxumandî, ji bo di nava wan de malekê ava bike wê konek hatibûya vegirtin. Li gorî peywirên diyar yên ku Xweda didan, piştî ku kon bi baldarî ava kirin, îcar em wisa dixwînin:

> “Ewr ser Konê Hevdîtinê nixamt û rûmeta Xudan mesken dagirt. Mûsa nikaribû biketa Konê Hevdîtinê, çimkî ewr li ser wê disekinî û rûmeta Xudan mesken tije kiribû” (Derketin 40:34-35)

## ASTÊN CURBECUR YÊN HEBÛNA XWEDA

Di vê vîrajê de divê ez berê xwe bidim rêyeke din û divê ez behsa astên curbecur yên hebûna Xweda bikim. Di ayetên jor de bala xwe bidin peyva “rûmet”ê. Gava kon cara pêşî hat avakirin, hebûna Xweda ewqasî bi rûmet bû ku Mûsayê weke hevalekî xwe bi Xweda re rû bi rû dipeyivî nekete hundur. Îcar hûn dikarin berz û balabûna Wî xeyal bikin? Di wê kêliyê de hem hebûneke bêhempa ye û hem jî hebûneke ecêb e!

Piştî bi salan Eli’yê hem kahîn û hem dadgerek e ku ji zuriyeta Harûn hatiye, di bi serokatiya wî de hebûna REB ya di kon de hema bêje di rewşeke nexuyayî de bû. Ya rastî ne tenê ketin hundir, li kêleka cihê ku Mûsa demekê nikarîbû têketaya hundurê wê, bêşerm guneh kirin. Em wisa dixwînin: “Di wan rojan de, gotina Xudan kêm dihat. Dîtinî jî kêm bibûn” (Samûêl I, 3:1). Çima gotina REB kêm bû? Eger careke din pêwîst be ku em bibêjin, wehiya ku gotina Xweda di xwe de dihewîne, di hebûna Wî de tê dîtin. Hebûna Xweda tunebe wehiy jî tuneye, hebûna Wî di asteke kêm de be wehiy kêm tê û hebûna Wî bi hêz be wehiya mezin tê! Di vê beşê de tê gotin ku hebûna Xweda qels dibe an jî pir hindik dimîne. Ev, tê wê wateyê ku Sindoqa Peymanê ketiye destê Filistîniya ku ev jî di dawiya rêvebiriya Eli de pêk hatiye. Di dawiya jiyana wî de gotina “Îkavot” ku dihat wateya “bilindayî veqetiya” hat ziman.

Ji ber gunehê, berevajî serdema Eli ya ku hebûna Xweda kêm û ya ku hema bêje hew dihat ferqkirin, herçiqasî biqasî

gava ku kon hat vegirtin nebe jî, hin demên ku hebûna wî bi awayekî eşkere rast û dema ku wehiy pir dewlemend bû, çêbûn. Di demên wisa de bêyî ku mezinahiya Xweda bê pêşkêşkirin, bi awayekî sergirtî nêz dibe. Em vê di Yakûb de dibînin. Bi Xweda re li ber hev dan û bi Wî re hatin rûyê hev lê diyar bû ku ne di nava mezinahiya xwe de bû. Lêbelê Yakûb hat guhertin û di encama vê rastîhevhatinê de bi wehiya Xweda re mezin bû (bnr. Destpêk 32:24-30). Yeşû REB dît û fêhm nekir jî ku kesê bi wî re dipeyive serleşkerê artêşa Xweda ye. Lêbelê ji aliyê din ve Mûsa ji bo rûyê Reb bibîne xwe avêt Wî û ev bersiv lê vegerand: “Lê tu nikarî rûyê min bibînî, çimkî kesê rûyê min bibîne nikare bijî” (Derketin 33:20). Em dixwînin ku Mûsa dixwaze Xweda bi hemû mezinahiya xwe bibîne lê Wî nabîne. Lê Yeşû û yên din rûyê Reb dîtin û dîsa jî nemirin. Çima? Ji ber ku Reb di nava hemû mezinahiya xwe de nedîtin.

## RONAHIYA RÛYÊ REB

Pêşî berî her tiştî em behsa mezinahiya Reb bikin. Hinek jê vê weke mij, ewr an jî tiştekî ku dişibe van xeyal dikin. Ev rewş rê li ber van hevokan vedike: “Ax, duh bi şev di dema hebandinê de mezinahiya Xweda bi min xuya bû.” Lê ev xuyakirin bi peyvên nezan, pêşnûmeya Wî bi sînor û xumamî dike (bnr. Eyub 38:2).

Berî her tiştî mezinahiya Xweda ne ewrek e. Hûn dikarin wisa bipirsin: “Naxwe gava di Nivîsên Pîroz de mezinahiya Xweda berçav bû, çima her carê behsa ewrekî tê kirin?” Sedema wê ev e: Xweda xwe di ewrekî de dinixumîne. Ew, ji ber ku mirov nikare li heybeta Wî binêre, ewr ser rûyê Wî dinixumîne. Eger ne wisa be wê heybeta wî hemû bedenên li derdora xwe winda bike û di cih de wê bimirin. Bînin bîra xwe, Xweda ji Mûsa re got ku çi kesê rûyê Wî bibîne nema dikare bijî. Wê demê ev pirs tê bîra mirov:

Yeşeya, Hezekîêl û Elçî Yûhenna gava mezinahiya Reb dîtin, ji bo vê binivîsînin çawa li jiyanê man? Bersiv hêsan e: Ne di bendenê de di giyan de dîtin. Bedena fanî xwe li ber REB'ê Pîroz ku xwe di nava hemû heybeta xwe de nîşan bide, nagire. Ew aGrêkî ku her tiştî dişewitîne lê di xwe de ne tarî ye (Îbranî 12:29, Yûhenna I 1:15). Pavlûs di derbarê Îsayê Mesîh de wisa dinivîsîne:

> "Ew Desthilatdarê yekta û Pîroz e, Padîşahê padîşahan û Xudanê xudanan e. Ew bi tenê bêmirin e û di ronahiya ku tu kes nikare nêzîk bibe de rûdine. Û ji mirovan tu kesî ew nedîtiye û nikare bibîne." (Tîmotêyos I, 6:15-16)

Îsa di nava ronahiyeke nenas de dijî ku tu kesî nedîtiye û nikare bibîne.  Ya rastî, nivêskarê Zebûrê anî ziman ku Reb ronahî weke qumaşekî li xwe bike cil û berg li xwe kirine (bnr. Zebûr 104:2). Pavlûs dikaribû bi hêsanî vê yekê binivîsîne, ji ber ku di rêya Şamê de wî heya radeyekê ronahiya hebûna xwe ya birûmet a ku negihîştiye serpêhatiya wî ezmûn kir. Wî serpêhatiya xwe ji Qiral Egrîpa re wisa anî ziman:

> "Ya padîşah, nîvro di rê de, min ji ezmên ronahiyek dît ku ji ya rojê bi şewqtir bû û dora min û yên bi min re ronahî kir." (Karên Şandiyan 26:13)

Pavlûs rûyê Îsa nedît; wî ronahiya ku ji rûyê wî dida der ya ku weke tava ronak a Rojhilata navîn dît! Ew li ber heybeta huzûra Wî bû. Ne tava sibeh û êvarê bû, tam ya nîvrojê bû. Ez diwanzdeh salan li Floridaya "bitaverojê" jiyam û qet pêdiviya min bi berçavka rojê çênebû û ez mecbûr nemam ku bidim ber çavê xwe! Lê çend sal berê, min û Lisa serdana Rojhilata Navîn kir û ez neçar mam ku li wir berçavka rojê bidim ber çavên xwe! Roj li kişwera çolê ya hişk, ji ya Florîdayê pir geştir bû û ji ber nêzîkbûna

wê ya ekvatorê ronahiya wê gelek caran zêde kir. Ronahiya tavê serê sibê û piştî nîvroyê dihat tehemûl kirin lê ji saet yazdehan û heta saet duduyan pir tîr bû. Lê Pavlûs got; ronahiya Îsa ji tava nîvroyê ya Rojhilata Navîn geştir bû! Ka kêliyekê bifikirin û bînin bîra xwe bê cara dawî we kengî rasterast li tava nîvro nêriye. Heya ku ew bi perdeyekê an jî bi ewrekî neyê nuxumamdin ev ne pêkan e. Heybeta Reb pir di ser wê ronahiyê re bû.

Ev rewş weke ku Yoel û Yeşeya radigihînin, di rojên dawî de gava heybeta Reb derket holê, bûyera ku roj tarî bû radigihîne: “Va ye roja Xudan tê! Roja xedar, roja bi xezeb û hêrsa dijwar tê Ku welatan wêran bike Û gunehkarên wan helak bike. Çimkî wê stêrên ezmanan Û komên wan nebiriqin. Gava roj derkeve wê tarî be, Heyv jî ronahiya xwe nede” (Îşaya 13:9-10).

Destûrê bidin ku ez hîn jî ragihînim. Di hewayek sayî de bi şev em çi li asîmanan dibînin? Sitêrkan! Bi şev li her deverê asîman in. Lê sibehê gava roj derdikeve çi dibe? Diçin kuderê? Sitêrk heta roj diçe ava di bin perdeya asoyê de xwe vedişêrin û bi şev bazdidin cihên xwe gelo? Bersiv helbet na ye. Naxwe wê demê çi dibe? Heta astekê sitêrk bi heybet in lê heybeta rojê ewqasî mezin e ku gava derdikeve holê sitêrk ji holê radibin. Hîn li wir in lê xuya nakin. Bi heman awayî gava Îsa vegeriya, wê heybeta Wî ji rojê ewqasî mezintir be ku wê rojê tarî bike. Her çiqasî roj li wir be jî wê ji ber ronahiya Îsa xuya neke! Weyla lawoo! Îcar aniha sedema bê çima Pavlûs “tu mirov nedîtine û wê nebîne” hûn fêhm dikin?

Heybeta Reb hemû ronahiyên din binpê dike. Ew bê kêmasî ye û Ew ronahiyeke ku dikare her tiştî xera bike. Ha ji ber vê di hatina Wî ya duyem de “Çaxê Xudan rabe dinyayê bitirsîne, Wê mirov ji ber tirs û xofa Xudan, ji ber rewnaqiya wî, Bikevin şikeftên zinaran û qulên axê” (Îşaya 2:19). Yûhenna wisa tîne ziman:

> "Hingê padîşahên dinyayê, mezinên wê, serekleşkerên wê, dewlemendên wê û hêzdarên wê û hemû mirovên xulam û azad xwe di şkeft û latên çiyan de veşartin. Wan ji çiyan û latan re digot: Bi ser me de bikevin û me ji ber rûyê yê ku li ser text rûniştiye û ji ber xezeba Berx veşêrin." (Peyxam 6:15-16)

## HEYBETA XWEDA ÇI YE?

Em pirsê bibersivînin: Heybeta Reb çi ye? Ji bo em vê bibersivînin em vegerin axaftina Mûsa ya bi Xweda re. Mûsa ne tenê li hebûna Xweda guhdar kir, di heman demê de xwest heybeta Xweda jî bibîne.

> "Mûsa got: Lava dikim rûmeta xwe nîşanî min bide." (Derketin 33:18)

Peyva Îbranî ya ku weke "heybetê" hatiye wergerandin "kabowd" e. Ferhenga Pirtûka Pîroz Strong, vê peyvê weke "giraniya tiştekî lê di wateya mecazî de baş" pênase dike. Pênaseya wê wekî din heybet, hebûnî û rûmetê tîne bîra mirov. Mûsa dixwest ku Xweda "hemû heybeta xwe nîşan bide." Bala xwe bidin bersiva Xweda:

> "Ezê hemû qenciya xwe di ber te re derbas bikim, ezê navê xwe, navê Xudan li pêş te eşkere bikim" (Derketin 33:19)

Mûsa xwest hemû heybeta Xweda bibîne û Xweda bersiva "hemû qenciya min" dayê. Peyva Îbranî ya weke "qenciyê" hatiye wergerandin "tuwb" e. Ev tê wateya "qenciya bi wateya xwe ya herî berfireh." Bi gotineke din, tu tişt nayê texsîrkirin.

Xweda pişt re wisa berdewam dike: “REB ez ê navê te li ber te ragihînim.” Qiralek berî têkeve odeya textê xwe, ji aliyê nûçevan ve navê wî tê ragihandin. Gava di nava heybeta xwe da dikeve odeya textê xwe, di ber ragihandinê re dengê borîzanan jî lê dixe. Mezinahiya qiral tê îlankirin û li bexçeyê sarayê diyar e bê qiral kî ye. Hebûna wî ya mezin sawê dixe dilê mirovan. Lê heman qiralî bi kincên xwe yên ji rêzê û li tenişt wî peywirdar tunebin û kolanên bajêr bigeriya wê çi bibûya? Rastî ev e ku tişta li hewşa sarayê bi awayekî pir zelal diyar e, wê li derve xumamî bibûya. Ji ber ku kesên di ber wî re biçûna û bihatana, wê hayê wan ji nasnameya wî ya rastî çênebûna. Berevajî hebûna wî ya li odeya textê wî, wê ne tiştekî rewnaq bûya. Gava Xweda ev gotin kirin, ya rastî tişta ji bo Mûsa kir ev e: “Ez ê navê xwe ragihînim û bi hemû heybeta xwe ez ê di ber te re herim.”

Di Peymana Nû de em dibînin ku mezinahiya Reb li ser rûyê Îsayê Mesîh dibiriqîne (Korîntî II 4:6). Gelek kesên ku di huzûra Reb de ne, anîne ziman ku Îsa dîtine û li rûyê Wî nêrîne. Ev tiştekî pir pêkan e lê divê ez bibêjim ku Ew bi hemû heybeta xwe nedîtine.

Hinek jê piştî ku Îsa ji mirinê rabû, dikare lê bipirse bê xwendekarên Wî çawa li rûyê Wî nêrîne. Ev jî rast e lê bedena vejiyayî heybeta Wî bi awayekî zelal eşkere nake. Weke min behs kir di Peymana Kevin de kesên hebûna REB dîtine û tecrube kirine, hene. Lê heybeta wî bi temamî nedîne. REB ji Brahîm re li deviya Mamreyê xwe da xuyakirin lê ne di nava heybeta xwe de (Destpêk 18:1-2). Yaqûb bi Xweda re çû binavê û Yeşû Ew nas jî nekir (Yeşû 5:13-15) û hin kesên din jî hebûn. Yeşû berî Erîha têkeve dest gava li rûyê wî nêrî, REB jê re weke şervanekî xuya bû. Yeşû, ji ber fêhm nekir bê zilamê li hemberî wî kî ye, wisa jê pirsî: “Tu li aliyê me ye an li aliyê din e?” Li ser vê REB xwe weke “serleşkerê artêşa REB” danasîn û ji ber cihê pêlê dikir

pîroz bû, Yeşûya ferman da ku çaroxên xwe derxîne! Yaqûb di seranserê şevê de bi Xweda re çûn hev binavê û di dawiya dawî de gava roj hilat qêriya: “Ji kerema xwe navê xwe ji min re bêje” (Destpêk 32:29). Em vegerin mînaka qiralê ku li kolanên bajêr bi kincên xwe yên ji rêzê digeriya û kesên di ber wî re diçûn ew nas nedikirin. Ev serpêhatiyên Yaqûb û Yeşû berçav dikin lêbelê dîsa jî ji Wî wehiyên mezintir sitandin.

Heman tişt ji bo piştî vejînê jî derbasdar e. Piştî vejîna Îsa kesê ku pêşî pê re peyivî Meryema Mecdelî bû û Meryem got qey Ew bexçivan e (Yûhenna 20:15-16). Xwendekaran li ber golê bi Îsa re masî xwarin (Yûhenna 21:9-10) û pêşî ne Ew û ne jî dengê Wî nas kirin. Lêbelê gava tiştekî tê zanîn kir, îcar Wî nas kirin. Dîsa piştî vejîna Wî, bi du xwendekarên xwe yên ku wê piştî mirina wî çi bibe ku ji wan re gotibû, meşiya. Lê wan jî Ew nas nekir ji ber ku “lê çavên wan dihatin girtin, da ku ew wî nas nekin” (Lûqa 24:16). Ne rûyê Wî, ne dengê Wî ne jî şeml û şemala Wî nas kirin. Hemûyan li rûyê Wî nêrîn û hebûna Wî tecrube kirin. Her çiqasî heybeta Wî bi awayekî zelal nebînin jî her yekî ji wan ji hebûna Wî wehiy sitendin.

Berevajî vê, Pêxember Yûhenna Ew li Girava Patmosê di giyan de dît û li gorî taştêya li ber golê hevdîtineke bi temamî cuda pêk hat ji ber ku Ew di nava heybeta Wî de dît. Îsa wisa pênase kir: “Rûyê wî wek wê roja ku bi hemû hêza xwe şewq dide bû. Gava min ew dît, ez wek yekî mirî ketim ber lingên wî” (Peyxam 1:16-17). Hebûna Reb ya bi heybet ewqasî bi hêz bû, Yûhenna weke miriyekî li erdê rast bû.

Heybeta REB, her tişta ku Xweda kiriye Xweda ye. Hemû rengên Wî, rayedariya Wî, hêza Wî, zanebûna Wî, ango giraniya Wî ya bêsînor û mezinahiya Wî, tu tişt kêm namîne an jî bêyî li dawî bimîne di heybeta Wî de ye! Hebûna bi heybet a Xweda dikare bi rengekî qismî were ceribandin, weke gava ku tenê pişta

xwe nîşanî Mûsa daye, an bê şekil, weke gava ku ew Saûl li ser rêya Şamê weke ronahî û dengek negihîştî nîşan dide.

## XANIYÊ XWEDA

Em dîsa li neviyên Brahîm vegerin. Gava Xweda li Çiyayê Sînayê hebûna xwe cara pêşî pêşkêş kir, bi paş de vekişiyan û kirin hawar: “Xwedayê me Xudan rûmet û mezinahiya xwe nîşan da. Me ji nav êgir dengê wî bihîst. Me îro dît dibe ku Xwedê bi mirov re peyivî û ew mirov nemir. Lê ji bo çi emê niha bimirin? Wê ev agirê mezin me daqurtîne. Heger em careke din dengê Xwedayê xwe Xudan bibihîzin, emê bimirin” (Dubarekirina Şerîetê 5:24-25). Xwe li ber hebûna Wî ya bi heybet negirtin ji ber ku wijdanên wan li rêya wan ya ku tenê li xwe difikirîn, lewitîbû.

Pişt re Konê Hevdîtinê tê avakirin û Xweda li cihê ku jê re dibêjin “Cihê Herî Pîroz”, di beşa herî hundur de xaniyekî ava dike. Tenê serkahîn salê carekê dikarîbû têkeve vir. Berî têkeve vir ji bo gunehên xwe û yên gel bibexşîne; li ser qurbangeha tûncî ya li hewşê, qurban dihatin serjêkirin. Piştî vê kahîn di dista li ber qurbangehê de, xwe dişûşt. Pişt re di perdeyekê re derbas dibû û dihat Cihê Pîroz. Ronahiyeke xwezayî nediket hundurê vir. Ronahiya me ya tikî tenê Îsayê ku weke hêmayeke çiraya zêr pêdikeve (Yûhenna 9:5). Dîsa li vir Îsayê Nanê me yê jiyanê ku weke nanên sedeqeyan destnîşan kirine, hebû (Yûhenna 6:48). Li vir heybera sêyem, jiyana dua û hebandinê destnîşan dike.

Gava li wir bû jî hîn neketibû cihê esasî yê ku hebûna Xweda lê xanî ava kiribû. Perdeyeke ku Cihê Pîroz ji Cihê Hîn Pîroztir vediqetîne heye. Li ser Qepaxa Bexşandinê ya Cihê Herî Pîroz, hebûna Xweda ya xuyayî weke fiîlî hebû. Kêlîka Îsa giyanê xwe teslîm kir, perdeya qetiya ev e: “Di wê gavê de perda Perestgehê ji serî heta binî çiriya û bû du perçe. Erd hejiya û lat qelişîn”

(Metta 27:51). Bala xwe bidinê ku perde ne ji jêr û ber bi jor ve, ji jor û ber bi jêr ve qetiyaye. Ne mirov, Xweda ev perde qetand ji ber ku êdî derdiket derve! Hîn ji destpêkê ve xwe amade dikir ku derbasî xaniyê nû yê ku bêriya wî dikir. Ji bo dilê zarokên xwe yên ku xwe nû dikirin. Ev kengî bû? Piştî pêncî û sê rojan, di Roja Pentîkost de Xweda di perestgeha xwe ya ku hesreta wê dikişand de bi cih bû. Em wisa dixwînin:

> "Û ji nişkê ve ji ezmên dengek wek rabûna bayekî xurt hat û ew mala ku ew lê rûdiniştin tije kir. Zimanên wek pêlên agir di nav wan de xuya bûn û li ser her yekî ji wan danîn. Hemû bi Ruhê Pîroz tije bûn û bi gotina ku Ruhê Pîroz dabû wan, dest pê kirin bi zimanên din peyivîn." (Karên Şandiyan 2:2-4)

Avakirina Konê Hevdîtinê gava ji aliyê Mûsa ve "hat temam kirin", weke hebûna Xweda têkeve hundurê wê, Îsa got: "Temam bû" û gava serê xwe danî û giyanê xwe teslîm kir (bnr. Yûhenna 19:30). Hebûna Xweda; bar kir xaniyê nû yê ku bi xwîna Berxê Ebedî hatibû amadekirin.

> "Ji bo vê yekê birano, bi xwîna Îsa em dikarin bi cesaret bikevin Cihê Herî Pîroz. Em di wê riya nû û jîndar re bikevinê ya ku wî ji bo me di bedena xwe de di perdê de vekiriye. Û li ser mala Xwedê kahînekî me yê mezin heye. Em bi dilê ku bi xwînreşandinê ji wijdana xerab paqij bûyî û bi bedena ku bi ava paqij hatî şuştin, bi piştrastiya temam a baweriyê, bi dilekî rastîn nêzîkî Xwedê bibin. Em, hêviya ku em eşkere dikin hişk bigirin; çimkî ew ê ku soz daye ewledar e." (Îbranî 10:19-23)

"Li Cihê Herî Pîroz" ji bo em nêz bibin ku xaniyekî ava bikin,

cegera me heye! Vê deverê êdî ne xaniyek an jî perestgeh e, bedenên me ne! Erê, bi qurbankirina Îsa re bar kir nav dilê mirovên ku pîroz tên dîtin. Gelek caran gava em bang Wî dikin, em xeyal dikin ku dikevin hundurekî text yê ku bi milyon kîlometreyan li dûr e. Na, mala Wî dilê me ye! Hîn em fêr nebûne ku li nava xwe vegerin, hîn jî em li derve dinêrin! Peymana Nû bi zimanekî eşkere tîne ziman "Ji bo hûn Mesîh bibînin û alîkariya we bike û ji bo hûn Wî bînin jêr ne hewece ye hûn Wî derxînin asîmanan" (Romayî 10:6).

Belê, odeyeke fizîkî ya textê Xweda ya sêyem ku li asîmanan cih digire heye. Lêbelê di Peymana Kevin de pir bêriya ku nêzî gelê xwe be kiriye, ji ber vê ji bo hebûna Wî ya xuyayî li ser rûyê erdê rûnê di konekî de ji xwe re cihek ava kir. Îcar aniha kesên ku jiyana xwe dane Îsa û kesên dixwazin bi giyanê Wî re bi ser ve herin, di dilê xwe de ji bo Wî xaniyekî di nava xwe de ava kirine. Cihê herî nêz yê hezkirin û baldariya Wî ji bo xwe hilbijart. Gava me nêzîkayî li wê hebûna Wî ya di dilê me de dijî kir, îcar em ê têkevin wê odeya text ya ku bi milyon kîlometreyan dûrî me ye. Wê ev çawa çêbibe? Ji bo Giyanê Xweda dûrbûn tuneye. Hebûna li huzûra Wî, bi Îsa û Bav re mayîna li odeya text e. Ji ber ku Ew Giyanê Xweda û Mesîh e! (Bnr. Romayî 8:9).

Bala xwe bidinê ku nivîskar wisa got: "Em bi awayekî eşkere xwe bi hêviya em jê bawer dikin girê bidin. Ji ber ku Xwedayê sozan dide ewle ye." Nivîskar ji bilî vê wisa dibêje:

> "Ev hêviya me wek lengerê can ê saxlem û ewledar e û derbasî aliyê perdê yê hundir dibe." (Îbranî 6:19)

Qetandina perdeyê li vê dinyayê hemû kesên dihebînin, di rêyeke nû û zindî de hişt ku xwe li hebûna Xweda vede. Îcar aniha perde bûye bedena me. Eger em bedena xwe li çarmîxê

xin an jî înkar bikin û ji hewşê dûr bikevin (bnr. Galatî 5:24), em ê têkevin nav hevpariya dil ango “Cihê Herî Pîroz” yê nû. Hebûna Wî her dem heqîqetek e. Gava bi dilekî rast em nêzî Wî bûn, soza ku hebûna xwe nîşanî me bide da! Tu carî negot ji bo demeke bi sînor an jî diyar. Heta ku ji Wî re sadiq bin, hebûna Xweda her dem weke di perestgeha xwe de be, aniha hebûna Wî di perestgeha dilê me de timî ye.

Em gotinên Yaqûb dîsa bînin bîra xwe: “Nêzî Xweda bin, wê Ew jî nêzî we bibe.” Hêviyeke pir mezin, baweriyeke pir saf û jidil! Xweda soz dide û li ser xwe sond dixwe: “Wisa ku bi du tiştên ku nayên guhertin û çênabe ku Xwedê di wan de derewan bike, cesareteke me ya xurt hebe, da ku em vê hêviya ku li ber me hatiye danîn, bigirin” (Îbranî 6:18). Ev hêvî çi ye? Eger em nêzî wî bibin, wê Ew jî nêzî me bibe! Baweriya wê daye!

Îcar naxwe çima hîn bêtir kes kêfa hebûna Wî ya xuyayî dernaxînin? Weke ku A. W. Tozer diyar dike:

> “Gava ku perde bi qurbankirina bedena Îsa re hat qetandin, çima em li derve disekinin dema ku tiştek nemaye ku pêşî li me bigire ku em herin aliyê Xweda? Çima em amade ne ku hemû rojên xwe li derveyî Cihê Herî Pîroz derbas bikin û qet neçin hundur da ku li Xweda temaşe bikin? Em dibihîzin ku Zave wisa bang dike: “Bejn û bala xwe nîşanî min bide, Dengê xwe bi min bide bihîstin, Çimkî dengê te şîrîn, Bejn û bala te xweşik e. (Helbesta Helbestan 2:14). Em hîs dikin ev bang ji bo me hemûyan e lê dîsa jî em nêz nabin û sal derbas dibin û li derveyî hewşa perestgehê pîr dibin û diwestin. Tişta dibe asteng çi ye?” *(The Pursuit of God,* Li Pey Xweda, r. 41)

Pirs hîn li ber me ye: Tişta ji me re dibe asteng çi ye? Çima em bi hêza xwe li ber xwe didin û ji ber korbûna xwe em li hedefê

naxin? Bi soza Xweda ya ku tu carî li erdê nakeve ku em xwediyê hêviyeke bêhempa ne îcar çima gelek ji me aciz û têrnabin? Ev têkiliya hevpar ya bêhempa ya ku Xweda ji bo her bawermendî ava kiriye, bê çi rê li ber girtiye di pêşerojê de em ê kifş bikin.

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Di destpêka vê beşê de ev pirs hatin pirsîn: "Naxwe wê demê gelek kesan ji bo çi bi Xweda re têkiliyeke rewşenbîrî pejirandiye? Ji ber çi em bi Xirîstiyaniyeke ku ji hebûna Mesîh bêpar in, qîma xwe pê tînin. Bêyî nêzîkayiya li Xweda, em çawa hîn bûn ku em ji halê xwe razî ne?" Hûn ê van pirsan çawa bibersivînin?

2. Weke ku nivîskar diyar kiriye, zanistiya derûniyê dibêje, têkiliyên me yên ku di pênc salên dawî de me ava kirine, şexsiyeta me ava dikin. Vê rewşê bi Nivîsên Pîroz piştrast dike: "Hevaltiya xerab exlaqê spehî xera dike" (Korîntî I, 15:33) û "Kesê bi şehrezayan re digere şehreza dibe" (Şîretên Silêman 13:20). We di jiyana xwe de ji van her du aliyan aliyek an jî her du alî tecrube kirine gelo? Encam çawa bûn?

BEŞ 6

# DOSTÊN XWEDA

“Xwe nêzî wan kir lê ew bi qîma xwe li vê xwedî derneketin.”

Gava min ev beşên destpêkê dinivîsandin, birçîbûneke wisa dilê min diçelqîne. Axaftina li ser van mijaran agir gur dike û ew Kesê bê hesab û bê tiştek ji me hez dike, dihêle ku arezûya min gur bibe. Li hemû dewr û dewranan di evîna herî mezin de, Xwedayê me her dem weke şexsî li me geriya. Lêbelê kirdeya lêgerîna me ya hêja Xwedayê me, ne “nêçîreke rehet” e. Ew Qiralê Mezin î pîroz e û bi vî awayî divê hurmet jê re bê girtin. Ji ber vê bêyî em dest bidin mijara “tirsa pîroz”, derbarê “nêzîkayiya” Wî de ebeden hûn nikarin bipeyivin.

## VEQETÎNA RÊ

Di vê fetlonekê de “peyamên ji têkildaran re xweş tên” û heqîqet, bi piranî ji hev vediqetin. Peyamên bi vî awayî di her mezhep û derdorê de dibe ku hebin. Behsa Xwedayekî ku arezûya mirovan dike û dixwaze wan bi bereket bike, dikin. Lêbelê ji ber ku pîroziya Wî bi tu tiştî nahesibînin, xeteyê dikin. Ev xete gelek caran bi niyeteka baş tê kirin. Hinekan jê trajediyên ku zagonan pêk hatiye dîtine an jî tecrube kirine. Yên din jî tenê dixwazin bibînin ku mirov bên hezkirin û bên xwedîkirin. Ji aliyê din ve hin peyam ji bo girseyeke hîn mezintir ya temaşevanan li hev kom bike, bi zanistî waaz kêm tên dayîn.

Yên ku mizgîniya Xwedayekî hezkirî û têgihîştî yê ku ji ber lepên dadmendiyê difilite û tenê bêqanûnî û dinyaya me vedişêre, di motîvasyon û taktîkan de bi bertek in.  Şîreta ku ew didin, bi bihîstina gotina wî ya li ber Xweda nehate bidestxistin. Eger wan bikira, ew ê fêhm bikirana ku rêya yekane ya nêzîkbûna li Wî ev e ku hem evîna Xweda û hem jî tirsa xwe sînordar bike.

Ji ber vê ev peyam, ya rastî ji ber hedefa ku hewl didin xwe bigihînînê “Rebekî hêsan” waazan dikin. Em tirsa Reb li derve bihêlin, di esasê xwe de wê “hebûna Wî bixilqînin.”

## TIRS MIROV ŞIYAR DIKE

Rastiyeke ku li huzûra Xweda disekine û derbarê civakekê de her dem derbasdar e heye ku ev rastî qet naguhere. Ev rastî di vê ayetê de bi kurtasî tê behskirin:

> “Di civata ezmaniyan de ew Xwedêyek pirr bi heybet e, Ji hemû yên li der û dora xwe ew bêtir tirsdar e.” (Zebûr 89:7)

Em serê ayetê ji nû ve bixwînin. “Di civata ezmaniyan de ew Xwedêyek pirr bi heybet e.” Ev her dem rast û derbasdar e: Li cihekî ku hebûna Xweda lê xuya dibe, hûn tu carî lê rast nayên ku hebûna Wî tirsê ava neke. Wê nêzî cihekî ku lê rûmet, hurmet û rêzgirtina herî bilind lê nebîne, nebe an jî wê li wir xaniyekî ava neke. “Hebandin” an jî îlahî xweşik bin, waaz an jî doktrîn baş bin an jî dua li gorî Pirtûka Pîroz bin ferq nake. Eger ji Xweda neyê tirsîn, Ew ji bo xwe bîne ziman, naqedime. Wê rewş ji ya Eli û kurikên wî ne cudatir be.

Di nava salan de, ez li salonên ku bi sedan heta bi hezaran bawermend lê civiyane, mam. Lêbelê mixabin, gelek caran tu işaretek ji hebûna Xweda li van salonan tunebû. Sedema vê ew bû ku li nav van civatan û heta di nava rêberên wan de kêmasiya tirsa pîroz bû. Dibe ku komên hebandinê bêhempa bin, dibe ku alan bihejînin û dansê bikin, dibe ku muzîsyen û stranbêjên wan yê bi qabîliyet hebin. Demên perestîşê bi alîkariya bangên medyayê dibe ku hîn bêtir nû û teknolojîk bin. Dibe ku çalakî bi henek û mijarên balkêş mirovan pêşkêş bike ku bihêle hem kêfa wan bîne û hem jî çalakiyeke bi qabîliyet be lê tiştek kêm e. Salon ji hebûna Xweda bêpar e. Rastiya ku dilê mirov perçe dike ew e ku kesên tevlî bûne nizanin û haya wan jê çênabe ku di rastiya xwe de salon vala ye. (Di vê xalê de têkilîdayîn, bihêlin ez bînim ziman ku rêyên nû bi tena serê xwe rê li ber hebûna Xweda negirtine. Li cihên ku teknolojiya nû li wan tê bikaranîn û ji hebûna Xweda ya dewlemend ku min bereket jê giritye jî ez mame. Tu têkiliya hebûna Xweda bi hebûn an jî nebûna teknolojiyê re tuneye lê rewşa dilê mirov eşkere dike.)

Di rewşên wisa de, Reb min ber bi îteat û tirsa Reb ve dibe ku ez wê parve bikim û her cara ku banga tobeyê tê kirin, gelek caran ez bûm şahid ku rêberên wan jî tevlî vê bangê bûne. Carinan jê, bêyî ku tiştek çê bibe û duayek bê kirin hebûna Xweda

derdikeve holê û mirov dest bi girî dikin. Çima wisa dibe? Ji ber ku Xweda nêzî kesên jê hez dike, yên wî bi rûmet dikin û yên ku jê ditirsin, dibe. Ji ber vê Yaqûb wisa dibêje:

> "Nêzîkî Xwedê bibin, ew jî wê nêzîkî we bibe. Gunehkarno, destên xwe paqij bikin. Dudilîno, dilê xwe safî bikin." (Aqûb 4:8)

Di vê ayetê de serê pêşî ji ber îfadeya "gunehkaran", dibe ku hûn bifikirin ku Yaqûb derbarê mirovên xelas nebûne de peyiviye. Lêbelê di dema axaftina xwe de pazdeh caran ji xwendekarên xwe re got, "gelî birano" û bi vî awayî bangî wan kir. Ji kesên ku ji nû ve çêbûne re dipeyive.

Naxwe wê demê em li peyva gunehkar binêrin, Grêkiya wê "hamartolos" e. Vine, wateya vê peyvê weke "kesê ku li hedefê nexistiye" pênase dike. Rast e ku ev peyv kesekî xelasnebûyî pênase dike lê li gorî pêwendiyê ji Xirîstiyaniyekî re jî dikare bê bikaranîn. Di vê pêwendiyê de; bawermendekî ku ramanên wî ji hedefê derketine û tevger û çalakiyên xelet nîşan dide, pênase dike. Wisa berdewam dike: "Wa kesên bêbiryar, dilên xwe paqij bikin." Bi vê hevokê re dadikeve koka bê bawermend ji ber çi li hedefê naxin.

Tiştekî pir girîng e ku em fêhm bikin ku tirsa Reb di dil de dest pê dike û xwe di tevgerên derveyî de xwe dide der. Xweda carekê ji bo gelê xwe wisa got û xwe "nêz" bikin û bala xwe bidin îfadeya Wî:

> "Ev gel bi devê xwe nêzîkî min dibe Û bi lêvên xwe min birûmet dike Lê dilê wan ji min dûr e. Tirsa wan a ji min jî, Tenê emrên mirovan in Ku ji wan hîn bûne." (Îşaya 29:13)

Nêzîkayiya li Xweda, her dem di dilekî ku Xweda ji her tiştî û ji her kesî bêtir jê hez dike û jê ditirse de, dest pê dike. Ne tenê tevgerên

derveyî, ev xwesteka dil e. Ji ber vê serê pêşî gava ku em tirsa Reb pênase bikin, divê pêşî em helwesta dil di ber çavan re bigirin.

Em dest pê bikin: Wateya tirsa ji Xweda ev in; hesibandin û rûmetkirina Wî û mirov Wî di ser her mertebeyê re bibîne, hurmetê jê re bigire, nefsbiçûkî û hebandina Wî ye. Ji Wî re, ji hebûna Wî re, ji fermanên Wî re û ji xwestekên Wî re divê mirov rêzê bigire û bi ser de bireele. Ev tenê destpêk e.

## NÊZÎKAYIYA BÊHURMET YA LI XWEDA

Carina ji bo mirov fêhm bike bê tiştek çi ye, mirov zanibe bê ew tişt ne çi ye jî bi kêrî mirov tê. Bêyî tirsa pîroz ya nêzîkayiya li hebûna Xweda mînakeke herî baş di jiyana her du kurên Harûn de xuya dibe.

Berî çêkirina perestgehê temam bibe, REB ji Mûsa re wisa ferman da: “Ji bo ku ji min re kahintiyê bikin, tu ji nav gelê Îsraîl kekê xwe Harûn û kurên wî Nadav, Avîhû, Êlezar û Îtamar bîne ba xwe” (Derketin 28:1).

Ev zilam ji bo xizmetê ji REB re bikin û ji bo ji gel re qasidiyê bikin, hatin neqandin û hatin perwerdekirin. Ji bo nêzîkayiya li hebûna Wî rayedariya wan hebû. Peywir û berpirsyariyên wan yên di xizmeta hebandinê de, ji aliyê Xweda ve bi talîmatên taybet yên dane Mûsa hatine sererastkirin. Piştî perwerdeya xwe kirin sedeqe, pişt re hebûna Xweda kon dagirt û xizmetan dest pê kir.

Lê ji bo van herduyan xizmet emirqutî bû; hem jî piştî ku heybeta REB di kon de xuya bû. Piştî demeke kin:

> “Nadav û Avîhû yên kurên Harûn bixûrdankên xwe hildan, agir xistin hûndirê wan û bixûr danîn ser. Wan li huzûra Xudan, agirekî xerîb ku wî li wan emir nekiriye pêşkêş kir.” (Lêwiyî 10:1)

Bala xwe bidinê ku Nadav û Avîhû, li huzûra Xweda agirekî nelirê pêşkêş kirine. Li gorî Ferhenga Webster wateya peyva “nelirê” yek jê jî ev e: “Bêrêziya li hemberî tiştên pîroz an jî kêmdîtina wan; bêhurmetî.” Tişta ku Xweda pîroz an jî weke sedeqeyê dibîne, tê wateya ku mirov van weke tiştên ji rêzê dibîne. Van her du zilaman rahişt wê buhûra veqetandî ya ji bo REB bihebînin û li şûna tişta ku Xweda anîbû ziman, bi buhûr û agirê ku wan hilbijartibû tije kirin. Tişta pîroz bi tu tiştî nehesibandin û ev tişta kirin bi bêîteatiyê bi dawî bû.

Li hemberî tişta pîroz ne baş tevgeriyan û bi pêşkêşkirineke ku nayê pejirandin û bi awayekî bêhurmet nêzî hebûna REB bûn. Pişt re lê binêrin bê çi bû:

> “Agirek ji huzûra Xudan rabû û ew daqurtandin. Ew li huzûra Xudan mirin.” (Lêwiyî 10:2)

Ji ber bêhurmetiya van her du zilaman, di cih de hatin darizandin û di cih de bi mirinê hatin cezakirin. Ev bêhurmetî di hebûna Xweda de pêk hat û her çiqasî kahîn bûn jî, ji rûmetkirina Xweda ne azad bûn. Weke ku Xwedayê pîroz kesekî ji rêzê be nêzî Wî bûn û bi vî awayî guneh kirin! Di hebûna wî de quretî kiribûn! Piştî darizandina wan li gotinên Mûsa guhdar bikin û bala xwe bidin gotina “kesên ji min re xizmetê dikin”:

> “Mûsa ji Harûn re got: Xudan gotibû: Bi saya kesên ku nêzîkî min dikin, Ezê pîroziya xwe nîşan bidim. Li ber çavê tevahiya gel, Ezê birûmet bim. Harûn bêdeng ma.” (Lêwiyî 10:3)

Ev rêgezeke ebedî û gerdûnî ye. Xweda dibêje tu kes nikare li hemberî min bêhurmetiyê bike an jî min bi tiştekî nehesibîne û nêzî min bibe. Hebûna Wî ji aliyê her kesî ve divê pîroz bê

hesibandin û hebûna Wî divê hurmet jê re bê girtin.

Reb, bi awayekî zelal diyar kiribû ku bêhurmetiya li hemberî hebûna Wî wê neyê bexşandin lê Nadav û Avîhû guhê xwe nedan vê. Îro roj jî rewş ne cuda ye, Ew heman Xwedayê pîroz e. Bi tevgerên elatewş em nikarin xwe di hebûna wî de bipejirînin!

Ji ber têkiliyên malbatî ji bo tu kesî rewşeke taybet tuneye. Ev her du kahîn her çiqasî kurên Harûn bin jî, xwarziyên Mûsa bûn jî. Lê herduyan jî li darizandina Xweda nepirsîn ji ber ku tenê Ew bi dadmend e. Ya rastî, Mûsa; Harûn û herdu kurên wî yên sax mane, ji ber darizandina Xweda hişyar kirin ku divê şînê girêdin, eger şînê girê nedin wê ew jî bimirin. Wisa kiribûna wê dîsa li hemberî Reb bêhurmetî bibûya, ji ber vê laşên Nadav û Avîhû derxistin derveyî artêşgehê û veşartin.

Van her du zilamên ciwan talîmatên taybet yên Xweda biçûk dîtin. Bêhurmetî kirin û tirsa Xweda nebîhîstin. Ev helwestên dil bû sedemên tevgerên bêîteatiyê. Em dibînin ku koka gunehê ji tunebûna tirsa REB pêk tê.

## VECINIQANDINA JI XWEDA Û TIRSA XWEDA

Xweda gava li Çiyayê Sînayê xwe pêş Îsraîliyan kir, Îsraîlî di hebûna Wî de nesekinîn. Sedema vê ew bû ku li ser wan tirsa Reb tunebû, ji ber ku gava di hebûna Wî de vekişiyan, Mûsa ji wan re wisa got:

> “Netirsin, çimkî Xwedê ji bo we biceribîne hat ku tirsa wî di dilê we de hebe û hûn gunehan nekin.” (Derketin 20:20)

Mûsa got: “Netirsin” ji ber ku Xweda ji bo “tirsa Wî li ser wan be” hatibû. Ev weke nakokiyê xuya dike lê ne wisa ye. Mûsa veciniqandina ji Xweda û tirsa Xweda ji hev vediqetand. Di vir

de ferqeke mezin heye. Kesê ji Xweda vediciniqe an jî jê fedî dike, hin tiştên wî yên ku veşêre heye. Naxwaze nêz bibe ji ber ku roniya saf ya hebûna Xweda tiştên veşartî derdixîne holê. Pavlûs ji me re wisa dibêje: “Lê her tiştê ku dikeve ber ronahiyê, xuya dibe” (Efesî 5:13).

Xweda naxwaze em jê biveciniqin, dixwaze em jê bitirsin. Pavlûs wisa dinivîsîne: “Çimkî Xwedê ne ruhê tirsonekiyê, lê belê Ruhê karîn, hezkirin û xwegirtinê daye me” (Tîmotêyos II, 1:7). Û Yûhenna wisa dibêje: “Di hezkirinê de tirs tune, lê hezkirina temam tirsê ji dil derdixe; çimkî di tirsê de cefa heye û yê ku ditirse di hezkirinê de bêkêmahî nebûye” (Yûhenna I, 4:18). Ev zilam di van ayetan de ne behsa tirsa Xweda dikin, behsa giyanê tirsonekiyê dikin. Ji ber ku nivîskarên Peymana Nû dibêjin: “bi tirs û lerizînê xilasiya xwe pêk bînin” (Filîpî 2:12). Û dîsa “Loma em şikir bikin ku em padîşahiyeke ku nayê vehejandin distînin û bi vî awayî em bi tirs û hurmetê biperizin Xwedê, wek ku li wî xweş tê. Çimkî Xwedayê me agirek e ku dixwe û tune dike” (Îbranî 12:28-29). Petrûs jî bi zimanekî pir eşkere tîne ziman: “Ji ber ku hatiye nivîsîn: Pîroz bin, çimkî ez pîroz im. Eger hûn ji yê ku cihêtiyê naxe nav mirovan û her kesî li gor kirina wî dîwan dike re, dibêjin Bav, dema xwe ya xerîbiyê ya li ser dinyayê bi tirsa Xwedê derbas bikin” (Petrûs I, 1:16-17). Gava em van hevokan dixwînin em teqez fêhm dikin ku tirsa pîroz; parçeyekî jiyanî ya Xirîstiyaniya Peymana Nû ye.

Gava hebûna Xweda hat, em bala xwe bidinê ku Mûsa ji gel re wisa got: “Bila tirsa Xweda li ser serê we be ji bo hûn gunehan nekin.” Tişta ku me ji gunehê vedikişîne ne hezkirina Xweda ye, tirsa Reb e. Pavlûs dibêje xelasiya xwe ne bi “hezkirin û dilovaniyê,” bi “hurmet û tirsê” çalak bikin. Di nameyeke din de li gorî ku em ê xwediyê wê soza ku wê Xweda di nav me de be, wisa nivîsandiye: “Îcar hezkirîno, madem ku em xwediyê van sozan in, em xwe ji her cûreyê murdariya ruh û bedenê paqij bikin û

bi tirsa Xwedê pîroziyê temam bikin” (Korîntî II, 7:1). Bala xwe bidinê ku negotiye “bi hezkirina Xweda.”

Ez ê tu carî ji bîr nekim gava ku min serdana xizmetkarekî naskirî yê dêrê kir ku ji ber xapandinê ketibû hepsê. Min ji wî ev pirsî: “Te kengî dev ji hezkirina Îsa berda?”

Li min nêrî û bêyî ku li tiştekî biawiqe got: “Min tu carî dev jê berneda.”

Bi matmayînê min pirsî: “Lê tu çawa ket nava gunehê xapandin û zînayê?”

Wisa bersin da: “John, di seranserê vê demê de min ji Xweda hez kir lê ez ji Xweda netirsiyam.” Û pişt re tiştekî ku bala min bikişîne got: “John, bi milyonan Amerîkayiyê weke min hene. Weke xelaskerekî bang Îsa dikin û ji Wî hez dikin lê weke Rebê Mezin jê natirsin.” Tam di wê xalê de di nava min de ronahiyek pê ket. Min ferq kir ku li gorî xeyal û têgihiştina xwe em dikarin îmaja “Îsa”yekî ne rast ku me li gorî xwe afirandiye hez bikin. Ji ber ku Nivîsên Pîroz dibêjin; tirsa Reb xala destpêkê ye ku mirov Xweda ji nêz ve nas bike (bnr. Metelokên Silêman 1:7; 2:5). Min fêhm kir ku ev zilam ji îmajeke belawela ya Îsa hez dike.

## XWEZÎ JI MIN BITIRSIYANA

Mûsa vê yekê bi awayekî zelal eşkere dike: Tişta me ji gunehê distirîne tirsa Reb e û guneh nahêle em nêzî Xweda bibin, me jê dûr dixe. Reb ji gelê xwe yê ku pê re peyam girê dabû, wisa got: “Ya ku hûn ji Xwedayê we veqetandin, Neheqiyên we ne. Gunehên we rûyê wî ji we veşart ku ew nebihîze” (Îşaya 59:2). Bala xwe bidinê ku dibêje; gunehên me ne tenê Ew ji me veqetandiye di heman demê de em jî ji Wî veqetandine. Ev hevok ne ji bo mirovên bêxweda, ji bo gelê xwediyê wan e dibêje. Yên ku ji Xweda dûr dikeve em in û di koka vê de kêmasiya tirsa pîroz heye.

Berevajî zilamê ku ji Xweda vediciniqe, tiştekî zilamê ku ji Xweda ditirse veşêre tuneye. Dizane ku jiyana wî li ber Xweda pirtûkeke vekiriye. Xwestekên Xweda di ser her tiştî re digire. Ji xwestekên heval, malbat û heta yên canê wî bi xwe jî girantir derdikeve. Ferq dike ku tiştek bi qasî îteata ji Xweda re wî têr nake. Xwe înkar dike, çarmîxa xwe li xwe dike û dide dû Îsa. Ji bo Xweda dijî.

Jiyana Mûsa wisa bû. Ji Xweda ditirsiya. Gelê Îsraîlê netirsiya. Xwestek, pêdivî û rehetiya xwe di ser xwesteka Xweda re girtin. Her çiqasî berevajî vê bi dehan caran gotin jî, di rastiyê de li Xweda bawer nebûn. Her dem û her kêlî di nava gumanê de bûn. Gotinên Wî, xwestek an jî fermanên Wî di ser her tiştî re negirtin û ji ber ku ji Wî netirsiyan, bi rastî ji Wî hez nekirin. Çima? Tu carî wehiyeke rast ji Wî negirtin. Ha ji ber vê di hebûna Wî de bi paş de vegeriyan. Pirsgirêkên wan yên ku wan ji ronahiya hebûna Wî veşêrin hebûn. Zanîbûn ku wê ev ronahî zorê li wan bike ku bi van pirsgirêkan dakevin û dîsa zanîbûn ku heta astekê wê zorê li wan bike ku wê xizmetê ji kê re bikin.

Gava Îsraîl bi paş de vedikişiya Mûsa nêz dibû. Aniha mecbûr bû ku ji Reb re bigota; ew gelê ku min bi zor û heft beleyan ji koletiyê rizgar kir û aniyê vê derê, niha naxwaze nêzî Te bibe. Mûsa ji ber vê yekê behetî bibû lê hayê Xweda zaten ji rewşê hebû û bi bersiva xwe hişt ku Mûsa şaş bimîne:

> “Min dengê gotinên vî gelî ji te re gotiye, bihîst. Her tiştê hat gotin rast e.” (Dubarekirina Şerîetê 5:28)

Min matmayîna rûyê Mûsa li ber çavên xwe dikarîbû xeyal bikim. Zanebûna ku Xweda dizanîbû bê ew çi dibêjin li hêlekê (Çi tiştekî balkêş e ku mirov ji bîr bike ku Xweda bi her tiştî dizane!), bihîstina ku gelê Îsraîlê di dawiya dawî de tiştekî rast gotiye, dibe ku ji bo Mûsa karekî pir ecêb be! Mûsa di dilê xwe de dibe ku

tiştekî nêzî vê gotibe: “Ji ber çi nêzî te nabin?”

Gava sedema ku gel nêzî Wî nabe tîne ziman, hûn dikarin êşa di nav dengê Xweda de bibîhîzin:

> “Xwezî dilekî wisa bi wan re hebûya ku ji min bitirsiyana û hergav hemû emrên min pêk bianiyana!” (Dubarekirina Şerîetê 5:29)

Xweda di bersiva xwe de du tişt pir zelal kirin. Ya yekem, eger tirsa pîroz tunebe, ne pêkan e ku mirov xwe nêzî Xweda bike û ya duyemîn jî delîla vê tirsê pêkanîna fermanên Wî ye. Îsraîliyan dizanibûn bê wê çawa ji derve de lihevhatî bin lê di dilê wan de tirsa Xweda tune bû.  Tirsa Xweda her dem di dilê me de dest pê dike û di îteata me de xwe dide der!

Reb pişt re di Peymana Kevin de yek ji wan hevokên herî trajîk dibêje. Vê peyamê bi rêya Mûsa digihîne gelê xwe:

> “Here ji wan re bêje: Bizivirin konên xwe.” (Dubarekirina Şerîetê 5:30)

Divê dilê Xweda çiqasî birîndar bûya û gava vegeriya dilê Mûsa çiqasî giran bû! Aniha jî dilê min giraniya vê hîs dike. Xweda ew ji ber sedemekê derxistin -ji bo bîne cem xwe- lê wan ev fersend bi avê de berdan (bnr. Derketin 19:4). Di karê mezin yê xelasiyê de armanca wî ya xwedayî ev bû. Lêbelê gava dema ku wî nas bikin hat bi paş de vekişiyan; di hebûna Wî de nesekinîn. Ji ber ku ji Wî netirsiyan. Wê li konên xwe vegerin û wê ji hebûn û dengê Wî dûr mabûna. Xweda li wan pêşniyaz kir ku nêzî Wî bin lê wan bi dilê xwe lê xwedî derneketin.

## DOSTANIYA BI REB RE

Ji aliyê din ve, piştî ku Xweda ji gel re got vegerin konên xwe îcar li gotinên ku ji Mûsa re gotin guhdar bikin:

> "Lê tu li vir li ba min bisekine. Ezê hemû emir, qanûn û rêbazên ku tê hînî wan bikî, ji te re bibêjim..." (Dubarekirina Şerîetê 5:31)

Hey looo! "Li vir bi min re bimîne û ez ê bi te re bipeyivim." Çi zewq e! Çi îmtiyazeke nedîtî! Mûsa hate vexwendin ku li cem Xweda bisekine û dilê Xweda bibihîze! Di tevahiya gerdûnê de ji vê çêtir tiştek tune! Ji bo wergirtina vexwendinê ji bo sekna li pêşberî yê ku evîn, hikmet, zanîn û hêza wî bêsînor e. Sekna li kêleka yê ku hemû ezman jê hez dike û bêriya wî dike. Ev vexwendin li Mûsa hat kirin!

Tirsa Xweda di dilê Mûsa de rûniştibû û ji ber vê dibe ku bi Wî re bibûya xwediyê parvekirineke nêz. Weke tespîta vê di van gotinên nivîskarê Zebûrê de em dibînin: "Wî riyên xwe bi Mûsa, Karên xwe bi kurên Îsraêlê da zanîn" (Zebûr 103:7). Mûsa gelek caran zanîbû bê wê Xweda çi bike ji ber ku Mûsa li cihê ku gel nêz nedibû sekinîbû, Reb pê re ya dilê xwe parve dikir.

Gelê Îsraîlê Xweda bi bersivên dida duayên wan re nas dikirin. Haya wan ji Motîvasyon, xwestek, rêbazên Wî an jî ji tiştên din yên di kûrahiya dilê Wî de cih digirtin, tunebû. Haya wan ji karên Wî hebû lê ji ber çi dikir tu carî pê nizanîbûn. Mûsa bi xêra tiştên li cihê veşartî dihat axaftin, Ew nas dikir. Yek ji wan ayetên ez herî pir jê hez dikim ev e:

> "Sira Xudan ji bo wan e ku ji wî ditirsin, Ew wan haydar dike ji peymana xwe." (Zebûr 25:14)

Bêyî ku em peywendê biguherînin em dikarin wisa bînin ziman: “Razên di dilê Reb de, bi wan kesên jê ditirsin re ye û wê rêya peymanê nîşanî wan bike.” Razên me hemûyan hene (hemû ne pîs in) lê em wan ne bi nasan re, bi dostên nêz re ango kesên em nêzî hev in û li wan bawer in, em parve dikin. Sedemeke vêya baş heye: Em dizanin ku wê tiştên baş yên di dilê me de bi armanca zerarê bide me an jî me sûîstîmal bike, wê tu carî bi kar neyînin. Em dizanin tiştên ku ji bo me bi qedir û qiymet in, wê bi baldarî guhê xwe bidin wan. Razên ku me bi wan re parve kirine, em dizanin ku wê bi awayekî nêyînî bi kar neyînin an jî wê belawela nekin. Ji ber ku ew bi dilê me dizanin û ji bo me tişta herî baş dixwazin.

Xweda ji vê ne cuda ye, razên xwe bi kesên ku ji zewqê hez dikin û bi ser berjewendiyên xwe de ne, parve nake. Razên xwe; bi kesên weke dostan li wan dinêre, ango kesên xwediyê dilê Wî û kesên jiyana xwe teslîmî Wî dikin re parve dike. Wergereke din ya vê ayetê, vê wisa rast derdixîne: “Sira Xudan ji bo wan e ku ji wî ditirsin, Ew wan haydar dike ji peymana xwe” (Zebûr 25:14).

## DOSTÊ XWEDA BRAHÎM

Di Peymana Kevin de zilamekî ku jê re dibêjin, dostê Xweda heye. Navê vî zilamî Brahîm e. Brahîm ji ber çi dostê Xweda bû? Bersiva vê pirsê di ceribandinên bi wan re rûbirû maye de veşartiye. Tam bîst û pênc salan li benda soza Xweda ma ku pêk were: Li benda jina xwe ya ku bi hemil nedibû ku jê re lawekî bîne, ma. Piştî salên ku wê zarok bi awayekî xwazayî çêbibe, gelek sal di ser re derbas kir jî, Xweda soza zarokekî da wan. Navê Îshaq ku tê wateya “dikene” li zarokê xwe kirin. Vî zilamê ciwan kêfxweşiyeke pir mezin li mala Brahîm û Sara zêde kir.

Hezkirina di navbera Brahîm û kurikê wî Îshaq de her

diçû mezin dibû û Xweda ev malbat ji nêz ve şopand. Dema ceribandinê hat û Xweda bang Brahîm kir: "Kurê xwe yê yekta Îshaqê jê hez dikî bibe herêma Moriyayê. Li wir, li serê çiyayekî ku ezê ji te re bêjim, bike qurbana şewitandinê" (Destpêk 22:2).

Hûn dikarin matmayîna Brahîm ya li hemberî vê xwestekê xeyal bikin? Ev kurikê ku soza wî jê re hatibû dayîn, kurikê ku bîst û pênc salan bi sebir li benda wî bû. Smaîl jixwe hatibû qewirandin, êdî wê tu kesî wî nemabûya! Pêwendiya hezkirina ya di navbera wan de evqasî bi hêz e îcar çima niha? Xweda ji bo çi evqasî sekinî? Çima gava hîn Îshaq pitik bû nexwest? Gelek pisporên Pirtûka Pîroz bawer dikin ku wê demê Îshaq sîh û sê salî ye.

Hûn dikarin wê şevê xeyal bikin? Dibe ku di giyanê Brahîm de şerek gur bibe. Xweda çawa tiştekî wisa jê dixwaze? Her tişt li gorî plana wî dimeşiya. Wê rojekê Îshaq bizewiciya û ji ziruyeta wî wê netewe û qiralên ku Xweda soza wan dabû, wê çêbibûna. Xweda ji ber çi evqasî zû canê wî xwest? Hûn dikarin pirsên li hemberî giyanê wî şer dikin, bibîhîzin: "Di serî de çima Îshaq da min? Madem wê ew ji min bistenda, çima da? Bi qasî min ji Îshaq hez dike? Çima li şûna wî canê min nastîne?"

Lêbelê di nava Brahîm de, tiştek di nava van pirs û ramanan de derket ser: Tirsa REB. Xweda peyivî û wê wî jê re îteat bikira. Pişt re em wisa dixwînin: "Serê sibê Brahîm rabû, kerê xwe kurtan kir, bi du xulam û Îshaqê kurê xwe re da rê. Wî ji bo qurbana şewitandinê êzing birîn û çû cihê ku Xwedê jê re gotibû" (Destpêk 22:3). Ez dixwazim bala we bidim ser gotinên sibehê zû. We qet bihîstiye ku yekî gotiye: "Di vê mijarê de bi mehan e ez û Xweda li ber hev didin lê hîn jî min gavek navêtiye?" Şîroveyeke wisa tîne ziman ku tirsa REB tuneye.

Tirsa Xweda ji nav gotinên Wî direele. Wateya vê, eger em sedem an jî fêdeya vê nebînin jî, xwedîderketina li gotina Wî ye. Em fêhm nekin jî ev tê wê wateyê ku em îteatê jê re bikin.

Gava êşê dide ev îteat e! Weke xizmetkarê mizgîniyê, carcaran ez difikirim ku zerara me digihê bedena Mesîh. Bi piranî tenê gava bi kêrî me tê em nêzîkayiya îteatê bi pêş dixin. Em hevokên wisa saz dikin: “Eger tu bidî, Xweda…” an jî “Eger tu duayan bikî, Xweda…” Hema bêje peyama “Ji bo stendinê were cem Îsa” tê dayîn. Ez bawer dikim ku ew me bi bereket dike? Teqez! Lêbelê motîvasyona me ya ji bo xizmeta Wî divê tu carî ne ji bo bereket û nîmetan be. Ne ji bo tiştên ku wê ji bo me bike, divê em zanibin bê Ew kî ye û li gorî wê em xizmetê bikin.

Îteata Brahîm wê kêlîkê bû û ji bo xwe bigihîne çiyayê ku Xweda nîşanî wî dabû, sê rojan rêwitî kir. Xweda çima cihekî nêzîktir nehilbijart? Çima sê rojan rêwitî kir? Ez bawer dikim Xweda hişt ku Brahîm li ser mijarê bifikire û heta ji bo vegerê wext jê re veqetand. Gava hûn nû dengê Xweda bibîhîzin û hûn tevbigerin ev tiştek e lê eger zeman derbas bibe? Piştî sê rojên ku we tiştek ji Wî nebîhîst, îcar ew mirovê herî girîng yê di jiyana we de ku we ew teslîmî wî çiyayê kiriye, gava hûn wî çiyayî ji dûr ve bibînin hûn ê çi bikin?

Dîsa jî Brahîm derket ser serê çiya, cihek ava kir, Îshaq girê da û kêr rakir hewa. Pişt re di cih de ferîşteya REB ji asîmanan bang Brahîm kir:

> “Dest nede kurik! Tiştekî pê neke. Niha ez dizanim tu ji Xwedê ditirsî. Te kurê xwe yê yekta jî ji min texsîr nekir.” (Destpêk 22:12)

Xweda çawa fêhm kir ku Brahîm ji Wî ditirse? Ji ber ku her çiqasî sedema wê fêhm nekir, êş dayê û ev tişt ne li gorî berjewendiyên wî bû jî, ji Xweda re îteat kir. Xweda dît ku Brahîm xwestekên Wî di ser her tiştî re girtine. Wê demê Xweda fêhm kir: “Ha vaye zilamekî ku ez xwe tê de bidim xuyakirin û bi wî re ya dilê xwe parve bikim.”

## ALIYEKÎ XWEDA YÊ DERKETIYE DERVE

Piştî vê di cih de, gava Brahîm serê xwe rakir dît ku wa ye beranekî ku sturehên wî di nav deviyan de aliqiye û ji dilê wî qêrînek derket: “YAHVE YİRE!” (Tê wateya REB dikare bike). Kesê pêşî yê ku Xweda weke “Yahve Yire” nas kir ew bû. Xweda, li hemberî hurmet û îteata Brahîm ev aliyê xwe yê ku berî niha tu kesî pê nizanîbû, jê re eşkere kir.

Hûn dikarin min weke “Nivîskar John Bevere” nas bikin. Hin ji we dikarin min weke “Axivêr John Bevere” nas bikin. Lê keseke bi navê Lisa min weke “Mêrê xwe John” nas dike. Ew bi qasî ku xanima min e di heman demê de dosta min e jî û bi wê re razên xwe yên ku tu kes nizane parve dikim. Kurikên min yên ku min weke “Bavo John” nas dikin, hene. Bi wan re tenê weke bavekî ku dikare bi kurikên xwe re têkiliyê deyne, ez tevdigerim. Di jiyana we de jî mirovên wisa hene. Xweda jî ji van ne cuda ye.

Xweda tiştên ku tu kesî pê nizanîbû bi Brahîm re parve kir. Heta REB, karên ku difikirî bike bi Brahîm re parve kir û hişt ku fikrên xwe jê re bîne ziman. Bi hev re nîqaş kirin. Sodom û Gomora meseleyeke wisa bû. Xweda wisa got: “Ma tiştê ku ezê bikim, ezê ji Brahîm veşêrim?” (Destpêk 18:17). REB ji bo ku vê meseleyê nîqaş bike nêzî Brahîm bû û qedir da fikrên wî û lê guhdar kir. Bi vî awayî eger li Sodomê deh kesên rast bihata pêdekirin, wê ew tofan nehata serê wê. Lêbelê deh kesên rast jî nehatin pêdekirin!

## BÊYÎ PILANA XWEDA

Ji aliyê din ve Brahîmê ku di Pirtûka Pîroz de weke “zilamê rast” (bnr. Petrûs 2:7) tê bi navkirin, îcar xwarziyê wî Lût jê pir cuda ye. Lût ji dinyayê hez dikir û ji Xweda neditirsiya. Çîroka wî bi temamî cuda ye. Bi Brahîm re meşiya lê gava ku di ber giyan

re cih da kesayetiya xwe, tu bikî nekî wê nelihvekirinek derkeve. Brahîm guh nade tiştên ku ev dinya li ber mirov radixîne, ew bêtir bi sozên Xweda ve girêdayiye ku ji ber vê jî mafê hilbijartinê dide Lût. Wê Brahîm rahiştaya yê mayî lê tişta ku hîn herduyan jî nizanîbû, wê di dawiya dawî de bibûya cihê herî bi tov, ji ber ku wê bibûya welatê ku şîr û hingiv lê diherike.

Em wisa dixwînin: "Lût serê xwe bilind kir û dît ku tevahiya Deşta Şerîayê heta Soarê avî ye, wekî Bexçeyê Xudan û welatê Misrê ye" (Destpêk 13:10). Di wê heyamê de erdên herî bi ber û baldar bûn. Çima Lût li derdora xwe nêrî? Zanîbû ku bajarên Sodom û Gomorayê bi pîsiyê tije ye. Sedema ku li derdora xwe nêrî, bêguman ji bo di bandora wan de nemîne û kêfa hebûna xwe derxînin ku ev yek bi lêgerîna li rêyeke din ve têkildar bû. Ji bedêla ku li bajêr bi cih bibe, biryar da ku konê xwe li deşta Sodomê deyne. Bi vî awayî dikare mesafeyeke diyar têxe navbera xwe û naveda pîsiyê lê dîsa jî dikarîbû ji hebûna herêmê sûd bigire. Em wisa dixwînin: "Lût li bajarên deştê rûnişt û bi aliyê Sodomê ve kon vedan" (Destpêk 13:12). Lêbelê hûn dûrbûna ji gunehê çiqasî bi pilan bikin jî bikin eger hûn ji Xweda netirsin, di dawiya dawî de hûn ê ber bi wê ve herin. Ev rewş ji bo Lût jî derbasdar bû, li konekî ku li deştê danîbû dest pê kir lê piştî şeş beşan li navenda Sodomê maleke wî hebû (bnr. Destpêk 19:2).

Sodom bajarekî dewlemend û xweş bû. Haya wan jê tunebû ku çend saetên wan mane ji ser rûyê erdê rabin û helaq bibin. Divê ev me matmayî nehêle. Lêbelê tişta tirsnak ew bû ku haya Lût jî jê tunebû. Xweda ji bo wî agahdar bike qasidên xwe ango ferîşteyên xwe şandin. Lût, weke gunehkarên Sodomê hîn gava haya wî ji tu tiştî tunebû, Brahîmê ku ji Xweda ditirsiya hîn berî ku tiştek biqewime, haya wî ji niyeta Xweda çêbû. Brahîm dostê Xweda ye ji ber ku ji Wî tirsiya!

## RASTÎ ÎSA YE?

Gava ku em jiyana Mûsa û Brahîm di ronahiya tirsa REB de lê dikolin em pênaseya xwe bêtir berfireh dikin. Tirsa REB, di nav xwe de hezkirina tiştên ku Xweda jê hez dike û tiştên ku nefretê ji wan dike, di xwe de dihewîne. Tiştên ku ji wî re girîng in, ji me re jî girîng dibin û tiştên ku ji wî re ne girîng in, ji me re jî ne girîng dibin. Em tiştên ku ew weke tiştên berî her tiştî dibîne û daxwazên Wî hembêz dikin. Tirsa REB; di daxwaz û viyana Wî de ku mirov jê re îteatê bike, diyar dibe.

Li gorî Nivîsên Pîroz, her ku tirsa REB li ser mirov be Xweda nêzî me dibe. Carekê eger mirov pê re hevdîtineke nêz ava bike, wê demê hezkirina me ya li hemberî Wî tîr dibe. Em ji Xwedayê zindî û rast hez dikin, ne ji îdraqa Wî. Gava ku tirseke REB ya kûr û mayînde tunebe, wê demê bêyî ku em bi rastî Wî ji nêz ve nas bikin, em dibêjin em jê hez dikin. Em derbarê Wî de bi tiştan dizanin lê em Wî nas nakin. Ji ber vê hezkirina me li şûna Îsayê rastîn yê ku li tenişta rastê ya Bav rûniştiye, ber bi îmajeke "Îsa" ya ku me di xeyalê xwe de avakiriye, diçe.

Ev rewş mirov dikare bişibîne heyraniya li hemberî lîstikvanên fîlman an jî ya li hemberî sporvanan. Ev heyraniyên van; ji îmaja ku medyayê derbarê van kesên binavûdeng de bi rêya roportaj û gotaran avakirine, hez dikin. Navên wan li malên Amarîkayiyan pir derbas dibe. Ez bûm şahidê ku hinek heyranên van kesên binavûdeng, weke ku hevalên wan yên nêz in dipeyivîn. Tu dibêjî qey endamên malbata wan in, min dît ku bertekên hestiyarî dan meseleyên şexsî yên van kesên binavûdeng. Lê eger rû bi rû ev kesên binavûdeng nas bikirina, wê kifş bikirina ku şexsiyeta rast ya kesekî ji îmaja ku derdixînin pêş pir cuda ye. Têkiliya kesên binavûdeng û heyraniyên wan, têkiliyeke aliyekî tenê ye. Eger bihatana cem hev, wê bidîtana ku hindik aliyên wan dişibe hev,

heta wê mijarek jî nedîtibûna ku li ser wê bipeyivin ji ber ku di rastiyê de hevdu nas nakin.

Min ev dînamîk li dêrê jî dît. Gelek kes gava derbarê Reb de dipeyivin, tu dibêjî qey pir nêzî wan e û dipeyivin. Lêbelê gava hûn li sohbetên wan guhdar dikin, hûn hîn dibin ku Reb nas nakin tenê derbarê kesekî ku agahaiya wan li ser heye dipeyivin. Bi Gotina Wî dizanin lê bi dengê Wî nizanin. Bi karên Wî dizanin lê bi rê û rêbazên Wî nizanin. Dizanin bê çi dibêje lê aniha nizanin bê dixwaze çi bibêje.

Par mînakeke vê rewşê yeka pir ecêb çêbû. Bi malbatî em li Hawaii'yê li tatîlê bûn. Ji ber ferqa saetê ez sibehê zû şiyar bûm. Wê sibehê gava min li beravê dua dikirin, zilamek hat cem min û dest bi peyvê kir. Ji ber ku hatibû giravê pir bi kelecan bû û ji devê wî ev gotin derketin: "Keçikên li vir weke fistiqa ne. Pir hevalên jidil in û ne fedyokî ne." Berî bi çendakî çûye pertiyekê û derbarê mijarên din de axaftina xwe domand, di seranserê axaftina wî de gelek caran serî li sixêfan da.

Ji min pirsî gelo ez çi karî dikim û min jî jê re got. Gava min got ez xizmetkarê dêrêkê me, bi kelecan bû û derbarê Reb de dest bi peyvê kir. Got ku dêra wan ji bo wan çalakiyeke ji bo kesên biskilêtan diajonin kiriye ku ew jî tevlî bûye û pişt re behsa pastorê xwe kir. Parve kir bê çawa ji Îsa bawer dike û belavokeke ku li cem wî bû da min. Pişt re behsa jin û zarokên xwe yên ku aniha li otelê razana kir (fikrên min di cih de çûn ser keçikên giravê bê ew çiqasî bi kelecan kirine). Dilê min tengijî ji ber ku vî camêrî bi awayekî zelal dianî ziman û bawer dikir ku Reb nas dike lê jiyana wî ji me re tiştekî din digot. Ha ji ber vê Îsa ji me re dibêje ku em ê bawermendan ne ji peyv an jî xizmetên wan; em ê wan ji fêkiyê wan an jî ji tarza wan ya jiyanê nas bikin (bnr. Metta 7:20-23).

Ev tenê yek ji wan mînakan e ku ez dikarim bidim. Ez bawer

im hûn jî bi mînakên wisa re rast hatine. Di nava evqas rewşan de kesên ku tînin ziman ku Xirîstiyan in, zanebûna wan ya derbarê Xweda de; dişibe ya wan kesên heyranê wan kesên binavûdeng in. Ji bo rewşeke wisa ez bi rastî û ji dil aciz dibim. Kesên wisa xelasiyê dixwazin lêbelê ji dinyayê hez dikin û zewqên xwe, bernameyên xwe û rojeva xwe di ser xwestekên Xweda re digirin.

Ji aliyê din ve kesên ku bi rastî xelas bûne lê eynî weke Lût bi ya dilê xwe dikin û kesên ku xwe li meseleyên dinyayê pêçane hene. Dixwazin xizmetê ji Xweda re bikin lê bi birçîbûna xwe ve hatine girêdan. Piştî Xweda li ber karê wî rabûne û nehiştine ku çarmîx jiyana wan ya ezîtiyê bikuje. Ji bo xwestek û desthilatdariya Wî bi pêş bikeve, bi arezûyê armanc nakin. Her çiqasî xelas bûne jî ji nêzîkayiya bi Wî re mahrûm in. Hîn li bexçeyê derve dijîn û bi perdeya ezîtiya xwe hatine sînorkirin û nêzî rêya zindî û nû nabin. Nêzî hebûna Wî ne lê dîsa jî dûr in.

Yên ku li bexçeyê derve dijîn, tênegihîştine bê Xweda ji ber çi ew ji ber mineta dinyayê xelas kirine. Negîhane ser banga ku ji nêz ve Xweda wan nas bike. Hez dikin ku derbarê peyamên hezkirin, bereket, parastin, avakirin û hebûna Xweda de biaxivin. Û ev hemû rast in lê xwe ji tiştên derbarê meseleyên dil de dûr digirin û jê direvin. Di ber çemên zindî yê ku di dilê wan de diherike re diçin û her diçe tiştên ku wan qanex nekin hildibijêrin.

Divê em diyar bikin ku Xweda dizwaze bi me re têkiliyeke nêz deyne, û divê em ragihînin ku Ew pîroz e û ne karê henekan e ku em bi çavekî cidî lê nenêrin. Ji bo me bîne cem xwe, li gorî ku bedeleke mezin daye îcar em çawa dikarin bi vê dinyayê re dost bibînin? Yaqûb berî teşwîqa nêzîkayiya li Xweda me hişyar dike: “Ma hûn nizanin ku dostaniya bi dinyayê re, dijminahiya bi Xwedê re ye?” (Aqûb 4:4). Dibêje eger gava em didin dû zewqên dinyayê wê demê em xwe dikin dijminê Xweda! Ji bîr nekin li vir bangî bawermendan dike. Pavlûs gotinên teqez bi kar tîne: “Çimkî

kerema Xwedê ya ku ji hemû mirovan re xilasiyê tîne, xuya bû û me perwerde dike ku em nepakiyê û xwestekên dinyayê red bikin û rast, sergiran û bi tirsa Xwedê li vê dinyayê bijîn û li benda hêviya pîroz û xuyabûna rûmeta Xwedayê mezin û Xilaskarê xwe Îsa Mesîh bimînin" (Tîtos 2:11-13). Sedema ku careke din, Pavlûs xelasiya me bi hurmet û tirsê ava dike û vê ji me re dibêje ev e.

## DOSTÊN ÎSA

Gelek caran, her kesê ku Îsa dipejirîne em peyamên ku êdî bûye dostê Wî parve dikin, dibînin. Ez hêvî dikim ku êdî wê fêhm kiribe ku Xweda ne hevalekî erzan û ji rêzê ye. Carekê gava ez li ser duayê bûm wisa qêriya: "Ka ji gelê min bipirse, ew dixwazin gava ku ji min re sadiq bin ez jî ji wan re sadiq bim gelo?" Îsa ne ji bo ku her kes tevlî "koma kesên ku ji nû ve çêdibin" bibe weke xelasker hatiye dinyayê. Na. Îsa dixwaze bi hezkirinên ku weke Wî ji Xweda hez dikin re di nava têkiliyê de be. Di vir de em dostaniya wî dibînin. Ev rewş bi gotinên Wî re piştrast dibe:

> "Eger hûn tiştên ku min li we emir kirin bînin cih, hûn dostên min in." (Yûhenna 15:14)

Ji bo em bi Îsa re bibin dost şert û merc hene. Negot: "Eger hûn bawer bikin ku ez Mesîh im, wê demê hûn ê hemû bibin dostên min." Li şûna vê got: "Eger tiştên ku ez li we ferman dikim hûn bikin, wê demê hûn ê bibin dostên min." Di vê beşê de em peyivîn ku hêza "bicihanîna fermanên Wî" di tirsa REB de cih digire.

Îsa ev gotin piştî ku Yahûda îxanet bi Wî re kir û jê veqetiya, got. Eger em li ayeta piştî vê berdewam bikin, em ê bibînin ku Îsa bangî bi deh hezaran kiriye: "Êdî ez ji we re nabêjim xulam" (Yûhenna 15:15). Peyva "êdî" tê wateya ku demekê ew weke

xulamê Xweda didîtin lê aniha asteke nû heye. Piştî vê hevokê em berdewam bikin:

> "Êdî ez ji we re nabêjim xulam; çimkî xulam nizane ku axayê wî çi dike. Ez ji we re dibêjim dostên min›; çimkî her tiştên ku min ji Bavê xwe bihîstin, min bi we dan zanîn." (Yûhenna 15:15)

Bala xwe bidin dostên Efendî ku dizanin bê Ew çi dike. Bi rê û rêbazên Wî dizanin! Çima ne di serê têkiliyê de lê aniha weke dost tên binavkirin? Bersiva vê di nav mûcîzeyan de û di nav karên baş de ku bi Îsa re kêfa wan tê û ji bilî vê di ceribandin û demên zor de, dane dû Wî û sadiqî û îteata Wî îspat kirine. Sadiqbûna wan bi îteata wan re îspat bû.

Gotina kir ji bo hemû kesên ku bang navê Wî kirin derbasdar e: "Eger hûn fermanên min bi cih bînin, hûn ê bibin dostên min." Bala xwe bidinê ku ev yek pir zelal kiriye: Dostanî ji kesên ku ji Wî re îtaetê dikin re veqetandiye. Di Zebûrê de jî em vê dibînin: "REB bi kesên jê ditirse re razên xwe parve dike."

Xweda çima dostaniya xwe vedişêre? Ez bawer dikim ku vê ya ji bo me ji talûkeyên quretiyê biparêze dike. Em kurikên Harûn û gotina ku ji bavê wan Harûn re kir bînin bîra xwe: "Kesên ji min re xizmetê bikin, wê ji pîrozbûna min re hurmetê bigire."

Ev bûyer di Peymana Nû de, zilamek û jina xwe bi awayekî quretî nêzî huzûra Xweda bûn û bi vî awayî dubare bû. Di huzûra Wî de mirin (bnr. Karên Şandiyan 5:1-11). Gava ku bawermendan fêhm kir ku bêhurmetiya li hemberî Xweda sûcekî pir cîdî ye, wê demê "tirseke mezin" xwe li nav koma bawermendan xist. Careke din diyar bû ku "di civata pîroziyan de Xweda tirsê ava dike, ji hemû derdora xwe berz û bala ye û bêhempa ye."

Par min razeke bêhempa kifş kir. Gava ez diketim nav dema

xwe ya duayan, ez ji peyvan reviyam û ez tenê li ser heybet û mezinbûna bêhempa ya Bavê xwe kûr û dûr fikirîm. Ez li bêhempabûna Îsa û ji bo bibim aîdê Wî, li şerê ku li ser navê min qezenc kir fikirîm. Ez li giyanê wî yê bi bandor û bê çawa biryar daye bi min re bijî, fikirîm. Ev hemû çawa aqil di wan de nagere!

Gava min ev kir, hîn berî ku peyvek ji devê min derkeve, min kifş kir ku hebûna Xweda bi min re hevdîtinê dike. Ji ber ku ez şaş mam ku tevlîbûna hebûna Wî evqasî hêsan e, îcar min ji Giyanê Pîroz pirsî. Ji dilê min re wisa got: “Kurikê min gava Îsa xwendekarên xwe hînî duakirinê kirin, çi ji wan re got?” Min duaya Reb ji ber got: “Bavê me yê li asîmanan bila navê Te pîroz bike.” Ez sar sekinîn û bi kêfxweşî min kir hawar: “Ha wisa, ha wisa!” Ha waye li wir e, hîn di serî de divê pîroz bihata hesibandin: “Bila navê te pîroz be.” Divê em bi hurmetî tevlî hebûna Wî ya pîroz bibin! Min ev dua bêyî ku ez ferq bikim bê Îsa çi gotiye, bi salan min ji ber gotibû!

## MIFTEYA XEZÎNEYÊN JIYANÊ

Tirsa ji REB, mifteya nêzîkayiya li Xweda ye û bingeha jiyanê ye. Yeşeya wisa dibêje:

> “Xudan berz e, Çimkî li jor rûdine. Siyonê bi heqî û edaletê tije dike. Ew ewlehiya serdemên te ye, Rizgarî, şehrezayî û zanîn wê zêde bibe. Tirsa Xudan xezîneya gel e.” (Îşaya 33:5-6)

Tirsa pîroz; kilîta xezîneya xelasî, zanîn û zanyariyê vedike. Çima? Ji ber ku bingeha nêzîkayiya li Xweda ye û di nava wê nêzîkayiyê de xezîneyên Wî derdikevin holê. Li tenişta hezkirina Xweda, tirsa REB bingeha jiyanê ava dike. Pêşî beyî ku em ji Wî bitirsin, divê em jidil ji Xweda hez bikin û jê zewqê bistînin.

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Bi peyvên xwe hûn çawa dikarin ferqa di navbera tirsa ji Xweda û veciniqandina ji Xweda pênase bikin?

2. Di vê beşê de "dostê Xweda" Brahîm û xwarziyê wî Lût ku weke "zilamê rast" tê binavkirin, tên berhevdan. Gava ku Lût erdên bi ber yên li teniŞta bajarên bi navûdeng Sodom û Gomorayê dima û li wan dikola, bêyî ku di bandora wan de bimîne li rêyekê digeriya ku ji hebûna wan sûd bigire. Hûn jî bi heman awayî meyildar in ku aqil tê de bigerînin? Tirsa REB wê rê çawa li ber nêzîkayiyeke wisa bi xetere, bigire?

3. Gava ku hûn li sohbeta ku nivîskar li Hawaii'yê bi wî zilamî re kir, difikirin; hevdîtinên we jî yên weke vê çênebûne gelo? Bi kesên wisa re hûn çawa tevgeriyan? Weke vê ne di asteke pirole de be jî, weke zilamê li beravê; axaftinên we an jî tevgerên we, wê kêliyê bi rastî dilê we bi rêyeke din de neçû gelo? Hûn çi hîn bûn ji wan rewşan an jî hûn hîn jî hîn dibin gelo?

4. Nivîskar li ber ronahiya Zebûra 25:14an ("REB raza xwe bi kesên ku jê ditirsin re parve dike.") Xweda dibêje ku ji bo me ji talûkeyên quretiyê biparêze, dostaniya xwe veşartî dihêle. "Talûkeyên quretiyê" çi ne?

BEŞ 7

# ÇI RÊ LI BER NÊZÎKAYIYA HEQÎQÎ DIGIRE?

"Kesên hatine xapandin pesnê xwe didin ku derbarê Xwedayekî ku nas nakin de, xwedî agahî ne."

Tirsa REB, bingeha nêzîkayiya li Xweda ye. Ev rastî di serê pirtûka Şîretên Silêman de bi awayekî zelal hatiye ragihandin. Em wisa dixwînin: "Tirsa Xudan destpêka zanînê ye" (Şîretên Silêman 1:7). Agahiyeke çawa? Nivîskar piştî çend ayetan daxuyaniya vê dike:

> "Lawo, heger tu gotinên min qebûl bikî, Emrên min di dilê xwe de hilînî, Heger tu guhdariya şehrezayiyê bikî Û dilê xwe ber bi fêmdariyê ve meyildar bikî, Heger tu gazî têgihîştinê bikî Û dengê xwe ji bo fêmdariyê bilind bikî, Heger wekî zîv li wê bigerî Û wekî xezîneyê li pey

> wê bikevî, Wî çaxî tê tirsa Xudan fêm bikî *Û zanîna Xwedê peyda bikî."* (Şîretên Silêman 2:1-5, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Peyva Îbranî ya di ayeta dawî de ku weke "nasînê" hatiye wergerandin, di Ferhenga Zimanên Pirtûka Pîroz de tê wateya "agahiya şexsî ya ku bi kesekî re di nava îmayeke bi hêz de ye." Ferhenga Şîrovekirinê ya Vineyê dibêje ev peyv tê wateya "xwedîbûna agahiyeke tecrubeyî ya nêzî Xweda." Pişt re wisa berdewam dike: "Nasîna erênî ya Xweda, bi tirsa Wî re hevseng e."

Di ayetên berê de tirsa REB, hûn dikarin bibînin ku qedir û qiymet dayîna fermanên Wî ye. Qedirdayîna fermanên Wî, şert çi bin bila be ji bo amade be ku îteatê bike, divê guhê xwe bidin gotina Wî. Kesên ku ne xwedî vê tirsa pîroz bin, berevajî vê nêzîkayiyê li benda wan e. Ji ber ku Yaqûb dibêje eger em bi xwesteka Wî zanibin û jê re îteatê nekin wê demê "em ê xwe bixapînin" (Aqûp 1:22). Xapandin tiştekî pir zor û zehmet e ji ber ku kesê hatiye xapandin di rastiyê de ne wisa be jî, bawer dike ku rast e. Kesên hatine xapandin, derbarê Xwedayekî ku nas nakin de, xwe dixapînin ku xwedî agahî ne.

## ÎMAJEKE BELAWELA YA REB

Bêyî tirsa REB em nikarin Xweda bi rastî nas bikin. Di nava me de an jî di xeyala me de wê îmajeke xelet bi pêş bikeve û wê bi şikil bibe. Her çiqasî em bibêjin ku têkiliya me bi Wî re heye û em Wî bi zimanê xwe bi rûmet bikin jî, dilê me ne nêzî dilê Wî ye û jiyana me û xwestekên Wî li hev nakin. Ev rewş di Îsraîliyan de diyar bû.

Weke di beşên berê de hat diyarkirin, Mûsa ji bo Îsrîliyan bi Xweda re bide naskirin ew anîn Çiyayê Sînayê lêbelê "Wî çaxî gel dûr sekinî lê Mûsa xwe nêzîkî wê dera tarî kir ku Xwedê lê bû" (Derketin 20:21). Nêzîkayiya wan ya li heybeta sekinî, çawa tiştekî

dilêş e. Kî dizane bê wê çi bibe? Fersenda wan hebû ku Xweda bi dengê Wî xwe guhdar bikin! Lêbelê weke ku dihat nîqaşkirin, xwe li ber hebûna Wî negirtin ji ber ku di dilê wan de tirsa Xweda tunebû û ji ber vê li gorî fermanên Wî neçûn (Dubarekirina Şerîetê).

Xweda, bi alîkariya şikestina xeyalan re di navbera xwe û gel de nevbeynekê ava dike. Bang Mûsa dike: "Rabe berjêr be û Harûn bîne" (Derketin 19:24). Xweda, ji bo navbeyna Harûn û Mûsa çêbibe bang wan kir. Wê gotinên Xweda ji gel re û yên gel ji Xweda re ragihandina. Bi qasî nêzîkayiya orîjînal ya ku hatiya şayesandin, nêrîneke cuda ye.

Lêbelê her gava em pirtûka Derketinê (ji Misrê) dixwînin, em dibînin ku Mûsa li çiya ye û Harûn jî li artêşgehê ye. Li gorî tê dîtin derket serê çiyê lê di dawiyê de vegeriya nav gel. Çima? Di nav gel de ji ber ku di hebûna Xweda de bû, xwe rehet hîs kir. Tirsa REB kêm bû. Harûn ji Xweda bêtir ji mirovan tirsiya û ji ber vê ji wan re xizmet kir. Di dawiya dawî de tiştên ku mirovan dixwest wê bidaya wan û weke em dibînin dayîna vê wê pir neajotaya. Mûsa hema bêje ev bû çil roj ku li ser serê çiya ye û em wisa dixwînin:

> "Gava gel dît ku Mûsa ji daketina çiyê bi derengî ket, ew li ba Harûn civiyan û jê re gotin: Rabe, îlahekî çêke ku li pêşiya me be. Çimkî em nizanin çi hat serê zilamê ku em ji welatê Misrê deranîn." (Derketin 32:1)

Hin aliyên Harûn hebûn ku ev işaretên rêberekî bûn û ev jê re weke xelatê bûn. Û yek ji van ew bû ku mirov weke miqnatisê ber bi xwe ve dikişandin. Rêberê bi xelat, bi Xweda re bûya jî ne pê re bûya jî wê kesên din ber bi xwe ve bikişandina. Ev rewş tîne ziman ku xwestekên Xweda nehatine rûmetkirin û bi hezaran kesên li dêran ji hebûna Xweda bê par in. Gelek caran rêberên

ji tirsa Xweda bêpar in, xelata xwe ya dayîna Xweda; ne ji bo xwestekên REB ji bo xwestekên mirovan bi cih bînin, bi kar tînin.

Gel rê li ber Harûn xist: "Rabe ser xwe û xwedayekî ku rêbertiyê ji me re bike, çêbike. Em nizanin bê çi hat serê zilamê em ji Misrê derxistin, em nizanin çi bi Mûsa hat!" Bala xwe bidinê ku nabêje: "Çi bi Xweda hat em nizanin!" Xweda înkar nakin lê Mûsa bi tiştekî nahesibînin.

## ÎLAH E AN XWEDA YE?

Xebatên min derbarê metnên orîjînal de kirine, min meraq kir gelo wergêr li vir vê tişta bi rastî tê gotin li paş dihêlin an na. Di wergerê de peyva "îlah" tê bikaranîn. Lêbelê peyva "îlah"ê bi Îbranikî "elohim" e. Ev peyv di Peymana Kevin de 2606 caran derbas bûye. Di nav van peyvan de bi awayekî giştî 2350 (ji sedî not zêdetir) heb jê ew Xwedayê Desthilatdarê Her Tiştî ku em Wî dihebînin tîne ziman. Tenê di pirtûka Destpêkê de 32 caran derbas dibe û her carê qesta wê REB e. Weke mînak di ayeta pêşî ya Pirtûka Pîroz de em wisa dixwînin: "Di destpêkê de Xwedê (elohim) erd û ezman afirandin" (Destpêk 1:1). Di vê ayetê de "elohim" weke "Xweda" tê wergerandin.

Ev peyv di Peymana Kevin de hema bêje 250 carî ji bo xwedayekî sixte bîne ziman hatiye bikaranîn. Ji ber vê ji bo em wateya rast jê veqetînin, divê em vê peyvê her dem li gorî peywendê bixwînin.

Harûn wisa bersiv da gel: "Guharên zêrîn ên ku di guhê jinên we, lawên we û keçên we de ne derxin û wan ji min re bînin" (Derketin 32:2). Gava gel ev kir: "Harûn zêr ji wan standin, bi amûra qewirandinê şikil dayê û jê golikekî rijandî çêkir" (Derketin 32:4).

Piştî ku bi amûrê xwe şiklê golikekî da zêr, gel got: "Ya gelê Îsraîl, îlahê te yê ku tu ji welatê Misrê deranî ev e" (Derketin 32:4).

Peyva ku ji bo Xweda bi kar tînin dîsa “elohim” e. Gel ev digot: “Waa gelê Îsraîlê yê ku hûn ji Misre derxistin “elohim”ê we ev e!” Hûn dibînin bê çi diqewime? Ji bo em piştrast bin bê ev gel dixwaze çi bibêje em xwendina xwe berdewam bikin.

> “Çaxê Harûn ev dît, wî li pêş golikê gorîgehek çêkir, gazî kir û got: Sibê ji bo *Xudan* cejn e.” (Derketin 32:5, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Di vê ayetê de peyva ku weke REB hatiye wergerandin “Yahve” an jî “Yehova” ye. “Yahve” di Pirtûka Pîroz de peyva herî pîroz e. Tekane navê Xwedayê rast e. Di Peymana Kevin de tu carî ji bo îlahekî sixte pênase bike an jî ji bo binavkirina wî nayê bikaranîn. Ev peyv ewqasî pîroz e ku alimên olî yên Îbranî saw bi wan re çêdibû ji bo vê peyvê bi temamî binivîsînin. Herfin bideng derdixistin û YHWH dinivîsandin. Alimên olî yên Yahûdî ev îfade weke tetragrammatona* pîroz ya ku tê wateya çar herfên nayê gotin, bi nav kirine. Ev, navekî pîroz bû ku ji ber quretiya gelê Îsraîlê hatibû parastin û tu carî bi ziman nedikirin.

Ji ber vê Harûn û Îsraîliyan ji zêr golikek çêkirin û ew nîşan dan û gotin: “Ha vaye, Yahveyê em ji Misrê derxistin, Xwedayê rastî û tenê!” Weke mînak wisa negotin: “Ha vaye hingivê em ji Misrê derxistin.” Xelasiya xwe bi îlahekî sixte ve girê nedan. Ev golik bi navê REB bi nav kirin.

## PIŞTÎ HEBANDINÊ KÊFXWEŞÎ HAT

Xweda bi awayekî eşkere înkar nedikirin lêbelê mezinahiya dadixistin asta vê golika ku ew bi şikil û şemal dikirin. Di agahiyên derbarê Wî de şaş bibûn. Hîn jî Yahve weke xelaskerê ku ew

---

* Di eslê xwe de îfadeyeke ji çar herfan pêk tê û Îsraîlî ji bo Xwedayê xwe bi kar tînin.

ji Misrê xelaskirin dipejirandin. Hêza Wî ya ku şîfa dida înkar nekirin, weke şexs îmaja wî guhertin! Gava em berdewam dikin em vê kifş dikin:

> "Dotira rojê ew zû rabûn, qurbanên şewitandinê pêşkêş kirin û pêşkêşiyên aştiyê anîn. Gel rûnişt, xwar û vexwar. Paşê rabû da lotikan û bi hev lîstin." (Derketin 32:6)

Bala xwe bidinê ku tiştên pêşkêş bikin anîne. Ji ber çi ev tişt pêşkêş kirin? Ji bo REBê ku digotin em wî dihebînin ango ji bo Yahve bi rûmet bikin! Piştî ku pêşkêşkirinên xwe kirin an jî piştî hebandinê, rabûn ser xwe û ketin nava kêfxweşiyê.

Ev rewş di roja me de dibe ku bibe? Bi alîkariya Xweda her çiqasî ji dinyayê hatibin rizgarkirin jî, ji ber ku ji tirsa pîroz mahrûm in, kesên ku Îsayê di xeyala xwe de avakiriye û bangê dike heye gelo? Di seranserê vê pêvajoyê de xwe bi serpêhatiyên xwe yên nû digirin û dibêjin ew ne Reb e. Diçin dêrê, îlahiyên xelasî û azadiyê dibêjin û li waazan guhdar dikin, pêşkêşan dikin lê pişt re diçin ji bo firotinê bikin, derewan dikin û mirovan dixapînin. Û dibêjin Xweda çawa bereketê dixe nav karê me. Belkî derbarê pastor û yên din de paşgotinan dikin û ji bo xwe mafdar derxînin dibêjin: "Lê rastî ev e û kesên din bi vê dizanin." Fuhûşê an jî karekî din yê nebaş dikin û pişt re her çiqasî ji aliyê Îsa ve hatibin xelaskirin jî, dibêjin em hîn di bedenekê de dijîn û pêdiviya me pê heye û bi vî awayî ji xwe re mahneyan pêde dikin! Vê lîsteyê hûn dikarin hîn jî dirêjtir bikin.

Îsa nas dikin gelo? Tu ji wan bipirse wê bi awayekî ji xwe bawer bêjin: "Erê!" Hatine xapandin gelo? Aniha gelo Kesê li cihekî berz û bal yê aliyê rastê yê Xweda rûniştiye nas dikin an di xeyalên xwe de ew Îsayê ku wê her tiştî bide wan ava kirine? Ji van hemûyan girîngtir: Em xwe di yekê ji van de dibînin an na?

Gava ku mirov ji REB netirsiyan, hûn ê kifş bikin ku dikarin bang navê Wî bikin lê hûn ê bibînin ku ber bi birçîbûna ezêtiyê ve diçin û ramana ku pişta xwe dide ezêtiyê dijminê Xweda ye. Ji ber ku nikare hustiyê xwe li ber Zagona Xweda bitewîne û gerek vê neke jî (bnr. Romayî 8:5-7). Her çîqasî bibêjin ku bang navê Reb dikin û Wî nas dikin jî, li gorî xwestekên Wî naçin û bawer dikin ku helwestên wan hatine pejirandin. Bêîteatiya wan ji ber dilekî ku ji tirsa pîroz mahrûm e pêk tê. Koka bêîteatiya wan û bêpewendiya wan di bin kirasê "naskirina Îsa" de ye.

## TIŞTEKÎ VEŞARTÎ TUNEYE

Ev rewş di seranserê Pirtûka Pîroz de xuya dibe. Piştî ketina gunehê di demek pir kin de hat dîtin û bi Kayînê kurê Adem re dest pê kir. Gava ku dê û bavê Kayîn li bexçe guneh kirin; ji ber nezaniya xwe, xwe bi pelên dara hejîra ku berhema axê ye nuxumandin. Xweda nîşanî wan da ku xwesteka Wî, pêşkêşkirina heywanekê ye. Ji eyarên heywanan kinc li wan kirin û ez bawer dikim ku ev heywan berxek e.

Lêbelê Kayîn ne yekî nezan bû. Zanîbû ku Xweda ji dê û bavê wî ne berhemeke ji axê, qurbanek heywanan xwestiye. Em wisa dixwînin: "Piştî demekê, Qayîn ji hatina dexlê axê hinek anî û pêşkêşî Xudan kir" (Destpêk 4:3). Diyar bû ku ji Xweda re xizmetê dike ji ber ku nabêje ku ji îlahekî sixte re pêşkêşek aniye. Ji bo pêşkêşiya xwe ji Xweda re bîne pir hewl da lêbelê di nava bêîteatiyeke diyar de bû.

Koka bêîteatiyê çi ye? Ji bilî ku mirov ne xwediyê tirsa Xweda be ne tu tişt e. Ev rewş di pirsa ku Xweda derbarê birayê wî de jê pirsî bi awayekî eşekere xuya dibe. Bersiva wî di şêwazeke ku meydanê jê re dixwaze de ye: "Ez nizanim, ma ez nobedarê birayê xwe me?" (Destpêk 4:9). Em dibînin ku weke gelê Îsraîlê

û bûyera golikê zêrîn, careke din gava ji Xweda neyê tirsîn, îmaja Xweda binpê dibe û rêyên xizmeta ji bo Wî têk diçin. Kayînê hatiye xapandin, difikire ku dibêje qey Xweda weke wî mirovek e û wê karibe hin tiştan jê veşêre. Îmaja Xweda ya di çavên Kayîn de, daketiye asta mirovekî. Pavlûs di rojên dawî de, dibêje ku em ê bê helwestê bibînin û bi awayekî cidî hişyar dike: “Çimkî, bi ser ku Xwedê dizanin jî, bi Xwedêtî rûmet nedanê û ne jî jê re şikir kirin; lê belê fikirîna wan bû pûçîtî û dilê wan ê fêmkor tarî bû. Wan digot: Em zana ne, lê bêaqil derketin. Û rûmeta Xwedayê bêmirin, bi wêneyên mîna mirovê mirindar, teyr, heywanên çarpê û yên ku dişêlin, guhertin” (Romayî 1:21-23). Weke di rewşa Kayîn de jî diyar dibe, kêmasiya tirsa Xweda mirovan ber bi xapandinê ve dibe û bawer dikin ku karên wan yên nelirê ji aliyê Xweda ve nayê ferqkirin.

Bersiva Kayîn nûşan dide ku tu tişt ji Xweda nayê veşartin. Xweda ne mirov e, ew bi her tiştî dizane û dibîne. Gava ku me tirsa Xweda winda kir aliyê me yê giyanî qels dibe. Ji ber ku gunehkarekî tê zanîn jî di wê ferqê de ye ku serhildan ji aliyê Xweda ve tê zanîn. Kesên ku derbarê Wî de agahiya wan heye lê yên ku jê natirsin, dibêjin “REB nabîne” (Hezekîel 9:9) an jî dibêjin bibîne jî bi tiştekî nahesibîne û xwe bi vî awayî dixapînin. Rêber jî ji vê ne mûaf in. Xwada dibêje: “Gelî mirovno, we dît bê rihspiyên gelê Îsraîlê çi kirin?” “Ew dibêjin REB çe nabîne” (Hezêkîel 8:12).

Ji bo em ji Xweda bitirsin we ji bîr kir bê Îsa çi peyv got? Ji ber ku ew ji me re dibêje: “Tiştekî nixumandî tune ku xuya nebe û tiştekî veşartî tune ku neyê zanîn” (Lûqa 12:2). Lêbelê gava me tirsa Xweda ji dest da, em wê dadixînin asta xwe û di binhişê xwe de em difikirin ku em ê hin tiştan karibin veşêrin. Eger gava hat pirsîn ku Xweda li her deverê ye an na û bi her tiştî dizane an na, bêyî ku duduliyê bikin teqez tevlî dibin. Lê di hebûna xwe ya hundurîn de, ne di ferqa mezinbûna nefsbiçûkiya Xweda de ne, ji ber ku eger

di ferqa wê de bûna, wê hewl nedana ku tiştekî ji Xweda veşêrin. Dikarin ji mirovên xwedayî veşêrin û gelek caran di vê meselê de bi ser dikevin lêbelê vê rastiyê ji bîr dikin: "Çavê Xudan li her derê ye, Ew qenc û xeraban dibîne" (Şîretên Silêman 15:3).

## MIROV NE ÎTEATKAR BE Û JI XWE BAWER BIKE KU ÎTEATÊ DIKE

Lêbelê ne ev tenê ye. Gava din ya xapandinê ew e ku hûn bi rastî ne îteatkar bin rê li ber baweriya we ya ku hûn jê re îteatkar in, vedike. Ev rewş di jiyana Qiral Uzziya de ku ji zuriyeta Dawid tê xuya dike. Gava bavê wî Amatsya mir, Uzziyayê şazdehsalî li şûna wî bû qiralê Yahûda. Gava hûn şazdehsalî bûn qiral, eger hûn bi aqil bin hûn ê berê xwe bidin Xweda û Uzziya ev kir. Ji ber vê serkeftinên mezin bi dest xistin. Salên dûr û dirêj kêfa hebûn û bereketê tahm kir. Em wisa dixwînin: "Navûdengê Uzziya li derûdprê belav bû ji ber ku bi xêra alîkariya bêhempa bû xwedî hêzeke mezin" (Dîrokan II 26:15).

Lê Uzziya gava hêz bi dest xist, dilê wî ket ber xurûrê. Xurûr û tirsa REB berevajî hev in. Gava di dil de tirsa pîroz tunebe, li wir xurûr şîn tê. Em bi baldarî bixwînin bê çi dibêje:

> "Lê belê dema quwetê dît, dilê wî wusa bilind bû ku, gîhaşt helaqê û li dijî Xwedayê xwe XUDAN xayîntiyê kir; ji ber bona ku buxurê li ser pêşkeşiya buxurê vêxe ket Perestgeha XUDAN. Û kahîn Azarya û tevî wî heyştê kahînên XUDAN, zilamên egîd, zilamên dilawêr, ki pêy wî ketin û li hemberî qiral Ûzziya sekinîn û jê re gotin: Ya Ûzziya ji XUDAN re buxur vêxistin ne ji te re, lê ji kahînên, ji lawên Harûn, yên ku bona buxur vêxistinê hatine pîroz kirin re dikeve; ji Perestgehê derkeve! Ji ber ku te xayîntiyê kir û dê ev kar ji XUDAN Xwedê ve mezinahiyê ji te re

> nayne! Û Ûzziya hêrs bû û bona ku bixurê vêxe di destê wî de buxurdan hebû û li ber kahînan, di mala XUDAN de li ber pêşkêşîgeha buxurê, gava li dijî kahînan hêrs bûbû, di eniya wî de cizam derket" (Dîrokan II 26:16-19)

Aniha pirsa ku divê em bikin ev e: Gava dilê Uzziya ket ber bayê xurûrê, giyanîbûna wî kêm bû an zêde? Gava min ev pirs di civînan de dipirsî, ji girseyê gelek jê dibêjin ku ew dikeve rewşa kêmgiyanî. Lêbelê ev ne rast e ji ber ku ji bo REB bihebîne ket perestgehê. Di bingeha xwe de di tevgerên xwe de hîn bêtir bi awayekî giyanî tevgeriya. Gelek caran tevgerên pir giyanî û xurûr bi destên hev digirin, yek ya din dinuxumîne. Xurûr, dibe bertek ku kesek bipejirîne ku kesekî oldar e û ol bi kirinên giyanî ne yên xwezayî re xurûrê ditepisîne. Her du jî ji tirsa REB û dilnizmiya rast re mahrûm in!

Gava ku Uzziya bi rastiyê re ketin rûyê hev, bala xwe bidinê ku hêrs dibe. Gava ku Kayîn jî bi rastiyê re diketin rûyê hev, tiştê ku tam dihat serê Kayîn jî ev bû. Di Nivîsên Pîroz de dibêje: "Qayîn gelek hêrs bû û rûyê xwe tirş kir" (Destpêk 4:5). Kayîn ji Xweda hêrs bû! Kesekî ku bi bêîteatiyê dijî, gava ku hûn wî bi rastiyê re dixin rûyê hev, eger ji tirsa Xweda ya pîroz bêpar be, wê hêrs bibe. Çima? Ji ber ku di rastiyê de bawer dikin ku mafdar in! Xapiyane û xapandin gava hûn neheq bin hûn bawer dikin ku hûn mafdar in.

Eger Uzziya bawer nekira ku mafdar e, çima ji kahînan hêrs bibe naxwe? Ji bo hebandinê ket hundirê perestgehê lê eyn weke kurên Harûn, rêgezên REB îhmal kiribû û îmaja Xweda jî xera kiribû. Ji ber bêîteatiyê bi temamî kete nav rewşeke nelirê. Her çiqasî bi çalakiyên kirinê re weke ku nêzî Xweda bûye xuya bike jî di rastiyê de ji Kesê ku armanc dikir wî bihebîne hîn bêtir dûr diket.

Ev rewş wan kesên ku îdîa dikin ku li dêrê nêzî Xweda ne lê bi xwestekên Wî re li hev nakin û wisa dijîn, ev vê yekê eşkere dike gelo? Bêyî ku van rêgezên em dipeyivin fêhm bike, kesên ku dibêjin Xweda bi Nivîsên Pîroz re tiştên nakok nîşan dide, dibe ku we şaş bihêle. Ji demeke duakirinê, çawa dikarin rêberên ku Xweda ferman daye em wan bi rûmet bikin, rexne bikin û jê derxînin? Eger tiştên ku Nivîsên Pîroz dibêjin ku hûn li xwe deynin bînin bîra wan, wê bi we de hêrs bibin. Wê bifikirin ku hûn bêeleqe û bedenî ne lê di rastiyê de yên ku li hemberî rêyên Xweda derdikevin ew in.

Weke rêberekî gelek caran, tiştên ku Xweda ji wan re anîn ziman ku ji van tiştan bawer dikin, ez bi wan mirovên ku bi min re parve kirin re peyivîm û giyanê min aciz bû. Her çiqasî bi tiştên ji Xweda bihîstin re qanex bûn jî, ji gotinên ku ez ê ji Nivîsên Pîroz parvekirinan bikim, direvin. Vê tenê bi min nakin, çi kesê ku dibin alîkarê wan bi hemûyan dikin. Ji bo di tiştên dibêjin de xwe mafdar derxînin, ayetên ku ji pêwendiya wan dûr dixin bi kar tînin û ji nîqaşê re deriyên xwe girtine. Piştî vê ji min dûr disekinin û çi kesên ku hewl didin alîkariya wan bikin direvin. Ji ber ku êdî em di çavên wan de ne giyanî ne. Her ku dem diçe rêyên ku dane ser wan tê dîtin ku ne li gorî xwestekên Xweda ne an jî tiştên li bendê ne pêk nayên. Ne Îsa lê dibe ku gelo dengê xeyalên xwe dibihîzin? Gava li nêzîkayiyê digeriyan gelo xapandin bi dest xistin?

## BI DILEKÎ PÛTPEREST NÊZÎKAYIYA LI XWEDA

Rêyeke ku ji vê xapandina xofdar dûr bisekine heye û ev rê tirsa REB e. Gava em ji Xweda ditirsin, bi dilekî bê pêşdarazî em bi hewldaneke amade ji bo ferman an jî azirandinên Wî bibîhîzin tên ber bi Wî ve. Em pişta xwe bi têgihiştin an jî xwestekên xwe ve girênadin lê em bi azweriyê xwesteka Wî dixwazin.

Nêzîkayiya Reb ya arezûyên ne li gorî xwestekên Wî, bi taybetî gava vê ji me re tîne ziman, rewşeke bi talûke û heta tu bêjî bêhikmet ava dibe. Ji ber ku em ber bi asteke din ya xapandinê ya hîn xofdar ve dibe. Ev asta xapandinê tişta em dixwazin ew dem e ku Xweda bi awayekî fiîlî destûrê dide ku em bi dest bixin:

> “Û vê gotina XUDAN ji min re hat: Lawê mirov, van zilaman pûtên xwe di dilê xwe de çikandin û dilpekiya fesadiyên xwe danîn ber wecên xwe; ma ez tu carî xwe bi wan didim gerandin?” (Hêzekîêl 14:2-3)

Ji bo rêliberxistin, şîret an jî hikmet bê sitendin, di dilê gelê hatiye huzûra Wî de hebûna pûtên veşartî REB xemgîn dike. Ne pak in bê bi temamî di ferqa vê de an na lêbelê li gorî tê dîtin çavên wan ji rastiyê re hatibû girtin. Van pûtan ew dixistin gunehê. Peyva Îbranî ya ku weke “guneh”ê hatiye wergerandin “awon” e. Û li hemberî xwesteka Xweda bi zanebûn an jî ne bi zanebûn, tawanbariya hatiye kirin nîşan dike.

Bala xwe bidinê ku pût li bexçe, odeyên wan yê rûniştinê an jî li odeyê wan yê razanê tunene. Ev pûtperestî di dilê wan de bû. Ji bîr nekin, pûtperestî ne bangkirina navê îlahekî biyanî ye. Weke ku berê hatibû diyarkirin, kêmkirina Xweda ya bi îmajeke qels, ango tişta ku em bi arezûyeke azwerî dixwazin gava ku mirov dadixîne tiştekî ku wê bide me, ev jî pûtperestî ye. Hûn ê bibînin ku di koka her pûtperestiyê de çavbirçîtî heye. Peymana Nû vê piştrast dike:

> “Loma xwestekên xwe yên dinyayî, fuhûşî, pîsîtî, şehwet, xwesteka xerab *û çavbirçîtiya ku pûtperestî ye,* bikujin. Ji ber van, xezeba Xwedê tê ser wan ên ku bi ya wî nakin.” (Kolosî 3:5-6, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

Pavlûs di Efesiya 5:5an de careke din dibêje ku kesê birçî pûtperest e. Pûtperestî pênaseyeke eşkere ku weke birçîtiyê tê bi navkirin. Naxwe em çavbirçîtiyê pênase bikin. Ferhenga Websterê vê termê weke "bi dest xistina tiştekî ku baş tê hesibandin an jî dildariya ji bo xwedîderketinê" pênase dike. Min dua kirin û pênaseya ku Reb dayêyê ji Wî pirsî. Bersiva da ev bû: "Birçîbûn çavsoriya biserkeftinê ye."

Ev pênase çavbirçîtiyê bi azweriya pereyan bi sînor nake. Mal, mevkî, konfor, îtîbar, zewq, rayedarî, şehweta zayendî û hwd. di xwe de dihewîne. Çavbirçîtî ew rewş e ku em di yên bi destên xwe de razî bin. Em hewl didin ji ber ku em bi tiştên ku Xweda dide re rehetî an jî xweşiyê nabînin. Em bi zanebûn an jî nezanebûn hewl didin ku li ber pêvajo an jî plana Wî ya derbarê jiyana me de li ber xwe bidin. Ji ber vê ev li me tê fermankirin: "Bila rabûn û rûniştina we ji hezkirina peran dûr be; bi tiştê ku di destê we de ye razî bin. Çimkî Xwedê gotiye: Ez tu caran te nahêlim, Ez tu caran te bernadim" (Îbranî 13:5). "Tu min haydar dikî ji riya jînê, Têr şahî heye li pêşberî te, Kêm nabe şahî li rastê te" (Zebûr 16:11). Gava em di vê ewlehiyê de dijîn, em li derveyî plan an jî huzûra Wî li bextewarî û diltêrbûnê nagerin.

Çavbirçîtî di bêhuzûriyê de cih digire û bi arezûyên bêdawî gur dibe. Ev rewş Îsraîliyên ku ji Misrê derketine bi awayekî bêhempa tîne ziman. Xweda gava xwesteka xwe ragihand jî her dem tişta ji bo wan ya herî baş ku lê difikirin xwestin. Ji bo wan amede bike ji bo welatê ku soz daye wan bi dest bixin, ji pêvajoya ku Xweda diyar kiribû kêfxweş nebûn û ji şert, av û xwarinê şîkayet kirin. Ji tirsa pîroz bêpar bûn û dilên wan ji bo çavbirçîbûna wan şîn bibe guncav bûn. Gava Xweda heybeta xwe nîşan da, dildariya wan ya kar û zewqê di ser arezûya wan ya li hemberî Xweda derket û ji bo vê veşêrin li dûr disekinin.

Gava ku REB û Mûsa bi hev re vekişiyan, gel Xweda anîn

awayekî ku xwestekên wan yên ji ber çavbirçîtiyê gur bûne pêk bîne. Bi awayekî ecêb her tişt li dora zêr pêk hat. Ev hezkirina pereyan ji ber ku ji xwestekên Wî nexweşbûn, diyar bû. Êdî di nava mija tîr ya xapandinê de bi pêş de diçûn.

(Weke noteke din, çavbirçîtî koka cureyên pûtperestiyên din e jî. Mirovahî ji bo Xweda bihebîne bi arezûyeke hundurîn hatiye afirandin. Lêbelê gelek jê naxwazin li ber Afirînerê rastî sitûyê xwe bitewînin. Bi vî awayî îlahekî sixte diafirînin lê di koka vî îlahê sixte de kî heye? Bersiv ew kesê ku ew afirandiye ango mirov e. Mirov vî îlahê sixte dihebîne ku jê re çi tiştê dixwaze didêyê. Dîsa di koka wê de çavbirçîtî heye.)

Di rastiya xwe de, têkevin kîjan şiklî ferq nake hemû pût çavkaniyek in. Tenê cihê ku ji aliyê Xweda ve heq dikin, distînin. Dibe ku pût weke çavkaniyên wê yên bextewarî, konfor, huzûr, başbûn û hwd. kar bikin. Xweda dibêje: “Hûn ê pûtan çê nekin” (Lêwiyî 26:1). Yên ku pûtan çêdikin em in. Pût her tiştên ku me di jiyana xwe de danîne ber Xweda ne. Ew tişt in ku em wan ji Reb bêtir hez dikin, diecibînin, lê ewle dibin, wa dixwazin an jî bala xwe didinê. Pût, ew tişt e ku hûn jê qewetê distînin an jî hûn jê re qewetê xerc dikin. Bawermendekî gava destûr da ku dilê wî bi bêrazîbûnê biçelqe û gava di jiyana xwe de li derveyî xwesteka Xweda li têrbûnê digere, ber bi pûtperestiyê ve diçe. Tişta di bin wê de ye careke din diyar dibe ku çavbirçîtî ye.

## LI GORÎ ÇAVBIRÇÎTIYÊ WÊ BERSIV BÊ DAYÎN

Eger em vegerin gotinên Xweda yên di Hezkîêlê de, ji ber di dilê gelê wî de pût hebûn û nêzî Wî dibûn xemgîn bû. Ji bedêla ku li xwesteka Xweda bigerin, bi awayekî xweperest dixwestin ku li tiştên digerin bide wan. Ev ne mîna wan kesên nû kamilbûne ye, yên ku ji dê û bavên xwe hêvî dikin ku bi ramanên xwe razî bin,

ne ku li şîretên wan ên biaqilane bigerin, ji ber ku ew fam nakin ku dêûbavên wan biaqiltir in û bextewariya wan dixwazin.

Bersiva ku Xweda di Hezêkîelê de da hem hişyarker e hem jî tiştekî hişyar e. Hezêkîel, ji gelê Wî yê ku bi dilekî çavbirçî tên, bi zimanekî zelal ji wan re eşekere kiriye bê wê çi bikin: “Ez XUDAN, li gor wê, li gor zêdeyiya pûtên wan bersivê bide wî” (Hêzekîêl 14:4). Di wergera Pirtûka Pîroz ya Standart ya Amerîkaya Nû de wisa dinivîsîne: “Ez REB, ez ê li gorî pîrbûna pûtan bersivê bidim wan.” Ev ayet dikare wisa jî bê xwendin: “Ez REB, ez ê li gorî azweriyên çavbirçî ez ê bersivê bidim.”

## JIRÊDERKETINA ZILAMEKÎ XWEDAYÎ

Jiyana Balam ji bo vê mînakek e. Ne ji bo îlahekî sixte lê ji REB Yahveyê ku em wî dihebînin re pêxembertî dikir. Xizmeta pêxembertiyê ewqasî bi hêz bû ku navûdengê wê çûbû heta bi guhê qiralan. Yek ji van qiralan, qiralê Moav û Midyanê Balak bû.

Îsraîliyan; welatê Misrê ku wê serdemê welatê herî bi hêz yê dinyayê bû, têk birin. Û gava gelê Moav û Midyanê bibîstin ku niha li deştên Moavê artêşgeh avakirine, ecêbmayî man. Fikirîn ku eger Misrî bi rehetî têk biribin, wê karibin heman tiştî bînin serê wan jî. Tirs pêl bi pêl belav bû û gîhaşt heta bi sarayê.

Qiral planek çêkir. Vî pêxemberê mezin bihîstibû ku Balam hatiye pîrozkirin û hatiye lanetkirin. Li ser vê yekê rihspiyên xwe bi xelatên pir mezin şandin ji Balam re û hat cem wan û ji ser serê girên Moavê teklîf kir ku Îsraîliyan lanet bikin.

Balam bi teklîfê daket: “Vê şevê li vir biborînin û li gor ya ku XUDAN ji min re bibêje, ez ê bersivê bidim we” (Hejmara Çolê 22:8). Bersiva da dişibe bersiva gelek bawermendên di roja me de: “Di vê mijarê de ez ê duayan bikim û ez ê binêrim bê ka wê Reb çi bibêje.”

REB tê û ji Balam re vê dipirse: “Ev zilamên li mala te dimînin kî ne?” Bi gotineke din vê dibêje: “Di vê mijarê de çima divê tu bi min bişêwire? Peymana van zilaman bi min re tuneye lê gelê min bi wan re peyman daniye, dixwazin tu wan lanet bike. Ma hewceye tu vê ji min bipirsî?”

Li vir ji bo me hemûyan peyamek heye: Hin tişt hene em ne mecbûr in ji bo wan duayan bikin! Hîn berî em bipirsin divê zaten di wan mijaran de em xwesteka Xweda zanibin. Kurikê min yê ku kamil bûye, bê û di mejareke ku zaten ez jê re bêjin “na” de tiştekî ji min bipirse, ev min aciz dike. Bersiva ku jixwe dizanin gava ez didim wan, ez di ber xwe de dibêjim: “Tu vê çima dipirsî?” Vê dikin, ji ber ku gotina min di wê qada jiyanê de ji bo wan, li şûna memnûniyetê zagonekê an jî sînorekî ava dike.

Eger em li Balam vegerin, xelata ku weke teklîfê lê kirine pir mezin e û ez texmîn dikim ku wê di nava gelê Moav û Midyan de bigihê asteke pir bilind. Azweriya Balam ya ji bo pere û rûmetê, gelo dibe ku çavên wî li ber zanebûna Xweda kor kiribin?

Xwedayê dilovan, bêguman wisa fikirî: “Temam Balam, li gorî ku te serê meseleyê fêhm nekiriye an jî tu naxwazî fêhm bikî, ez ê xwesteka xwe bi awayekî pir net bînim ziman.” Wisa bi awayekî zelal dibêje: “Bi wan re neçe! Lanetê li vî gelî neke, ew gelekî hatiye pîrozkirin” (a. 12). Îcar aniha ev gotin ma ne zelal e? Ez dibînim ku Xweda her dem teqez û zelal dipeyive, yên ku gotinên Wî tevlihev û xumamî dikin em in.

Balam îteatê dike û ji rêberên Balakê re dibêje: “Li welatê xwe vegerin. Ji ber ku REB destûrê nade ez bi we re bêm” (a. 13). Her çiqasî îteatê bike jî di hilbijartina peyvan de, bi taybetî jî di îfadeya “destûrê nade” de, mirov dikare nexwestineke diyar tê de hîs bike. Vê bînin ber çavên xwe: Keçikeke ciwan, ji aliyê xortekî ku li dibistanê pir populer e lê xwedî navekî ne baş e, ew vexwendiye dansê. Keçik; ji ber ku ji aliyê xortekî bi navûdeng

hatiye vexwendin, kelacanî dibe û bi dilxwaziyeke mezin ji bo here ji bavê xwe destûrê dixwaze. Ji ber ku ji keçika xwe hez dike û bi wê dadikeve, bavê wê bi awayekî nazik destûrê nade. Keçik xemngîn dibe û ji xort re dibêje: “Ez nikarim bêm ji ber ku bavê min destûrê nade.” Ya rastî keçik wisa dibêje: “Bavê min got ‘na’ lê ez dibêjim ‘erê.’ Kesê ku destûr nedaye wan bavê wê ye. Keçik dixwaze here û tekane tişta ku rê li ber vê xwesteka wê ya çavbirçî digire, gotina bavê wê ye. Mixabin, eger bi ya dilê bavê xwe neke, di dawiya dawî de wê rêyekê bibîne ku bi vî xortî re bê cem hev û bêguman wê bi encamên tirsnak re rû bi rû bimîne.

Balam pêxemberekî ku li hemberî pereyan xwedî arezûyeke nebaş bû. Dilê wî bi çavbirçîtiyê lê dida. Xwestekên ezîtiyê ji bo mevkiyeke civakî ya bilindtir pir li ber xwe dida ji bo bigihê wir. Îteat kir lê xwedî helwesteke dilekî ku nedixwest bû. Gotina Xweda li şûna memnûniyetê bû sedema rêlibergirtinê ji ber ku ew ji xwesteka wî ya rastî mahrûm hişt.

## KIŞKIŞANDINA BI DILDARIYA XWE

Rihspiyên Moav û Mîdyaniyan vegeriyan cem Qiral Balak û rapor dan: “Balam bi me re nehat.” Lêbelê vê bersivê rê li ber qiral negirt, ji yên pêşî çûn hîn bêtir û hinek rêberên din şandin û hîn bêtir pere teklîf kirin.

Balak çima wisa dike? Ez bawer dikim ku hêzên şeytanî ew bi rê ve birine. Ez ji ber çi wisa dibêjim? Pirtûka Pîroz wisa dibêje: “Lê her kes ji aliyê xwesteka xwe ve tê kaşkirin, xapandin û tê ceribandin” (Aqûb 1:14). Ez ê bala we bikişînim ser herdu îfadeyan. Îfadeya pêşî bi arezûya xwe. Berevajî xwesteka Xweda, çavbirçîtiyeke bi hêz, ango pûtperestî ye. Îfadeya duduyan xapandin e, ev qisim rola dijmin e, ew dixapîne. Lê li vê guhdar bikin: Ji bo tiştekî ku hûn arezûya wê nakişînin, hûn nayên

xapandin. Eger gelek kesên ku diçin dêrê hûn tiryakê teklîfî wan bikin, bêyî ku lê bifikirin wê di cih de red bikin. Çima? Ji ber ku arezûya wê nakin. Tiştekî ku hûn arezûya wê nakin di wir de tu kes nikare we bixapîne. Lêbelê ji bo arezûyên ku me teslîmî çarmîxê nekirine dibe ku em bên xapandin! Bi çavbirçîtiyê an jî bi awayekî din tiştên ku em pir arezûya wan dikin, dibe ku em bên xapandin.

Dijmin zanîbû ku ev pêxember ji pereyan û ji navûdengiyê hez dike û ji bo qiral hîn bêtir teklîf bike ew dahfandin bi ber ve. Nûnerên ku nû hatin rayedariyên wan bêtir fireh bûn û peyama Balak ya ku dibêje "tu çi bixwazî ez ê bikim" ragihandin. Wey, ji xwe re lê binêre, çawa teklîf e! Her çiqasî xwediyê gelek tiştan be jî gava yekî ji rêzê teklîfeke wisa bike tiştek e lê qiralekî ku her tiştên hûn dixwazin teklîfî we bike tiştekî din e. Bi taybetî eger aliyê we yê qels îcar aliyê qiral yê bi hêz be. Lêbelê li bersiva Balam guhdar bikin bê çi gotiye:

> "Ger Balak mala xwe bi zêr û zîv tijî bidin min jî, dixwaze bila biçûk be, an jî mezin be bona kirina tiştekî ez *nikarim* ji gotina Xwedayê xwe XUDAN ve wêdetir herim!" (Hejmara Çolê 22:18, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Gelek jê wê di bin bandora îteata Balam ya di vir de bimînin. Lêbelê careke din bala xwe bidin gotina "ez nikarim" bê çawa peyv hatiye hilbijartin. Careke din gotina Reb wî ji tiştên ku arezûya wan dike, dûr dixe. Balam di roja me de bi tiştên ku gelek kesên diçin dêran dizane. "Eger hûn bi zanebûn ji gotina Xweda re bêîteatiyê bikin, hûn nayên pîrozkirin." Ya din jî belkî bi wê tişta ku nêviyê kesên ku tevlî dêrê dibin jî dizane: Kesên ku bi zanebûn bêîteatiyê dikin, darizandin li benda wan e. Lêbelê carina ji bo hûn serê xwe têxin belayê evqasî agahî bes e. Ji ber ku eger hûn li gorî xwesteka Xweda ranehijin tiştên hûn dixwazin, di çarçoveya "xwesteka Xweda" de ji bo hûn rêyekê bibînin ku hûn tiştên dixwazin bi dest

bixin, hûn ê dest bi lêgerînê bikin. Weke daxuyaniyê em li gotina piştî vê ya Balam, bikolin:

> "Û niha rica dikim hûn îşev liv ir bimînin û ka dê XUDAN hîn çi ji min re bibêje ez binerim!" (Hejmara Çolê 22:19)

Hûn vê dibihîzin? "... Tiştekî din ku REB ji min re bêje heye?" Hîn bêtir pereyan teklîf bike dibêje qey wê Xweda fikra xwe biguhere? REB cara pêşî gava got "Bi wan re neçe!" Gelo difikire ku Xweda ew ji bo teklîfeke hîn baştir sekinandiye?

Di vê mijarê de çima divê ji nû ve duayan bike? Ji bo tiştê dixwaze bi dest bixe, hûn dibînin ku hîn jî li rêyeke din digere ne wisa? Azweriya wî hemû aqlê selîm binpê dike. Tu ferka wî û wê keçika ku dixwest bi wî xortê populer re be ku serê bavê xwe biribû, tuneye. Balam bi serhişkî tevdigere û naqedime ku xwesteka Xweda bi kêfxweşiyê bîne cih ji ber ku li hemberî dilê xwe yê çavbirçî ye. An jî ez ji dilê wî yê pûtperest re bibêjim gelo? Nivîsên Pîroz vê yekê piştrast dikin: "Çimkî serhildêrî wek gunehê falbaziyê û serhişkî jî wekî pûtperestî xerab e" (Samûêl I, 15:23). Em bersiva Xweda ya ku daye Balam bibîhîzin:

> "Û Xwedê şev hat cem Balam û jê re got: Ger van zilaman bona bang kirina te hatibin, rabe û bi wan re here; lê tiştê ku ez ê ji te re bibêjim tuyê bike!" (Hejmara Çolê 22:20)

Wê zilaman sibeha din bang wî bikirana ji ber ku bi wan re hêvî dikir ku wê bê û ji ber vê li cem Balam mabûn. Ango Xweda di esasê wê de wisa digot: "Gava ku zilaman bang te kir bi wan re here lêbelê ez çi ji te re bêjim wê bike." Wey ji xwe re lê binêre, belkî jî em di nirxandina xwe de şaş bûn. Hûn bala xwe bidinê nabêje "Wê şevê şeytan hat cem Balam" an jî "Wê şevê giyanekî xapîner hat cem Balam." Serê pêşî min henek dikir lê li

gorî ronahiya vê ayetê tu dibêjî qey Xweda ji bo hîn bêtir pereyan rahijêyê ew sekinandiye, dibe ku wisa xuya bike ji ber ku yê dibêje aniha “here” Ew e.

## BIDESTXISTINA TIŞTÊN EM DIXWAZIN

Balam êdî ji bo here mafê axaftinê ji Xweda xwest. Bi vî awayî ji bo here sibehê zû şiyar dibe û pişt re binêrin bê çi dibe:

> “Û Balam sibehê rabû û kurtanê kere xwe gire da û tevî serokên Moabê çû. Û ji ber ku çû, hêrsa Xwedê sor bû” (Hejmara Çolê 22:21-22)

Bise deqîqeyekê! Aniha ji ber ku Reb ew tişta bi şev jê re got û kiriye îcar Balam ji ber vê hêrs dibe? Em dizanin ku Xweda ne şewişî ye, naxwe em ê vê çawa bi nav bikin? Bersiva vê di gotinên ku Xweda ji Hezekîel re kiriye de peyda dibin. Gotinên Xweda yên ku gel bi dilê xwe yê çavbirçî nêzî Wî dibin, bînin bîra xwe: “Ez REB, ez ê li gorî azweriyên wan yên çavbirçî bersivê bidim wan.”

Tişta ku gelek kesên li dêrê nizanin an jî fêhm nakin ev e. Eger em tiştekî bi dil û can bixwazin û eger Xweda xwesteka xwe bîne ziman jî îcar em hîn jî çavbirçîtiya xwe bidomînin, bêguman her çiqasî ev li hemberî xwesteka Wî be jî û zanibe ku pişt re em ê bên darizandin jî wê wî tiştî bide me!

Dibe ku di vir de hûn matmayî bimînin lê li gelê Îsraîlê bifikirin. Qiralek li ser serê xwe xwestibûn. Gava Samûel ev xwesteka wan gîhand Reb, Xweda anî ziman û got ez naxwazim qiralek bê ser serê we. Got wê qiral; kur, keç, erd, rez û deviyên gel wê ji wan bistîne û wê bacê ji wan bide hev.

Samûel gotina Reb ji gel re ragihand lêbelê ji xwe re li bersiva gel binêrin: “Mixabin, gel nexwest li gotina Samûel guhdar bikin.” Hûn bala xwe bidinê, di Pirtûka Pîroz de nanivîsîne ku gel

naxwaze li gotina Xweda guhdar bike. Weke rewşa Mûsa careke din ji bo bigihên xwestekên xwe îmaja Xwedayê xwe parastin û qasid bi tu tiştî nehesibandin. Xweda bi awayekî taybet bi Samûel re peyivî: “Yê ku red dikin ne tu yî, weke qiralê xwe ez red kirim” (bnr. Samûel I, 8).

Li hemberî vê Xweda qiral dan wan. Heta qiralan wan jî Wî hilbijartin û yê pêşî Saûl bû. Eynî weke ku berê hatibû ragihandin, qiralan erd, kur û keçên gel yên herî baş ji wan sitendin û baca xwe li ser gel girê da. Di dawiya dawî de van qiralan hişt ku gelê Îsraîlê li Babîlê bibe êsîr û bindest. Xweda tiştê ku gelê Wî dixwest bi dil û can da gelê xwe!

Li gelê Îsraîlê yê li beyebanê bifikirin. Bi nanê herî xweş yê ku heta niha mirovan li ser rûyê erdê xwariye, zikê xwe têr kirin. Ilyas ji vî nanî xwar û bi qeweta vî nanî re çil şev û çil rojî meşiya! Nanê Man xwarineke çavkaniya qewetê bû!

Lêbelê gelê Îsraîlê jê aciz bû û bêriya xwarina goşt kir. Ji REB goşt xwest û em dixwînin ku Xweda “tiştên dixwest da wan” (Zebûr 106:15). Careke din arezûya wan ya çavbirçî da wan. Ya rastî Xweda bi mûcîzeyekê goşt ji wan re pêde kir:

> “Wî li asîman bayê rojhilat rakir, *Bi hêza xwe,* rê da bayê başûr. Wî goşt wek tozê, Çûkên bi bazk wek qûma deryayê bi ser wan de barand; Wan ew kir nav konên xwe, Danîn dora ciyên lê diman.” (Zebûr 78:26-28, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Tîştek ji Xweda xwestin û Xweda ev xwestek bi awayekî mûcîzeyî da wan (bi hêza xwe). Têra sê milyon mirovan sûsik şandin beyebanê! Ti ji xwe re lê binêre! Çawa mûcîzeyeke bêhempa! Ji ber ku sûsik nikarin li beyebanê bijîn! Ne tenê ev jî lê li ber destên wan ne tifing û ne jî tajî hebûn! Çawa mûcîzeyeke bêhempa! Di ber vê re pişt re binêrin bê çi diqewime:

> “Bi vî awayî xwarin pirr têr xwarin, Xwedê bi cih anî ya ku xwestin. Hê îştaha wan li cih, Xwarina wan di devê wan de bû, Hêrsa Xwedê li hember wan rabû. Yên herî hêzdar kuşt, Mêrxasên Îsraêlê li erdê hêşt.” (Zebûr 78:29-31)

Belê, Xweda bi awayekî mûcîzeyî xwestekên wan tîne cih lê hîn xwarina di devê xwe de xelas nekiribûn, darizandina wî xwe li ser wan danî. Weke arezûyên çavbirçî yên dilê wan bersiv da wan.

Li vê bifikirin: Xortek têkiliya wî bi keçikekê re heye. Dê û bavê vî xortî xema vê têkiliyê dixwin û wisa dibêjin: “Kurikê me, em ji vê têkiliya te aciz in. Em dixwazin tu têkiliya xwe ji vê keçikê qut bike.” Pastorê ciwanan jî li pişt vê biryarê disekine: “Tiştên ku dê û bavê te gotin ez dixwazim careke din bibêjim. Gava ku li ser mijarê min dua kirin ez aciz bûm. Divê bi rastî jî tu têkiliya xwe û vê keçikê bi dawî bike.” Lê ev xort li hemberî wan derdikeve û dibêje: “Min dua kirin, gelek dua kirin û Xweda ji min re got tu dikarî bi wê re bizewice.” Werhasil zewicîn lê pişt re meraq kir bê ji ber çi pirsgirêkên wî evqasî pir in.

Li vê bifikirin: Zilamekî ji jina xwe re dibêje ji bo karekî min dua kirine. Jina wî wisa bersivê dide: “Ez ji ber vê karî aciz im. Eger tu vî karî bistînî, di salekê de tu yê ji dused rojî zêdetir rêwitiyê bikî. Tu nikarî bi rêkûpêk werî dêrê, belkî ji mehê carekê tu yê bê û peyamên ku Xweda xistine dilê pastorê me tu nagihê ser wan. Ez hebandin û fersedên ku tu yê xizmeta dêrê bikî, nahesibînim…” Pastor jî heman xemên xwe tîne ziman lê mêrik li ser a xwe ye û heta wî karî bi dest dixe duayan dike. Piştî salekê ji malbata xwe dûr li odeya otelekê bi êşeke dijwar ferq dike ku bi jinikeke biyanî re di nava heman cihî de ye.

Lîste dirêj dibe û diçe. Tişta ku divê em fêhm bikin, gava ku me çavberda tiştekî ku ne li gorî tiştên ku Xweda ji bo me dixwaze, wê Xweda gelek caran destûra vê bide, bersiva vê wê li gorî pûtên

di dilê me de bi cih bûne be. Di dawiya dawî de vêya ji bo ji nû ve dilên me ber bi xwe ve bikişîne, vê dike.

> "Ji her kesê ku ji mala Îsraêlê yê ku pûtan di dilê xwe de çikandiye, ez XUDAN, li gor wê, li gor zêdeyiya pûtên wan bersivê bideme wî ku, mala Îsraêlê di dilen wan de bigirim, ji berk u gişt bi pûtên xwe ve ji min re bûn biyan." (Hêzekeîêl 14:4-5)

Di wergereke din de wisa îfade dike: "Ji bo ez dilê gelê Îsraîlê dîsa zeft bikim, ez ê bikin." Reb bi daxwazeke mezin xwest ku me bikişîne nav dilê xwe. Ji bîr nekin, Ew li dû me ye, bêriya me dike. Xwesteka Wî ew e ku tu kes ji me ji rê dernekeve lêbelê ew ne yê ku em henekê xwe pê bikin. Dilê Wî tenê ji bo kesên ku dilê xwe bi temamî teslîmî Wî kirine, hatiye veqetandin. Ji ber vê armanc ew e ku em dilê xwe ji pûtperestiya ku jê re dibêjin çavbirçîtî xelas bikin û nekevin nav xefkên wê.

Kurikê winda gava ji bavê xwe mîrasê ku li para wî ketiye xwest, ne weke biyaniyekî an jî koleyekî, weke kurikê malê yê esîl, hat. Ev kurik helbet ne xwediyê dilê bavê xwe bû û ew bi xwestekên xwe yên egoîst hat kişkişandin. Her çiqasî bavê wî zanîbû ku wî kurikê wî vî mîrasî belewela bike jî, dîsa xwesteka wî red nekir. Dîsa jî pereyekî mezin da wî û weke ku bav texmîn dikir, kurik kete nav pirsgirêkên mezin. Nûçeya baş ev e, di dawiya dawî de hişê kurik hat serê wî û li bavê xwe vegeriya. Bi vê vegerê re dilê bavê xwe pir ji nêz ve nas kir ku ev yek berî vê tu carî nebibû.

Xweda, dixwaze ji nû ve dilê her zarokê ji ber tunebûna tirsa pîroz ji rê derketiye, bikişîne ber bi xwe ve. Mixabin, eynî weke di mînaka Balam de bûye, hin jê tu carî rast nabin û dilê Reb nas nakin. Eger hûn çîroka Balam ya mayî bixwînin, hûn ê bibînin ku daye dû çavbirçîtiya xwe û bi şûr hatiye darizandin.

Kesên ku di dema me de ji tirsa pîroz bêpar bin, bi heman danberhevdana Îsraîliyan, Kayîn û Balam (di vê beşê de ez li ser hemûyî sekinîm) re, di Peymana Nû de ev danberhevdan xuya dibe. Em vê hişyariyê dixwînin:

> "Îcar her çiqas hûn her tiştî dizanin jî, ez dixwazim bînim bîra we ku Xudan gelê xwe ji diyarê Misrê xilas kiribe jî, yên ku bawer nekirin, piştre helak kirin." (Cihûda 1:5)

Cihûda; bawermendên Peymana Nû yên ku pişt re başiya Xweda înkar dikin lêbelê li çavbirçîtî, şehwet û serhişkiyê vedigerin, tîne ziman:

> "Wey li wan! Ew li ser riya Qayîn çûn û ji bo qezencê xwe avêtin nav xapandina Balam û di serhildana Qorax de helak bûn. Evên ha di ziyafetên we yên hezkirinê de bê tirs dixwin û vedixwin, ew leke ne. Ew mîna wan şivanan in ku bi tenê xwe xweyî dikin. Ewrên bêbaran in ên ku li ber bayê diçin; darên payîzê yên bêfêkî ne, ew du caran mirine û ji ra ve hatine hilkirin." (Cihûda 1:11-12)

Baldar bin ku ev kes; di merasîmên me yê hezkirinê yên ku xizmetên me yê dêrê îfade dikin de her yek ji wan deqeke lewitî ye. Divê tu carî em ji bîr nekin ku Îsa ji bo Bûkeke (hezkiriyê Wî yê nêz) ku bi arezûyên dinyayî nehatiye lewitandin, hatiye. Lê Cihûda dibêje van kesên ku qaşo bawermendin gotiye, "bi we re bê ser û ber xwariye û vecwariye" û "tenê xwe bi xwedî kirine." Ev dixwazin bi bereket bin û heta dixwazin nêzî Xweda bin lê ji tirsa Xweda bêpar in. Di nava xetereyê de ne û bi hezkirin û tirsa pîroz re, heta ku li dilê Xweda venegerin, wî xetereya wan hîn mezintir bibe.

## HIŞYARKIRIN Û PERWERDEKIRIN

Em ji berevajî de li vê binêrin. Nivîskarê Nameya Îbraniyan wisa dibêje: "Lê belê em ne ji wan in ên ku xwe bi şûn ve dikişînin û helak dibin; lê em ji wan in ên ku ji bo rizgariya canê xwe bawer dikin" (Îbranî 10:39). Ez bawer dikim sedema ku hûn vê pirtûkê dixwînin û sedema ku hûn dixwazin dakevin kurahiya dilê xwe, ew e ku hûn li cem Xweda dimeşin û ne tenê hûn Wî bi gotin û ziman lê bi çalakî û jidil Wî dixwazin. Ji ber vê ji me re ev tên gotin:

> "Ji ber vê yekê, hezkirîno, çawa ku we hergav bi ya min kiribe, niha jî, ne tenê di dema ku ez li ba we me, lê belê hê bêtir di dema ku ez ne di nav we de me jî, bi ya min bikin; *bi tirs û lerizînê* xilasiya xwe pêk bînin. Çimkî Xwedê ye yê ku di dilê we de dixebite, da ku hem daxwaz û hem jî kirina we li wî xweş bê." (Filîpî 2:12-13, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Kesên di tirsa pîroz de dijîn, hebûna Xweda hîs bikin jî nekin jî, îteatê jê re dikin. Weke ku Xweda dev ji wan berdaye xuya bike jî, jixwe tu carî ferq nake, dîsa jî sebir dikin! Reb nêzî kesên ku di nava tirsa pîroz de dimeşin, dibe. Ne tenê ji bo Wî kêfxweş bikin, ji bo bikin jî wan bi hêz dike. Xweda dibêje xelasiya me ne bi hezkirin û kêfxweşiyê, divê em bi tirs û rêzê çalak bikin. Careke din diyar e ku tirsa Reb girîng e û di dilê me de bi îteateke bêşert çalakiyan ava dike.

Pavlûs dibêje; ji bo pêşkêşî Xweda bike weke her bawermendê li ber Mesîh tekûz bûye, divê em her kesî hişyar û perwerde bikin (Kolosî 1:28). Di destpêkê de dibe ku erênî xuya nebe lêbelê di dawiya dawî de xelaskerên jiyanê ne û gava guh bidinê ber didin. Kêfa min tê gava ez gotinên baş û bextewar dibihîzim lê wekî din weke gelek kesên ku di Roja Darizandinê de li xizmetkaran

dinêrin, ez difikirim ku wê bikin hawar û bêjin: “Çima te ez şiyar nekirim?” Eger ev waîz peyamên xweş belav bikin û bibin berpirsyarê cezeyên ku wê bên serê wan, wê biricifin.

Carekê di waazekê de min ev şîrove kir û piştî wê pastorek aciz bibû ji ber wê hat cem min. Got: “Tu çawa dibêje ku em ê ji cezayê kesekî berpirsyar bin? Ev peyvên Peymana Kevin in, ne litûf in.” Li ser vê min Pirtûka xwe ya Pîroz vekir û min ev gotinên Pavlûs dîtin:

> “Ji ber vê yekê di roja îro de ez ji we re şahidiyê dikim ku ez ji xwîna her kesî bêrî me. Çimkî min xwe neda paş, min hemû daxwaza Xwedê ji we re got. Îcar hay ji xwe û ji hemû keriyê ku Ruhê Pîroz hûn di nav de kirine çavdêr, hebin. Şivantiya civîna bawermendan a Xwedê bikin a ku wî bi xwîna Kurê xwe bi dest xistiye.” (Karên Şandiyan 20:26-28)

Gava ev ayet xwendin, ez ê tu carî ew matmayîna li ser rûyê wî ji bîr nekim. Bi salan bû xizmet dikir û ev ayet gelek caran xwendibû lêbelê wê rojê cara pêşî dît. Lêborîna xwe jidil xwest û pişt re di waazên me de her dem em bi şertê ku em li ser tiştên erênî an jî neyênî bisekinin, em li ser ku em nekevin xefka aliyekî sekinîn û peyivîn. Divê em bi denge bin û hem “hişyar” bikin hem jî “perwerde” bikin.

Em di demekê wisa de dijîn ku Îsa hişyar kir û gelek kesên din, heta kesên hatine hilbijartin, dikarin ji rê derxînin. Wî anî ziman ku wê xapandin bi gelemperî be. Ji bo em nekevin divê em baldar bin bê em ê li kuderê bisekinin. Li şûna dilekî bêhiş ku bi hêsanî wê bê xapandin, divê em bi dilekî tije tirsa pîroz nêz bibin. Bavê me yê dilovan ji bo qenciya me dixebite û her tiştê derbarê jiyan û pîroziyê de daye me. Wî bi saya Xwedayê me Îsa kerem da me ji bo ku em li gorî daxwaza wî bijîn û tenê bi vê tirsa pîroz em dikarin bi Xweda re bibin xwediyê nêzîkbûna rastîn!

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Îfadeya “Bêyî tirsa REB… di nava me de an jî di xeyalên me de, wê îmajeke xelet bi pêş bikeve û bi şikil bibe” derbas dibe. Gava hûn li jiyana xwe ya baweriyê ya heta niha dinêrin, demeke we ya xelet ya îmaja Xweda çênebûye? Eger çêbibe ji kîjan alî ve xelet e?

2. Gava me çavberda tiştekî ne li gorî dilê Xweda, gelek caran Xweda nîşanekê dide me ku wê wî tiştî bide me. Gava hûn li jiyana xwe ya duayan bi duristî dinêrin, di eslê xwe de ji bo tiştekî ku wê bibe arezûyeke çavbirçî hûn her dem nêzî Xweda dibin gelo? Di jiyana we de tiştekî ku we bi arezûyeke mezin dixwest, îcar piştî ku we ew tişt bi dest xist gelo hûn poşman bûne?

3. Di pirsa dawiya beşa pêşî de, ji we hatibû pirsîn bê we çawa xwestiye hûn vê pirtûkê bixwînin. Gava hûn li tiştên ku hûn heta niha hîn bûne difikirin, çawa meydan li we hat xwarin? Hûn di îmaja xwe ya Xweda de û di têgihiştina we ya ku hûn di çalakî û rastiyê de dixwazin Wî kêfxweş bikin, hûn guhertinên çawa dibînin?

BEŞ 8

# HEBANDINA HEQÎQÎ

"Giyanekî oldar ji bo xwesteka xwe bi cih bîne,
Gotina min bi kar anî."

Kesên ku tirsa Reb bi wan re tunebe tên xapandin lê kesên ku bi tirsa pîroz re dijîn, nêzî Xweda ne. Îspata vê ya ji derve de, îteata bê şert ya li gorî xwestekê Xweda ye. Em tenê îteatê nakin, di heman demê de dilekî me yê ku wê xwestekên Wî bîne cih heye. Em vê rewşê di jiyana kesên ku bi Xweda re dimeşin de, li ser hev çend caran dibînin.

Em dizanin ku Hanok Reb kêfxweş kiriye. Ji bo nêrîneke berfirehtir, ji nivîsên Klement ku yek ji wan bavên pêşî yê dêrê ye, em ê jêgirtinan ji wan bikin. Klementê Romayî ku di sedsala yekê de jiyaye û kedkarê Petrûs û Pavlûs e, wisa nivîsandiye: "Weke mînak em li ser Hanokê ku bi îteata xwe rast dihat dîtin û mirin

nedît û firiya bi ezmanan de, bisekinin...” Nîşana ku Xweda ji Hanok kêfxweş bû, îteata wî bû.

Di Nivîsên Pîroz de zilamê din yê ku di nava parvekirineke nêz de bi Xweda re dimeşe, Nûh e. Di derbarê wî de Nivîsên Pîroz wisa dibêjin:

> “Serpêhatiya Nûh ev e: Nûh mirovekî rast û di nav nifşê xwe de kamil bû û *bi Xwedê re diçû.”* (Destpêk 6:9, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Eynî weke Hanok, nîşaneya jiyana Nûh ew bû ku ew jî di rêya Xweda de dimeşiya. Bi gotineke din îteat ji xwestekên Xweda re dikir. Ev zilam tenê dijberên Balamê ku ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî îteat dikir. Balam zanîbû ku di rewşeke eşkere ya bêîteatiyê de, wê tu kes neyê pîrozkirin û di dawiya dawî de wê bê darizandin. Ji ber vê ne bi azweriya ku xwesteka Xweda bîne cih, ji bo berjewendiyên xwe bi awayekî ne jidil îteat kir û gotina Xweda serobino kir. Xwesteka Xweda ne armanca wî bû, tenê ji qanûnekê pêk dihat.

Rewşa Dawid îcar tam berevajî vê rewşê bû. Di Nivîsên Pîroz de, derbarê wî de wisa tê gotin:

> “Piştî ku ew ji text anî xwarê, Dawid rakir ku bibe padîşahê wan û li ser wî weha şahidî kir û got: Min Dawidê kurê Yêşa, zilamekî li gor dilê xwe dît. Ewê hemû daxwazên min bîne cih.” (Karên Şandiyan 13:22)

Tirsa REB ne tenê gava em îteat bikin lê ew dema gava em hemû xwesteka Wî tînin cih e. Xwestekên Wî weke ku yên me ne, em armanc dikin ku bînin cih. Em arezûyên di dilê Wî de, li ser xwe ferz dikin. Îteata heqîqî ev e.

## GIYANEKÎ OLDAR

Gava min Reb diheband, ez ê tu carî wî kêlîkê ji bîr nekim gav ji nişka ve baz da û ji dilê min re wisa got: "John tu dizanî bê giyanekî oldar çi ye?"

Xweda gava pirsekê ji min dike, ez ji zûde hîn bûme ku ne li dû agahiyekê ye ku ji min bistîne. Di esasê xwe de sedema ku pirsan dike, hînkirin an jî wehiya bi sînor ya ku em xwediyê wê ne, dixwaze firehtir bike. Li ser tevgerên kesên oldar min nivîsandibû û ez peyivîbûm lê min ev bersiv da pirsa Xweda: "Rebê min diyar e ku ez nizanim. Giyanê oldar çi ye?"

Li ser vê yekê bi dilê min re peyivî: "Giyanê oldar, ji bo xwesteka xwe bîne cih Gotina min bi kar tîne." Gotinên Wî di kurahiya dilê min de bi rojan olan da û bersiva gelek pirsan berdewam kir.

Tişta ku Balam kir tam jî ev e. Ji bedêla ku li arezûya di dilê Xweda de bigere, tenê ji bo berjewendiyên xwe armanc kir ku îteatê bike. Ji ber vê ferîşteya REB jê re wisa got: "Ji ber ku li ber min rêya te dibe helaqê" (Hejmara Çolê 22:32). Îfadeya hilweşandina di vir de; serobinkirin an jî dejerekirina Gotina Xweda û loma ji bo berjewendiyên me yên ezperestî ku em wan di dawî de bi kar tînin, pênase dike.

## HEBANDINA HEQÎQÎ

Eger hûn li jiyana Brahîm, Mûsa, Yeşû, Dawid, Ester, Danyel û kesên ku dane ser rêya Reb; binêrin û lêbikolin, hûn ê di jiyana hemûyan de vê hevpariya hevgirtî bibînin. Di bingeha nêzîkayiya wan ya Xweda de, îteata heqîqî ya ku ji dilê wan ji bo xwestekên

Xweda tê, heye. Xweda di serdema Peymana Kevin de, her kesên ku xwediyê têkiliya Wî ya peymanê bûn, ev bang ji wan re kir:

> "Şahdeyî kirine bapîrên we ji warê Misirê derxistime heta îroj, bi quwet şahdeyiyê li wan kirim." (Yêremya 11:7)

Reb; ji ber ku gelê wî guh neda gotinên Wî û li gorî xwestekên dilê xwe lê çûn, xemgîn bû. Li dilê Wî xwedî derneketin, berevajî vê bi gotinên Wî re hat astengkirin. Di encama vê de, di çarçoveya sînorên xeyal dikirin ku wê Xweda bi kêfxweşî bibîne de, li rêyên ku arezûyên xwe bînin cih geriyan û bi Xweda re nebûn xwediyê hevpariya nêz. Îteateke jidil, ji bo nêzîkayî ava bibe heta tu bêjî bes girîngiya wê heye. Di Peymana Nû de Îsa wisa dibêje:

> "Lê belê wext tê û niha ye: Yên ku bi rastî diperizin, ewê bi ruh û bi rastiyê biperizin Bav. Çimkî yên ku Bav li wan digere ew in ku bi vî awayî diperizin wî. Xwedê ruh e û yên ku diperizin wî, divê bi ruh û bi rastiyê biperizin wî." (Yûhenna 4:23-24)

Di van çend hevokan de pir tişt hene. Pêşî, bala xwe bidinê ku Bav li kesên wisa dihebînin "digere." Beşa berî vê bînin bîra xwe, em peyivîn bê me çawa bi arezûyeke azwer dixwaze û armanc dike ku bi me re hevpariyê ava bike. Careke din, gotinên Îsa vê yekê derdixîne holê.

Ya duduyan jî, li wan kesên ku Wî di giyan û rastiyê de dihebînin, digere. Em li ser hebandinê bipeyivin. Gava min Pirtûka xwe ya Pîroz dixwend, ez ê tu carî wê dema ku Giyanê Pîroz di dilê min de ji min re wisa digot, ji bîr nekim: "Hebandin ne xwendina bi hêdî ya îlahiyekê ye!" Vê gotinê di cih de bala min kişand.

Gelek kes hebandinê wisa dibînin: Îlahiyeke bi hêdî tê gotin. Li herikandina merasîma dêreke ji rêzê bifikirin: Em tên civînan

û bi pesnan dest pê dikin û piştre hebandin tê, dûra daxuyanî, pêşkêşî, waaz û ya dawî ji bo tobeyê banga kursiyê. Dêrên kevneşopî gava weşanên çapkirî bi kar tînin, em mizgînxêr me yên xwe tenê ji ber kirine lêbelê em pesnê xwe didin ku ji aliyê giyanî ve hatine bi rêvebirin an jî azad in. Îcar gava em bên hebandinê, ji bo kêm kesên ferqa di navbera pesindayîn û hebandinê de nizanin, pesindayîn gotina bi xurt ya îlahiyan e û hebandin jî gotina bi hêdî ya îlahiyan e. Ya rastî tiştekî henek e, em ji pirtûkên îlahiyan xelas bûn lê em di projektorên ku perdeyên wan fireh in de awiqîn. Ji ber vê gava em peyva hebandinê bi kar tînin, ji bo gelek bawermendan tişta pêşî tê bîra mirov, gotina bi hêdî ya îlahiyên ku di CDyekê de, di vîdeoyek muzîkê de an jî ya di ayînekê de tê gotin.

Gava Reb ev ji min re got, di cih de min Pirtûka xwe ya Pîroz ji destên xwe danî û min wisa got: “Rebê min, ez nizanim bê hebandin çi ye. Ji kerema xwe re ji min re bîne ziman.”

Li ser vê pirsê bi îfadeyeke zelal û eşkere got: “Tarzeke jiyanê ye!”

Di cih de mînakek da min. Wisa got: “Kurikê min, li vê bifikir: Tu sibehê şiyar dibî û Lîsa ji bo zarokan ji dibistanê re amade bike pêdiviya wê bi alîkariyê heye lê tu dibêjî ez pir mijûl im. Piştî vê bi hinekî din dîsa pêdiviya wê bi alîkariyê çê dibe û tu dîsa dibêjî ez mijûl im. Pişt re dixwaze tu alîkariya wê bike ku hûn firavînê amade bikin lê careke din tu dibêjî ez pir mijûl im. Piştî nîvro ji te rîca dike ku tu herî ji dibistanê rahije zarokan lê tu dîsa heman bersivê didêyê. Ji bo amadekirina şîvê û danheva şîvê, dîsa alîkariyê dixwaze lêbelê careke din bersiva ku tu dibêjî ez pir mijûl ji te distîne.”

Reb berdewam kir: “Wê êvarê piştî zarok radikevin xew îcar aniha tu tiştekî taybet jê dixwazî, ango tu dixwazî hûn bi hev şa bibin. Bi vî awayî tu jê re peyvin nazik dibêjî, ‘Delalîka min ez pir ji

te hez dikim.' Bi peyvên wisa nermik tu nêzî wê dibe."

Pişt re ev ji min pirsî: "Wê bertekeke çawa bide gotinên hezê û nêzîkayiya ji bo zayendiyê?"

Min wisa bersiv dayê: "Bêguman wê bêje ez teqez naxwazim."

Pişt re wisa got: "Tu mafdar î, wê çima ji te re bêje na gelo?"

Min wisa bersiv dayê: "Ji ber ku nêzîkayiya zayendî sibehê dest pê dike û êvarî bi têkiliya zayendî re digihê asta herî dawî."

Gava ez li ser tiştên ku min ji Xweda bihîstine difikirim, ez bi rastî jî bi wî awayî nêzî jina xwe bibûma, min ferq kir ku wê hezkirina min ne di çalakî û rastiyê de, wê tenê di peyvê de bûya. Mêrekî ku her dem bi vî awayî nêzî jina xwe dibe, wê xwe bixapîne.

Pişt re Reb wisa got: "Kurikê min, di seranserê hefteyê de gelek zarokên min yê ku ez bala wan dikşînim ser xwe hene lê min nedîtî dihesibînin. Ez hewl didim ku ji cîranê xwe yê li kêlekê re xizmetê bikin lê ya li min guhdar nakin ya jî rêliberxistina min ditepisînin ji ber ku ya mijûl in ya jî dixwazin bidin dû zewqa ku pilana wê kirine. Gava ez ji wan dixwazim ku pêşkêşiyê bikin û xizmeta dêra xwe, civaka xwe an jî ya malbata xwe bikin, li min guhdar nakin. Pişt re tên perestîşê û ji min tiştekî ango bereketê dixwazin û ji bo min dest bi îlahiyên hêdî yên ku bi gotinên hezkirinê tije ne, dikin û ji vê re dibêjin hebandin. Hebandin ne ev e, ev tenê îlahiyeke bi hêdî ye!"

Ez matmayî mam. Min fêhm kir ku têgihiştina min ya hebandinê xwaromaro ye. Pişt re min tiştekî ku heta wê kêliyê qet ferq nekiribû, kifş kir. Destûrê bidin min ji bo ez pirsekê ji we xwendekaran bikim: Di Pirtûka Pîroz de peyva hebandinê cara pêşî di kuderê de derbas dibe? Ev pirs girîng e ji ber ku gava hûn pirtûkekê dinivîsînin û danasîna termeke nû ya ku haya gelek kesan jê tuneye, hûn dikin; ji sisê tiştan divê hûn yekê jê bikin: kifşkirina pênaseya wê, pêşkêşkirina mînakeke ku wateya wê

disêwirîne an jî bikaranîna peyvê ku wateya wê bîne ziman. Di Nivîsên Pîroz de peyva hebandinê cara pêşî di beşa 22yem ya Destpêkê de em dibînin. Wisa dibêje:

> "Wî ji xulamên xwe re got: Hûn li vir li ba kerê bimînin. Ez û kurik emê herin dera hanê *biperizin* û werin." (Destpêk 22:5, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Brahîm wê bi Îshaq re îlahiyeke di tempoyeke hêdî de negotibûya. Wê xezîneya xwe ya ku pir qedir û qiymet didayê, wê teslîmî mirinê bikira, sirf ji bo ku Xweda wisa xwestibû! Ango weke hûn dibînin hebandin jiyaneke îteatê ye. Ha ji ber vê ji gelê xwe yê ku jê re newayan dibêje re, bi awayekî eşkere wisa dibêje:

> "Şemateya qesîdeyên xwe ji min dûr bibe; ji ber ku ez ê ahenga harpa te jî guhdarî nekim. Tenê bila maf mîna avan û dad mîna çemekî xwurt bıherikin!" (Amos 5:23-24)

Ez tevlî gelek perestîşa dêrên ku li wan muzîkên xweş û bi bandor lê dixin, bûm. Lê dîsa jî hebûna Xweda ya xuyayî li wir tunebû. Di rewşên wisa de bi piranî pêşî bi hewldanê ez li dilê xwe dikolim û ji Giyanê Pîroz wisa dipirsim: "Min tu aciz kir an jî min guneh kir gelo?" Bi piranî di kurahiya dilê xwe de, ez hîs dikim ku min guneh nekiriye û bi vî awayî ez fêhm dikim ku pirsgirêk ji ber mirovan e. Ji vir şûnde derbarê tirsa Reb û îteatê de, ez bi ewlehiyê waazan didim. Di atmosferên wisa de, hema bêje her dem, di dawiya waazê de ez dibim şahidê ku ji sedî pênciyê qelebalixê bersivê dide banga tobeyê. Piştre heman îlahî û bi koma hebandinê re ez têm perestîşa piştî vê û hema bêje her dem hebûna Xweda xwe bi awayekî bêhempa nîşan dide. Çima wisa dibe? Hebandina heqîqî jiyana îteatê ye û ji jiyaneke wisa weke di ayetên jor de pêk tê, wê ne newayên ku Xweda aciz bikin,

wê newayên hebandinê yên ku Wî kêfxweş bikin, jê biherike. Ji bedêla ku ez jina xwe îhmal bikim, piştî rojeke ku min hezkirina xwe nîşanî wê daye, ji nêzîkayiya min ya li hemberî wê ji bo têkiliya zayendî tu ferq tuneye.

## HEBANDINA BI RASTÎ

Îsa dibêje ku Bav li wan kesên ku di giyan û rastiyê de wî dihebîne, digere. Terma hebandina Xweda ya di giyan de, di beşên pêşiyê de em ê bi awayekî berfireh li ser bisekinin. Aniha em bi Wî re li ser hebandina bi rastî bipeyivin. Peyva ku di Grêkî de tê wateya "rastî"yê aletheia ye. Di Ferhenga Vine'yê de ev peyv wisa tê pênasekirin: "Tişta bingehîn ya ku di bin tişta xuyayî de veşartiye, bingeha heqîqî û aliyê xuyayî yê tiştekî."

Ez ji vê pênaseyê hez dikim ji ber ku tişta Îsa radigihîne bi awayekî zelal berçav dike. Diyar dike ku hebandina heqîqî, di asta bingehîn ya mirovekî de ango di dilê wî de pêk tê. Ji bo alîkariya daxuyaniyê bike, destûrê bidin ez sê astên ragihandinê pênaseya wan bikim.

Asta pêşî ya herî kêm, ew asta ragihandina devkî ye. Îsa, vê di mînaka bavê ku dixwaze her du kurên wî li nav rez bişixulin de, li ber çavê me radixîne (Metta 21:28-31). Ji kurikên wî yekî jê got: "Helbet bavo!" lê neçû. Kurikên din got: "Ez naçim!" lê pişt re poşman bû û çû. Li ser vê Îsa got, yê ku xwesteka bavê xwe anî cih ne yê ku pêşî got "Belê!" yê ku got "Ez naçim!" bû. Ji ber vê çalakî ji gotinan bêtir awayekî ragihandinê ne.

Yaqûb jî bi van gotinan tîne ziman ku ragihandina bi gotinan ango ya devkî ragihandina herî qels e: "Eger birayek an xwişkek tazî û bêyî xwarina rojane be û yek ji we ji wan re bêje: Bi xêr û silamet herin, germ bibin û têr bibin, lê hûn hewcedariya wan a bedenê nedin wan, hingê çi feyde heye?" (Aqûb 2:15-16). Elçî

Yûhenna jî vê rastiyê bi van gotinan piştrast dike: “Eger malê dinyayê bi kesekî re hebe û birayê xwe di rewşeke hewcedar de bibîne û dilê wî pê neşewite, çawa hezkirina Xwedê di dilê wî de dimîne?” (Yûhenna I, 3:17).

Ji bo heman rewşê bi hezaran senaryo dikarin bên nivîsandin. Dîsa weke mînak mirov dikare van bide: Zilamekî ku ji jina xwe re dibêje ez ji te hez dikim lê bi wê re wext derbas nake an jî jinikeke ku dibêje ez ji mêrê xwe re hurmetê digirim lê guh nade lîmîta qerta xwe. Ez dibêjim wê fêhm kir ku wê dawiya vê lîsteyê neyê. Yûhenna di nameya xwe de wisa berdewam dike:

> “Zarono, ne bi gotin û peyvê, lê bi kirin û rastiyê em hez bikin.” (Yûhenna I, 3:18)

Bêguman divê em bi peyvên xwe hez bikin lê jidilbûn û tevgerên me yên ku van gotinan piştrast bikin tunebin, ev dibe durûtî. Bala xwe bidinê ku dibêje bi “jidilbûn û tevgeran.” Ev du astên ragihandinê yên herî bilind in.

Asta piştî va çalakî ye lêbelê asta herî bilind ya ragihandinê ne ev e û ji ber dibe ku çalakî dijberî rastiyê be, dikare bi hêsanî ji rê derxe. Weke mînak Pavlûs wisa dibêje: “Eger ez her tiştê xwe bi alîkarîtî bidim û bedena xwe ji bo şewitandinê teslîm bikim, lê hezkirina min tune be, qet feyda min jê tune” (Korîntî I, 13:3). Çalakiyên ku di vê ayetê de behsa wan dike, mirov dikare wan weke asta herî bilind ya hezkirinê bibîne. Lêbelê ev çalakiyên ku mezin xuya dikin, dibêje di dilê we de hezkirina Xweda tunebe jî hûn dikarin pêk bînin.

Ev yek me dibe asta ragihandinê ya herî bilind ango me dibe ber bi dil ve. Ev der asta bingehîn ya mirov e. Yûhenna û Îsa asta ku bi gotinên rast an jî jidil pênase dikirin ev der e. Niyet û fikrên dilê me, rastiya hebandina me derdixîne holê lêbelê mirov van

nikare ji Gotinên Xweda veqetîne. Tê gotin ku divê em dilê xwe bi hemû hewldana xwe biparêzin ji ber ku hêzên jiyanê ji wir diherikin. Eger bên îhmalkirin bi rehetî em dikarin bên xapandin. Dilekî bi serê xwe ku ji rêliberxistina Giyan û Gotina Xweda bêpar maye, ji her tiştî bêtir xapîner e.

Xweda ji gelê xwe re vê tîne ziman: “Heger hûn dilxwaz û guhdar bin, Hûnê berê herî baş ê welêt bixwin” (Îşaya 1:19). Bala xwe nedin “hûn li gotinê guhdar bikin”, bala xwe bidin “hûn dilxwaz û li gotinê guhdar bikin.” Mirov kesekî xwestîner be ev bi tevgera dilê mirov re girêdayiye. Gava ez tiştekî ji kurikê xwe dixwazim ji bo bike, dibe ku di cih de li gotina min guhdar bike û dibe ku tebitî xuya bike lê di seranserê vê demê de di nava xwe de diqeliqe. Di rastiyê de an jî jidil li gotinê guhdar nake lê weke ku wisa ye xuya dike. Yûhenna dibêje ku divê em Xweda û mirovan bi qasî ku di tevgerê de hez dikin, divê em wan jidil ango di asta dil de ji wan hez bikin: “Û bi vê yekê emê bizanin ku em ji rastiyê ne û li ber wî emê dilê xwe rihet bikin” (Yûhenna I, 3:19).

Gava ku Xweda di vê meseleyê de ez hişyar kirin ez ê tu carî ji bîr nekim. Ji bo ez ji her gilî û gazinan birevim, min pir hewl dida. Min fêhm kiribû ku gazinkirin li hemberî karakterê Xweda heqaret e. Ji ber ku gazinkirin ji Xweda re wisa dibêje: “Ji tişta tu dikî hez nakim û ez di şûna te de bûma min ê ne wisa bikira.” Ev kêmasiya tirsa pîroz e û Xweda ji vê nefret dike. Ya rastî tişta ku fersenda bi destxistina welatê Îsraîliyan yê ku soz ji wan re hatibû dayîn, ji dest berda gilî û gazin in. Ji ber vê ev bû çendayek min gotinên bi gilî û gazin nedikirin û di esasê xwe de min bi vê tevgera xwe serbilindî dikirin. Lêbelê gava ez sibehekê şiyar bûm, min bihîst ku Giyanê Pîroz bi awayekî eşkere wisa got: “Ez gazina dilê te dibihîzim!” Ez sar sekinîm, gava ez li wir bi awayekî şaş disekinîm, ji ber xurûra xwe min fêhm kir bê ez çiqasî hatime xapandin. Hebandina min ya Xweda ne jidil bû û ji bo ez xeteya dilê xwe eşkere bikim, ronahiya

gotina Wî ya erzşkerandinê pêwîst bû. Di cih de min tobe kir û ji wê demê ve ji ber ku bi vî şiklî erza min neşikerandiye, ez bextewar im. Ji bo dilxweşiyê spas ji Xweda re!

Em careke din di bin vê ronahiyê de li pênaseya rast ya Ferhenga Vine'yê, binêrin. Di vê ferhengê de wisa hatiye pênasekirin: Di bin tişta rast ya xuyayî de weke temelê bingehîn û weke tişteki xuyayî û navika heqîqî, derbas dibe. Dibe ku em bi rehetî ji rastiyê dûr bikevin. Ezê mînakekê bidim. Em dikarin ji Reb re duayan bikin û newayan jê re bixwînin lê dibe ku peyvek çi ye ji dilê me dernekeve. Dibe ku ji aliyekî ve em îlahiyan bibêjin ji aliyê din ve em bifkirin ku em çiqasî birçî ne, li pevçûna zarokan ya wê sibehê fikirîne û dibe ku piştî perestîşê me ji xwe re pilana rojeke xweş daniye û hwd. Em dikarin duayan bikin û bibêjin "Rebê min em spasdarê te ne." Lêbelê dibe ku ji ber rewşeke zor ya ku bi rojan e em di nava de ne, em van gotinan dikin. Bi rastî em spasdar in an ji ber ku karên me weke em difikirîn pêk nehatin, em di kurahiya dilê xwe de Xweda sûcdar dikin gelo? Ax, dawiya lîsteyê nayê!

Hebandina Xweda ya bi rastî ne tenê ew e ku mirov jê re îteatê bike, di heman demê de tişta ku hûn dixwazin bikin jê zewqê bistînin. Tişta rastî ya di dilê we de hûn ji Wî re bibêjin, ne ew tişta ku hûn weke rast e dizanin. Ne durûtiya li hemberî Xweda ye. Ez ji van gotinên Dawid hez dikim:

> "Ey gelê min, hergav tu bi wî ewle be, *Dilê xwe birêje ber wî,* Çimkî Xwedê stargeha me ye." (Zebûr 62:8, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Gava ez li hember Reb ji dilê safî rast bûm, min kifş kir ku nêzî min dibe. Eger ez hin tiştan veşêrim, min asteng dike û bi duayan nagihêm tu deverê, tam dikeve rewşa têkoşînekê ji ber ku ez nikarim bi Wî re têkiliyê deynim. Ew, ne li kesên ku bi helwesteke

sexte nêzî Wî dibin, Ew li kesên ku bi dilekî rast nêzî Wî dibin, digere. Carina ez meraq dikim kesên li perestgehan bang dikin û dibêjin: "Ez spasdarê te me Îsa… Hellelûya… Hemd bo Reb!" Gelo ev kes "jargona Xirîstiyaniyê" dubare dikin an ji kurahiya bingehîn ya dilê xwe dipeyivin. Ev rewş ji rewşa zilamekî ji bo jina xwe sakîn bike û di ser re dibêje: "Ji te hez dikim, cana min" tu ferq tuneye. Lêbelê zilamê ku hemû bala xwe dide jina xwe û ji dil û can jê re dibêje: "Ji te hez dikim." ev rewşeke pir cuda ye.

Ji navika hebûna me ya ku ji jiyana hebandinê ya heqîqî ya ku bi îteatê tê îfadekirin, wê newayên hebandinê jê biherikin. Di bedena Mesîh de; jin û mêrên xelatdar yên ku îlahiyên pesindayîn û hebandinê diafirînin, hene. Ev nivîskarên Zebûrê yên roja me ne. Hinek jê jiyaneke hebandina heqîqî dijîn, yên din bedenî û dinyayî ne. Yên bi qilêr ji ber xelatên xwe hîn jî dikarin newayên pir xweş derxînin holê lêbelê gava dibêjin hebûna Reb ya pîroz xuya nake. Tenê yên pak û paqij gava xizmeta Reb û gelê wî dikin, hebûna Xweda ya berz û bala hildigirin.

## SOZA ÎSA YA KU WÊ XWE NÎŞAN BIDE

Hebandina Xweda ya bi rastî, bi dilên rast û durust re hebandina Wî ye. Di rastiya rastî de tirs û rêza li hemberî Xweda ye. Nivîskarê Zebûrê wisa dibêje:

> "Xwezî bi wî gelî ku dizane bi şahî biqîre! Û di ronahiya rûyê te de dimeşe, ya Xudan." (Zebûr 89:15)

Xweda li kesên ku Wî bi kêfxweşî dihebînin û dizanin bijîn digere. Kesên wisa wê di hebûna Wî de bimeşin. Xweda wê xwe nîşanî wan bide û wê ew Xweda ji nêz ve nas bikin. Îsa ev wisa aniye ziman:

> "Piştî demeke kurt, êdî dinya min nabîne, lê hûnê min bibînin. Madem ez dijîm, hûn jî, hûnê bijîn. Wê rojê hûnê bizanin ku ez bi Bavê xwe re me, hûn bi min re ne û ez jî bi we re me. Yê ku emrên min qebûl dike û wan tîne cih, ew e yê ku ji min hez dike. Yê ku ji min hez dike, ewê ji aliyê Bavê min ve bê hezkirin. *Ez jî, ezê ji wî hez bikim û xwe ji wî re eşkere bikim."* (Yûhenna 14:19-21, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Yên ku bi fermanên Xweda dizanin û wan tînin cih, yên ku bi rastî Wî dihebînin û ji kesên wisa re soz hatiye dayîn ku wê Wî bibînin. Lêkera "nîşankirinê"; bînin bîra xwe ku tê wateya alema xuya nake dide xuyakirin, alema nayê zanîn tê zanîn. Di wergera Peymana Nû ya bi şîroveya Standard ya Amerîkayê de, ayeta dawî daxuyaniya wê wisa ye:

> "Ez ê jî jê hez bikim, ez ê bihêlim ku min bi zelalî binîne û ez xwe ji Wî re bi rastî vebêjim."
>
> Kesên ku bi rastî Wî dihebînin, dikarin bi rastî Wî nas bikin. Weke dostên Wî yên rêzdar, wê xwe ji wan re eşkere bike. Vê gotinê elçî şaş kirin û yekî ji nava wan wisa pirsî:
>
> "Cihûda – ne yê Îsxeryotî – ji wî re got: «Ya Xudan, ev çawa dibe ku tê xwe ji me re eşkere bikî, lê xwe ji dinyayê re eşkere nakî?» Îsa bersîva wî da û got: Eger yek ji min hez bike, wê gotina min bigire. Bavê min jî wê ji wî hez bike û emê bên ba wî û li ba wî cih bigirin. Yê ku ji min hez nake, gotinên min jî nagire. Gotina ku hûn dibihîzin ne ya min e, lê ya wî Bavî ye, ku ez şandime." (Yûhenna 14:22-24)

Weke hûn dibînin her kar tê û xwe li soza Mesîh digire. Tişta ku Xweda ji dilê min re got, bînin bîra xwe: "Hebandin, jiyana

îteatê ya ji arezûya dilê Xweda re ye." Gava me ji dilê safî ji Wî hez kir, ne ji bo serdanê ji bo di nava me de xaniyekî ava bike û bi vî awayî xwe bîne ziman, tê cem me.

Kesên ku ji Giyanê Xweda gelek xelatan distînin lêbelê gelek kesên ku bi hemû dilê xwe bi ya gotina Efendiyê xwe nakin, hene. Kesên wisa, ew kes in ku pir zû tên xapandin. Sedema vê ew e ku hebûna Reb bi waaz, îlahî, dua an jî bi xelatên din yên xizmetê heta cihekî tên hîskirin. Meseleya Balam jî wisa ye, ku ew xwediyê diyariya pêxembertiyê ye û bi vî awayî gava ku pêxemberîtiyê dike, hinekî hebûna Reb diceribîne, lê dîsa jî ji dilê Xweda dûr e.

Ev mirov gava xizmetê dikin, ji ber hebûna Xweda ya ku li ser wan bi bandor e, bi rehetî dikarin ferz bikin ku jiyana wan ji aliyê Xweda ve hatiye pesendkirin û dibe ku vê bi nêzîkayiya bi Wî re tevlihev bikin. Ev rewş ji rewşa zilamekî baş yê ku ji bo xwe karkerek girtiye ji bo ku ji wî re bixebite, wê hindik ferq hebe di navbera wan de. Ev karker ji ber ku her roj li cem kesê ku kar dayiyêye, dibe ku têkeve xeletiyê û xwe nêzî wî hîs bike. Weke hûn dizanin ev gumaneke xelet e û xapandin e. Îsa di derbarê gelek kesên ku dibêjin em Wî nas dikin de van tiştan dibêje:

> "Piştî ku malxwê malê rabe û derî bigire, hûnê li derve bimînin, dest pê bikin li derî bixin û bêjin: Ya Xudan, ji me re veke! Hingê ewê li we vegerîne û ji we re bêje: ‹Ez nizanim hûn ji ku derê ne.› Hingê hûnê dest pê bikin û bêjin: Me li ber te xwar û vexwar û te di kuçeyên me de hîn kir. Lê ewê bêje: Ez ji we re dibêjim ku ez nizanim hûn ji ku derê ne. Ji min dûr kevin, hey hûn hemû yên ku neheqiyê dikin!" (Lûqa 13:25-27)

Eger hûn van ayetan bi tiştên Metta nivîsandine re bixwînin (Metta 7:21-23), hûn ê bibînin kesên ku vê dibêjin yên ku bi navê

Îsa re mûcîzeyan pêk tînin. Ev kes xelatgir bûn lêbelê hebûna Reb ya ku bi xelatê re tevgeriya, bi pesendkirin an jî hebûna Wî ya nêz re, weke ku weke hev in tevgeriyan û wisa ferz kirin. Her çiqasî kesên ku digotin em Wî nas dikin, hûn dikarin wê matmayîna ku van kesên hatine vegerandin, bibînin. Di navbera hebûna Wî ya xaniyan ava dike û hebûna Wî ya xizmetê dike de, girîng e ku hûn fêhm bikin ku ferq heye.

Di bersiva ku Îsa di ayeta jor de da Yehûda (ne Îskaryot), hûn dikarin bibînin ku armanca Wî ew e ku bi kesên Wî bi rastî dihebînin re bijî. Qesta wan ya ji jiyana bi hev re ew tişt e ku bibin mal an jî xaniyê Xweda. Di vê xalê de ferqeke balkêş ya di navbera pîroziyên Peymana Kevin û Peymana Nû de, heye. Pîroziyên Peymana Kevin; ne xwediyê wê jiyana bi Xweda re ango ne xwedî îmtîyaza ku bibin xaniyê Wî bûn. Xaniyê ku Xweda tê de dijî; “Cihê Herî Pîroz” yê di çadir an jî perestgehê de cih digirt. Lêbelê em tertîbekê tê de dibînin. Di serdema Eli de; hem ji ber xwemezinkirina wî û hem jî ji ber ya gelê Îsraîlê, hebûna Xweda pir kêm bû, hema bêje qet tunebû. Lêbelê wan rojên ku gelê Wî bi hewldanê îteat jê re dikir, hebûna Wî pir bi hêz bû.

Di roja me de rewş weke hev e. Kesên ku bi giyan û bi rastî Wî dihebînin, yên ku jidil li gotina Wî guhdar dikin; hebûna Wî ya mayînde tecrube dikin. Xweda xwe nîşanî kesên wisa dike. Ax, çi hevkariyeke mezin li benda me ye! Xezîneyeke wisa bêhempa û mezin li benda me be, îcar bawermendek çawa bi bêîteatiyê an jî bi dinyayê dikare xwe bixapîne?

Soz daye me ku bi me re bijî û me ji xwe re bike mal û xaniyekî taybet. Gava ev kir, wê nîşanî me bide bê di rastiyê de kî ye an jî wê vê meseleyê zelal bike. Ax, fikra sozeke wisa mezin çi xweş e û ev soz ne tenê ji bo pêşerojê, ji bo niha jî derbasdar e! Di Pirtûka Pîroz de, ji wan gotinên herî pir jê hez dikim yek jê ev e. Ev Qiralê berz û bala “wê xwe nîşan bide.” Ango wê xwe bi min û we bide

nasîn. Di beşên pêşiyê de, bê vê di esasê xwe de çawa dike em ê lê bikolin. Lêbelê di beşa piştî vê de em ê li ser dilpakiya pêwîst û girîng ya ku bi kesên wê bi wan re bijî digere, bisekinin.

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Gava em li jiyana Hanok, Nûh, Brahîm, Dawid, Ester, Daniel û kesên din yên ku di Nivîsên Pîroz de derbas dibin, dinêrin û lê dikolin; em dibînim ku hevkariya hevpar ya di jiyana wan de ew e ku ne didin dû xwestekên xwe, îteatê ji xwestekên Xweda re dikin û vê jidil û can dikin. Eger îro roj we îteateke wisa di jiyana xwe de bi cih bikira wê di jiyana we di guhertinên çawa pêk bihatana?

2. Gava em li ser hevoka "Pesindayîn, gotina îlahîyên xurt e; hebandin, gotina îlahiyên bi hêdî ye." nivîskar ya ku bi zimanekî henekî gotiye difikirin, gelo hûn tevlî vê nirxandinê dibin? Derbarê hebandinê de li gorî peyama dawî ya ji Reb girtiye "şêweyeke jiyanê ye." Ev hevok bandoreke çawa li pêwistiya guhertina jiyana we dike?

3. Gava em li ser gotinên Îsa yên di ayetên Lûqa 13:25-27 û Metta 7:21-23yan de difikirin, hûn ê ferqa di navbera hebûna Wî ya mayînde û hebûna Wî ya xizmetê de çawa bînin ziman?

BEŞ 9

# MIROVÊN KU XWEDA BI WAN RE DIJÎ

“Tirsa REB û dilnizmî, cêwiyên hêza desthilatdariyê ne.”

Di vê beşê de, derbarê nêzîkayiya Xwedayê me yê ku hevkariya me jidil dilxwaze de, em ê hêmaneke din ya pir girîng kifş bikin. Di ayeta me ya me jêgirtin jê kiriye de dibêje: “Nêzîkî Xwedê bibin, ew jî wê nêzîkî we bibe.” Îcar aniha berî û piştî vê vexwendina bêhempa em li xwendinên xwe bikolin:

> “Loma dibêje: Xwedê li hember pozbilindan disekine, Lê keremê li nefsbiçûkan dike. Nêzîkî Xwedê bibin, ew jî wê nêzîkî we bibe. Xwe li ber Xudan nizim bikin, ewê we bilind bike.” (Aqûb 4:6-10)

Qêrîna di dilê Xweda de, di nava banga du dilnizmiyan de cih

digire. Sedemeke vê ya baş heye ji ber ku Xweda dibêje:

> "Çimkî Yê berz û bilind, yê ku her û her heye û navê wî pîroz e, wiha dibêje: Ez hem li dera bilind û pîroz rûdinim Û hem jî bi kesên nizim û nefsbiçûk re me. Ez rihê nefsbiçûkan Û dilê kesê nizim nû bikim." (Îşaya 57:15)

Yakûb dibêje eger em li ber Xweda bejna xwe bitewînin, wê Ew me bilind bike. Wê me bilindî kuderê bike? Xweda bi rêya pêxember Yeşeya re wisa bangî me dike: Cihê bilind û pîroz! Ne li mirovên ku wê serdana wan bike digere, li mirovên ku wê bi wan re bijî digere. Yakûb ji serdanekê zêdertir me vedixwîne tiştekî hîn mezintir. Her dem em tên vexwendin ji bo em di hebûna Wî de bijîn û weke ku Yeşeya dibêje ev vexwendin tenê ji bo kesên dilnizm e.

## TÊNEGIHIŞTINA DILNIZMIYÊ

Gelek kesên bawermend yên di bedena Mesîh de, dilnizmiyê an jî hêza dilnizmiyê fêhm nakin. Dibêjin qey dilnizmî; zeîfbûm, newêrekbûn, bêprensîpbûn e an jî heta dibêjin qey oldariya tûj e. Ya rastî gelek caran kesên dilnizm yê jidil weke kesên bêrêz tên tawanbarkirin! Em li Dawidê ku serdana birayên xwe yên ku li ser daxwaza bavê xwe çûbûn şerê bi Filîstîniyan re kiribû, bifikirin. Tê qada şer û birayên wî jî di nav de, dibîne ku hemû leşker pozîsyoneke şer ya nû xerîb, ferq dike: Xweveşartina li pişt latan ya ji ber tirsa Golgatê dew. Hîn dibe ku ev rewş ev çil roj e berdewam dike. Dawid pişt re qet ne bi dengekî tirsonek, ji kesên li cem xwe dipirse: "Ev Filîstiyê bêsinet kî ye ku gefê li artêşa Xwedayê Jîndar dixwe?" (Samûêl I, 17:26).

Ev pirs birayê wî Eliav aciz dike. Bêguman di dilê wî de ev fikir derbas dibe: "Birayê min yê biçûk ne tenê qure ye, di heman demê

de dibêje ez û ne kesekî din!” Li ser vê Eliav bi Dawid re dixeyide: “Ez bi te zanim tu çiqas qure û dilxerab î” (Samûêl I, 17:28).

Bise deqeyekê, kî qure ye? Hîn beşa berî vê Pêxember Samûel ji bo qiralê pêşerojê bi rûn mesih bike, hatibû mala Îşay û ev birayê nû çêbibû nehatibû mesihkirin. Bêguman ji ber di nava kurên Îşay de yê herî dirêj, yê herî bi qewet, yê herî qeşeng û yê herî biaqil Eliav bû; hem Îşay hem jî Samûel texmîn kiribûn ku wê ew bibe qiral. Lê Xweda biryara xwe bi awayekî eşkere diyar kir: “Min ew red kir” (Samûêl I 16:7). Tenê sedemek heye ku Xweda mirovekî red bike, ew jî nefsbiçûkî ye. Eliav, Dawid bi payebûnê tawanbar dikir lê ya rastî di dilê Eliav de nefsbiçûkî hebû. Lêbelê Xweda, ji Dawid re got ku ew zilamekî li gorî dilê Wî ye û bi vî awayî dilnizmiya Dawid pesend kir (Karên Şandiyan 13:22). Dawid ne zilamekî zeîf, newêrek an jî bêpirensîb bû, ji van tiştan pir dûr bû.

Dawid ev êrîşa devkî bihurand û nekir tiştek û bi baweriyeke mezin derket hemberî dew û îlan kir ku wê bîsteke din serî ji laşê wî jêbike. Pişt re Dawid baz da ber bi eniya dijmin ve, Golyat dikuje û serê wî jê dike. Em hinekî din li dilnizmiyê bikolin bê me çiqasî xelet fêhm kiriye. Hejmara Çolê ku yek ji wan pênc pirtûkên pêşî yên Pirtûka Pîroz e, tê de wisa hatiye gotin:

> “Mûsa ji hemû kesên li ser rûyê erdê dijiyan bêtir dilnizm bû.” (Hejmara Çolê 12:3)

Wey ji xwe re lê binêre, çawa beyaneke balkêş e! Eger mirov li xwe mukir bê, mirov helbet diwaze ku tiştekî wisa jê re bê gotin lê ew cegerê me tunebû ku em vê gotinê ji xwe re bibêjin! Çima? Ji ber ku tenê kesekî bêhurmet dikare di derbarê xwe de wisa bipeyive. Lê pirtûka Hejmara Çolê kê nivîsî? Bersiv: Mûsa. Wey ji xwe re lê binêre gidî!

Kesekî ku dibêje ez mirovekî dilnizm im, mirov nafikire ku

ew kes dilnizm e, îcar naxwazim weke kesê herî dilnizm yê li ser rûyê erdê, em qet li vê nafikirin! Xizmetkarekî ku di konferanseke Xirîstiyaniyê de dipeyive, hûn dikarin xeyal bikin ku ji guhdaran re wisa dibêje: "Ha vaye ji we hemûyam re tînim ziman, ez kesekî dilnizm im, naxwe ka bisekinin ez ji we re bibêjim." Kesekî wisa wê kêm bê dîtin, wê kes pê re nede û nestîne û wê weke kesekî jirêderketî bê îlankirin. Li ser vê yekê ka em binêrin bê Îsa çi gotiye:

> "Werin ba min, ey hemû yên westayî û bargiran, ezê rihetiyê bidim we. Nîrê min deynin ser stûyê xwe û ji min hîn bibin, çimkî ez nerm û ji dil nefsbiçûk im û hûnê rihetiyê ji bo canê xwe bibînin." (Metta 11:28-29)

Ango di esasê xwe de em wateya rastîn ya dilnizmiyê nizanin ji ber ku em difikirin ku ev term ew tişt e ku mirov derbarê xwe de qet nepeyive û weke wan kurmikên binê erdê yên bi kêrî tiştekî nayên, bijî û hew. Têkiliya vê fikrê bi rastiyê re tu carî tuneye.

## DILNIZMÎ TÊ PÊNASEKIRIN

Sisê hêmanên dilnizmiyê hene. Ya pêşî îteata me ya ji Xweda re ye, ya duduyan girêdana me ye bi Wî re ye û ya sisêyan jî fikra me ya derbarê me de ye. Em bi kurtasî li her yekê ji wan binêrin.

Ya pêşî îteata me; Yaqûb hema piştî ku derbarê dilnizmiyê de nivîsand îcar wisa berdewam kir: "Ji bo vê bi Xweda re girêdayî bin" (4:7). Ev gotin îteat û dilnizmiyê bi hev re girê dide. Reb her dem soz û pêşnûmeyan dide gelê xwe. REB dibêje: "Ji ber ku ez bi pêşnûmayên ji bo we fikirîme dizanim." "Ne fikren xerab, lê di dawiya we de, bona ku hêviyê bide we, fikren xweşiyê ne" (Yêremya 29:11). Ev soz xwestekên Wî ne û di nava me de cihê ku divê em herine, resmekî pêxembertiyê diresmîne. Em ji dilê

safî dixwazin ku ev bên cih, ji ber yê ku van di dilê me de bi cih dike Xweda ye (bnr. Zebûr 37:4). Em ê li cihê ku me di dilê me de dibêyê binêrin û wê têgihiştina me rêyeke bi mantiq diyar bike. Lêbelê gelek caran wê berê me bide rêyên ku bi temamî dijberî aqil in. Dilnizmiya bi rastî; dipejirîne ku hikmet û rêliberxistinên Xweda pir di ser yên me re ne û em fêhm nekin jî dihêle em îteatê hilbijêrin. Metelokên Silêman ayeta 3:5an dibeje: “Bi hemû dilê xwe ewle be bi Xudan, Xwe nespêre fêmdariya xwe.”

Brahîm, bi salan li benda soza ku wê kurê wî Îshaq çêbibe ma û her ku diçû li gorî aqil û li gorî rewşa xwezayî zewac û pişt re jî wê zarok çêbibûna. Brahîm dikarîbû bala xwe bide soza ku wê bibe bavê hemû gelan. Lê gava Xweda jê re got, sê rojan rêwitiyê bike pişt re Îshaq bike qurban; van hemûyan di şevekê de diguherîne! Pir jî ne bi mantiq e! Hûn dikarin têkoşîna Brahîm ya ji bo îteatê xeyal bikin gelo? Ev fermaneke bi êş bû û li gorî soza ku hatibû dayîn ne bi mantiq bû! Lêbelê ev ferman bi serê Brahîm neketibe jî bi dilnizmiyê îteat kir.

Di Pirtûka Pîroz de, gelek mînakên ne li gorî talîmatên Xweda ne xuya dikin an jî destûr dide şert û mercan hene. Lêbelê bi alîkariya îteatê em ê bibînin ku soza Xweda bi rêyeke din ku li derveyî têgihiştina me tê, pêk tê.

## DILSOZIYA ME YA BI XWEDA RE

Ya duduyan, dilnizmî weke dilsoziya me ya bi Xweda re ya bê şert û merc, dikare bê pênasekirin. Dawid weke yekî bêrêz tê xuyakirin lêbelê zanîbû ku hêza wî ji Xweda tê. Bi gotinên xwe got: “Xudanê ku ez ji lepên şêr û hirçan rizgar kirime, wê min ji destê vî yê Filîstî jî rizgar bike. Şawûl ji Dawid re got: De here, bila Xudan bi te re be” (Samûêl I, 17:37). Birayên wî li hêza xwe bawer bûn û ji ber vê gava xwe bi Dawid re didan ber hev, bêtir xwedî

tecrube û bi hêz bûn. Hêza Dawid ji bawerî û îteata wî pêk dihat.

Heman sekin di Kalev û Yeşû'ya de jî em dibînin. Ev her du ji wan diwazdeh rêberên ku hatibûn şandin da ku li wê erda ku soz ji wan re hatibû dayîn bigerin. Piştî çil rojî diwazdeh rêber ji bo ku derbarê erdê de raporê bidin Mûsa û gel, vegeriyan. Rapora hevpar ya deh kesan jê ev bû: "Em gîhaştin welatê ku te me şandine û bi rastî şîr û hungiv û mêwa wê ev e. Lê belê netewa ku li welêt rûdine xwurt e û bajar bi endezyarî û zehf mezin in" (Hejmara Çolê 13:27–28).

Va zilaman gava raporên xwe dan, deng bi qelebalixiyê ket. Li ser vê Kalev gel sekinand û bi ewlehiyeke tam ew qedimandin bi ber de. "Em hema derkevin û wir bi dest ve bixin; ji berk u di her rewşî de bona vêya qudreta me heye" (Hejmara Çolê 13:30).

Rêberên din di cih de li hember derketin: "Qudreta me nîne ku em li dijî wê netewê derkevin; ji ber ku ew ji me xwurttir in" (Hejmara Çolê 13:31).

Nivîsên Pîroz pişt re ji me re wisa dibêjin: "Em wan (Yeşu ve Kalev) bidin ber keviran…" (Hejmara Çolê 14:10).

Di çavê gel û rêberên din de; Kalev û Yeşû du kesên ku li xwe pir bawer bûn û xwe pir diecibandin. Rêberên ku digotin nikarin welat têxin bin destê xwe rast digotin. Rewş nirxandin û weke koleyên berê, dîtin ku nikarin gelên wisa bi hêz û yên bircên wan hene, fetih bikin. Ev ne pêkan bû. Ma ne jixwe tenê jin û zarokên xwe diparastin (bnr. Hejmara Çolê 14:3). Ev rêber, kesên yextiyar û zeîf jî di nav de, ew weke kesên dilnizm ku bi hemû gel ve dadiketin, didîtin. Ji aliyê din ve Kalev û Yeşû weke kesên qure ku li başiya kesên pêdiviya wan ji alîkariyê heye, nafikirin dihatin dîtin.

Lêbelê li çavkaniya vê baweriya wan bê ji kuderê derketiye guhdar bikin: "Lê li dijî XUDAN ranebin û hûn ji gele welêt ve netirsin; ji berk u ew nanen me ne; piştgirê ku wan diparêze, ji ser wan vekişiyaye û XUDAN bi me re ye; ji wan metirsin!" (Hejmara Çolê 14:9).

Yeşû û Kalev ne bi qabîliyetên xwe ve girêdayîbûn, ew bi hêza Xweda ve bûn. Zanîbûn ku wê wî welatî fetih bikin û wê ev xwesteka Xweda be. Rêberên din dibe ku weke kesên cidî hatibin dîtin lê dibe ku îcar ew weke kesên qure hatibin dîtin. Lê yê ku dilnizmî û quretî ji hev derdixist Xweda bû.

Jiyana Pavlûs jî mînakeke girêdanê ye ku bi dilnizmî an jî xweşiya Xweda ve girêdayiye. Derbarê xwe de wisa dibêje:

> "Em têrê nakin wek ku tiştekî ji me bi xwe ye em bifikirin; lê belê karîna me ji Xwedê ye." (Korîntî II, 3:5)

Û careke din:

> "Ji bo vê yekê ezê bi dilxweşî hê zêdetir bi bêhêziya xwe pesnê xwe bidim, da ku hêza Mesîh li ser min be. Ji ber vê yekê ez di ber Mesîh de bi lewazî, lome, dijwarî, cefa û tengahiyan kêfxweş im; çimkî kengê ez lewaz bim, hingê ez hêzdar im." (Korîntî II, 12:9-10)

Ev di jiyana Pavlûs de pêkahtinek bû: Her ku yextiyar bû bêtir bi dilovaniya Xweda ve hat girêdan û hindiktir jî bi hêz, qabîliyet û şiyanên xwe ve kêmtir hat girêdan. Her ku wî bi xwe hindiktir înkar dikir û bi Mesîh ve dihat girêdan, di biryara xwe ya mezinkirina Wî de, hîn bi ceger û bi hêz bû.

## EM XWE ÇAWA DIBÎNIN

Ev me ber bi hêmana sisêyan ya dilnizmiyê ve ango em xwe çawa dibînin ve dibe. Pavlûs gava pêşî xelas bû, hemû serkeftin û dev ji cihê ku bi dest xistibû berda berî ku bi Îsa re li hev rast bên, bi vî awayî xwe bi van tiştan biçûk didît û ev tişt hemû weke qirş û qal bi navkir. Ji bo gelek bawermendan jiyana berî ku Mesîh nas

bikin, ne tiştekî zor e ku wê jiyanê bi tiştekî nehesibînin.

Lê piştî xelasiya me îcar wê çi bi serkeftinên me yên bi Mesîh re bê? Ev gelek caran bi temamî çîrokeke cuda ye. Derbarê van serkeftinan de îcar ev gotin: "Birano, ez xwe hê gihîştî hesab nakim, lê ya ku ez dikim ev e: Ez tiştên çûyî ji bîr dikim û xwe dirêjî yên pêş dikim. Ez ji bo qezenckirina xelata ku Xwedê di gazîkirina xwe ya ezmanî de bi Mesîh Îsa pêşkêş dike, ber bi armancê ve dibezim" (Filîpî 3:13-14).

Piştî Pavlûs bawer kir bi salan weke elçî hat tayînkirin (bnr. Karên Şandiyan). Dana hikmetê û fersenda wehiya pîroz ya ku dîsa serkeftinê jê re bîne, dane wî. Li bajarên Asyayê û li her deverên Balkanan komên dêrê ava kirin. P.Z (Piştî Îsa an jî Zayînê) di sala 56an de ku di Korîntiyê de dest pê kiribû û ji dêrê re name nivîsandibû, em li dilnizmiya wî dinêrin. Yextiyarekî gihiştî yê di xizmeta Îsa de bû û berî mirina wî bi deh salan bû. Li ser vê em li gotinên wî guhdar bikin:

> "Çimkî ez, ji Şandiyan yê herî biçûk im. Ez ne hêja me ku Şandî bêm gazîkirin; ji ber ku min tengahî da civîna bawermendan a Xwedê." (Korîntî I, 15:9)

Dengê dilnizmiya di van gotinan de tê we? Ez dixwazim vê diyar bikim, ev ne dilnizmiyeke sexte ye. Dilnizmiya sexte ji bo xweşik bê xuyakirin ji siyasetê dizane vê çawa peyvên rast bi kar bîne lêbelê ne di dil de ne jî di fikir de kêmasiyek heye. Ev xapînok û li derveyî rastiyê. Lê di bin îlhama Giyanê Pîroz de, gava hûn Nivîsên Pîroz li pênûsê dixin hûn nikarin derewan bikin! Pavlûs bi rastî jî bi vî çavî li xwe nenêriya, wê destûr nedanayê ku vê hevokê binivîsîne. Ji ber vê Pavlûs gava got ku ez di nav elçiyan de yê herî ji rêzê me, ev di nav siyasetê de ne jargoneke rast bû, ev dilnizmiya bi rastî bû.

Lêbelê li hevoka Pavlûs ya piştî vê binêrin: "...lê ez ji wan hemûyan bêtir xebitîm" (Korîntî I, 15:10). Bise deqeyekê! Ma qey Pavlûs pesnê xwe bi xwe dide? Tu dibêjî qey aniha weke ku bi zimanekî din dipeyive. Piştî ku got ez di nava elçiyan de yê herî ji rêzê me îcar çawa çê dibe û dibêje, "Ji hemûyan bêtir min ked da"? Gava pêşî hat bihîstin weke bêhurmetiyê hat û weke tiştê cara pêşî gotiye hat lê ne wisa ye. Piştî vê îfadeyê, beyaneke din ya girêdana Pavlûs ya bi Xweda re tê:

> "Ya rast ne ez, lê belê kerema Xwedê ya bi min re xebitî." (Korîntî I, 15:10)

Bi dû vê de gotina ku dibêje elçiyê herî bi kêr nehatiye û her tişt bi daya qenciya Xweda ava dibe, tê. Xwe ji hemû tiştên ku biserkeftinê pêk dianî, veqetandiye. Haya wî jê heye ku her karê dike Xweda bi rê wî re van karan dike, ew di ferqa vê yekê de ye.

Pênasekirina Pavlûs ku xwe weke "elçiyê herî ji rêzê" dibîne, zor e ku mirov vê bipejirîne. Hem di dema wî de hem jî di seranserê dîroka dêran de, weke elçiyê herî mezin hatibû hesibandin. Îcar aniha piştî vê bi heft salan, berî mirina xwe bi sisê an jî çar salan, P.Z. di 63yan de em binêrin bê çi ji Efesiyan re nivîsandiye. Piştî nameya ku ji Korîntiyan re nivîsî û şûnde di nava wan heft salan de, pir kar kir ku heta wê demê di jiyana xwe de evqasî kar nekiribû. Di Nameya Efesiyan de xwe wisa tîne ziman:

> "Bi ser *ku ez di nav hemû pîrozan de yê herî kêm im jî,* ev kerem ji min re hat dayîn, da ku ez Mizgîniya dewlemendiya Mesîh a ku nayê salixdan ji miletan re bidim û plana bi sira ku ji demên bê destpêk ve li ba Xwedayê ku her tişt afirandiye veşartî bû, ji hemûyan re derxim ber ronahiyê, ku ew çi ye." (Efesî 3:8-9, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Berî bi heft salan Pavlûs xwe wekî “elçiyê herî bi kêrnehatî” tîne ziman, îcar aniha jî dibêje “ez di nava hemû pîroziyan de, yê herî bênirx im!” Çi?! Eger kesekî pesnê xwe bidaya wê teqez ev Pavlûs bûya û ji bîr nekin gava hûn Nivîsên Pîroz dinivîsînin hûn nikarin derewan bikin û hûn ê durûtiyê nekin. Xwe bi rastî jî wisa didît!

Ev pêşketin berdewam kir ji ber ku berî mirina wî di demeke pir nêz de, nameya ku ji Timoteos re nivîsî, wisa got:

> “Ev peyv dilsoz e û bi her awayî hêjayî qebûlkirinê ye, ku dibêje: Mesîh Îsa hatiye dinyayê, da ku gunehkaran xilas bike û ji wan ê herî gunehkar ez im.” (Tîmotêyos I, 1:15)

Êdî xwe ne weke elçiyê bikêrnehatî, heta ne weke pîroziyên bênirx, xwe weke gunehê herî nebaş dibîne. Bala xwe bidinê nabêje “Ez bûm” dibêje “Ez im.” Û di Mesîh de wehiya ku dihat halê afirandina nû ew bû, tiştên berê derbas bûne, her tişt ji nû ve çêbûye! (Bnr. Korîntî II 5:17). Tu carî ji bîr nekir bê çiqasî deynê mezin yê Xelasker di situûyê wî de ye. Her ku Pavlûs ji Mesîh re xizmet kir, xwe hîn bêtir biçûk dît û biçûk kir ji ber ku her diçû dilnizmiya wî mezin dibû. Baş e, ma gelo nabe her ku Pavlûs yextiyar dibû sedema ku qenciya Xweda ya li ser wî jî pê re mezin dibû, ev be? Ji ber ku Yaqûb ji me re radigihîne ku “keremê li nefsbiçûkan dike” (Aqûb 4:6). Ya din jî sedema ku rêyên Xweda ji Pavlûs re bên wehiykirin ku ev yek Elçî Petrûs matmayî bihêle, ma nabe ku ev be? Xweda bi rêya Yeşeya re dibêje, ne ku ez serdana kesên dilnizm dikim, ez bi wan re dijîm. Gava em bi Wî re jiyan em ê nêzî Wî bin.

## HÊZÊN CÊWÎ

Aniha em bi hêzên cêwî yên desthilatdariyê re li hev rast tên. Ev “tirsa REB û dilnizmî” ye. Bînin bîra xwe, di beşên derbasbûyî de me dît ku destpêka naskirina Wî ya ji nêz ve, tirsa REB e lêbelê aniha em dibînin ku heman tişt ji bo dilnizmiyê jî derbasdar e. Nivîskarê Zebûrê wisa tîne ziman:

> “Di riya edaletê de, ew e ji bo *nefsbiçûkan* rêber, Ew riya xwe nîşanî wan dide her û her.” (Zebûr 25:9, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Xweda rêyên xwe ji kesên dilnizm re diyar dike lêbelê piştî çend ayetan em vê dixwînin:

> “Her kî *ku bitirse ji Xudan,* Ew hînî wî dike riyan.” (Zebûr 25:12, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Ya rastî, kesên ji REB ditirsin bi rastî dilnizm in û kesên bi rastî dilnizm im ji REB ditirsin. Bînin bîra xwe ku Mûsa bi rê û rêbazên Xweda dizanîbû lê Îsraîliyan tenê karên Wî, ango bersivên duayên Wî dizanînbûn. Mûsa hem ji REB ditirsiya hem jî pir dilnizm bû. Hûn têkiliyê dibînin ne wisa? Gelê Îsraîlê ne ji REB ditirsiya (Dubarekirina Şerîetê 5:29) ne jî dilnizm bû (weke me di mînaka jor ya Yeşû û Kalev de dît).

Nivîskarê Zebûrê hema bêje bi qasî ku tirsa REB û dilnizmiyê ji hev nikare veqetîne, wan bi hev ve girê dide. Ev vê di Nivîsên Pîroz bi dehan caran dibînin. Mînakek jê ev ayet e:

> *“Tirsa Xudan şîreta* şehrezayiyê ye, Nefsbiçûkî şertê pêşî yê rûmetê ye.” (Şîretên Silêman 15:33, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Hêza cêwî ya desthilatdariya tariyê jî heye. Ev tam berevajî tirsa REB û dilnizmiyê ne, ev îsyan û qureti ye. Di Şîretên Silêman de em dibînin ku van didin ber hev:

> "Xelata nefsbiçûkî û tirsa Xudan, Jiyan, rûmet û dewlemendî ye. Li ser riya kesê dilxerab dirî û dafik hene, Kesê canê xwe diparêze, xwe ji wan dûr dixe." (Şîretên Silêman 22:4-5)

Dilnizmî û tirsa REB, ji xeynî ku têkildarî hev in, hûn dibînin ku bi nebaşiyê re li hev nakin? Îsa ji mirov an jî ji ferîşteyeke ji rêzê bêtir xwe biçûk kir. Ji ber vê ji kesên din bêtir berz û bala bû (bnr. Filîbî 2:8-9). Ji hemû dilpakiyan bêtir, kêfa wî ji tirsa REB re hat, ji ber vê hebûna Giyanê Xweda li ser Wî bê pîvan disekinî (bnr. Yeşeya 11:2-3, Yûhenna 3:34).

Bervajî vê, Şeytanê ku serê pêşî weke Keruvekî hatibû mesihkirin, ji ber pozbilindiya wî ji hemû kesên ku berî wî an jî piştî wî hatibûn bêtir, xwe mezin dît û bû yekî îsyankar. Ji ber vê ew daxistin "binê koncala mirinê" (bnr. Hezekîel 28:14-17, Îşaya 14:12-15).

Ji bîr nekin, Nivîsên Pîroz bi dehan caran dubare dikin ku Xweda li cihên bilind rûniştiye lêbelê hêzên şeytanî li cihên nizm disekinin. Di seranserê Nivîsên Pîroz de hûn ê gelek caran bibînin ku qureti û îsyan bi dilnizmiyê re; dilnizmî û tirsa REB jî bi bilindiyê re girêdayiye. Bilindbûn jiyana nêzî Xweda ye!

## KESÊN KU XWEDA LI DÛ WAN E

Xweda li hemberî kesên qure û îsyankar e (Aqûb 4:5) lê nêzî kesên ku jê ditirsin ango nêzî kesên dilnizm yê heqîqî dibe. Di Peymana Kevin de kesên ku di Nivîsên Pîroz de ji Xweda re hatine pênasekirin ku xizmeta Wî dikin an jî Wî dihebînin hene. Berx û

gayan weke qurbanan serjê dikin û li Cihê Pîroz daran dişewitînin û zad pêşkêş dikin. Lêbelê Xweda got li gorî Wî serjêkirina qurbanan li cem Wî weke kuştina zilaman e. Bi ser halan de pêşkêşkirina zad weke ku xwîna berazan jê re tînin, şewitandina daran ku dua û pesinandinê temsîl dike jê re weke hebandina pûtan e! Pişt re anî ziman bê ev yek çima wisa ye:

> "Çimkî gava min gazî we kir, we bersiv neda, Gava min got, we guhê xwe neda. Wan ya di çavê min de xerab e kir Û ya ku bi dilê min ne xweş e hilbijart." (Îşaya 66:4)

Xweda ji çi hez nake? Ji qurbanên ku îteatê nakin hez nake! (Bnr. Samûêl I 15:22). Bi gotineke din ji her awayê ku ji tirsa REB bêpar e.

Reb darbeyeke mezin li van cureyên "hebandin"an dixe. Lingên wan bi ser serê wan dixe. Hûn dikarin matmayîna van mirovan xeyal bikin? Difikirin ku xizmeta Wî dikin û kêfa Wî tînin lêbelê di rastiyê de kifş dikin ku îmana Xweda ji hebandina wan diçe. Lêbelê derbarê gelê xwe de, Reb ji cihê ku niyet lê nekiriye biçîne tu carî naçîne. Li cihê ku niyet lê nekiriye bînayekê lê bike tu carî hilnaweşîne. Ji ber vê pişt re tişta ji bo Wî balkêş tê dibêje û wan teşwîq dike:

> "Ez li vî kesê dinêrim, Li kesê bindest, ruhşikestî Û ji ber peyva min dilerize." (Îşaya 66:2)

Di vê ayetê de Îbraniya lêkera "qedirdayîn"ê "nabat" e. Di Ferhenga Strongs'ê de ev peyv tê wateya "nêrîna bi baldarî, memnûn, ecibandin û pêşwaziya bi eleqe." Ango di esasê xwe de Xweda wisa dibêje: "Ez kesekî wisa bi awayekî memnûn, diecibînim û eleqeyekê xweşik pêşwazî dikim." Bi îfadeyeke basît

dibêje: “Ez li kesên wisa digerim, yên ku ez didim dû wan ev kes in.” Nivîskarekî nûjen û mamosteyê Pirtûka Pîroz Tommy Tenney, pirtûkeke wî heye ez navê wê pir diecibînim: Li Dû Xweda. Ev nav dilê kesên ji Xweda hez dikin bi awayekî pir xweş pênase dike. Mirov li dû Xweda be ev tiştek e. Lêbelê Xweda li dû we be ev bi temamî tiştekî pir cuda ye! Tişta ku Xweda li vir dibêje tam ev e.

Em li ser Dawid bisekinin. Xweda, pêxemberê mezin yê Îsraîliyan Samûel şand mala Îşay. Heta ji ber ku Samûel ji xezeba Saûl ditirsiya serê pêşî nexwest. Lêbelê Xweda ferman lê kir ku here ji ber ku li dû kurikekî Îşay bû. Pêxember yek bi yek di ber heft kurikên mezin yên Îşay re derbas dibe û di dawiya dawî de Reb wisa jê re dibêje: “Na Samûel, ne ev kurik in, ez li dû kurikê por sor im ku aniha li çolê pezê xwe diçêrîne!” (Îfadeye nivîskar).

Xweda ji ber çi ne li dû birayên wî yên mezin an jî ne li dû zilamên din yê Îsraîlê bû lê li dû Dawid bû? Bersiva vê di ayeta jor de ye. Ew ji kesên dilnizm, yên giyanê wan êşiyaye û yên ji gotinên wî dilerizin hez dike û li dû wan e. Kesên giyanê wan êşiyaye, di meseleya ku li ber Xweda sitûyê xwe bitewînin de zûtir tobe dikin. Wergereke din wisa ye: “Ji kesên dilnizm û tobekar, ji kesên ji min ditirsin û li gotina min guhdar dikin hez dikim” (TEV). Giyanekî êşiyayî û çilmisî, şêweyeke din ya dilnizmiya rastî û tirsa REB e. Ango kesên ku di esasê xwe de dilnizm in û ji Wî ditirsin, ango tîne ziman ku kesên li dû dilpakiya hêzên cêwî yên desthilatdariyê dimeşin, bi wan re ye! Ji ber vê wisa tê gotin:

> “Ew tinazên xwe bi tinazkaran dike, Lê ji nefsbiçûkan re keremdar e.” (Şîretên Silêman 3:34)

Û dîsa dibêje:

> “Çi mezin e qenciya te ya Xudan, Tu wê vedişêrî ji bo

> yên ku ji te ditirsin, Li pêş çavê her kesî, Li yên ku xwe dispêrin te, tu dikî qenciyan. Li hember fenên mirovan, Bi aştiya xwe ya parastinê, tu wan dinixêmî; Li hember zimandirêjiyan, Tu wan vedişêrî li holikê. (Zebûr 31:19-20)

Ha ji ber vê di Peymana Nû de ji me re dibêje, "bi dilnizmiyê tevbigerin" (Petrûs I 5:5) û "li vê dinyaya ku em lê li xerîbiyê ne, dema xwe bi tirsa Xweda re derbas bikin" (Petrûs I 1:7). Giyanê Pîroz Xweda; ji bo me zarokên xwe, ji bo em têkevin nav hevpariya di dilê Wî de, bi alîkariya Petrûs me bi van gotinan teşwîq dike.

Em bi qîma xwe ne. Xweda, ji bo em bi Wî re bimeşin rê li ber me vekiriye û em bi qîma xwe hiştine ku em vê bikin an jî nekin. Em çi Xweda û Bavekî bêhempa dihebînin! Îcar aniha em bi qîma xwe ne ku guh bidinê û bi dû banga Wî ya ku ji odeya xwe bang me dike, herin. Di beşên pêş de em ê nîqaş bikin bê van bi awayê fîîlî çawa dike!

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Di vê beşê de her çiqasî dilnizmî weke tiştekî zeîf, newêrek û tirsonek bê fêhmkirin jî, kesên bi rastî dilnizm in weke kesên bêrêz tên fêhmkirin. Gava hûn li vê mijarê difikirin, kesên ku di ewlê xwe de dilnizm in lê hûn wan weke kesên bêrêz dibînin, heye gelo? Eger bersiva we erê be, hûn ji vê nirxandina xelet dikarin çi hîn bibin?

2. Sê hêmanên dilnizmiyê -îteata Xweda, dilsoziya tam ya bi Wî re û nêrîna me ya derbarê xwe de- û li ser mînakên wan yên di Pirtûka Pîroz de, bifikirin. Eger hûn li xwe mukir bihatana û we bigota yek ji van zordariya min ya herî mezin e, wê ev kîjan bûya?

3. Di beşa 66an ya Yeşaya de, komek mirov li gorî Zagona Pîroz Xweda dihebandin. Qurbanên li gorî usûlê pêşkêş dikirin, dara li gorî usûlê dişewitandin û pêşkêşiyên li gorî usûlê li dar dixistin. Lêbelê Reb, ji ber bêîteatiya wan ji hebandina wan ne kêfxweş bû. Hebandina me ji aliyê rêberên bi qabîliyet û xelatgir ve bê bi rêxistin jî, ji kîjan aliyan ve dibe ku Xweda kêfxweş neke?

# MessengerX

***Sepana we ya rojane ya perwerdeya xwendekaran***

**Bi temamî belaş e!**

Tenê daxînin cîhaza xwe ya mobîlê û pêde herin!
An jî varyanta webê bi kar bînin:





**MessengerX.com**

## Bi 120 zimanan û hîn jî berdewam e

- Bi 120 zimanan naverokê bibînin û daxînin.
- Çavkaniyan bi hevalên xwe re parve bikin an jî koma xebatê ava bikin.
- Her dem naveroka wê nû dibe.

# Temaşe bikin. Bixwînin. Guhdar bikin.

Ji bo hûn qurs, e-pirtûkan, pirtûkên bideng û kurte fîlman temaşe bikin, bixwînin û guhdar bikin; vê pirtûkxaneya dewlemend kifş bikin.



## Di mijarên herî girîng de bi pêş bikevin

Van mijaran kifş bikin: rehên malbatê, têkiliyên baş, nasîna hevjîna xwe, xelasiya ji pornografiyê, avakirina bîr û baweriyê, guhdariya Xweda û pêşengiya kar û bar û hîn pirtir!

## Rêwitiya we ya pêşketinê


**MessengerX** ji bo hûn gava xwe ya din biavêjin, heye. Ji ber vê wê alîkariya we bike ku hûn bi pêş bikevin. Ji ber vê jî me alavên bi hêz yên ku alîkariya xwendekaran bike û rê li ber wan veke, ava kirin.



## Taybetmendiyên bêhempa yên ku hûn ê pir ji wan hez bikin!

- Alavên rehet û hêsan yên ku wê bihêle hûn notan bigirin û hetta wê bihêle hûn komên xebatê ava bikin.
- Bi alîkariya AirPlayê re hûn dikarin li ser televîzyona xwe û Chromecastê bar bikin.
- Li ser hemû cîhazên xwe pêşketina xwe qeyd bikin. Ji bo ragihandineke xurt favoriyên xwe li pirtûkxaneya xwe qeyd bikin.
- Ji bo gava hûn ne onlayn bin jî hûn bikaribin daxînin cîhaza xwe.
- Tişta hûn lê digerin ji bo hûn bê kêmasî bibînin, lêgerîneke xurt û parzûneke bêqusûr.
- Pirtûkên bideng, beşên li dû hev tên yên Pirtûka Pîroz ya bideng û hetta hebandinan hûn dikarin bi awayekî otomatîk guhdar bikin!

## MessengerX, bi qasî sê (1-2-3) gavan hêsan e.




**1** Sepana MessengerXê ji App Store an jî ji Google Playê daxînin.

**2** Hesabekî li ser navê xwe vekin û zimanê wê biguherînin.

**3** Çavkaniyên xwe yên sereke kontrol bikin, bixwînin, temaşe bikin, guhdar bikin, daxînin û parve bikin.

## Weke xwendekaran xwe perwerde bikin û piştre xwedekaran jî perwerde bikin

Weke endamê **MessengerX**ê, hûn ê alîkariya xizmeta çavkaniyan ji hemû mirovên li her aliyê dinyayê re bikin.

***Ji ber ku mafê her kesî heye ku hîn bibe!***

**MessengerX.com**

Daxîne ji ser App Store

Werbigire ji ser Google Play

</> Guncav e li ser hemû gerokên înternetê

BEŞ 10

# NÊZÎKAYIYA BI GIYANÊ PÎROZ RE

"Ez bawer dikim Kesê li dêrê herî pir tê îhmalkirin Giyanê Pîroz e."

Aniha em digihên beşa pirtûkê ya ku bi çar çavan ez li bendê bûm ku li ser bisekinim. Reb bi tevgereke çawa nêzî me dibe? Pêşî ez ji nû ve îfade bikim. Ew ji we bêtir bêriya we dike û vê bêrîkirinê li gorî ku hûn bêriya wî dikin, tîrtir dijî. Gotinên Mûsa bînin bîra xwe: "Ez Xudan im û navê min Xîret e. Xwedayekî xîretkêş im" (Derketin 34:14).

Berî çendakî gava min dua dikirin, min nizanîbû bê ez tam çi dikim û min wisa gilî û gazin dikirin: "Ya Reb, eger ez ê li vê dinyayê bi te re ne di nava têkiliyeke nêz de bim, ji kerema xwe re ji bo ez bi te re bim min bibe mala min ya li bihuştê!" Gava gotinên min ji dilê min dirijiyan, kabokên min hinekî dilerizîn. Min zanîbû tişta ez dixwazim, dibêjim lêbelê di cih de hişê min kir

qêrîn, “Berî niha te çi xwest?” Aqlê min li tiştên wisa bê divê ez li wan guhdar bikim an na, pirsî. Piştî çend seatan ez li balafireke ku diçe Phonenix Arizonayê siwar bûm, li cihê xwe rûniştim, min ji çenteyê xwe Pirtûka xwe ya Pîroz derxist û min vekir. Ayeta ku pêşî li ber çavên ket ev bû:

> “Ya Xudan, ez gazî te dikim, Ey zinarê min, tu negire gohê xwe li min; Eger tu gohê xwe nedî min, Ezê bibim wek wanên ku dişeqitin gorê.” (Zebûr 28:1)

Kirî ez ji cihê xwe biketama erdê. Dibetiya ku çavên min bitesadufî li vê ayetê ket çi ye? Bi temamî bi mijara ku berî çend seatan li ser difikirîm ve girêdayîbû. Min ji tepîna dilê xwe fêhm kir ku ev peyv ji cem Xweda tê.

Dawid dibêje, gava Xweda bi me re nepeyive wê tu ferq di navbera me û gunehkarekî ku here dojehê de tunebe. Ez Wergera Jiyana Nû bi xwe re digerînim, ji ber vê min ew vekir û lê nêrî û min dît ku bi wê tişta min wê sibehê dua jê re kirin re girêdayiye. Wisa digot: “Eger tu bêdeng bimînî, wê demê ez ê dev jê berdim û bimirim.” Tişta min jê gilî û gazin dikir tam jî ev bû. Her çiqasî min ev ayet gelek caran xwendibe jî, berê min tu carî di bin vê ronahiyê de nedîtibû.

Di cih de min fêhm kir ku ez ne berevajî xwesteka Xweda duayan dikim û bi alîkariya Giyanê Pîroz duayan dikim. Vê serpêhatiyê careke din piştrast kir ku Xweda naxwaze ji me re bêdeng be, berevajî vê dixwaze jidil û can bi me re di têkiliyê de be. Yek ji wan ayetên ez pir jê hez dikim van gotinên Dawid di xwe de dihewîne:

> “Ya Xudan, te got, Li rûyê min bigerin Dilê min ji te re got,
> Ez li rûyê te digerim.” (Zebûr 27:8)

Hûn bêrîkirina di dilê Xweda de dibihîzin gelo? Her yekî ji me vedixwîne: “Biqedimin, ez dixwazim bi we re bipeyivim, ya dilê xwe ji we re bêjim û tiştên bêhempa û mezin yên hûn nizanin pêş we bikim!” Divê ev jiyana her bawermendî pênase bike. “Divê em nêzî Xweda bibin” û gava em vê bikin Xweda mîsogeriya “wê nêzî me bibe” dide. Asta nêzîkayiyê ne Ew, em diyar dikin. Xweda, deriyê ku li odeyên Wî yên taybet vedibe, halêhazir vekiriye. Li benda me ye û ji bo em herin bang me dike. Bersivdayîn li ser me maye û em çiqasî bên bi nêz de, xwe û xwestekên xwe bêtir ji me re diyar dike. Berî vê vexwendina mezin careke din em li gotinên Yaqûb binêrin:

> “Ma hûn guman dikin ku Nivîsara Pîroz badîhewa dibêje: Xwedê bi hesûdî ruhê ku daye me dixwaze.” (Aqûb 4:5)

Ew bêriya me dike lê di asta hesûdiyê de. Di beşên derbasbûyî de me dît ku Xweda me arezûyên çavbirçî yên vê dinyayê re parve nake. Ji ber vê Yaqûb dibêje: “Hey zînakarno! Ma hûn nizanin ku dostaniya bi dinyayê re, dijminahiya bi Xwedê re ye? Loma kî ku bixwaze bibe dostê dinyayê, xwe dike dijminê Xwedê” (Aqûb 4:4). Tu ferq di navbera vê nêzîkayiyê û jinika ku mêrê wê pê re ne sadiq e, tuneye. Ev jinik wisa dibêje: “Tu nikare bibî hem xwediyê min û hem jî xwediyê dostika xwe, ji ber vê yekê ji me bineqîne! Eger tu wê bixwazî, tu min red dikî û ez ê herim.” Reb jî wisa ye. Ew me bi dinyayê re parve nake. Divê Ew bibe arezûya dilên me. Eger ne wisa be wê Ew bi xwe ji me re nebêje.

## BÊRIYA GIYANÊ KU DI NAVA ME DE BI CIH KIRIYE DIKE

Berî vê em li ser bêrîkirina Wî ya li hemberî me bi awayekî berfireh, sekinîn lê aniha divê em li ser peyva “Giyan” hûr bibin.

Di Nivîsên Pîroz de ku dibêje “Bêriya giyanê ku di nava me de bi cih kiriye, dike.” pir girîng e. Bala xwe bidinê nabêje “Îsayê di nava me de dijî!” Îsa ne li ser rûyê erdê ye, li bilindahiyê li aliyê rastê yê Xweda rûdinê û hema bêje ev bû du hezar sal li wir e. Roja ku Îsa hilgirtin asîmanan, ferîşteyan ji xwendekarên xwe re ev îlan kirin: “Celîlîno, çima hûn li vir radiwestin û li ezmên dinêrin? Ev Îsayê ku ji nav we ber bi ezmên ve hat hilkişandin, çawa we dît ku ew hilkişiya ezmên, wisa jî wê vegere” (Karên Şandiyan 1:11). Ewrekî bi awayekî fizîkî rahişt Wî û ji ber çavan dûr xist û soz ji me re hat dayîn ku wê bi heman awayî li me vegerîne.

Aniha min xelet fêhm nekin, Xelaskerê me yê bêhempa Îsa bêriya me dike lê ji çûna Wî de Kesê ku di nav me de ye Giyanê Pîroz e û di vê ayetê de yê ku bi taybetî tê nîşandan Ew e. Lêbelê Giyanê Pîroz, ji aliyê kesên ku bang navê Îsa dikin ve gelek caran tê piştguhkirin. Ya rastî, ez bawer dikim ku kesê li dêrê herî pir tê îhmalkirin Giyanê Pîroz e. Ka bifikirin, ma tiştekî pêkan e hûn bi kesekî di erebeya we de li cem we rûniştî û bîst deqiqeyan peyvekê nekin û herin? Lêbelê em gelek caran bi Giyanê Pîroz re vê dikin. Em li roja xwe difikirin an jî gava di erebeyê de diçin li muzîkên Xirîstiyaniyê an jî li radyoyê guhdar dikin lê em gelek caran fêhm nakin ku Ew bi me re ye. Li malê, li cihê kar û gelek cihên din ku wextê me belasebeb li wan deran diçe, em hevaltiya Wî ferq nakin. Lêbelê eger bê pirsîn hebûna Wî û teqez em dipejirînin ku di dilê me de dijî.

## ÎMAJA GIYANÊ PÎROZ YA DI HIŞÊ ME DE

Yek ji wan sedemên ku nahêle em hebûn û hevaltiya Wî ferq bikin ew îmaja ku derbarê Giyanê Pîroz de ye ku em xwediyê wê ne. Ji ber nivîsên me yên derbarê Wî de û yên ku waaz kirine, nepen e. Ya rastî, ji bo her cara ku ez dibihîzim ku weke

“heyberekê” behsa Giyanê Xweda tê kirin, eger min dolarek qezenc bikira heta niha ez ê bibûma milyoner. Mixabin, pir kes Wî weke “hebûneke pîroz” dibînin, ne weke Kesê Herî Pîroz ê ku dixwaze hûn bibin hevalê wî yê herî nêzîk. Eger em li ser Nivîsên Pîroz kûr bifikirin, em ê bibînin ku Ew xwediyê fikrekê (Romayî 8:27), xwediyê xwestekan (Korontî 12:11) û xwediyê hestên bi hezkirina Wî ya ji me re hatiye pênasekirin e. Ew dipeyive (Îbranî 3:7), ya rastî Ew eşkere dipeyive (Tîmoteos 4:1). Ew fêr dike (Korîntî I 2:13), dibe ku xeman bikişîne (Efesî 4:30), dibe ku heqaret lê bê kirin (Îbranî 10:29) û dibe ku derew li Wî bên kirin.

Dîtina me ya pêşî ya li ser wî bi gelemperî wêneyê kevokekê ye. Lê çima Ew weke kevokekê tê xêzkirin gelo? Ew carekê çi ye weke kevokekê xuya nebû! Her çar mizgînxêr jî dibêjin Giyanê Xweda “weke kevokekê” xwe li ser Îsa danî (Metta 3:16, Markos 1:10, Lûqa 3:22, Yûhenna 1:32). Ev yek Giyanê Pîroz nake kevokek. We bihîstiye ku ji bo hinekan dibêjin “weke ba baz dide” an jî “weke gayekî bi qewet e.” Ev şibandin wan kesan nake ba an jî ga.

Yekî din dibe ku wisa bibêje: “Erê lê gava Elçî Yûhenna li textê Xweda dinêrî, Giyanê Pîroz weke meşaleyan dît.” Belê, ev rast e ji ber ku wisa nivîsand: “Û li ber text heft xetîrên êgir yên pêketî hebûn, ew heft ruhên Xwedê ne” (Peyxam 4:5). Lê heman Yûhenna ev jî nivîsand: “Hingê li ber text û di navenda çar afirîdên jîndar û rihspiyan de min Berxek dît, wek ku şerjêkirî be. Heft strûhên wî û heft çavên wî hebûn. Evên ha heft ruhên Xwedê ne yên ku li seranserê dinyayê hatine şandin. Ew hat û kitêb ji destê rastê yê wî yê ku li ser text rûdinişt stand. Çaxê wî ew stand, çar afirîdên jîndar û bîst û çar rihspî li ber Berx deverû çûn ser çokan. Di destê her yekî ji wan de çeng û piyanên zêrîn ên tije bixûr hebûn. Bixûr duayên mirovên pîroz in. Û lavijeke nû distrandin û digotin: Tu hêja yî ku kitêbê bistînî Û morên wê vekî. Çimkî tu hatî şerjêkirin Û te bi xwîna xwe ji

her bavikî, ji her zimanî, Ji her gel û ji her miletî mirov ji Xwedê re kirrîn” (Peyxam 5:6-9). Li vir bi awayekî diyar behsa Îsa dike lê îmaja me ya derbarê Îsa de ne heywanek e! Bêguman em dizanin ku em weke Îsa ango di şuphê wî de hatine afirandin, em ne di şuphê heywanekê de hatine afirandin!

Giyanê Pîroz kesek e û em ji ber Wî hatine afirandin. Ax erê, di sûretê wî de! Li gorî afirandinê em dixwînin: “Xwedê got: Em mirovan di sûretê xwe de çêkin ku bişibin me” (Destpêk 1:26). Nabêje, “Ez mirovan di sûretê xwe de biafirînim.” Na; Bav, Kur û Giyanê Pîroz bi hev re mirov afirandin. Haya me ji erka Bav û Kur ya di afirandinê de heye lê Nivîsên Pîroz vê yekê jî bi awayekî eşkere diyar dikin: “Ruhê Xwedê ez afirandim” (Eyûb 33:4) û dîsa dibêje: “Tu Ruhê xwe dişînî, ew diafirin, Û tu, rûyê erdê nû dikî” (Zebûr 104:30). Ji ber vê gava Xweda got “em mirov di sûretê xwe de bifarînin” Giyanê Pîroz teqez di nava vê pêvajoyê de bû. Em di îmaja Bav, Kur û Giyanê Pîroz de hatin afirandin. Ew kesek e, ev her sê bi hev re kesê sêyem yê Xweda ye û ne bayekî mîstîk an jî çivîkeke ku li asîmanan difire.

Eger em ne di şuphê wî de bihatana afirandin, wê Meryem çawa ji Giyanê Pîroz bi halekî bimaya? Lêbelê Nivîsên Pîroz dibêjin: “Bûyîna Îsa Mesîh jî bi vî awayî çêbû: Diya wî Meryem dergistiya Ûsiv bû, lê berî ku ew bizewicin û bigihîjin hev, xuya bû ku ew bi Ruhê Pîroz bizaro ye” (Metta 1:18). Piştre ferîşteya Reb ji Ûsiv re wisa got: “yê ku di malzaroka wê de çêbûye ji Ruhê Pîroz e” (Metta 1:20). Eger Giyanê Pîroz “heyberek” an jî “tiştek” bûya, wê di malzaroka Meryem de çawa bi şikil bibûya? Ji Giyanê Xweda bi halekî ma. Ji bo kurikekî normal çêbibe, du kesên ku xwedî heman îmajê ne lazim in.

Ez hêvî dikim we dîtibe ku Giyanê Pîroz kesek e û di esasê xwe de kesekî bêkêmasî ye. Ji ber vê Pavlûs wisa bang bawermendan dike:

> “Kerema Xudan Îsa Mesîh, hezkirina *Xwedê û hevpariya Ruhê Pîroz* li ser we hemûyan be.” (Korîntî II, 13:13, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Bala xwe bidinê ku dibêje “Bila hevkariya Giyanê Pîroz bi we re be.” Bi salan ez li vê peyva “hevkariyê” xebitîm ji ber ku erezûya min e ku ez Xweda ji nêz ve nas bikim. Çi ferhenga Grêkî ya ku ket destê min, her dem min li vê peyvê nêrî. Yên li jêr îfadeyên diyar yên sereke ne:

- Hevaltî
- Parvekirina hevpar an jî têkiliya sosyal
- Şirîkatî an jî Tevlîbûna hevpar
- Têkiliya Beramber
- Nêzîkayî

Hin peyvên din yên ku hevkariyê pênase dikin jî hene lêbelê hemû jî di dawiya dawî de dişibin peyveke di lîsteya jor de hatine pênasekirin, ji ber vê min ev hilbijartin. Em li ser her yekê, yek bi yek bisekinin û li ser wan bifikirin.

## HEVALTÎ

Peyva pêşî “hevaltî” di ferhenga Websterê de weke yarîtiyê an jî dostaniyê tê pênasekirin. Di heman demê de weke çawanî an jî rewşa rêheval jî tê pênasekirin. Mirov tu carî ne li bendê ye ku heval ji têkiliya bi hev re birevin, her du jî aniha çi dikin an jî çi pilan dikin ku bikin, hevdu agahdar dikin. Rêhevalên hev in û di navbera wan de têkiliyeke ku her dem hebû, heye. Ev têkiliya di navbera Giyanê Pîroz û xizmetkaran de, di Karên Şandiyan de gelek caran weke mînak hatiye dayîn. Ayeta li jêr tenê mînekeke ji wan hevokên Pavlûs e:

> "Û va ye, niha ez bi daxwaza Ruh girêdayî diçim Orşelîmê û ez nizanim li wir wê çi bê serê min. Bi tenê ez dizanim ku Ruhê Pîroz *li her bajarî ji* min re şahidiyê dike ku zincîr û tengahî li benda min in." (Karên Şandiyan 20:22-23, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Ji gotinên wî, hûn dikarin têkiliya di navbera Pavlûs û Giyanê Pîroz de bibînin. Di jiyan, rêwitî û xizmetê de rêhevalên hev bûn.

Heman tişt, di Peymana Nû de ji bo xizmetkarê bi rastî yê Reb jî derbasdar bû. Diçûn kuderê Ew jî bi wan re bû û gava li Wî dinêrîn bi wan re têkilî datanî. Hevalê wan bû. Di rewşeke din de Elçî Filîpûs, ji bizaveke giyanî ya ku li hemû bajar belav bibû veqetiya û ket ser rêya beyebanê lêbelê ne tenê bû û ne jî di derbarê karê wê bike de bêagahdarî bû ji ber ku got: "Îcar Ruh ji Filîpos re got: Pêşve here û beşdarî vê erebê bibe" (Karên Şandiyan 8:29).

Petrûsê ku hewl dida fêhm bike tişta zor ya ku dît bê çi ye û tê çi wateyê, mecbûr nema ku serî li agahiya xwe ya Pirtûka Pîroz bixe ji ber bihîst ku Giyan jê re wisa dibêje: "Tiştê ku Xweda pak kirine tu wan ji rêzê nebîne." Pişt re rê li ber wî xist û got: "... Ruh ji wî re got: Va ye, sê mirov li te digerin. Niha rabe, here jêr, qet dudilî nebe û bi wan re here. Çimkî min ew şandine" (Karên Şandiyan 10:19-20).

Hûn dikarin hevaltiya Giyanê Pîroz ya ku ji Pavlûs û hevalên wî re pêşkêş kiriye, bibînin. Ji ber ku Lûqa wisa qeyd dike: "Ew di herêma Firîgya û Galatyayê re derbas dibûn, çimkî Ruhê Pîroz nehişt ku peyva Xwedê li herêma Asyayê bêjin. Çaxê ew hatin pêşberî Mîsyayê, xwestin ku herin herêma Bîtînyayê, lê Ruhê Îsa destûr neda wan" (Karên Şandiyan 16:6-7).

Ez dikarim mînakan zêde bikim. Lêbelê tişta ez dixwazim bibêjim, xizmetkarên Peymana Nû heta tu bêjî bes haya wan ji

hevaltiya domdar ya bi Giyanê Pîroz re hebû. Têkiliya wan ya bi Wî re tu carî ew netirsandibûn an jî ev ne bûyereke ecêb bû. Li bendê man ku tevlî jiyana Wî bibin, eynî weke kesekî ku em bîst û çar seatan bi hev re dijîn û li bendê ne ku tevlî jiyana me bibe.

Mirov ji min dipirsin, bê ma ez di dema rêwitiyên xwe de ji otelan aciz bûme an na. Ez wisa bersivê didim: "Ez dikarim ji dilê safî bibêjim ku ez tu carî ji wan aciz nebûme."

Ya rastî ez çûm hinek bajarên herî xweş yên li dinyayê lê tu carî ew xwesteka min çênebû ku li wan bigerim. Ji ber ku ez ji hevaltiya wî pir zewqê distînim ku nayê gotin û loma ez naxwazim wê demê ji dest berdim. Berê berî ku ez hevaltiya Giyanê Pîroz bi rastî fêhm nekim û tecrube nekim, gava ez tenê dimam ez pir bêhêvî dibûm. Her dem pêdiviya min bi mirovan hebû ji bo li derdora min bin. Îcar aniha ji bo ez bi rehetî li Wî guhdar bikim û bi Wî re bipeyivim ez pir bêriya tenêtiyê dikim.

Ha arezûya Wî ev bû, bi we re hevkariyê bike! Ka kêliyekê çavên xwe bigirin û lê bifikirin ku Giyanê Pîroz hevalê we an jî rêhevalê we ye. Gotina Xweda vê diyar dike: "Hevkariya Giyanê Pîroz bila bi we re be." An jî li vê bifikirin: "Hevaltiya Giyanê Pîroz bila bi we re be." An jî: "Dostaniya Giyanê Pîroz bila bi we re be." Ji bo deriyê nêzîkatiyê yê di navbera we û Afirînerê we de vebe, destûrê bidin ku ev peyv di dilê we de çalak bin.

## PARVEKIRINA HEVPAR

Pênaseya duyem ango parvekirina hevpar an jî têkiliya sosyal, bihevguhertina fikir an jî hestan tîne ziman. Demên herî xweş û dewlemend yên ku min bi derdora xwe ya nêzîk re derbas kiriye, ew dem in ku me bi hev re sohbet kirine û tiştên herî kûr yên dilê xwe an jî tiştên herî taybet me ji hev re gotine. Di demên wisa de em dilê xwe vedikin û dibe ku tiştên kesên bi rastî me nas nakin

yên ku wê jê fêhm nekin an jî tiştên ku wê henekê xwe pê bikin, em parve dikin. Lêbelê em dizanin ku wê bi hevalê me yê herî nêz re rewş ne wisa be, herduyan jî nakin ji ber ku bi ya dilê me dizanin û tiştên em parve dikin xelet fêhm nakin. Pavlûs bi Giyanê Pîroz re û mînakeke têkiliyeke weke vê, bi van gotinan diyar dike: "Ez yê Mesîh, rastiyê dibêjim, ez derewan nakim û wijdana min jî bi Ruhê Pîroz vê yekê ji min re erê dike" (Romayî 9:1). Giyanê Pîroz çawa ku bi ya dilê Pavlûs dizanîbû, Pavlûs jî bi ya dilê Giyanê Pîroz dizanîbû. Di navbera wan de nêzîkayiyeke ku ji ber fikrên wan yên bingehîn û parvekirina hestan derdikeve, hebû.

Sedema ku tirsa REB evqasî girîng e careke din diyar bû ku ev e. REB, wê fikr û ramanên xwe yên herî kûr bi kesên qedir û qiymetê nedin wan re parve neke, eynî weke kesên ku wê durên me bi tiştekî nehesibînin û em ê jî navêjin ber wan. Bi îfadeyeke basît, tiştên kûr yên di jiyana me de em tu carî bi kesên ne xwediyê dilê me ne re parve nakin, Xweda jî weke vê ye.

Ezîzekî Peymana Kevin wisa dike hawar: "Gelo tu dikarî sirên Xwedê yên kûr fêm bikî?" (Eyûb 11:7). Lêbelê bi xêra fersenda nêzîkayiya Giyanê Pîroz ya bi Peymana Nû re derdikeve holê, Pavlûs bi kelecan vê rastiyê diyar dike: "Lê Xwedê ew bi Ruh ji me re kifş kirin. Çimkî Ruh li her tiştî, li tiştên Xwedê yên kûr jî dikole" (Korîntî I, 2:10). Bala xwe bidinê ku ev bi alîkariya Giyanê Xweda çê dibe. Giyanê Pîroz, fikir û ramanên Xweda yên kûr an jî yên jidil bi me re parve dike ku ev Kesê Sêbirkan e! Weyla law ji xwe re lê binêre ma ev we bi kelecan nake?

Naxwe dîsa bisekinin, çavên xwe bigirin û li ser nêzîkayiyeke wisa ya ku Giyanê Pîroz dixwaze bi me re ava bike bifikirin. Ew, fikir û hestên xwe yên herî kûr dixwaze ji we re diyanbike û bêriya ku li yên we jî guhdar bike, dike. Gotina Xweda dibêje: "Bila parvekirina fikir û hestên Giyanê Pîroz bi we re bin."

## ŞIRÎKATÎ

Pênaseya sêyem; ango şirîkatî an jî tevlîbûna hevpar, li pêş çavên rêberên dêrê yên pêşî bi awayekî xweş tên şanîdan. Di nameyên xwe de wisa nivîsandin:

> "Çimkî ji Ruhê Pîroz û ji me re jî qenc hat dîtin ku em ji van tiştên ku pêwist in pê ve, barekî din daneynin ser pişta we." (Karên Şandiyan 15:28)

Ji bilî nêrîna xwe nêrîna Giyanê Pîroz jî diyar dikin. Di biryarê de tevlîbûna hevpar heye, di karê desthilatdariyê de şirîk in. Ev rewş di Peymana Kevin de dişibe nîqaşa li ser Sodomê ya Brahîm û Xweda. Destûr hat dayîn ku Brahîm fikra xwe ya şexsî bîne ziman û Xweda piştî fikra Brahîm bihîst, biryara xwe teqez kir.

Ev şirîkatî di xizmeta Mûsa de jî çend caran hat dîtin. REB ji ber hêrsa xwe amade bû ku Îsraîliyan qir bike û eger ne ji Mûsa bûya, wê ev bi rastî jî bikira. Mecbûr ma ku soz û îtîbara Xweda bîne bîra wî. Di encama midexaleya Mûsa de em di eyetekê de wisa dixwînin: "Bi vî awayî Xudan fikra xwe guhert û xerabiya ku gotibû, bi gelê xwe nekir" (Derketin 32:14). Mûsa û Brahîm şirîkê Xweda bûn lêbelê di bin nîmetên Peymana Nû de ne xwediyê hevpariya ku di roja me de dane me bûn, gava em li vê difikirin mirov sewsî dibe.

Di van gotinên ku Pavlûs ji yextiyarên Efesiyan re gotiye, em bi awayekî eşekere delîla ku Giyanê Pîroz şirîkê me yê sereke ye dibînin:

> "Îcar hay ji xwe û ji hemû keriyê ku *Ruhê Pîroz* hûn di nav de kirine çavdêr, hebin. Şivantiya civîna bawermendan a *Xwedê* bikin a *ku wî bi xwîna* Kurê xwe bi dest xistiye." (Karên Şandiyan 20:28, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

Di vê ayetê de em bi awayekî eşkere Kesên ji hev cuda lê xwediyê yekitiya bêqisûr yên Xweda dibînin. Kesê ku pêşî behsa wî dibe Giyanê Pîroz e û yê ku wan weke çavdêr peywirê dide wan Ew e. Piştre di îfadeya dêra Xweda de behsa Bav têkirin. Di dawiyê de em erka Kurikê Wî yê ku bi xwîna xwe em kirîn, dibînin. Sê kesên ji hev cuda lê Xwedayek tenê. Têgihiştina vê zor e lêbelê mînakeke me ya xwezayî ya ku vê bi awayekî baldar li ber çavan radixîne heye. Em bi sê awayên avê yên ji hev cuda dizanin -hişk, rohn û xaz- lêbelê binyada molekulan yek e. Weke vê Xweda jî sê kesên cuda ye lêbelê bi awayekî bêqusûr yek e.

Tiştekî balkêş e ku em careke din not digirin ku Kesê van rêberan tîne ser peywira wan Giyanê Pîroz e. Dêreke cuda, ango di rewşeke ku yextiyarên Antakya li Reb digerin de ev rastî net bû. Gava ji Reb re duayan dikin, Giyanê Pîroz ji wan re wisa got: “Barnaba û Saul ji bo peywira ku min bang wan kiriye ji min te veqetînin.” Piştre destê xwe danîn ser van herdu zilaman û dua kirin û piştî vê em wisa dixwînin: “Yê ku bi fermana Giyanê Pîroz derketiye ser rê…” (Karên Şandiyan 13:2-4). Kesê Sêbirkan yê ku bi van zilaman re xebitî da ku Îsa mezin bike, Giyanê Pîroz bû.

Di van mînakan de em şirîkatiyeke teqez ya ku Giyanê Pîroz rêber e an jî şirîk e. Divê ez vê dîsa bînim ziman: Arezûya Wî ew e ku ez û we em bibin hevkedkarên Wî, erê, em bibin şirîkê Wî! Di nameya ku Pavlûsê ji Korîntiyan re nivîsandiye de em vê bi awayekî eşkere dixwînin: “em hevparên Xwedê yên xebatê ne” (Korîntî I, 3:9). Wateya peyva hevkedkar, şirîkê kar an jî rêheval e. Wergera Qiral James vê wateyê hîn bêtir net dike: “Em karkerên bi Xweda re dixebitin.” Weyla law, ez careke din dipirsim, hûn hevkedkarên ku bi hev re naxebitin û bi hev re ne di têkiliyê de ne nas dikin gelo?

Dîsa çend deqîqeyan veqetînin û li xwesteka Giyanê Pîroz ku dixwaze bibe şirîkê we yê sereke bifikirin. Ji ber ku Gotina

Xweda wisa diyar dike: “Bila şirîkatiya Giyanê Pîroz bi we re be.” An jî careke din: “Bila Giyanê Pîroz di her tiştî de bibe şirîkê we û tevlî we bibe.”

## TÊKILIYA BERAMBER

Pênaseya piştî vê têkiliya beramber e. Rêya vê ya herî baş ya ku ez diyar bikim, ew demên ku min bi zilam û jinên Xweda re di nav salan de wext derbas kiriye. Li paytexta Koreyê Seulê, gava cara pêşî min pastorê yek ji wan dêrên li dinyayê ya herî mezin Dr. David Cho nas kir, tê bîra min. Serdana wî ya pêşî bû ku hatibû dêra min lê xizmet dikir. Wê demê ez yek ji wan pastorê alîkar bûm û di dema serdana wî de, ez ji çûn û hatina wî berpirsyar bûm. Min ev xizmet bi salan dikir û ji ber vê nêzî sed xizmetkarên ku serdana dêra me kiribûn, min bi erebeyê ew biribûn û anîbûn. Lêbelê vê carê ne weke her car bû ji ber ku gava cara pêşî li erebeya min siwar bû, hebûna Reb ket hundurê erebeya min. Hema bêje di cih de min dest bi girî kir û min nikarîbû esirên xwe bigirim. Berî ez xizmetê bikim, ji ber min nedixwest ez wî aciz bikim, ez bêdeng dimam lêbelê di dawiya dawî de ez macbûr mam bipeyivim. Bi awayekî cidî û bi dengekî sakîn min wisa got: “Dr. Cho, Xweda tam li vir e, di erebeya me de ye.” Bişirî û serê xwe hejand.

Pişt re ez li ser ku ev zilam derbarê zewqa ku ji hevkariya Giyanê Pîroz sitendiye, bê çiqasî nivîsandiye û waaz kirine, fikirîm. Pişt re xizmetkarên din yên ku min ew bi salan bi erbeya xwe biribin û anîbûn ku her dem behsa Giyanê Pîroz dikirin û digotin me tecrube kiriye, hatin bîra min. Her çiqasî min xizmeta çûn û hatinê ya bi sedan kesan dikir jî, tenê çend kes tên bîra min ku gava me hev nas dikir Giyanê Pîroz di cih de bi min re temas dikir. Yek ji van kesan xizmetkareke jin ya bi navê Jeanne Wilkerson bû

ku bi salan ji bo navbeynkariyê dua kiribûn û aniha li cem Reb bû. Gava min pêşî ew nas kir, li erebeya dêrê siwar bû û li seranserê rê ji ber tirsa di nava min de devê min vekirî ma. Pir bi min zor dihat gava min erebe diajot. Min fêhm kir ku ez ne tenê li cem jineke ku Xweda nas dike, ez li cem yeka ku bi rastî Wî ji nêz ve nas dike sekinî me. Derbarê Giyanê Pîroz de gelek axaftin kiribûn û her gava ez pêrî wê dihatim, hebûna Giyanê Pîroz diyar û bi hêz bû.

Berî bi çendakî ez li navenda rojavayê Amerîkayê, li dêreke ku çar hezar kes lê vehewiyabûn, axivîm. Di waaza serê sibehê de min derbarê Giyanê Pîroz de waaz dan û gava wê êvarê em vegeriyan dêrê, divê min waazeke din li dor çil û pênc deqîqeyan bidaya. Lê piştî perestîşa êvarî bi du seatan şûnde ez incex derketim ser dikê ji ber ku hin pilanên din yên Giyanê Pîroz hebûn. Giyanê Pîroz destê xwe da gelek mirovan û dem dema xizmeteke bêhempa bû! Berî ez derkevim ser dikê bi hindikî, pastorê ne nerm û ne jî zeîf (di ser dused û bîst kîloyan re radihêje halterê) di nava hêsiran de hat cem min û got: “John, ev bû heşt sal ez li vê dêrê pastor im û min tu carî hebûna Xweda evqasî bi hêz hîs nekiribû!”

Di cih de min wisa bersiv da: “Sedemeke vê heye, vê sibehê ji ber ku em derbarê Giyanê Pîroz de peyivîn wisa bû û em kengî derbarê wî de bipeyivin wê xwe nîşanî me bide.”

Ev têkiliya beramberî hev dibe ku di zewacan de xuya bibe. Xizmetkarên ku derbarê jinên xwe de pir dipeyivin hene. Hevserên xwe gelek caran dixin nava peyamên xwe de an jî gava hevserên wan ne li cem wan bin, derbarê wan de dipeyivin. Ne tenê di jiyana xwe ya taybet de, li pêş çavên mirovan jî her dem bi hev re ne. Ji ber vê gava hûn li xizmetkar difikirin hevsera wî jî tê bîra mirov. Ji ber ku ez di derbarê Lisa de pir dipeyivim û dinivîsînim, pir pirsên derbarê wê de ji min tên pirsîn. Ma çi xem e, xizmetkarên zewicî lê yên ku derbarê hevserên xwe de pir kêm dipeyivin jî hene û hema

bêje hûn wan bi hev re nabînin. Gava behsa van xizmetkaran tê kirin, hevsera wan di cih de nayê bîra we.

Heman tişt ji bo Giyanê Pîroz jî derbasdar e. Zarokên Xweda yên diyar ku bi Giyanê wî re di nava têkiliyeke beramberî hev de ne, hene. Gava hûn derbarê wan de peyivîn, Giyanê Pîroz tê bîra we ji ber ku ev jin û mêr bi awayekî zaneyî weke şirîkê wî xizmetê dikin û her dem Wî tînin ziman û behs dikin. Ji ber vê Giyanê Pîroz di xizmetên wan de xwe diyar dike. Di encamê de rûmet bêtir dan Îsa ji ber ku Giyanê Xweda Îsa berz û bala dike.

Giyanê Pîroz dixwaze bi we re di nava têkiliyeke beramber de be. Eger hûn Wî bi rûmet bikin, wê xwe nîşan bide lêbelê eger hûn rûmetê nedênê, wê rewşa we ji wan xizmetkarên ku bi salan zewicî ne lê bi jina xwe re tu nêzîkayiya wan tuneye, ne cuda be. Wê tenê ne ew û jina xwe ji hev dûr bimînin, di heman demê de wê di çavên mirovan de jî ji hev dûr bisekinin. Naxwe li vê bifikirin: “Bi Giyanê Pîroz re di nava têkiliyeke beramber de bin.”

## NÊZÎKAYÎ

Di lîsteya jor de pênaseya dawî ya ku cih digire nêzîkayî ye. Ev peyv hevkariyê pir baş pênase dike ji ber ku her çar kategoriyên berê ku me behsa wan kir kurtase dike. Ya rastî, yek ji pênaseyên hevkariyê yên Websterê, bihevrebûna nêz an jî lihevkirin: danûstendin e. Nêzîkayî, ji bo hevaltiyeke bi hêz tenê bi rêya danûstendinê dikare bi pêş bikeve. Di wergereke alternatîf ya Peymana Nû de, dibêje: “Bila hevaltiya nêz ya Giyanî Pîroz bi we re be.”

Careke din diyar bû ku her tişt bi hevaltiyê re girêdayiye, armanca hevkariyê ya dawî ev e. Giyanê Xweda dixwaze bibe hevalê we. Tiştê dizane dixwaze hînî we bike û agahiyên Wî bêsînor in! Ew Xweda ye, tiştekî ji Wî veşartî an jî ji bo Wî bi sêhr

tuneye. Agahiyeke ku nizane tuneye. Weke Yeşeya tîne ziman:

> “Ma kê fikra Xudan dizane? Ma kê şêwirmendê wî bû ku hînî wî bike? Ma ew bi kê dişêwire, Kê fêmdariyê didê? Kê hînî riya edaletê dike, Kê zanînê hînî wî dike Û riya fêmdariyê nîşanî wî dide?” (Îşaya 40:13-14)

Bersiv, ne tu kes e ji ber ku ew Xweda ye!

Ez dîsa dibêjim: Ew Xweda ye! Hikmet, zanebûn û têgihiştina Wî bê sînor e û pir dixwaze tiştên ku dizane we hînî wan bike. Li vê bifikirin, gava hûn bi tiştekî pir bi qedir û qiymet zanibin, hûn ê pir bixwazin bi kesên hûn nêzî wan û ji wan hez dikin re parve bikin. Ew jî ji vê cuda nafikire. Dixwaze tiştên bi wan zane bi we re parve bike! Tiştên ji we re hatine amadekirin hûn wan dibînin? Ji ber ku hûn li Kesê Xwedayî yê di nava we de dijî, nagerin; ma nabe ku hin tişt ji ber çavên we winda dibin? Hûn têkiliya xwe û Îsa, ji Giyanê Pîroz cuda difikirin ku bi pêş bixin?

Li dêran gelek caran pir kes bêyî ku bi Giyanê Pîroz re di nav têkiliyeke nêz de bin, hewl didin ku nêzî Îsa bibin. Berî bi çendakî li vê fikirîm û di dema xizmeta Îsa ya li ser rûyê erdê de, hat hişê min ku gelek caran Cihûyan bêyî Îsa xwestine ku têkiliyê bi Xweda re deynin. Hevokên wisa saz kirin: “Em ji zînayê çênebûne! Bavekî me heye, ew jî Xwedê ye” (Yûhenna 8:41) û “...em şagirtên Mûsa ne. Em dizanin ku Xwedê bi Mûsa re peyivî ye…” (Yûhenna 9:28-29). Ya rastî her çiqasî ne wisa be jî ji xwe bawer bûn ku bi Xweda re di têkiliyê de ne. Ev baweriya wan ji ber alîkariya Mûsa ya ku Soza Xweda (Nivîsên Pîroz) jê re hatibû dayîn, zanîbûn ev yek dikirin. Lêbelê bi rastî bi vî dizanîbûn? Ew bedena di nav wan de ya ku Soz stendibû, nepejirandin û red kirin.

Îro roj jî gelek kesên bawermend ji Giyanê Pîroz cuda, dixwazin bi Îsa re têkiliyê qva bikin. Lêbelê yê di nava me de ye

Ew e û tu kes bêyî Wî nikare Îsa nas bike. Mixabin Cihû, Giyanê Xweda ji Îsa bêtir nedîtî û nebihîstî dibînin û ev pir rehettir e. Ji ber ku Ew weke Îsa ne ji xwîn û goşt pêk nehatiye.

Îsa dibêje: "Eger we ez nas bikirama, weyê Bavê min jî nas bikira" (Yûhenna 14:7). Îsa bu awayekî hêsan wisa digot: "Bav ne li vir e, Ew li asîmanan e lê eger hûn Min nas bikin, hûn ê Bavê Min jî nas bikin ji ber ku Em dizanin." Heman tişt ji bo Giyanê Pîroz jî derbasdar e. Îsa êdî ne li vir e, Ew li asîmanan e lê eger hûn Giyanê Pîroz nas bikin, hûn ê Îsa jî nas bikin ji ber ku ew yek in! Ha ji ber vê Ew, di heman demê de weke "Giyanê Mesîh" tê bi navkirin (Petrûs I 1:11, Romayî 8:9).

## WEKE MIN YEKÎ DIN

Îsa berî ku ji nav xwedekarên xwe derkeve ji wan re wisa got:

> "Eger hûn ji min hez dikin, hûnê emrên min bînin cih. Û ezê ji Bav bixwazim û ewê Alîkarekî din bide we, da ku her û her bi we re bimîne. Ew Ruhê Rastiyê ye; dinya nikare wî qebûl bike, çimkî ne wî dibîne û ne jî wî nas dike. Lê hûn wî nas dikin, çimkî ew bi we re dimîne û ewê di dilê we de be. Ez we sêwî nahêlim; ezê dîsa bêm ba we." (Yûhenna 14:15-18)

Di van çend hevokan de gelek tişt hene. Pêşî, careke din bala xwe bidinê ku Îsa derbarê îteatê de dipeyive, piştî gotina "hûnê emrên min bînin cih" dibêje "ezê ji Bav bixwazim… ewê Alîkarekî din bide we, Ew Ruhê Rastiyê ye." Bi destxistina Giyanê Pîroz û îteatkirina bi Gotina Wî û di navbera tirsa REB de rasterast têkiliyek heye. Petrûs bi vê gotina xwe vê piştrast dike: "Em şahidên van tiştan in û Ruhê Pîrozê ku Xwedê daye wan ên ku bi ya wî dikin jî, şahid e" (Karên Şandiyan 5:32). (Careke din bala

xwe bidin şirîkatiyê, di vir de behsa du şahidên cuda têkirin. Yên pêşî xwendekar, yên din jî Giyanê Pîroz). Petrûs dibêje yên ku fermanên Wî bi cih tînin, Xweda Giyanê Pîroz dide wan. Bingeha nêzîkayiyê tirsa REB e. Çima em di waazên xwe de vê hîn bêtir bi dil û can parve nakin?

Eger em vegerin beşa 14an ya Yûhennayê, Bav Îsa dibêje yên ji Xweda bitirsin ez ê "Alîkarekî din" bidim wan. Di Peymana Nû de du peyvên Grekî yên ku bi awayekî din hatine wergerandin hene. Gava em li van dikolin, di derbarê Giyanê Pîroz de bêtir dibin xwedî agahî. Peyva pêşî ya Grêkî "allos" e, ango tê wateya "ji heman cureyê yeka din." Peyva din "heteros" jî tê wateya "ji cureyên cuda yeka din."

Ji bo ferqa di navbera van peyvan de diyar bibe mirov dikare van mînakan bide: Em bibêjin ku hûn fêkiyekî dixwazin û ez xoxekê didim we. Piştî xelas bû hûn fêkiyekî din dixwazin. Vê carê ez sêvekê didim we. Min fêkiyek din da we lê cureyeke din. Lê min xoxeke din bidaya we, ji heman cureyê min ê fêkiyeke din bidaya we, eynî weke ya min da we. Ev mînak ferqa di navbera "heteros" û "allos" de diyar dike.

Peyva Grêkî ya ku Îsa li vir bi kar tîne "allos" e. Ango ji heman cureyê yeka din. Îsa dibêje: "Giyanê Pîroz tam weke min e." Ya rastî ji bo peyva "alîkar" peyva Grêkî ya ku tê bikaranîn "parakletos" e. Ev peyv peyveke ji du peyvan pêk tê: Peyva "para" tê wateya "li cem" û peyva "kaleoo" jî tê wateya "bangkirin"ê. Ji ber vê peyva "parakletos" tê wateya "ji bo alîkariyê bangkirina li cem yekî din." Ev peyv di eslê xwe de, di dadgehekê de ji bo alîkarekî zagonî, şêwirmendê parastinê an jî ji bo parêzer dihat bi karanîn. Pişt re, bi piranî kesê li daweya kesekî din dinêre, navbeynkar an jî kesê parastinê dike, dianî ziman. Bi awayekî balkêş ev peyv di nameyan de tenê carekê derbas dibe û Îsa pênase dike (Yûhenna I 3:1). Ango Îsa weke navbeynkar an jî

parêzerê me heta hetayê bijî, Giyanê Pîroz jî alîkarê me ye. Ji bo bê bibe alîkarê me bang wî hatiye kirin.

Îsa ji xwendekarên xwe re dibêje: "Çawa ez bi we re bûm, wê Ew jî bi heman awayî bi we re be." Ez pirî caran dibihîzim ku mirov wisa dibêjin: "Ax, eger ez bi Îsa re meşiyabama, min ê pir pirs ji Wî bipirsiyana." Baş e, wê bipirsiyana gelo? Gotina tiştên wisa tenê rastiya ku ev kes ne nêzî Giyanê Pîroz in derdixîne holê. Eger bi Giyanê Xweda re hevkariyê nekin, tişta ku dihêlin bifikirin ku wê bi Îsa re tiştekî cuda bikin çi ye? Ya rastî Îsa ev gotina balkêş got:

> "Ez ji we re rastiyê dibêjim." (Yûhenna 16:7)

Berî ez berdewamiya ayetê bînim ziman, divê ez bibêjim ku ev pêşgotin her dem min ecêbmayî dihêle. Bi wan re sê sal û nîvan ma. Ji wan re tu carî derew an jî fikreke ku wan bixapîne, negot. Di seranserê vê demê de çi tiştên ku ji wan re got rast derket. Lêbelê aniha tişta ku dike parve bike, ewqasî aqil jê re ne lazim e ku bi destpêkeke weke vê dest bi gotinên xwe kir: "Zarokno; tişta ez ê bibêjim ne derew, rast e! Naxwe em li van gotinên ku hişê mirov nagihe wan, binêrin:

> "Çûyîna min ji bo we çêtir e. Eger ez neçim, Alîkar ji we re nayê. Lê eger ez herim, ezê wî ji we re bişînim." (Yûhenna 16:7)

Wey tu ji xwe re lê binêre, ji xwe re bisekinin û li ser van gotinan bifikirin. Dibêje çûna wî ji bo wan wê pir baştir be. Aniha hûn dikarin fêhm bikin bê ji bo çi di destpêka van gotinan de mecbûr ma ku bêje "Ez ji we re rastiyê dibêjim." Di seranserê dema ku bi wan re ma de, derbarê Desthilatdariyê de tiştên herî kûr yên ku tu kesî nebihîstibûn, hînî wan kiribû. Nexweş rehet kirin, mirî rakirin, giyanên ne baş qewirandin, heta baca xwe jî da

lê ev tenê destpêk bû. Lêbelê aniha dibêje, ez aniha herim ji bo we baştir e! Çima? Bersiva dide ji ber wê ye ku here wê Alîkar ji me re bişîne.

Ka lê bifikirin, eger Îsa li ser rûyê erdê bimaya û eger me bixwesta pê re hevkarî bikira an jî pirs jê bipirsiyana; em ê mecbûr bimana ku bilêteke balafirê ya Tel-Avivê qut bikin, erebeyekê kirê bikin, biçûna erda Celileyê û piştre em ê lê bigeriyana. Wê ev ne zor bûya ji ber ku wê li derdora Wî bi deh hezaran mirov hebûna. Lêbelê ji bo we xwe bigihişta cem Îsa, hûn ê mecbûr li benda bi hezar kesên berî we hatine, bimana ku rê bidana we. Lê wê demê jî wê axaftina we li paş biketaya ji ber ku Petrûs gotina xwe her dem tîne ziman û di hemû axaftinan de bi ser dikeve. Wekî din kurikên "Gurmîna Ewran" Yaqûb û Yûhenna jî pir ne bêdeng bûn. Di heman demê de ji bo tiştên di dilê wan de bipirsin, elçiyên li benda fersedekê bûn jî li wir bûn. Ji bilî van hemûyan, divê Îsa rojê şeş an jî heyşt saetan razê, pêdiviyên xwe yên şexsî bi cih bîne û bi awayekî rêkûpêk xwarin bixwaraya.

Lêbelê xweşikbûna Giyanê Pîroz ku di nava me de dijî, ew e ku ne mecbûr e rakeve. Di nava roj û şevê de hûn kengî bixwazin, hûn dikarin bi Wî re bipeyivin û hûn ne mecbûr in li benda axaftina kesê din bin. Bala wî ya tam û ne belawela her dem li ser we ye. Ya rastî bi deh hezaran kes di heman demê de dikarin bi Wî re bipeyivin! Bi hemû kesê ku bi arezûyê lê digere, dikare bi hemûyan re têkeve têkiliyê. Lê ne ev tenê ye, rewş hîn baştir dibe ji ber ku Îsa wisa berdewam dike:

> "Hê gelek tiştên ku ez ji we re bêjim hene, lê niha hûn nikarin wan ragirin. Lê dema ku ew Ruhê Rastiyê bê, ewê we ber bi hemû rastiyê ve bibe. Çimkî ew ji ber xwe napeyive, lê tiştên ku bibihîze wê bêje û tiştên ku wê bibin, wê bi we bide zanîn. Ewê min bi rûmet bike,

> çimkî ewê ji yê min bistîne û bi we bide zanîn. Her çiyê Bav hebe, yê min e. Ji ber vê yekê min got ku ewê ji yê min bistîne û bi we bide zanîn." (Yûhenna 16:12-15)

Gava Giyanê Pîroz bi me re dipeyive, di esasê xwe de Îsayê ku Bav ji me re weke Soz'ê ji me re şandiye dipeyive. Ax erê, her çiqasî weke sê kesên cuda ne xwediyê heman hiş, îrade û hestan bin jî; bi giştî yek in. Hûn tu carî nabînin ku ji hev veqetiyane û hûn ê her dem bibînin ku di heman armanc, pêşnûma û kiryarê de gîhane hev. Beyana eşkere ya di Nivîsên Pîroz de bînin bîra xwe: "Bibihîze, ya Îsraîl! Xwedayê me Xudan yek Xudan e" (Dubarekirina Şerîetê 6:4)

## SÊ ASTÊN TÊKILIYÊ

Di ayeta jor de Îsa ji xwedekarên xwe re got, pir tişt hene ku ez dixwazim ji we re bêjim lêbelê hûn nikarin xwe li ber wan bigirin. Bi alîkariya sehekên xwe yên xwezayî re, nikarîbûn di tiştên kûr û dûr yên aîdî Xweda de têbigihêjin.

Bînin bîra xwe bê piştî vejîna Îsa çi bûye: Xwe pêş deh xwendekarên xwe kiriye, Tomas ne bi wan re bû. Pişt re jê re gotin ku Îsa rabûye ser xwe, li ser vê yekê Tomas ev bersiv da wan: "Heta ku ez di destên wî de cihê bizmaran nebînim, tiliya xwe li cihê bizmaran nedim û destê xwe daneynim ser newqa wî, ez qet bawer nakim" (Yûhenna 20:25).

Piştî vê Îsa xwe pêş wan hemûyan kir. Di cih de berê xwe da Tomas û jê re got tiliya xwe deyne ser newqa min û baweriya xwe bîne. Ji ber vê Tomas kir hawar: "Rebê min û Xwedayê min!" Piştî vê Îsa ji Tomas re tiştekî ku demeke pir dirêj min tu tişt jê fêhm nekir, got:

> "Ji ber ku te ez dîtim tu bawer dikî? Xwezî bi wan ên ku nebînin, lê dîsa bawer dikin!" (Yûhenna 20:29)

Ji ber ku piştî tobe kir û kir hawar û got: “Rebê min û Xwedayê min!” û ji ber pir hêvî neda wî, min digot qey Îsa li hemberî Tomas hinekî hişk tevgeriyaye. Ji ber nezanî û têgihiştina min ya xelet, ev fikra min ne rast bû. Pişt re Giyanê Pîroz, ev gotina Îsa derxist ber roniyê. Îsa li hemberî Tomas bi hişkî tevnedigeriya, tenê rastiyek dianî ziman. Îsa dianî ziman ku kesên Wî bi sehekên fizîkî nas dikin, bi qasî kesên ku Wî bi giyanê xwe nas dikin, wê Wî baş û kûr nas nekin. Ji ber vê dibêje wê kesên ku bi giyanê xwe Wî nas dikin, bêtir bên pîrozkirin.

Li elçî Pavlûs binêrin. Weke Petrûs û yên din bi Îsa re nemeşiya lêbelê Îsa bi rêya wehiya Giyanê Pîroz nas kir. Wisa nivîsand:

> “Birano, ez bi we didim zanîn ku ew Mizgîniya ku ji aliyê min ve tê dayîn, ne ji mirovan e. Çimkî min ew ji mirovan nestand û ez ji aliyê wan ve nehatim hînkirin, lê belê min ew bi peyxama Îsa Mesîh stand. We li ser jiyana min a berê ya di Cihûtiyê de bihîst. Hingê min pirr zêde tengahî dida civîna bawermendan a Xwedê û min dixwest ku ez wê ji holê rakim. Ez di nav gelê xwe de, ji gelekên ku di emrê min de bûn, di Cihûtiyê de bêtir pêşve diçûm û ji bo adetên bav û kalên xwe bi zêdehî xîretkêş bûm. Lê hê ku ez di malzaroka diya xwe de bûm, Xwedê ez veqetandim û bi kerema xwe gazî min kir. Û çaxê li wî xweş hat ku Kurê xwe ji min re eşkere bike, da ku ez di nav miletên din de wî bidim bihîstin, ez bi xwîn û goşt neşêwirîm û derneketim Orşelîmê, ba yên ku beriya min bûbûn Şandî. Lê belê ez çûm Erebistanê û careke din vegeriyam Şamê.”
> (Galatî 1:11-17)

Pavlûs bi demê re têkiliyeke kûr ya ku tu elçiyên pêşî bi dest nexistibûn, bi Reb re ava kir. Petrûs jî bi van gotinan behsa vê têkiliyê kir:

> "Îcar bîhnfirehiya Xudanê me xilasî hesab bikin, çawa ku birayê me yê hezkirî Pawlos jî, li gor şehrezayiya ku ji wî re hatiye dayîn, ji we re nivîsiye. Ew di hemû nameyên xwe de li ser van tiştan dibêje. Di wan de hin tişt hene ku fêmkirina wan zehmet e. Yên nezan û dilê wan xilupilo, wek ku di nivîsarên pîroz ên din de dikin, van jî çewt şîrove dikin û bi kirina vê yekê helakbûna xwe tînin." (Petrûs II, 3:15-16)

Wey tu ji xwe re lê binêre! Petrûs sê sal û nîvan bi Efendî re bi awayekî bedenî geriya û Pavlûs ev yek qet nekir. Lêbelê Pavlûs derbarê xweza û rêyên Îsa de, ku Petrûs bi xwe jî di wan de nedigihiya, gelek nêrînên xwe dianî ziman. Çima? Ji ber ku Petrûs bêguman bi bîranînên tiştên ku her dem dibihîst û didît re bû û vê yekê rê li ber wî digirt ku bi Îsa re têkeve nav têkiliyeke kûr û dûr. Ji ber vê Îsa wisa got: "Hê gelek tiştên ku ez ji we re bêjim hene, lê niha hûn nikarin wan ragirin. Lê dema ku ew Ruhê Rastiyê bê, ewê we ber bi hemû rastiyê ve bibe."

Mînakeke vê (ne tam be jî hinekî ji bo zelalbûnê) ew kesên ku qet hevdu rûbirû nabînin lê di ser înternetê re dil dikevin hev. Mirov pir li vê rewşê rast tê û ji kesên ku rûbirû hev dibînin bêtir dil dikevin hev.

Ya rastî, ji bo ez vê nîşan bidim bê çiqasî bi hêz e, ez ê nîşanî we bidim bê çawa dikare zewacekê hilweşîne. Êvarekê piştî perestîşê ez çûm cem zilamekî ku dilê wî lê giran bûye. Di himbêza wî de du zarok hebûn. Min meraq kir û jê pirsî: "Tu baş î ne wisa?"

Bersiv da û got: "Na, berî çendakî jina min di ser înternetê re zilamek nas kir û dev ji min berda û pê re reviya."

Pişt re got, ji bo zilamekî ku berê ew qet nedîbû; ne tenê ew di heman demê de dev ji şeş zarokên xwe jî berda bû. Tişta min

jê fêhm kir, di ser înternetê re bi heft dilan dil berdabûn hev û ev evîneke wîsa bi hêz bû ku hiştibû dev ji zarokên xwe jî berde.

Em dîsa vegerin aliyê erênî, min çavdêriya kesên ku ji mesafeyekê dûr dil dikevin hev ji kesên ku her dem li cem hev in bêtir nêzî hev dibin. Sedema vê ew e ku asta bedenî derbas dikin û nêzîkayiya di canê xwe de mezin dikin. Çend caran gava mirov rûbirû hev nas dikin, hêmanên bedenî dibin serdestên rewşê û xweşikbûn û tevgerên derveyî rê li ber kesên li hemberî me digirin ku nahêlin em wan di eslê xwe de nas bikin.

Weke min di beşa berî vê de anî ziman, weke sê astên ragihandinê yên devkî, çalakî û dilî hene, sê astên têkiliyê an jî hevnaskirinê jî hene. Asta herî kêm ya xwezayî an jî ya bedenî ye. Mixabin asta ku gelek zewacan motîve dike ev e. Gava ku şewqa cazîbeya bedenî vedimire; her du alî ango jin û mêr her diçe, dibin bi serê xwe. Zilam bêtir bi sporê, hobiyan, xizmetê û hwd. re dema xwe derbas dike; jin jî berê xwe bêtir dide danûstendin, heval, xizmet û tiştên hwd. Ev rewş rewşeke xemdar e.

Ya piştî vê dil an jî kesayetiya kes e. Asta bi hêz ya ku Dawid û Yonatan bi hev re avakiriye ev e. Em wisa dixwînin: “Yonatan bi Dawid ve hat girêdan. Wî bi dil û can, wekî nefsa xwe jê hez kir” (Samûêl I, 18:1). Gava ku Dawid şîna mirina Yonatan girê dida, wisa kir qêrîn: “Ji bo te xemgîn im, birayê min Yonatan. Tu ji bo min pir hêja bûyî. Hezkirina te ji hezkirina jinê bêtir bû” (Samûêl II, 1:26). Dawid helbet bi Yonatan re nekete nav têkiliyeke ji rêderketî û di nava wan de dilbijandineke bedenî qet tunebû lê di nava wan de ji dilbijandineke bedenî kûrtir têkiliyek hebû û ev têkilî gava ku dibêje hezkirina Yonatan ji ya jinê mezintir bû, xuya dike. Naskirina wan di asteke bilintir de bû ango di dil de bû. Asta vê têkiliya ji dil û fêhmkirina wê ya ku ji têkiliyeke bedenî mezintir e; diyar dike bê çima mirov ji bo kesekî ku di ser telefon, înternet

an jî nameyan re nas dikin û dev ji malabata xwe berdidin, li ber çavan radixîne.

Lêbelê asta herî bilind ya naskirina kesekî, asta giyanî ye. Ha ji ber vê Pavlûs wisa dibêje:

> "Ma tiştên mirov, ji ruhê mirov ê ku di hundirê mirov de ye pê ve, kî dizane? Wisa jî ji Ruhê Xwedê pê ve, tu kes bi tiştên Xwedê nizane. Îcar me ne ruhê dinyayê, lê belê Ruhê ku ji Xwedê tê stand, da ku em wan tiştên ku Xwedê ji me re kirine diyarî, bizanin." (Korîntî I, 2:11-12)

Asta ku Pavlûs Îsa naskiriye ev e. Her çiqasî Petrûs jî Ew di vê astê de nas kiribe jî, di demên gava bi hev re dimeşiyan de, li gorî bîranînên xwe yên ku Îsa di astên din de naskiriye bêguman li wan kêliyan vegeriyaye. Ji ber vê Pavlûs bi awayekî eşkere wisa dibêje:

> "Êdî em ji niha û pê ve li gor fikra mirovan tu kesî nas nakin. Eger me Mesîh li gor fikra mirovan nas kiribe jî, êdî em niha wisa nas nakin." (Korîntî II, 5:16)

Eger em ê bigihêjin asta ku em Xweda ji nêz ve nas bikin, divê em fêhm bikin ku nîmeta herî mezin ya ku ji me re behsa wê kiriye, ne naskirina bedenî ye, naskirina Giyanî ye.

Wey ji we re lê binêre! Hûn jî weke min bi kelecan dibin gelo? Em ji Rebekî bêhampa re xizmetê dikin. Bêriya ku xwe bi awayekî herî kûr bi me bide naskirin, dike. Yê ku pêşî vê nêzîkayiyê dixwaze Ew e. Dilê we aniha ji bo heman nêzîkayiyê laveyan dike gelo?

## PIRSÊN XEBATÊ

1. We duayeke bi tarza “Ji bo ez karibim bi te re bim, ez rîca dikim min bibe mala xwe ya li bihuştê” kiriye gelo? Bersiva we erê be eger, we di kîjan şertan de kir?

2. Gelek mirovên li dêrê, her çiqasî zanibin ku Giyanê Pîroz tunebe nikarin Îsa nas bikin jî, bêyî bi Giyanê Pîroz re têkiliyeke nêz ava bikin, hewl didin nêzî Îsa bibin. Çima? Di jiyana we de jî ev rewş derbasdar bûye gelo?

3. Gava hûn li ser şirîkatiya rola Giyanê Pîroz difikirin, gava hebûna Wî tiştên di dilê we de ji Xweda re dibêje, bandoreke çawa li baweriya we dike?

BEŞ 11

# SOZA BAV

"Tiştekî ku hûn jê bawer nakin,
tu carî bereketê nade we."

Di sala 1979an de gava ez diçûm Zanîngeha Purdue'yê, li yûrda ez lê dimam bi alîkariya hevalekî xwe min bawerî bi Îsayê Mesîh anî. Piştî min li gorî rêyên xwe tobe kir û Îsayê Mesîh weke Xwedayê xwe pejirand, min fêhm kir ku ez di bin desthilatdariya Xweda de ji nû ve çêbûme. Nivîsên Pîroz wisa dibêjin: "Eger tu bi devê xwe eşkere bikî ku Îsa Xudan e û di dilê xwe de bawer bikî ku Xwedê ew ji nav miriyan rakiriye, tê xilas bibî. Çimkî ji bo rastdariyê bi dil tê bawerkirin û ji bo xilasbûnê jî bi dev tê eşkerekirin" (Romayî 10:9-10).

Min baş zanîbû ku ez xelas bûme. Dilê min şahidî ji vê re dikir û Nivîsên Pîroz ev yek piştrast dikirin. Lêbelê di jiyana min ya nû de tiştên jê kêm bûn û bi mehan min pê re şer kir bê çi kêm bû.

Her çiqasî min zanîbû ku ez zarokê Wî me jî, Reb ji min ve pir dûr xuya dikir. Gava min Pirtûka xwe ya Pîroz dixwend te digot qey ez di nava mijekê de me. Min bi zorê fêhm dikir û her çiqasî min hewl dida xwendina wê jî, min pir tiştên kêm fêhm dikirin. Di heman demê de li hemberî rewşên neyênî qabîliyeta min ya ku ez jiyaneke serkeftî bijîm kêm bû û weke xwedekarekî zanîngehê li hemberî zordestiya bihêz ya hevalên xwe weke ku ez bêçare bûm.

Her ku dem derbas dibû, min mirovên weke ku ji min bêtir nêzî Xweda dimeşiyan nas kirin. Derbarê Wî de bi zimanekî xweşik û şexsî dipeyivîn. Ez matmayî dimam. Tiştê ku min nedikir, wan dikir. Xweda çima û ji ber çi ew nêzîkayiya ku min nedidît dabû wan? Derbarê rêyên Xweda de, hêz û têgihiştineke ku ez nedigihiyamê, ew xwediyê wê bûn. Pişt re her ku ez li Pirtûka xwe ya Pîroz xebitîm, min fêhm kir ku hevnaskirineke din ya ku hîn min bi Reb re tecrube nekiriye, heye.

## SOZA BAV

Em li tişta ku min ji Nivîsên Pîroz kifş kiriye binêrin. Berî Îsa rakin asîmanan em wisa dixwînin:

> "Gava ku Îsa bi wan re bû, *wî tembîh li şagirtan kir* ku ji Orşelîmê dernekevin, lê li hêviya soza Bav bin. Wî got: We ev soz ji min bihîstiye. Yûhenna bi avê imad kir, lê piştî çend rojan hûnê bi Ruhê Pîroz imad bibin." (Karên Şandiyan 1:4-5, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Îsa ji kesên ku jê bawer dikin re got; heta "Soza Bav" pêk neyê ango heta bi gotinên Wî re ji Giyanê Pîroz re bên waftîzkirin, divê neçin cihekî, waazan nedin an jî bangên Wî neynin cih. Peyva waftîzê ya ku Îsa di vê ayetê de bi kar aniye, ji peyveke Grekî ya bi navê "baptizo" pêk tê ku ev jî tê wateya "têrakirin, noqkirin, di ser serê

xwe re şemitandin." Îsa digot, hîn ne xwediyê ku xwe di Giyanê Pîroz de radikin; her çiqasî baweriyê bi vejîna Wî bînin, diyar bikin ku Reb e û di rêya bihuştê de rêhavelên wî yên sadiq bin jî.

Tişta ku pêşî li ber çavên ket ew bû ku fêhmkirina Giyanê Pîroz ne pêşniyaz, vebijêrk an jî tembiyek e. Ji ber ku ew fermanek bû! Fermanek ji bo başiya me, parastina me an jî ji bo başiya Desthilatdariyê tê kirin. Fermanên Wî divê em ji bo xwe û desthilatdariyê kêm nebînin.

Ev soza Bav ku weke fermanê li wan hatiye kirin, piştî Îsa çû asîmanan tenê bi deh rojan şûnde, wê pêk bihata. Tişta balkêş, piştî Îsa ji mirinê rabû xwe nîşanî ji pêncsed kesî zêdetir kir (Korîntî I 15:6) lê piştî ji wan veqetiya li Odeya Jor sed û bîst bawermend hebûn. Gava ji pêncsed kesî zêdetir dest pê dikir ku li benda soza Bav bimîne lê her diçû ez bawer dikim ku ji ber bêsebriyê, gumanê, bêbaweriyê an jî ji ber sedemên din girseyek mezin dûr dikeve û li dawiyê tenê evqas bawermend mane. Mixabin, hema bêje ji pênc kesan çar jê bi ya fermana Îsa nekirin.

Yên li dawiyê man di nava hevkirinekê de bûn, rojeva wan ne li ser bala wan bû. Ji fermana Îsa re ne biçûk dîtin û ne jî mahne jê re avakirin. Fikrên Wî her çiqasî dewam bike bila dewam bike, ez teqez bawer dikim ku divê em li bendê bin. Ji ber ku Efendî ji wan re gotibû bisekinin. Xweda, piştî ku kesên fermana Îsa bi awayekî cidî dibînin civandin, em wisa dixwînin:

> "Gava ku Roja Pentîkostê hat, ew hemû bi hev re li derekê civiyabûn. Û ji nişkê ve ji ezmên dengek wek rabûna bayekî xurt hat û ew mala ku ew lê rûdiniştin tije kir. Zimanên wek pêlên agir di nav wan de xuya bûn û li ser her yekî ji wan danîn. Hemû bi Ruhê Pîroz tije bûn û bi gotina ku Ruhê Pîroz dabû wan, dest pê kirin bi zimanên din peyivîn."
> (Karên Şandiyan 2:1-4)

Wê rojê, yek ji wan cejnên herî li pêş ya Îsraîliyan ya bi navê "Pentîkost" bû ku koka wê nagihê Peymana Kevin. Eynî weke çawa Îsa ji berê de ragihandibû, bala xwe bidinê ku bi Giyanê Pîroz hatine dagirtin an jî hatine waftîzkirin. Ev soza bav bû û axaftina bi zimanên din havaltî bi vê bûyerê re kir.

Di roja me de ji bo hinekan derbirina "zimanan" ji ber nezaniyê serî tevlihev dike an jî nepenî ye. Gava ku Nivîsên Pîroz behsa zimanan dike, tîne ziman ku bi zimanekî em jê fêhm nakin tê axaftin. Vê îfadeyê em li derveyî axaftina Pirtûka Pîroz jî bi kar tînin. Eger hûn bixwazin hîn bibin bê kesekî biyanî kîjan zimanî dipeyive, hûn ê zimanê wî yê bav û kalan jê bipirsin. Gava we ev pirs pirsî, ev tê wê wateyê ku hûn dixwazin hîn bibin gava mezin dibû zimanê pêşî yê ji dê û bavê xwe hîn dibû, fêr bibin.

Dengê bayê xurt nîşaneya ketina pêşî ya Giyanê Pîroz bû ku dixwest di her dem di wan perestgehan de bijî. Nivîsên Pîroz nabêjin Ew ba ye;  li şûna vê, ba nîşaneya ketina Wî bû.

## RÊYÊN DIJBER

Di vê xalê de destûrê bidin ez vê çavdêriya xwe ya ecêb bînim ziman. Şeytan û hevkarên wî her dem tiştên nelirê û dijberî rêyên Xweda dikin. Giyanê Pîroz gava ketina xwe ya pêşî kir, vê bi awayekî wisa dike ku ev nikare ji ber çavan bifilite. Gava ku Giyanê Pîroz dikeve dilê mirovan, rûdana Wî dibînin û dibihîzin. Em vê di pirtûka Karên Şandiyan de li cihên din dibînin. Lêbelê gava Giyanê Pîroz vediqete, vê ya bi awayekî bêdeng dike. Ji bo Delila, Şimşon bide girtin, nûçeya Filîstîniyên ku tên dide. Em derbarê wê kêliyê de, di Pirtûka Pîroz de wisa dixwînin:

> "Û pîrekê got: Filistî bi ser te ve hatin; ya Şîmşon! Û ji xewa xwe şiyar bû û got: Mîna derbên din ez ê xwe hilweşînim

> û derkevim. Lê belê *nizanîbû* ku XUDAN jê veqetiya ye” (Serweran 16:20, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Şimşon nizanîbû ku Xweda çûye ji ber ku Giyanê Xweda her dem bi awayekî bêdeng diçe. Lê mixabin giyanên ne baş bi awayekî bêdeng dikevin nava mirov lêbelê gava derdikevin vê bi awayekî xuyayî dikin û derdikevin (hûn ê vê yekê di seranserê metnên Mizgîniyê de bibînin).

## SOZ JI BO HER KESÎ DERBASDAR E

Îcar aniha em vegerin Roja Pentîkostê. Yahûdiyên ku ji her welatên dinyayê hatibûn, ji bo cejnê pîroz bikin li Yerûşalîmê gîhabûn hev. Gelê bajêr gava dengê ku dişibiya dengê ba bihîst, girseyên mezin hatin cihê xwendekaran. Van serdêran gava bihîstin ku xwendekarên bêperwerde karên Xweda yên bêhempa bi zimanên wan pesnê wan didin, matmayî man. Di nava matmayînê de ji hev pirsîn û gotin: “Ev tê çi wateyê gelo?”

Petrûs ji vê matmayînê sûd wergirt û ji hemû kesên li wir in re ji bo waaza Îsa bike derket holê. Di dawiya peyama xwe de wisa got:

> “Xwedê ev Îsa ji nav miriyan rakir û em hemû şahidên vê yekê ne. Îcar ew hatiye hilkişandin milê Xwedê yê rastê û ji Bav soza Ruhê Pîroz stand û çawa ku hûn *dibînin û dibihîzin* ew rijandiye.” (Karên Şandiyan 2:32-33, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Bala xwe bidinê ku dibêje soza Giyanê Pîroz tiştekî “tê dîtin û tê bihîstin.” Di dilê xwe de vê bibêjin: “dîtin û bihîstin.” Ji bo ayetên pêş girîng e ku hûn van bînin bîra xwe.

Girseya ku hatibû ser hev weke ku xincerek li dilê wan bikeve çêbû û pirsîn bê divê çi bikin. Petrûs wisa dibersivîne:

> "Petrûs ji wan re got: Tobe bikin û ji bo ku li gunehên we bê bihûrtin bila her yek ji we bi navê Îsa Mesîh imad bibe û hûnê diyariya Ruhê Pîroz bistînin. Çimkî ev soz ji bo we, ji bo zarokên we û ji bo hemûyên ku dûr in; *ji bo her kesî ye ku Xudan Xwedayê me gazî wî dike."* (Karên Şandiyan 2:38-39, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

Bala xwe bidinê ku ev soza "dibînin û dibihîzin" ji bo her kesê li dûr, ji bo her kesê ku wê Xwedayê me Reb bang wan bike, derbasdar e. Bûyera ku van xwendekaran li Odeya Jor tecrube kir, ez û we jî di nav de ji her kesê bang Reb kiriye soz hatiye dayîn!

Li vir di seranserê Peymana Nû de, di ser her kesê ku wê Giyanê Pîroz bi dest bixe re, ez dixwazim bi kurtasî em derbas bibin. Çar mînakên din hene. Du tiştan not bistînin. Ya pêşî, yek ne di nav de, di her qeydê de ku Îsayê Mesîh weke Reb bipejirîne, tecrubeyeke din bû. Ya duduyan, di her rewşê de şahidên li derdorê dîtin û bihîstin ku mirovan rûdana Giyanê Pîroz ya derveyî hîn bûn.

## SAMÎRIYE

Filipus çû bajarekî li Samîriyeyê û Îsa diyar kir. Girse ji bo li wî guhdar bikin hatin. Li wî bajarî Xweda pir karên xweş kirin û "Çimkî ruhên nepak bi dengekî bilind qîriyan û ji gelek kesên cinoyî derketin û gelek kesên felcî û seqet sax bûn" (Karên Şandiyan 8:7). Çalekiya mizgîniyê pir bi hêz bû û di bajêr de coşiyeke mezin li dar ket. Em wisa dixwînin:

> "Lê gava ku wan ji Filîpos bawer kir, yê ku Mizgîniya li ser Padîşahiya Xwedê û li ser navê Îsa Mesîh dida, hem jin hem mêr imad bûn. Şimûn bi xwe jî bawerî anî. Piştî ku

> imad bû, hergav li ba Filîpos dima û li nîşan û kerametên mezin ên ku dihatin kirin, şaş dima.” (Karên Şandiyan 8:12-13)

Gelê bajêr bawerî bi mizgîniya Îsayê Mesîh anîn û bûn waftîzê avê. Bi vî awayî li gorî Nivîsên Pîroz di bin Desthilatdariya Xweda de ji nû ve çê bûn. Lêbelê gava em xwendina xwe didomînin em vê dibînin:

> “Îcar gava ku Şandiyên li Orşelîmê bihîstin ku Samerya peyva Xwedê qebûl kiriye, wan Petrûs û Yûhenna şandin ba wan. Ew jî daketin jêr, ji bo wan dua kirin ku Ruhê Pîroz bistînin, çimkî hê Ruhê Pîroz nehatibû ser yekî ji wan, tenê ew bi navê Xudan Îsa hatibûn imadkirin.” (Karên Şandiyan 8:14-16)

Di bin Desthilatdariya Xweda de halîhazir bi îfadeya ku ji nû ve vejiyane “Bi navê Reb Îsa waftîz bûne” careke din tê tesdîqkirin. Êdî tu guman jê tuneye ku ji desthilatdariya tariyê xelas bûne û bûne ji malbata Xweda. Lêbelê her çiqasî weke bawermendên ji nû ve çêbûne bên dîtin jî, hîn jî bi Giyanê Pîroz nehatibûn waftîzkirin.

Dibe ku hûn bipirsin bê çawa xelas bûne ji ber ku Nivîsên Pîroz bi awayekî eşkere wisa dibêjin: “Ji bo vê yekê ez bi we didim zanîn: Tu kes bi peyivîna ku bi Ruhê Xwedê ye nabêje: Nifir li Îsa be! Û eger ne bi Ruhê Pîroz be, tu kes nikare bêje: Îsa Xudan e” (Korîntî I, 12:3). Ev rast e. Bêyî bandora Giyanê Pîroz em nikarin mikur bên ku Îsa Reb e. Lêbelê ev ji rewşa ku mirov bi Giyanê Pîroz tije bibe cuda ye. Di dema bîr û baweriyê de, Giyanê Pîroz me pîroz dike, mor dike û di nava me de mala xwe ava dike (bnr. Petrûs I 1:2, Efesî 1:13, Romayî 8:9-11) lê bi navê Îsa heta ji Bav parsê bikin, divê em bi hebûna Wî tije bibin. Ji ber ku Nivîsên Pîroz wisa dibêjin:

> "Bi ser ku hûn xerab in jî, hûn dizanin diyariyên qenc bidin zarokên xwe. Îcar Bavê ezmanî hê çiqas bêtir wê Ruhê Pîroz bide wan ên ku ji wî dixwazin." (Lûqa 11:13)

Ji gotina "Bavê li Asîmanan" em fêhm dikin ku ev soz tenê ji bo zarokên Wî hatiye dayîn. Di vê peywendê de, Îsa pişt re dibêje Giyanê Rastiyê yê dinyayê "ez ê nikaribim qebûl bikim (Yûhenna 14:17). Ji gotinên Îsa em dibînin ku ev di Desthilatdariya Xweda de ji nû ve çêbûne û serpêhatiyeke cuda ye.

Em bi gelê Samîriye re berdewam bikin:

> "Hingê Petrûs û Yûhenna destên xwe danîn ser wan û wan jî Ruhê Pîroz stand. Îcar gava ku Şimûn dît ku Ruh bi destdanîna Şandiyan a li ser wan tê dayîn, wî pere pêşkêşî wan kirin û got: Vê hêzê bidin min jî, da ku ez destên xwe deynim ser kê, Ruhê Pîroz bistîne." (Karên Şandiyan 8:17-19)

Piştî ku ev bawermend jixwe rizgar bûn, rahiştin Giyanê Pîroz. Bi taybetî dibêjin ev kes bi zimanan napeyivin lêbelê Simun ji ber çi pereyan teklîfî elçiyan bike? Di Nivîsên Pîroz de tê gotin ku Simun dîtiye ku Giyanê Pîroz tê dayîn. Rûdaneke pir eşkere hebû û rûdan ji bilî tiştekî ku bi zimanên nayê zanîn ne tiştekî din e. Ji ber ku hemû Giyanê din yê ku di Peymana Nû de hatiye qeydkirin, bi wan serpêhatiyan re li hev dike.

Gava em li ser Nivîsên Pîroz yên derbarê tiştên li Samîriyeyê pêkhatine, disekinin; berî her tiştî em fêhm dikin ku rahiştina tijebûna Giyanê Pîroz tecrubeyeke ji bîr û baweriyê cuda ye û ya duduyan jî em fêhm dikin ku temaşevanan rûdaneke dervejî dîtine.

## EFES

Elçî Pavlûs û tîma xwe hatin Efesê û li wir hin xwendekar dîtin. Pirsa pêşî ya ku ji wan pirsî ev bû:

> “Wî ji wan re got: Ma gava ku we bawerî anî, we Ruhê Pîroz stand? Wan lê vegerand û gotin: Na, me qet nebihîstiye jî ku Ruhê Pîroz heye.” (Karên Şandiyan 19:2)

Divê pirsa ku em ê jî ji kesên nû bawer kirine re bipirsin ev be. Mirov çima bêyî ku nêzî Xweda bibin û ji bo bibin şahidên Îsa, em ji wan bixwazin bêyî ku bi hêz bibin saetekê derbas bikin (bmr. Karên Şandiyan 1:8)?

Van xwendekaran Giyanê Pîroz nebihîstibûn û tenê ji aliyê Yehyayê Waftîzkar di avê de hatibûn waftîzkirin. Ji ber vê Pavlûs û tîma xwe ji wan re xelasiya ku ji aliyê Îsayê Mesîh ve hatiye, diyar kirin. Em xwendinê berdewam bikin:

> “Îcar gava ku ev bihîstin, bi navê Xudan Îsa imad bûn.” (Karên Şandiyan 19:5)

Li gorî Nivîsên Pîroz êdî teqez di bin Desthilatdariya Xweda de ji nû ve çêbûn. Ji ber ku Rebbûna Îsa eşkere kirin û bi navê Wî bûn waftîzê avê. Di ayeta piştî vê de em vê dixwînin:

> “Çaxê Pawlos destên xwe danîn ser wan, Ruhê Pîroz hat ser wan, bi zimanên din peyivîn û pêxemberîtî kirin. (Karên Şandiyan 19:6)

Careke din kêlîka ku bi Giyanê Xweda bi ser ve çûn, bi zimanan peyivîn û dest bi pêxemberiyê kirin û kesên li wir bûn, rûdana soza Bav dîtin û bihîstin.

Pêxemberî tê wateya “axaftina bi alîkariya îlhama xwedayî.”

Petrûs di Roja Pentîkostê de, gava waaza bêhempa ya ku bi hezaran mirov anîn ber Desthilatdariya Xweda da, pêxembertî kir. Bêyî amadekariyekê an jî xebatekê, Gotina Xweda îlan kir û weke îlhama Xwedayî peyivî. Ev zilamên li Efesê berî ku bi Giyanê Pîroz bên dagirtin, derbarê rêyên Xweda de hinekî xwediyê têgihiştinekê ne. Lêbelê piştî ku bi Giyanê Pîroz bi ser ve çûn, îcar aniha bi rêya îlhamê dipeyivin.

Her mirovê ku bi Giyanê Xweda tije dibe, heman tişt bi wan tê. Mamoste tê di nava me de dijî û mijarên aîdê Xweda zelal dibin. Berî ku bi Giyan re waftîz bibim, Soz û rêyên Xweda ji bo min xumamî bûn. Lêbelê pişt re rewş hat guhertin, Pirtûka Pîroz bi awayekî şexsî dilê xwe ji min re vekir. Bêyî Giyanê Pîroz kesên ku demeke pir dirêj bi bîr û baweriyê jiyan, îcar pişt re gava ev kes bi Giyanê Pîroz tije bûn li wan rast hatim û min dît ku wisa gotin: "Pir pirsên min hebûn lê aniha min bersiva hemûyan dît." Û wekî din digotin: "Pirtûka Pîroz heta tu bêjî bes li ber min eşkere bû."

Bi heman awayî dîsa çêbûne lêbelê min şîroveyên derbarê Pirtûka Pîroz yên bawermedên bi Giyan dagirtîne yên xwendekarên Pirtûka Pîroz yên bixîret ku bi Giyanê Pîroz ne dagirtîne, bihîstin. Sê qatan zêdetir dikarin bixebitin lêbelê dîsa jî li dawiya têgihiştina bawermendên bi Giyan tije ne, dimînin. Gava ez van şîroveyan dibihîzim tenê wisa bersivê didim: "Ev hêsan e, kesê bi Giyan ne dagirtî be, ne xwediyê ronîbûna tam ya ku Giyanê Pîroz ava dike." Lê dibe ku xwediyê wê bin jî ji ber ku tijebûna bi Giyan, ew soza Xweda ye ya ji bo her kesê ku navê Îsa bang dikin! Xweda ji me re pir baş e!

Wê demê careke din, weke li Samîriyeyê bûye, tijebûna bi Giyanê Pîroz ya bawermendên li Efesê, tecrubeyeke ji bîr û baweriyê cuda bû û rûdaneke derveyî xuya bû.

# PAVLÛSÊ ELÇÎ

Di beşa 9an ya Karên Şandiyan de, Saulê ku em weke Pavlûs nas dikin, bi niyeta ku zilmê li bawermendan bike, berê xwe dida Şamê. Gava nêzî Şamê dibe ji asîmanan ronahiyeke ku çavan kor dike xuya dibe û dengê Reb dibihîze:

> "Ew ket erdê û dengek bihîst ku ji wî re got: Şawûl, Şawûl, tu çima tengahiyê didî min?» Şawûl pirsî û got: Ya Xudan, tu kî yî? Wî jî got: Ez Îsa me, yê ku tu tengahiyê didiyê. Lê rabe û bikeve bajêr; wê ji te re bê gotin, ku divê tu çi bikî." (Karên Şandiyan 9:4-6)

Tam di vê kêliyê de ez bawer dikim ku Saul ji nû ve çêbûye. Ji ber vê du sedemên min hene. Ya pêşî piştî ku Reb got "Ez… Îsa me", Saul ew weke "Efendî" îlan kiribû. Ya duduyan jî Saul sê rojan rojî girtibû û dua kiribûn. Pişt re Hananya hatibû cem wî û bi awayekî eşkere wisa got:

> "Hingê Hananya rabû û çû ket wê malê. Wî destên xwe danîn ser Şawûl û got: *Birayê* Şawûl, Xudan ez şandim, ew Îsayê ku di rê de li te xuya bû, da ku tu dîsa bibînî û tu bi *Ruhê Pîroz tije bibî."* (Karên Şandiyan 9:17, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Bala xwe bidin peyva "bira." Ji Îsayê Mesîh bawer kiribû, Ew weke Efendî pejirandibû û ev bibû sê roj ku dua dikirin. Bi vî awayî piştî ku halîhazir ji nû ve çêbû, Hananya ji bo bi Giyanê Pîroz bê dagirtin ji Saul re dua kirin.

Li vir nabêje ku Saul bi zimanan peyiviye. Lêbelê di Nameya Korîntî Iê de bi awayekî eşkere dibêje: "Şikir ji Xwedê re, ez ji we hemûyan bêtir bi zimanên din dipeyivim" (Korîntî I, 14:18). Kengî dest bi axaftina zimanan kir? Gava Hananya destê xwe danî ser wî û dua kirin (Karên Şandiyan 9:17).

## MALÎ Û KORNELIUS

Fermandarekî Romayî yê bi navê Kornelius heye. Ew, maliyên wî û hevalên li mala wî kom dibûn ji gelên din bûn yên ku pêşî bawer kirin û ji nû ve çêbûn. Kornelius her dem rojî digirt û dua dikirin û rojekê ferîşteyekê xwe nîşanî wî da û jê re got bang Petrûs bike.

Piştî çend rojan gava Petrûs hat, Kornelius hemû hezkiriyên xwe dabûn hev û hemû li bendî peyama Petrûs amade bûn. Petrûs dest pê kir û Îsa olan da û hîn berî gotinên xwe biqedîne em van bûyeran dixwînin:

> "Hê Petrûs ev tişt digotin, Ruhê Pîroz hat ser hemûyên ku peyv bihîstin. Îcar bawermendên Cihû yên ku bi Petrûs re hatibûn, şaş man ku çawa diyariya Ruhê Pîroz bi ser miletên din de jî rijiya bû. Çimkî wan bihîst ku ew bi zimanên din dipeyivin û pesnê Xwedê didin." (Karên Şandiyan 10:44-46)

Ola Yahûdiyan û heta di meseleyên civakî de ji mirovê gelên din tu têkiliya wan tunebû. Ev gel ji peyamên ku soza wan hatibû dayîn re biyanî bûn û li dinyayê ne bextewar bûn û bêxweda bûn (bnr. Efesî 2:12). Ji ber vê bûyerên li vir diqewimin, Yahûdiyên bi Petrûs re hatin matmayî hiştin. Ji ber ev kesên ne Yahûdî ku gîhan xelasiyê û Giyanê Pîroz fêhmkirin, matmayî man.

Di Pirtûka Pîroz de ku mirov di esasê xwe de hem xelas bûne û hem jî bi Giyanê Pîroz tije bûne, tenê ev mînak heye. Yahûdiyên ku bawer nakin wê Kornelius û hezkiriyên wî xelas bibin, ji bo Îsa an jî Giyanê Pîroz fêhm bikin, tê zanîn ku wê duayan nekin, ez bawer dikim ku Xweda wisa kiriye û ez fêhm dikim ku hûn ê li hemberî vê derkevin. Ka lê bifkirin, kesekî ku ji nû ve çêdibe îspateke derveyî ya mûcîzeyî û ji nişka ve xuya nabe. Ji ber vê ev

kes gava Petrûs waazan dike, ji Gotin'ê bawer bikirina û Îsa weke Reb pejirandina, ji ber ku îspateke derveyî tuneye wê Yahûdiyan tu carî bawer nekira ku mirovên ji gelên din tên xelas bibin û ev tişt karekî pêkan be.

Lêbelê piştî bi Giyanê Pîroz tije bûn eynî weke Yahûdiyan, gava bi zimanan dipeyivîn Xweda ji mirovên din yên ji gelên din jî xelasî ava kir û wan ev yek înkar nekir.

Ev bûyer, bêyî duduliyê bike nîşan dide ku kesek bidestxistina Giyanê Pîroz ya mirov pê tije ye, bi axfatina zimanan ji aliyê derveyî de dide xuyakirin. Di wergereke din de wisa derbas dibe: "Xelata Giyanê Pîroz bi ser kesên ku ji gelên din in jî rijiya. Û tu guman ji vê tunebû ji ber ku bi zimanên ku nizanîbûn dipeyivîn û diyar dikirin ku Xweda berzûbala dikin" (Karên Şandiyan 10:45-46). Çawa fêhm kirin? "Ji ber ku... dibihîstin." Soza Bav dîtin û bihîstin!

## WÊ ZIMAN NEMÎNIN

Aniha dibe ku hûn wisa bipirsin: Belê, ev ji bo hemû xwendekarên pêşî derbasdar e lê ma di Pirtûka Pîroz de nabêje gava yê tekûz bê wê ziman bi dawî bibin? Belê, tê gotin. Lêbelê ma yê tekûz hat? Dibe ku hinek wisa bibêjin: "Belê, ya tekûz Pirtûka Pîroz bû û aniha li gorî ku em xwediyê wê ne, naxwe pêdiviya me bi zimanan tuneye." Baş e, ji bo em li vê şîroveyê binêrin bê rast e an na, em li Nivîsên Pîroz binêrin. Pavlûs wisa dinivîsîne:

> "Dawiya hezkirinê qet nayê; lê heçî pêxemberîtî ne, wê betal bibin; heçî zimanên ruhanî ne, wê rabin; heçî zanîn e, wê betal bibe. Çimkî zanîna me kêm e û pêxemberîtiya me kêm e. Lê çaxê ku bêkêmahîtî bê, ya kêm wê betal bibe." (Korîntî I, 13:8-10)

Pêşî, gava yê tekûz hat wê ne tenê ziman, tê gotin ku wê zanîn jî (zanînên hatine wehiykirin) ji holê rabe. Ev rewş teqez hîn nehatiye kirin. Naxwe ji bo em dema hatina “kesê tekûz” bi awayekî teqez diyar bikin, em xwendina xwe bidomînin:

> “Çimkî niha em di neynikê de, ne zelal dibînin, *lê hingê* emê rû bi rû bibînin. Niha ez hinekê dizanim, *lê hingê,* çawa ku ez tam têm zanîn, ezê tam bizanim.” (Korîntî I, 13:12, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

Bala xwe bidinê ku du carî gotina “lê hingê” bi kar aniye. Di vir de dema ku tê behskirin ew dema ku wê kesê tekûz bê ye. Du tişt wê demê pênase dikin. Ya pêşî em ê bi Reb re rû bi rû hevdu bibînin. Aniha hûn bi Wî re hevdu dibînin? Bedena Wî ya vejînkar, çavên Wî yên diçirisin, porê Wî yê weke pelên spî, rûyê Wî yê şewq jê dibare hûn dibînin gelo? Ya duduyan ku vê rewşê diyar dike ev e: “çawa ku ez tam têm zanîn.” Weke ku Ew bi we dizane hûn pê dizanin? Bersiva van pirsan helbet na ye! Behsa demên ku em ê bi bedenên xwe yên hatine berzûbalakirin, em ê bi Reb re bin. Dema kesê tekûz ha wê tam ew dem be.

Li gorî ku hîn kesê tekûz nehatiye, teqez dawî hîn li zimanan jî nehatiye. Di beşên pêş de, ez ê diyar bikim ku yek ji hebûna pêşî ya zimanan ew e ku em nêzîkayiyeke mezin ya bi Xweda re deynin!

## GELO HEMÛ DIKARIN BI ZIMANÊN KU NIZANIN BIPEYIVIN?

Yekî din dikare wisa bipirse: “Ez ji zimanan bawer dikim lê her bawermend nikare vê hilgire ji ber ku di Nivîsên Pîroz de jî wisa dipirse: ‘Gelo hemû dikarin bi zimanên ku nizanin bipeyivin?’ û bersiva vê yekê na ye.” Ev jî dîsa têgihiştineke şaş

ya mezin ya gotinên Pavlûs e. Ji bo çareserkirina vê pirsê ya ku gelek kesan ji soza Xweda dûr disekinîne, divê pêşî em fêhm bikin ku di Peymana Nû de ziman di çar beşên cuda de ji hev hatine veqetandin. Dudu jê ji bo xizmeta civakî û duduyê din ji bo hevkariya şexsî ya bi Xweda re ye. Ji bo em bersiveke têr û tije bidin vê pirsê, em her yekê di ber çavan re derbas bikin: Gelo xwesteka Xweda ew e ku hemû zarokên Wî bi zimanan bipeyivin?

## ZIMANÊN NÎŞANKIRÎ JI BO KESÊN BÊ BÎR Û BAWERÎ

Beşa pêşî ya zimanan ji bo xizmeta civakî ye. Bi gotina civakî, qesta min ew e ku ji kesekî din re an jî ji komeke din re xizmetê bike. Pavlûs wisa dibêje:

> "Ji ber vê yekê ziman ne ji bo bawermendan, lê ji yên ku baweriyê naynin re, ji bo nîşanekê ne." (Korîntî I, 14:22)

Ev beşa zimanan, gava ku Giyanê Pîroz qabîliyeta axaftina zimanekî din yê dinyayî an jî yê ku berê em hîn nebûne dide me xuya dibe. Li gorî xwesteka Giyanê Xweda tê dayîn, em bi xwe nikarin biryarê bidin ji bo biaxivin û gelek caran em ferq nakin ku bi van zimanan dipeyivin jî. Tenê em di wê ferqê de ne ku em bi zimanekî ku nizanin dipeyivin, li vê dinyayê em nizanin ku em bi zimanekî tê zanîn, dipeyivin.

Ez mînakekê bidim. Berî bi çendakî li dêreke mezin ya Koloradoyê min waaz didan. Yek ji endamên kadroya min di civînê de li ser kursiyên dawî rûdinişt. Ew bi xwe xwuşkeke duaker e û gava min waaz dida, hîs kir ku Reb dixwaze ji bo min duayan bike. Bi vî awayî di seranserê waazên min de bi zimanên nizane (bîsteke din ez ê bêm ser) bi awayekî bêdeng dua kirin. Piştî waazê zilamê maqûl yê li pêşiya wê rûniştî li wê vegeriya û

wisa got: “Hûn bi awayekî pir herikbar bi Fransî dipeyivin, ya rastî şêweyê axaftina we bêhempa ye.”

Li ser vê yekê ji zilam re got ez bi Fransî nizanim.

Zilam matmayî ma û di nava vê matmayînê de wisa got: “Ez mamosteyê zimanê Fransî me û di seranserê vê demê de ji bo waîzker, bi Firansiyeke bêqusûr te dua kirin û di duayên xwe de te ji Nivîsên Pîroz nivîs dixwendin û piştî te ayetek xwend û pişt re di cih de waîzker ji me xwest ku em wê ayeta te xwend ji Pirtûka xwe ya Pîroz vekin!”

Ne hewce ye em behs bikin ku zilam pir di bin bandora vê yekê de ma û xwuşka me pir bi kelecan bû. Ev bûyer ji bo wî zilamî tiştên min weke waazan didan di rastiyê de Gotina Xweda bû ku ev weke daxuyanekê bû jê re.

Ev ziman di Roja Pentîkost de, di xwedekaran de xuya bû. Nivîsên Pîroz wisa dinivîsînin:

> “Hingê li Orşelîmê, Cihûyên xwedêtirs ji hemû miletên ser rûyê erdê hebûn. Li ser vî dengî elaleteke mezin civiya û tevlihev bû, çimkî her kesî dibihîst ku bi zimanê wî dipeyivin. Matbûyî û şaşmayî pirsîn: Ma ev hemû yên ku dipeyivin ne ji Celîlê ne? Ma çawa çêdibe ku her yek ji me zimanê xwe yê dê dibihîze? Di nav me de Partî, Mêdî û Elamî hene. Ji Mezopotamyayê, Cihûstan, Kepedokya, Pontos û Asyayê, ji Firîgya û Pamfîlyayê, ji Misrê û ji herêma Kûrenê ya Lîbyayê, mêvanên ku ji Romayê hatine, Cihû û Xwedêperestên ji miletên din, Girîtî û Ereb hene. Em dibihîzin ku ev bi zimanên me li ser karên Xwedê yên mezin dibêjin.” (Karên Şandiyan 2:5-11)

Eger em careke din diyar bikin, ev beşa zimanan ji bo kesê bê bîr û bawerî, diyardeyek e. Weke ji bo kesên xwende yên di van ayetan de ku ji welatên dinyayê tên, di çîroka jor de ji bo

mamosteyê Fransî jî ev diyardeyek bû. Vê diyardeyê bala wan kişand û dilê xwe ji Gotina Xweda re vekirin.

Min gelek mînakên ku kesên bawermend bi zimanên biyanî yên ku qet nizanin, ji mirovan re Gotina Xweda gotine, bihîstine. Ev diyardeyek e ku peyama hezkirina Xweda ye ku vê yekê piştrast dike. Di her rewşê de di encama vê diyardeya bêhempa de, xizmeteke bêhempa pêk tê.

## ZIMANÊN JI BO WERGERÊ HATINE DAYÎN

Beşa duduyan ya zimanan jî, ji bo xizmeta di nav civakê de ye. Ev ziman zimanên asîmanî ne, ne zimanên li ser rûyê erdê tên axaftin in. Ji bo beşên din yên ku ez ê pênaseya wan bikin jî heman tişt derbasdar e.

Belkî dibe ku hûn li asîmanan li rastiya ku gelek ziman û zaravayên hene dipirsin. Li vê dibetiyê bifikirin: Di pirtûka Peyxamê de Îsa ji hemû kesê ku wê li asîmanan bi ser bikeve “Ewê ku bi ser dikeve, ezê ji Mannayê veşartî bidim wî. Ezê kevirekî spî yê ku navekî nû li ser nivîsiye bidim wî; ji yê standî pê ve, kes nizane” (Peyxam 2:17) nivîsandiye. Ya din jî ji bo Îsa ev tê gotin: “Çavên wî wek pêta êgir in û li ser serê wî gelek tac hene. Navekî wî yê nivîsî heye ku ji wî pê ve tu kes nizane” (Peyxam 19:12). Wê demê eger kesek van navan nizanibe, sedema vê dibe ku li asîmanan zimanên cuda hebin.

Ev ziman di 12 beşên Nameya Korîntî ya Yekem de ku weke lîsteyekê tê dayîn, yek ji wan neh xelatên Giyanê Pîroz e. Em wisa dixwînin:

> “... ji yekî re zimanên cûr bi cûr, ji yekî re karîna wergerandina zimanan tê dayîn.” (Korîntî I, 12:10)

Bala xwe bidinê ku divê wergera van zimanan hebe. Çima? Ji

ber ku ev zimanên asîmanî ne ku li dinyaya normal nayên zanîn.

Civîneke li Sîngapûrê tê bîra min. Li dêrekê mezin ya wî welatî ji min hatibû xwestin ku xizmetê bikim û rêwitiya min ya pêşî bû li wî welatî. Berî ji bo waazê derkevim ser dikê, piştî dema hebandinê ku me îlahiyên xweşik dixwendin, civat bêdeng ma.  Ji nişka ve zilamekî bi dengekî bilind û bi zimanekî asîmanî dest bi axaftinê kir. Her çiqasî mîqrofona wî tunebû jî dengê wî bilind û zelal bû. Li cihê fireh li aliyê şaneşînê li cihekî bû lêbelê her kesî zelalbûna dengê zilam û desthilatdariya wî dibihîst. Te digot qey asîman dengê zilam bilind dikir.

Gava zilam dipeyivî zilamê di nava min de ji kêfan lotik li xwe dixistin, zilamê min yê ji her kesî ve xuyakirî jî bi hurmetî disekinî. Di nava vê atmosfera pîroz de, min hîs kir ku mûyên canê min bûne weke şûjinan û gurme gurma dilê min e. Piştî ku axaftina xwe xelas kir, wergera wê hat kirin, werger û Gotina Reb ya bi rêya wî zimanî hatibû dayîn, wê êvarê bi peyama min dikir ku parve bikim re tam li hev dikir. Ez matmayî mam. Xweda ne tenê ji min re lê peyama ku min ê wê êvarê ji hemû civatê re parve kiribûya, ji aliyê Wî de piştrast dikir.

Gava ku wergera van zimanan tê kirin dişibe pêxembertiyê. Ji ber vê Pavlûs wisa dibêje: “Ez dixwazim ku hûn hemû bi zimanan bipeyivin; lê ez hê bêtir dixwazim ku hûn pêxemberîtiyê bikin. Yê ku pêxemberîtiyê dike, ji yê ku bi zimanan dipeyive mezintir e. Lê eger yê ku bi zimanan dipeyive ji bo avakirina civînê wergerîne, ev tiştek din e” (Korîntî I, 14:5). Careke din bi vê ayetê re hûn dikarin bibînin ku ziman ji bo xizmeta civata dêrê hatine dayîn û gava Pavlûs dipirse “Gelo hemû dikarin bi zimanên ku nizanin bipeyivin?” qesta wî ev beşa zimanan bû. Ji ber vê aniha ka em vê ayetê ji peywenda wê bixwînin:

> "Xwedê di civîna bawermendan de, pêşî Şandî, duwem pêxember, sêwem mamoste, piştre yên ku kerametan dikin, yên ku nexweşan qenc dikin, yên ku alîkariya kesên din dikin, yên ku dikarin îdare bikin û yên ku zimanên din dipeyivin destnîşan kir. Ma hemû Şandî ne? Ma hemû pêxember in? Ma hemû mamoste ne? Ma hemû kerametan dikin? Ma diyariya hemûyan heye ku nexweşan qenc bikin? Ma hemû bi zimanan dipeyivin? Ma hemû zimanan werdigerînin?" (Korîntî I, 12:28-30)

Hûn ferq dikin ku Pavlûs derbarê xelatên xizmetê yên ku Xweda di dêrê de bi cih kiriye, dipeyive? Helbet hemû elçî, pêxember, mamoste an jî pastor, weke çawa ne xwediyê ku mûcîzeyê bikin û ne xwediyê xelata başbûnê ne, hemû ne xwediyê axaftina zimanan an jî xelata wergera zimanên asîmanî ne. Çima? Bersiva vê di ayetên jêr de ye:

> "Ji ber vê yekê ziman ne ji bo bawermendan, lê ji yên ku baweriyê naynin re, ji bo nîşanekê ne. Û pêxemberîtî ne ji bo yên ku baweriyê naynin, lê ji bo bawermendan e. Niha eger tevahiya civîna bawermendan li hev bicive û hemû bi zimanan bipeyivin û yên ku ji diyariyên ruhanî fêm nakin an jî yên ku baweriyê naynin bikevin hundir, ma nabêjin ku hişê we ji serê we çûye?" (Korîntî I, 14:22-23)

Berî ez pirsê bibersivînim, ez bi awayekî zelal bînim ziman ku di van ayetan de du qategoriyên cuda ku di xizmeta civakê de ne tê bikaranîn, xuya dikin. Pêşî dinivîsîne ku ziman ji bo kesên ne bawermend diyardeyek e. Ev axaftina zimanên dinyayê ne ku em tu carî wan hîn nabin. Keseki ne bawermend yê ku bi van zimanan dizane, bêyî midaxeleya mûcîzeyî ya Reb, fêhm dike

ku ne pêkan e em van gotinan bibêjin. Bi vî awayî ji bo kesên bêbawerî ev dibe diyardeyek.

Pavlûs pişt re behs dike ku hemû civata kesên bawermend hatine cem hev û hemû bi hev re bi zimanan peyivîne. Ev eşkere ye ku ev zimanên asîmanî ne. Sedema ku wisa got ew bû ku di Roja Pentîkostê de hemû xwendekar karên Xweda yên bêhempa bi zimanên cuda yên dinyayê peyivîne. Ziman ne mecbûr bûn ku bên wergerandin ji ber ku yên bê bîr bawerî zanîbûn bê çi dibêjin. Di vê ayetê de wergera dêrê behsa axaftina zimanên asîmanî yên pêwistî dike. Eger neyê wergerandin wê tu kes fêhm neke. Weke tê dîtin ne her kes ne mecbûr e bi zimanan bipeyive, eger ne wisa be kesên nû tevlî me bûne an jî yên bawer nakin wê bibêjin ez dîn bûme.

Wê demê bersiva pirsa “Hemû dikarin bi zimanên ku nizanin bipeyivin?” ku gelekan jî xelet fêhm kiriye, pir hêsan e. Xweda di mijara xelatên xizmetê yên ku di dêrê de bi cihkirine, hilbijêr e. Ji ber ku her kes ne mecbûr e vê xelatê bi kar bîne. Lê ew ferqê naxe nav û ez dîsa dibêjim, di rêwitiya me ya baweriya şexsî de, di mijara tiştên ku daye her yekî ji me de, ne hilbijêr e. Du beşên piştî van, xelata zimanan ya derbarê têkiliya me ya şexsî ya bi Xweda re, di xwe de diwehîne.

## ZIMANÊN JI BO DUAYÊN ŞEXSÎ

Du beşên zimanan yên piştî van ji bo duayên şexsî ne û avakirina Bav ji bo her kesê ku baweriya xwe pê tîne. Di ayetên jêr de hûn dikarin bibînin ku behsa van zimanan dike:

> “Çimkî, eger ez bi zimanê din dua dikim, ruhê min dua dike, lê hişê min bêber dimîne. Îcar ez çi bikim? Ezê bi ruh dua bikim û ezê bi hiş jî dua bikim; ezê bi ruh lavijeyan bêjim û ezê bi hiş jî lavijeyan bêjim.” (Korîntî I, 14:14-15)

Bala xwe bidinê ku Pavlûs ev ziman ne weke zimanên ku ji dêrê re xizmetê dike, bi taybetî weke duayan pênase kirine. Ya din jî di heman beşê de wisa tê gotin: “Çimkî yê ku bi zimanê ruhanî dibêje, ne ji mirovan re, lê ji Xwedê re dibêje. Kes wî fêm nake; ew bi ruh siran dibêje” (Korîntî I, 14:2). Gava em bi zimanekî xizmetê yê civatekê peyivîn, em ji kesên bê bawerî (zimanên ji bo diyardeyê) an jî ji dêrê re (zimanên wergera wan heye) dipeyivin. Lê gava em bi zimanan duayan dikin, em ne bi mirovan re em bi Xweda re dipeyivin. Hûn ferqa wê dibînin?

Di ayeta jor de Pavlûs, behsa du rêyên duakirinê dike. Ya pêşî ew e ku em bi hişê xwe duayan dikin ku ev ji bo min di zimanê îngilîzî de pêk tê. Rêya din ya duakirinê jî bi zimanan duakirin e ku di vê rewşê de bi rêliberxistina Giyanê Pîroz re giyanê min duayan dike. Heman tişt ji bo gotina îlahiyên hebandinê jî derbasdar: “Ez ê bi giyanê xwe re bibêjim û di heman demê de ez ê bi hişê xwe jî bibêjim.” Yehûda bi van gotinan weke şexsî duakirina bi zimanan pênase dike:

> “Lê hûn, ey hezkirîno, xwe li ser baweriya xwe ya herî pîroz ava bikin, bi Ruhê Pîroz dua bikin, xwe di hezkirina Xwedê de bigirin û ji bo jiyana herheyî li hêviya rehma Xudanê me Îsa Mesîh bimînin.” (Cihûda 1:20-21)

Gava em bi zimanan duayan dikin, em xwe bi pêş dixin lê gava em ji civatê re bi zimanan dipeyivin û wergera wê dikin bala xwe bidinê ku em kesên bawermend bi pêş dixin (Korîntî I 14:5). Xweda herduyan jî dixwaze û herdu jî girîng in. Di beşa piştî vê de ez ê li ser vê meseleya zimanan hîn bêtir bisekinim. Ji bo em bi Rebê xwe re nêz bimeşin hûn ê kifş bikin ku ev bivênevê ye. Ez navê vê kategoriya zimanan dikim “Zimanê Nêzîkayiyê.”

## ZIMANÊN JI BO NAVBEYNKARIYÊ

Ji çar kategoriyên ziman ya dawî ya ku em bi duayan li ber devê derî sekinîne, ango ji bo xizmeta navbeynkar e ya kesekî ku pêdiviya wî bi alîkariyê heye:

> "Bi vî awayî Ruh jî di qelsiya me de alîkariyê dike. Çimkî em nizanin ka divê em çawa dua bikin; lê belê Ruh bi xwe bi nalînên ku nayên îfadekirin ji bo me mehderê dike. Û Xwedayê ku li dilan dikole bi fikirîna Ruh dizane. Çimkî Ruh li gor daxwaza Xwedê ji bo pîrozan mehderê dike." (Romayî 8:26-27)

Hin demên me yên ku em nizanin bê ji bo çi duayan dikin, hene. Di Wergera Şîroveya Jiyana Nû de dibêje, "Em nizanin bê divê em ji bo çi jî û çawa duayan bikin jî em nizanin" ku ev yek vêya herî baş li ber çavan radixîne.

Ez bi her tiştê dibe û diqewimê yê di jiyana hezkiriyên me û kesên pêdiviya wan bi alîkariyê heye de, nizanim lê Giyanê Xweda pê dizane. Mala dêya min li Floridayê ye û mala min Coloradoyê ye. Bifikirin ku dikeve nav rewşeke ku pêdiviya wê bi alîkariya Xweda çêdibe lê ne di ferqa vê de ye an jî nikare xwe bigihîne min. Dev ji pêdiviya wê ya ku bi duayê heye berdin, ez ê çawa hîn bibim bê ez ê ji bo çi duayan bikim?

Gava cara pêşî min dît ku ev ayet ji bo min rast in, ez li zanîngehê bûm. Hîn bibû di sal ku min bawer dikir lê ez pir dilxwaz bûm ku ji kesên din re behsa Îsa bikim. Ji ber vê min dest bi xebateke Pirtûka Pîroz kir ya ku armanca wê xwendekarên kur û keç yên li kampusê bûn ku xwe bigihîne wan. Kesên ku tevlî xebatê bûn gîha nêzî şest kesî. Êvarekê derbarê Giyanê Pîroz de min perwerde da. Ez tenê di ser Nivîsên Pîroz re lê çûm û min xwesteka Xweda nîşanî wan da. Di xebatan de keçikeke ku ji nû

ve çêbibû û bi Giyanê Pîroz tije bibû hebû. Ev keçik hîn bibû ku dawiya ziman hatiye. Çi tiştekî ne xweş e ku mamosteyê wan baweriyê bi Nivîsên Pîroz neke. Lêbelê wê êvarê gava tiştên Pirtûka Pîroz ku di vê mijarê de gotine, dîtin bawer kir û weke gelek kesên din di cih de bi Giyanê Pîroz re tije bû.

Sibeha piştî vê, serê sibehê zû hevalekî min yê li yûrda kurikan dima li min geriya û ez bi dengê telefonê şiyar bûm. Got kesek hatiye serdana te. Min bi ecele kincên xwe li xwe kirin û ez daketim salona ku mirov li benda mêvanên xwe dimîne û pişt re min keçika ciwan ku li wê yûrda li hemberî min ya keçika dima, dît. Nûra Xweda ji rûyê wê dibiriqî û ji min re got: “John, ez lêborîna xwe dixwazim ji ber min tu şiyar kirî lê tiştên ku vê sibehên qewimîn ji bo ji te re bibêjim min hîn bêtir nikarîbû bi xwe.”

Got, vê sibehê di saet pêncê sibehê de ji aliyê Giyanê Pîroz ve şiyar bûm û ji bo di dilê xwe de duayan bikim, min hîseke ecêb hîs kir. Fêhm kir ku hin tişt ji rê derketine, ji ber vê cihekî bêdeng dîtiye û dest bi duayan kiriye. Got gava min ferq kir ku ez di şerekî de me, duakirin her ku çû tîrtir û girantir bû li min. Li ser vê gava dua dikir, ji Reb dipirse bê ji kê re navbeynkariyê dike. Di dilê xwe de bihîst ku ji bo zilamekî yextiyar duayan dike û bihîst ku jiyana vî zilamî di talûkeyê de ye. Qederê saetekê dua kiriye û pişt re hîs kiriye ku dilê wê ketiye cih û rehet bûye.

Piştî vê bi çend deqîqeyan, ji hevala wê ya bawermend ya di odeya wê de dimîne, telefoneke acîl tê. Gava hevala wê telefonê vedike, hîn dibe ku kalikê wê, wê sibehê saet di pêncan de qirîzeke dil ya cidî derbas dike û pişt re bi awayekî mûcîzeyî namire. Berî telefonê bi çend deqîqeyan dilê wê ketibû cih û gava duakirina wê sekinîbû rewş jî normal bibû.

Ronahî jê dibariya. Di hemû jiyana xwe ya Xirîstiyaniyê de ji ber ku êdî pêdiviya kesî pê tunebû, ew hîn kiribûn ku zimanên

nayên zanîn bi dawî bûne. Sirf ji ber ku hinekan ji Nivîsên Pîroz bawer nedikir, negîhabûn ser çi? Êdî hûn hew dikarin wê ji bo berevajî vî karî qane bikin. Heta hetayê qane bûye ku bi zimanan duakirin di roja me de ji bo kesên weke me bawermend, pêdiviyek e dîsa heta hetayê ye.

Min ev gelek caran dît. Ji bo navbeynkariyê, mînaka herî diyar ya axaftina bi zimanan, bûyereke ku hatiye serê Esteher ku rêvebirê ofîsa me ya Avûstûralyayê ye. Hem xizmetkarek e û hem jî di heman demê de şervanekî duakirinê yê bêhempa ye. Di salên notî de, di serdema ku diçû dibistana Pirtûka Pîroz de, sibehekê gava siparteka xwe çêdikir, destê xwe rakir hewa û got: “Rebê min îro tiştekî ku ez jê re duayan bikim tuneye, ji ber vê eger pêdiviya te bi min hebe ha vaye li vê derê me.”

Got, ji nişka ve ji bo ez duayan bikim barekî ecêb giran xwe li ser pişta min danî. Li odeya rûniştinê çong vedan û bi awayekî ecêb gelek ziman ji devê wî herikîn.

Wî di giyanê xwe de zilamekî Çînî dît ku li ser erdeke pîs çok vedane û destên xwe bi tevgereke dorveger digerîne, mîna ku ew erdê paqij bike. Di dema duakirinê de wî xwesteka qêrînê hîs kir û got, “Rabe ser xwe! Rabe ser xwe! Rabe!” Piştî ku demekê dua kirin dilê wî sivik bû û vegeriya ser karê malê.

Piştî pênc mehan, zilamekî ji Zelandaya Nû ku li Çînê weke mizgînxêr xizmet dike, hat dibistanên Pirtûka Pîroz û li girtîgeheke li Çînê bi pastorekî din re çîroka pastorekî Çînî ku zilm û zor lê dibû parve kir. Pastorê din li vî pastotê Çînî nêrî û jê re got wê Xweda te ji vê girtîgehê derxîne. Bi vê fikra di dilê wan de karên xwe yên paqijiyê yê rojane li girtîgehê berdewam kirin.

Piştî vê bi demeke kin gardiyan ji bilî vî pastorî hemû girtiyên din şandin quncikên wan. Îcar aniha gava bi tena serê xwe erd paqij dikir, dengekî “Rabe ser xwe! Rabe ser xwe! Rabe!” bihîst. Îteat ji dengê bihîstî re kir û rabû ser xwe û ber bi derî ve meşiya.

Bi awayekî ku mirov matmayî dimîne derî ne xilqandî bû, li ser vê yekê derî vekir û bêyî ku bê ferqkirin ji girtîgeha ewle derket derve. Gava derket derve li ber wî texsiyek sekinîbû. Li texsiyê siwar bû û ji wê deverê dûr ket.

Esther gava li bûyera berî bi mehan ku dua li ser kiribûn û fikirî ku ev bûyer e, bû gurme gurma dilê wê. Li ser vê yekê piştî ku axaftina xwe qedand, çû cem mizgînxêr (berê ew qet nas nekiribû) û kifş kir ku ev bûyer roja li odeya xwe ya rûniştinê dua dikirin pêk hatiye û ev ji rojnivîska xwe ya duayan pê derxist.

Ya din jî yek ji rêberên dibistana Pirtûka Pîroz, hat cem Esther û mizgînxêr. Wî jî anî bîra xwe ku berî bi mehan Giyanê Pîroz; kesekî ku pêdiviya wî bi alîkariyê heye, ji bo wan duayan bike li ser pişta wî kiriye bar. Gava bi zimanan dua dikirin wî jî bi awayekî zindî, zilamekî Çînî yê di girtîgehê de dîtibû. Mizgînxêr wêneyê ku dêra li Çînê bi hev re kişandibûn, derxist û rêberê dibistana Pirtûka Pîroz gava zilamê bi zimanan duayan dike dît, ew nîşan kir. Ne hewce ye em bibêjin ku zilamê nîşan dike, pastorê ji girtîgehê derketiye!

Esther û rêberê dibistana Pirtûka Pîroz, pişt re gava rovnivîskên xwe yên duayan dan ber hev, dîtin ku tam heman rojê dua kirine! Xweda bi vî awayî nîşanî wan da ku di xelasiya wî zilamî de, bi duakirina îteatê re erkeke herduyan jî tê de heye.

## EM Ê ÇAWA BAWER BIKIN?

An Esther hîn bikirina ku bi temamkirina Pirtûka Pîroz re ziman bi dawî bûne? Baş e, an hîn bikirina ku ziman ji bo her kesî ne derbasdar in? Di roja me de gelo çend kes li şûna ku ji Pirtûka Pîroz hîn bibin, ji tiştên ku mirov hîn dikin, bawer dikin û ji ber vê jî ji vê berektê bêpar dimînin?

Di seranserê salên xwe yên xizmetê de yek ji wan trajediya

herî mezin ku min çavdêriya wê kiriye, ew e ku gelek Xirîstiyaniyan li şûna ku bihêlin Gotina Xweda tecrubeyên wan diyar bike, li gorî tecrubeyên xwe Gotina Xweda şîrove dikin. Xweda ne bi tecrubeyên me re sînordar e, Ew ji vê pir mezintir e!

Di lêgerîna min ya ku min dixwest bi Giyanê Pîroz tije bibim de, ez bi gelek Xirîstiyaniyên niyeta wan ne xerab ku dixwestin min ji axaftina zimanan dûr bixin, rast hatim. Piştî min Îsa weke Rebê xwe dît û jê bawer kir bi çend mehan, ji bo berê min bidin baweriyê ez birim civîna rêberên xizmeta kampusê ya ku belavokên vê baweriyê çap dikirin. Ez ê her dem minetdarê wê komê bim.

Lêbelê di civînê de matmayîneke ecêb li benda min bû. Serok ji rêberan xwest ku di betlaneya somestirê de mijarên sereke yên duayan parve bikin. Zilamekî ciwan got; ji bo dersên xwe bikim nota “B”yê, ez duayan dikim. Yekî din ji bo xelasiya hevalê xwe yê odeyê dua dikirin. Pişt re gava dor hat min, tenê min wisa got: “Weke di Pirtûka Pîroz de, gava bi zimanên nû dipeyivin, bi temamî dixwazim bi Giyanê Pîroz bi ser ve herim.”

Çawa min ev gotin kirin, serok bi awayekî lez û hêrsokî wisa got: “John, piştî civînê em ê vê mijarê bipeyivin.”

Em qet nepeyivîn. Lêbelê hevalê min yê yûrdê yê ku berê min da Xweda, piştî civînê ez kişandim qorziyekê û got: “John, ew bawer nakin bi zimanên nû tên axaftin.”

Weke bawermendekî nû, min bi awayekî ecêb lê nêrî û jê pirsî: “Çi, ew ji tiştekî ku di Pirtûka Pîroz de heye, bawer nakin?”

Vê yekê ez birim tiştên kevin ji ber ku doktrînên mezheba min ya kevin, bi piranî pişta xwe nedida Nivîsên Pîroz lê dida doktrînên mirovan. Ya rastî li şûna ku em Nivîsên Pîroz bixwînin, destûr didan ku pastorê me ji bo me şîroveyan bike û me ber bi aliyekî din ve bibe. Nozdeh salan ez tevlî dêrê bûm û her çiqasî di rastiyê de ez di rêya dojehê de bim jî, min digot qey ez li ser rêya

bihuştê me. Bi vî awayî gava ez bi alîkariya hevalê xwe yê yûrdê hînî pilana xelasiyê ya Xweda bûm, ez fêhm bikim jî fêhm nekim jî min biryar da ku her dem ji Gotina Xweda bawer bikim! Tirsa REB ev e û bingeha zanyariyê tirsa REB e (bnr. Zebûr 111:10).

## AN BI BEREKET AN JÎ NEZANÎ

Xebeteke min ya xweş heye: Xwesteka Xweda ew e ku hûn bi Giyanê Wî re tije bibin û bi zimanên asîmanî re duayan bikin! Eger hûn bixwazin qêrîna di dilê Xweda de hîn bibin, wisa ye:

> "Ez dixwazim ku hûn hemû bi zimanan bipeyivin."
> (Korîntî I, 14:5)

Lê dibe ku hûn wisa bibêjin: "Ev peyvên ku Pavlûs ji Korîntîniyan re gotine."

Na, ji ber ku bi awayekî eşkere wisa tê gotin: "Divê berî her tiştî hûn vê bizanin ku tu pêxemberîtiya Nivîsara Pîroz ne ji şîrovekirina ji ber xwe çêkirî ye" (Petrûs II, 1:20) û "Tevahiya Nivîsara Pîroz ji bîhna Xwedê ye" (Tîmotêyos II, 3:16). Bi îfadeyeke basît ev ne tenê gotinên ku Pavlûs ji Korîntîniyan re gotine, di heman demê de ev ew gotin in ku Reb ji me re gotine ji ber ku gotina Xweda "jîndar û mayîndar" in (Petrûs I 1:23). Xweda ji zarokên xwe re dibêje: "Ez dixwazim hûn hemû bi zimanan bipeyivin."

Bi tiştekî ku hûn jê bawer nakin hûn tu carî ji bereketa wê sûd nagirin. Ez dîsa dixwazim bibêjim: Xweda ne bi mantiq, pêdivî an jî hestên me, bi baweriya me dixebite. Hûn ê bibînin ku Îsa ji gel re gelek caran gotiye "bila li gorî baweriya we be." Bawerî tenê ew tişt e ku mirov ji tişta ku Xweda dibêje ez ê bikim, bawer bike. Bawerî ne li gorî baweriyên xelet yên mirovan, bi bihîstina gotina Xweda re tê.

Ji ber vê ji bedêla serpêhatiyan, pir girîng e ku em rastiyê waaz bikin û ji rastiyê bawer bikin. Tecrube erêkirina bêhempa ya rastiyê ye lê divê nebe mamosteyê rastiyê. Mamosteyê me Giyanê Pîroz e û Ew tu carî berevajî tişta ku Gotina Xweda bi awayekî nivîskî diyar kiriye, napeyive. Gava em baweriyê bi Gotina Xweda tînin, em ê bibînin û em ê tecrube bikin. Lêbelê gelek kes berevajî vê tevdigerin, pêşî dixwazin tecrube bikin û piştre jî dixwazin bawer bikin. Ev careke din gotina ku Îsa ji Tomas re got tîne bîra mirov. Hilbijartineke me heye: Em ê yan baweriya xwe li ser gotina kesên din an jî li ser Gotina Xweda ava bikin. Wisa nivîsandiye:

> "Xwedê ne mirov e ku derew bibêje û ne lawê mirov e ku poşman bibe; ew dema bibêje qey wê nake? An jî dema soz bide, qey nayê cîh?" (Hejmara Çolê 23:19)

Di dawiya dawî de, Giyanê Pîroz ji me hemûyan re derbarê bi zimanan duakirinê de dibêje "ez naxwazim hûn di vê mijarê de nezan bimînin (Korîntî I 12:1). Piştre derbarê tiştên ku me di vê beşê de nivîsandine û derbarê gelek tiştên din de dipeyive. Piştî ku li ser van hemû mijaran disekine, weke encam bi awayekî eşkere wisa dibêje:

> "Lê yê ku van qebûl neke, bila neyê naskirin." (Korîntî I, 14:38)

Bi awayekî din, bi alîkariya Pavlûs wisa bangî me dike: "Di mijara duakirina bi zimanan de, min xwesteka xwe ji we re got. Eger hûn nezaniyê hilbijêrin û ev ne li ser bala we be, wê demê hûn ê nezan bimînin, hesabê we nayêkirin û bi başkirina min re hûn ê neyên bi bereketkirin." Gava ku Xweda îlham da Pavlûs ji bo vê ayetê binivîsîne, ez jê bawer im ku Xweda xemgîn bûye, ji ber

ku wê mirovên ku piştî bi salan vê mijarê bikin mijara nîqaşê, hîn di serî de ew didîtin (di serdema pêş ya dêrê de, di vê mijarê de nîqaşek tuneye).

Careke din, bi xemgînî dibêje ku em ê di nava nezaniya xwe de bimînin û wê tu kes hesabê me neke lê eger em wisa bikin wê di vê mijarê de gotina wî ya dawî ev e:

"ji peyivîna zimanan re nebin asteng." (Korîntî I, 14:39)

Ha vaye hişyariyek, eger we bihîst ku kesek êrîşî zimanan dike, zanibin ku rasterast li hemberî Reb derdikeve. Xweda, di rojên dawî de hinek jê yan ji ber nezaniyê an jî ji ber inyadê, zanîbû ku wê hinek bibêjin axaftina bi zimanan qediyaye an jî ne ji aliyê Xweda ve pêk tê.

Her ku em ber bi beşa din ve diçin, ez duayan dikim ku hûn bereketa bêhempa ya ku Xweda dide zarokên xwe bibînin û zimanê nêzîkayiyê yê bêhempa ku Giyanê Pîroz dide kesên bawermend, kifş bikin.

*(Not: Eger hîn dilê we bi Giyanê Pîroz tije nebibe; Pêvek B'yê vekin, ji bo hûn vê fêhm bikin ez dixwazim berê we bidim duayan.)*

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Di vê beşê de nivîskar, gava hîn xwendekarê zanîngehê ye derbarê baweriya xwe de dipeyive. Tîne ziman ku bûye xwediyê jiyaneke nû lê her çiqasî Nivîsên Pîroz bi xîret xwendibin jî, hîskiriye ku hin tişt kêm in. Hûn di paşeroja xwe de an jî belkî di jiyana xwe ya aniha de bi vê rewşê re rûbirû mane gelo?

2. Gava hûn li vê xebata ku li ser wateya axaftina bi zimanan dipeyivin, difikirin; bîr û baweriya we çawa tê darizandin? Xwesteka nûçeya ku hûn bi Giyanê Pîroz tije bibin û bi zimanên asîmanî duaya bikin, bandoreke çawa li we dike?

3. Vê pirtûkê ji ber sedemekê hûn dixwînin -ji bo hûn wateya nêzîkayiya li Xweda kifş bikin, serpêhatiyekê an jî bûyerekê hûn teşwîq kirin. Aniha bi alîkariya mijara hûn lê dixebitin, gelo dibe ku rêyeke nêzîkayiya li we ava kiribe? Ji bo duaya şexsî û navbeynkariyê, bikaranîna xelata zimanan nabe ku gava we ya din ya meşa bi Xweda re be?

BEŞ 12

# ZIMANÊ NÊZÎKAYIYÊ

“Hikmet an jî şîreta Xweda weke avên kûr e û ji bo hişê xwezayî gelek caran sirek e.”

Min ev çend caran dîsa nivîsand lê ji bo ez jê bawer bim ku di bingeha hebûna we de rastiyek heye, ez ê vê dubare bikim: “Xweda bi eşq û şewq dixwaze nêzî we be.” Bêriya hevkariya we dike. Ne tenê dixwaze bi we re di nava têkiliyê de be, di heman demê de dixwaze ku ev têkilî dewlemend û berhemdar be.

## HEVKARIYA DI ASTA XWEDA DE

Ji bo pêkhatina hevbandoriya bi bereket Xweda, rê li hevkariya di asta Wî de vekir! Bihêlin ez bînim ziman. Di Nivîsên Pîroz de dibêje:

> "Çimkî yê ku bi zimanê ruhanî dibêje, ne ji mirovan re, lê ji Xwedê re dibêje. Kes wî fêm nake; ew bi ruh siran dibêje." (Korîntî I, 14:2)

Em dizanin ku Pavlûs behsa zimanên ku di nav civakê de tên axaftin nake. Ji ber ku her du jî Gotina Xwedayê bi zimanên ku qet nayê fêmkirin ji mirovan re dibêjin. Di vê ayete de Pavlûs behsa dema ku em duayan ji Xweda ra dikin an jî dema em bi Xweda re dipeyivin, dike. Dema em bi zimanan duayan dikin, ne bi mirovan re em rasterast bi Xweda re diaxivin. Pavlûs di hemam demê de wisa nivîsand: "Bi vî awayî Ruh jî di qelsiya me de alîkariyê dike. Çimkî em nizanin ka divê em çawa dua bikin; lê belê Ruh bi xwe bi nalînên ku nayên îfadekirin ji bo me mehderê dike" (Romayî 8:26). Du astengiyên li pêşiya axaftina bi Xweda re ev in: Gelek caran em nizanin bê em ji bo çi duayan dikin an jî ya duyem em nizanin em ê çawa duayan bikin.

Ev rewş herî baş di mînaka jêr de tê ravekirin. Eger ez biçûma ofîsa serokê Amerîkayê, gelo min ê bikariya di asta zanîna wî de bi wî re biaxivim? Helbet bersiva me 'Na!' ye. Divê ew dakeve asta têgihiştina min. Ji ber ku ew ji min bêhtir dizane bi gelek mijarên welêt û mijarên ewlehiyê ku ji gel re nikarin bên ravekirin. Û ew ji bilî gelek pilan û pirojêyên derbarê welêt de di heman demê de ew bi qod û şertên ku divê bên veşartin jî dizane. Ji ber ku ev agahî bikeve destê hinekan dibe ku ji bo ewlehiya welatê me xetere be.

Weke vê dema em çûn ofîsa Qiralê gerdûnê ango gava ez çûm odeya wî ya text, eger ez li gorî têgihiştina xwe duayan bikim wê demê wê axaftina me kêm bimîne! Ez nikarim di asta Reb de biaxivim, ji ber ku ew ji min pirtir dizane. Tekane rêya axaftina min û Wî divê ew xwe daxîne asta min. Weke mînaka me ya li jor jî me behs kir, agahiyên Wî pirtir hene di derheqê weşartina sirên

gerdûnê de, ji ber gelek sedeman ku yek ji van jî ji bo nekeve destê kesên xetere. Di şîreta Pavlûs de em vê eşkere dibînin:

> "Lê belê em şehrezayiya Xwedê ya bi sir û veşartî dipeyivin, a ku Xwedê ji beriya dem û zemanan ve ji bo rûmeta me kifş kiriye. Tu kesî ji serokên vê dinyayê bi vê nezanî. Eger bizanibûna, wê Xudanê rûmetê xaç nekirana." (Korîntî I, 2:7-8)

Her çiqasî li vir behsa çarmîxê û ji nû ve vejîna Reb Îsa were kirin jî ev mînakeke rêlibergirtina zanebûna Xweda ye ku nekeve destê kesên xetere. Lê gelek mînakên din jî hene (Bnr. Meta 7:6). Nivîsên Pîroz ji me re rave dikin ku em di şerekî de ne û dijminên me jî rêvebirî, hukumranî, hêzên dinyaya tarî û artêşa giyanî ya xerabiyên erd û ezmanan in (Efesî 6:12). Di şerekî xwezayî de divê têkiliyeke weşartî di navbera kesên bi hev re şer dikin de, hebe. Heman tişt ji bo Serbazê artêşa Reb û şervanên Desthilatdariyê jî derbasdar e. Reb him ji bo parastina me û him jî ji bo serkeftina desthilatdariyê, çi têkiliyeke veşartî ya bêhempa ji zarokên xwe re peyda kiriye. Gava em bi zimanan diaxivin di destê dijmin de tu şop tune ye bê em ji Bav çi daxwazê dikin. Dibe ku hêzên şeytanî pilaneke êrîşa ji bo me û hezkiriyên me bikin lê gava em bi zimanan duayan bikin wê demildest li hemberî cinan ferîşte dîwar ava bikin. Di encama vê de, hîn berî ku êrîşên cinan dest pê bikin wê cin revî revî birevin.

## ARMANCA SEREKE

Duayên ku em bi zimanan dikin ne tenê ji bo rêlibergirtina agahiyên krîtîk in, yên ji bo nekevin destê dijmin. Armanca sereke nêzikbûn e. Ez û hevjîna xwe ev demeke dirêj e em bi hev re ne û em evqasî nêzî hev in ku me ragihandineke taybet ava kiriye di navbera xwe de. Di nava gelek kesan de, dikare ji min re tiştên

ku tu kes jê fêhm neke bibêje. Me zimanekî nêzîkayiyê ava kir. Ev ne tenê di navbera jin û meran de, di navbera gelek kesên ku têkilyeke wan ya taybet heye de jî xuya dibe. Yên di seranserê emrê xwe de havale hev in, yên bi hev re xebitîne, yên bi hev re çûne şer û hwd. dibe ku di nava wan de hebe. Bi kurt û kurmancî zimanekî dostanî yê taybet di navbera wan de heye.

Bi heman awayî Xweda, ji bo ku em bi awayekî nêz bi Wî re biaxivin û hevkariyeke di asteke kûr de bi Wî re bikin, rê li ber me vekir; di asteke wisa de ye ku em bi mêjiyê xwe yê xwezayî û ne azad tu carî nagihênê. Nîvîskarê Zebûrê ev pêşbinî kir û wisa nivîsand: "Kûrahî deng li kûrahiyê dike, bi gurmîna leylanên te" (Zebûr 42:7). Vê ragihandinê dişibînin xumxuma sûlavan. Îsayê Mesîh got wê ji dilên me "çemên bicoş biherikin." "Îsa ev peyv li ser wî Ruhê Pîroz got, ku wan ên bawerî bi wî dianîn wê bistandana" (Yûhenna 7:38-39). Hevkariya di navbera me û Reb de dişibînin ava geş a çemekî. Ax! Giyanê Pîroz çi tiştên xweş bexşî me kiriye! Qabîliyeta daye me! Tenê fikra wê mirov direelîne.

Li vekolîna xwe em ê berdewam bikin, lewra ber bi başiyê ve diçe. Pavlûs di derheqê bawermendekî ku bi zimanan duayan dike de, axaftina xwe berdewam kir:

"Kes wî fêm nake; ew bi ruh siran dibêje." (Korîntî I, 14:2)

Pavlûs bi "siran" qesta çi dike? Peyva Grekî "musterion" e. Pisporê Grekiya Peymana Nû W.E.Vine li ser vê peyvê wisa nivîsiye: "Di Peymana Nû de ev peyv derveyê têgihiştina xwezayî ye, tenê bi rêya wehiya Xwedayî ve wê bê zanîn û tenê ji bo kesên ku ji aliyê Giyanê Pîroz ve hatine ronakkirin re hatiye ravekirin. Halê normal 'sir'ek agahiya zanîneke weşartî îfade dike. Li gor Nivîsên Pîroz ravekirina rastiyê girîng e."

Yek ji wan başbûnên ku mirov bi zimanan duayan bike ev e.

Giyanê Pîroz Xweda, bi ramana Îsa û Bav dizane, ji ber ku hemû yek in. Ya din jî ji ber ku hevalê me ye bi kemasiyên me jî dizane. Ji ber vê jî bi dayîna peyvên zimanê ezmanî navbeynkar bû ku em bi awayekî bêqisur; bixwazin, lêbigerin an jî baxivin. Oxx, çi xweş e! Dibe ku hûn wisa bifikirin: “Lê gava ez bi zimanan dipeyivim ez nizanim bê ez dibêjim çi.” Erê ji bo vê Pavlûs wisa dibêje:

> “Ji bo vê yekê, yê ku bi zimanê din dipeyive, bila dua bike da ku bikare wergerîne. Çimkî, eger ez bi zimanê din dua dikim, ruhê min dua dike, lê hişê min bêber dimîne.” (Korîntî I, 14:13-14)

Ji ber vê çendê çi ji bo daxwazê be, çi ji bo navbeykariyê be, çi jî tenê axaftina bi Xweda re be; eger ez ji Giyanê Pîroz, ji bo duakirinê xweşbiniyekê bixwazim wê vê bike! Bi vî awayî êdî ne tene giyanê min, canê min jî zewqê ji hevkariya Xweda distîne.

## KAHYATIYA SIRÊN EŞKERE BÛNE

Wehiyên Xweda gelek caran di vê hevkariyê de ji Nivîsên Pîroz ên ji nişka ve divejinin pêk tên û rastiyên min yên di seranserê salên xwe yên xizmetê de min nivîsandine û hîn kirine ev in. Lêbelê hê jî gelek tişt hene ku min hîn nekirine.

Dibe ku hûn meraq bikin bê min ji bo çi ew hîn nekirine. Sedema vê ew e yan dem guncav nebû yan jî Xweda xwest ku hin tiştên dîtir ji gelê xwe re bêje û bide fêhmkirin. Gava em weke elçiyên desthilatdariyê diaxivin, dibê em bînin bîra xwe ku em weke kahînên Xweda nedipeyivin. Û mijarên ku di hin deman de Ew dixwaze bên axaftin û dîsa mijarên ku di hin deman de dixwaze neyên axaftin hene.

Ez ê tu caran ji bîr nekim wê dema ku ez bi awayekî dijwar hîn bûme. Min bi zilamekî Xweda re dan û standin dikir ku di

herêma xwe de baş dihat nasîn. Min xizmetkariya wî bihîstibû, ez heyranê wî bûm û ez bi dil û can li benda wî bûm. Hevdîtina me pastorekî din pêk anîbû. Ez pir kelecanî bûm. Axirê ez, zilamê Xweda, hevjînên me û pastor em di şîvê de hatin ba hev. Ji bo bandorê li zilamê Xweda bikim min hemû ayetên kûr ku Xweda bexşî min kiribûn parve kirin. (Wê kêliyê bi zanebûn ez wisa nedifikirîm lê gava ez li xwe vedigeriyam û min li dawiya xwe dinêrî, motîvasyona min ev bû. Çi cahiltiyeke mezin e.)

Wê şevê pastor bi erebeya xwe em birin otela me. Ez û hevjîna xwe em gelekî westiyayîbûn; rojeke dirêj bû ji bo me. Lêbelê her çiqasî westiyayî bim jî nerehetiyekê xwe li ser giyanê min danîbû. Min zanînû ku Reb ji min dixwaze ez duayam bikim, ji ber vê jî min ji hevjîna xwe xwest ku bêyî min here nav livînan û rakeve. Ew raza û ez jî derketim şaneşîna odeya me ya otelê. Çawa ku min gava xwe avêt şaneşînê, min bihîst ku Giyanê Pîroz bi awayekî hêzdar wisa got: "Bi vî awayî qiral wê şevê her tiştên li odeyên xezîneyan nîşan da!"

Dilê min tengijî. Ez hem matmayî mam û hem jî min şerm kir. Min fêhm kir ku Giyanê Pîroz qesta şaşiya Hîzqiya dike. Hîzqiya xwest ku bandorê li ser wan kesên ku hatine dîtina wî bike û em ê wisa bixwînin:

> "Hîzqiya bi wan şa bû û mala tiştên hêja, zêr û zîv, biharat û rûnê bêhnxweş, tevahiya cebilxane, hemû tiştên odeyên xezîneya xwe nîşanî wan da. Tiştek li qesir û tevahiya welatê wî nema ku Hîzqiya nîşanî wan neda." (Îşaya 39:2)

Piştî Hîzqiya hemû xezîneyên xwe nîşan dan, Reb bi rêya Yeşaya erza wî şikerand. Heman tişt min jî hîs kir. Ji bo bandorê li wî zilamî bikim, min fêhm kir ku rastî an jî xezîneyên ku Xweda nîşanî min dane, min parve kirine.

Piştre Xweda bi hêrs ji min re wisa got: “Kurkê min, min ew rastiyên giranbiha ne ji bo ku tu li gorî dilê xwe wan parve bikî dan te. Ew ji bo bandorê li kesan bike nayên dayîn! Tu serkarê wan tiştan î ku min ji te re rave kiriye. Divê heta ez destûrê nedim tu derbarê wan de nepeyive.”

Demildest min tobe kir û efûkirina xwe min jê xwest. Barê li ser min vê çaxê rabû û bi rehetî ez ketim nav nivînên xwe. Dilovaniya wî bêhempa ye!

Eger em zana bin divê em hevalên xwe ji wan kesan hilbijêrin ku tiştên em di navbera xwe de diaxivin, ji her kesî re nebêjin. Hevalên nêzî hev tiştên derbarê hev de dizanin û bi zanebûn dinirxînin. Eger hevalekî me ev sînor her carê binpê bike divê êdî em jî li gorî vê li parvekirinên xwe baldar bin. Heman tişt ji bo sirên Reb jî derbasdar in. Eger em bixwazin ku ya dilê xwe bi me re parve bike divê em baldar bin bê Ew dixwaze em kengî û li kuderê parve bikin.

## EŞKEREKIRINA NÎYETA XWEDA

Wexta ez bi zimanan ji Xweda re duayan dikim an jî diaxivim lê hay dibim ku raman, hikmet an jî doktrîn tên hişê min. Li gorî min ravekirina vê ya herî baş ew e ku dişibe peqpeqongên ji binê behrê derdikevin ser avê. Raman ji kûrahiya dilê min derdikevin û berê xwe didin mêjî an jî fêmkirina min. Nivîsên Pîroz wisa dibêjin:

“Ruhê mirov qendîla Xudan e,
Ew bi dil û hinavên mirov dizane.”
(Şîretên Silêman 20:27)

Divê em ji bîr nekin ku Giyanê Pîroz ne ji hişê me re ji giyanê me re dipeyive. Cihê ku hebûna me ronak dike ev der e. Dema em bi siya Giyan duayan dikin û wergera wê dixwazin hikmet an

jî şîreta Xweda wek çirûskan ji dilê me dipekin û diçin digihêjin têgihiştina me an jî hişê me. Nivîsên Pîroz wisa dibêjin:

> "Pîlana dilê mirovan wekî ava kûr e, Lê kesê fêmdar wê dikişîne." (Şîretên Silêman 20:5)

Niyet çi ye? Zanebûna tetbîqkirina rewşekê ye. Însan çima diçin cem şêwirmendan? Ji ber bidestxistina zanebûnê ku ji bo wan wek sirekê bû û hewcedariya wan a di merceke diyarkirî de hebû. Divê hûn bala xwe bidin yê ku niyeta Xweda an jî zanebûna Wî eşkere bike an ew kesê biaqil e an jî bi rê û rêbaza "Şîretkar" dizane. Giyanê Pîroz bi hemû sirên desthilatdariyê (niyeta ku nehatiye eşkerekirin, zanyarî an jî agahî) dizane. Careke din em ê li gazina Îsa binêrin:

> "Yê ku baweriyê bi min bîne, wek ku di Nivîsara Pîroz de hatiye gotin: Wê ji dilê wî çemên ava ku jiyanê didin biherikin. Îsa ev peyv li ser wî Ruhê Pîroz got, ku wan ên bawerî bi wî dianîn wê bistandana." (Yûhenna 7:38-39)

Li gorî Şîretên Silêman ava ku ji kûrahiya dilê we derdikeve niyet an jî siren Xweda ne û Îsa ji me re dibêje ku ev Giyanê Xweda ye. Ew kaniya avên geş in (Yêremya 2:13). Aniha gotinên Pavlûs bi baldar bixwînin:

> "Lê belê em şehrezayiya Xwedê ya bi sir û veşartî dipeyivin, a ku Xwedê ji beriya dem û zemanan ve ji bo rûmeta me kifş kiriye. Îcar me ne ruhê dinyayê, lê belê Ruhê ku ji Xwedê tê stand, da ku em wan tiştên ku Xwedê ji me re kirine diyarî, bizanin. Em van, ne bi peyvên ku bi şehrezayiya mirovî hatine hînkirin, lê belê bi peyvên ku Ruh hîn kirine dibêjin. Em tiştên ruhanî ji mirovên ruhanî re eşkere dikin." (Korîntî I, 2:7, 12-13)

Wê demê zanebûn an jî niyeta Xweda avên kûr in û ew pirî caran ji bo hişê xwazayî sir e. Lêbelê Îsa dibêje ku ew ava geş wê bi destê Giyanê Pîroz bê eşkerekirin. Çawa? Pavlûs rave dike:

> "Çimkî yê ku bi zimanê ruhanî dibêje, ne ji mirovan re, lê ji Xwedê re dibêje. Kes wî fêm nake; ew bi ruh *siran* dibêje."
> (Korîntî I, 14:2, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Ha ev e! Kesê bi aqil û xwedî têgihiştin niyeta Xweda wisa eşkere dike. Di Nivîsên Pîroz de, pirî caran gelek cihên bisir hebûn ji bo min. Pirsên min ên bêbersiv hene û tên bîra min. Çareserkirina van sirek e. Gelek caran tenê ez wisa dibêjim: "Giyanê Pîroz, ez vê fêhm nakim gelo tu dikarî ji kerema xwe re nîşanî min bidî?" Pişt re bi awayekî hêsan û bi zimanan duayan dikim di vê keliyê de an jî pişt re ew rastiyên weşartî di hiş û bîra min de berz dibin. Ax, ev çi tiştekî bêhempa ye!

Gelek caran dema ez pirtûkê dinivîsim berê min dikeve cihekî tu dibêjî qey tu rê têde tunene. Ji bo min nayê zanîn bê ez ê di vir de çawa berdewam bikim. Pişt re ji ser kursiya xwe radibim û bi zimanan dest bi duayan dikim û piştî keliyekê carinan piştî çend deqîqeyan lê hay dibim ku deriyên zanebûnê li ber min vedibin û wek lehiyekê diherikin û bi saetan dinivîsim.

Dema ez hîn nezewicî bûm, "pirsa gelo ez ê bi kê re bizewicim" sirek bû. Weke xortekî mesîhî di nav salan de kêfa min ji sê keçikan re hat lê piştî min di Giyan de dua kirin, ez têgihiştim ku Xweda bi awayekî tekûz dibêje "na." Pişt re min Lisa nas kir û bi qasî mehekê her roj û rojê nîv saetê bi zimanan min dua kirin ji bo têkiliya me. Xweda bi awayekî hêzdar di dema wan duyan de pesindayineke hêzdar da min. Û pişt re jî bi her awayî pesenda xwe nîşanî min da. Lêbelê berî pesenda Xweda jî keliyên duayan jî ew dilfirehî û rehetiya min hîs dikir ku min guman jê nedikir û min baş fêhm kir ku ew ê bibe hevjîna min.

Carina hem di jiyana xwe de hem jî di jiyana nas û dostên xwe de hin bûyerên ku min tu tişt ji wan fêhm nedikir qewimîne. Ji bo min her yek ji wan “sirek” e. Ji Giyanê Pîroz derbarê rewşê de fikir an jî zanebûna Wî dipirsim. Piştî ku bi zimanan duayan dikim îcar gava bixwazim dixwaze ku agahiyekê bide min, ez radihêjim wê agahiyê.

Carina hin rewşên ku bêyî ez bizanim hewcedariya endamekî ji malbata min bi duayan heye, çêdibin. Lê Giyanê Xweda ji bo ku ez ji bo wî duayan bikim dinuqitîne dilê min û pişt re ez dibînim ku ew kes alîkariya Xweda sitendiye û ji xirabiyan dûr ketiye.

“Sir” ew agahî ne ku mirov bi têgihiştina xwe bi ser wan venabe. Ev agahî dikarin bibin tiştên wekî ez ê biçim kîjan dêre? Ez ê bibim parçeyê kîjan xizmetê? Ji bo serok an jî pêşengên din ez ê çawa duayên bi bandor bikim? An jî ji bo pastorê xwe ez ê çawa duayên bibandor bikim? Helbet wê dawiya vê lîsteyê neyê.

## XWEŞIYA ZANÎNA HÊLA XWEDA

Li gorî tê xuyakirin, “sira” ku gelek bawermend jê aciz in, ew e ku gelek ji wan nizanin wê herin bi kîjan hêlê ve. Sedema sereke ya mirovan ku serî li şêwirmendan didin jî ev e. Lê ji bo we agahiyeke min a bêhempa heye! Êdî hûn ê xemê nexwin ji ber kirina van tiştan. Xweda wisa sozê dide: “Eger şehrezayiya yekî ji we kêm be, bila ji Xwedayê ku bi camerî dide hemûyan û lê nahile, bixwaze û wê ji wî re bê dayîn” (Aqûb 1:5). Em dikarin ji Wî bixwazin! We got çawa! Derbarê rewşa xwe de em ê bi zimanan duayam bikin. Çi cara ku ez li demên min nizanîbû û ez ê çibikim rast dihatim, min bi zimanan dua kirin û her carê fikrek bi silametî ji dilê min berz dibû û berê xwe dida têgihiştina min û ew zanebûna hewce ya li ser rewşê çêdibû.

Em di xizmetê de bi salan wisa xebitîn. Gava min nizanîbû ez

ê herim bi kîjan alî ve, demeke dirêj min bi zimanan dua kirin û ji nişka ve fikrên Xweda yên ku îlhamê didin mirov herikîn. Min û hevjîna xwe berî bi çend salan me dest bi xizmetê kir: hemû biryarên mezin di bin rêvebiriya Giyan de bi duayan derketine holê. Îro roj di ofîsên me yên li sê parzemîman de ji sîh kesî zêdetir xebatkarên me hene. Xweda, bi Soza Wî re û bi hebûna xwe derfeta ku em xwe bigihînin jiyana bi mîlyonan da me. Me di çardeh salan de tu caran deyn nekir. Niha jî em xwediyê milkekî û çavkaniya mirovan in ku em pê dikarin alîkariya gelê Xweda bikin. Sedema vê ev gotina Xweda ye:

> "Xudan, Pîrozê Îsraîl ê Rizgarkarê te wiha dibêje: Xwedayê te Xudan ez im Ku ji bo te yê bikêr hînî te dike Û di riya tu diçiyê de te dimeşîne. Xwezî te baş guhê xwe dabûya emrên min! Wî çaxî wê aştiya te wekî çeman Û edaleta te jî wekî sêlaka deryayê bûya." (Îşaya 48:17-18)

Ez dikarim ji dil bibêjim ku îlhama me wekî çemekî diherike. Gava em li şert û mercên li derdora xwe dinêrin, me di demên pir tengezar û bipanîk re derbas bûne. Lêbelê gava em bi zimanan duayan dikin û karê xwe dispêrin Reb, jiyana me bi îlhameke xweş bi ser ve çû. Derbarê duakirina bi zimanan de em wisa dixwînin:

> "Wê Xudan esse bi lêvên jê nayê fêmkirin, Bi zimanekî din Ji vî gelî re bêje. Wî ji wan re got: «Rihetî ev e, Vê rihetiyê bidin kesên westa. Bêhnvedan ev e.» Lê gelê wî nexwest guhdarî bike." (Îşaya 28:11-12)

Kesên ku îlhama wan tune be rehetiyê bi dest naxin. Rehetiya ku di vê ayetê de tê behskirin encama îlhama weke çemekî diherike. Dikarim di nava salan de gelek çîrokan bibêjim ji bo şayesandina vê lê tenê yek ji wan tê bîra min. Windakirina

hemû îlhama xwe ji bo min hêsan bû ji ber ku min nizanîbû ez ê çi bikim. Ev bûyer gava ez bi rêwitiyê çûm Meksîkayê, ji bo ez di civîneke mizgîniyê de waazan bidim, pêk hat. Êvarekê ji bo civîna mizgîniyê ez bi balafirê çûm bajarê Montereyê. Civîn wê li navenda bajar, di odîtoryumekê de pêk bihata. Ji sibehê û heta êvarî min bi zimanan dua kiribûn û vê êvarê min li ser odîtoryûma ku em ê lê biciviyana, min ronahiyek rewnaq dît. Reb bi dilê min re peyivî û ev got: “Vê êvarê dê mezinahiya min xuya bibe.”

Wê şevê ez û pastorê ku ew civîn organîze kiribû bi kelecan çûn salonê. Dêra wî ji bo vê çalakiyê gelekî amadekarî kiribû. Gava berî civînê bi pazdeh deqîqeyan em gihîştin salona civînê, min ferq ku zilamekî cirnexweş tevî du heb parêzvanên bi çek, hat cem pastor. Bi wî re bi zimanê îspanyolî axivî û ji axaftina wî ez têgihiştim ku ne bi awayekî xweş dipeyive. Pişt re pastor hat cem min û wisa got: “John tu îşev waazan nadî.”

Min jê pirsî û got: “Çima?”

Wisa bersiv da min: “Ev zilam rayedarekî payebilind yê hikumetê ye û zagoneke wan heye ku kesê ne welatiyê Meksîkayê be nikare waazên mizgîniyê bide. Ev zagon kêm caran hatiye bicihkirin lê ew dibêje divê em li gorî vê zagonê tevbigerin. Eger tu bi ya gotina wî nekî wê sere te biêşe. Ya rastî ew dixwaze hema aniha vê kêliyê bi te re biaxive.”

Wê kêliyê Petrûs û Yuhanneyê ku bi destê pêşengên olî ji bo Mizgîniyê belav nekin û neyê zanîn hatibûn hişyarkirin, hatin bîra min. Ji ber ku ev yek derketina li hemberî Gotina Xweda bû, wan ew guhdar nekiribûn. Ji ber vê min ji pastor re got: “Tu hêza wî zilamî tune ye, ew tiştên ku Xweda îro dema min jê re dua dikirin nîşanî min da asteng bike! Ev tişt wê bandorekê neyênî li dêra we bike gelo? Ji ber ku eger bandoreke neyênî çêneke piştî ku ew çû ez ê waaza xwe bidim. Min ewqas rê ji bo ku ez bêm rûnêm û tiştekî nekim û paşiya stûya xwe bixwirînim nehatime! Lêbelê

eger ev biryara min we bike rewşekê tengezar wê demê ez waaza xwe nakim.”

Wî wisa bersiv da min: “John, ew zilam dikare gelek serêşiyan derxîne ji bo dêra me, ji ber vê jî ez difikirim ya baş em bi ya gotina wî bikin.” Min şîreta pastor qebûl kir û me berê xwe da rayedarê hikumetê.

Zilam demildest bi awayekî hêrsbûyî li min nêrî û ji min pirsî: “Tu bi Îspanyolî dizanî?”

Min lê vegerand: “Na ezbenî”

Pişt re wisa berdewam kir: “Tenê ez ê vê ji te re bibêjim. Tu tenê dikarî li ser çalakiyên turîstîkî biaxivî ji van mirovan re.” Pişt re berê xwe da û bi pastor re bi awayekî hişk bi Îspanyolî axivî, heta wê keliyê jî parêzvanên bi çek bi awirên xwe yê tirsnak li me temaşe dikirin. Piştî hişyarkirina rayedarên hikumetê bi dawî bûn ji wir çûn.

Xof ketibû dilê pastor û lêborîna xwe ji min xwest ji bo ku ez nikarim xizmetê bikim. Pişt re jî ji bo amadekariyên dawî bikin, em ketin odîtoryûmê.

Wê kêliyê pir xemgîn bûm. Min dizanîbû ku hewcedariya min bi şîreta Xweda heye lê ji bo min “sirek” bû bê ez ê çi bikim û çawa tevbigerim. Li ser vê rewşê ji odîtoryûmê derketim û min berê xwe da cihekî nîv taybet ku bikaribim duayan bikim. (Ji ber ku em li navenda bajêr bûn cihekî ku ez tikûtenê bimînim tûnebû.) Min dizanîbû ji bo eşkerekirina niyeta Xweda divê di bin siya Giyan de min dua bikirina. Bi vî awayî bi wêrekî min bi zimanan dest bi duayan kir. Çend kes di ber min re derbas bûn lê bi îhtîmaleke mezin ji wan weye ku yekî biyanî digere û xwe bi xwe diaxive.

Piştî çend deqîqeyan ku min bi zimanan dest bi duayan kir lê hay bûm ku îlhama Xweda giyanê min bi ser ve biriye. Bi qasî panzdeh deqîqeyan min dua kirin û ji nişka ve fikrek weke

peqpeqonkekê bi ser dilê min ve ket. Min ev bihîst: “Pirtûka Pîroz deyne aliyekî û ji wan re behsa turîstê herî mezin bike ku hatiye serdana Meksîkayê.”

Ji ber kelecaniya xwe li cihê xwe min xwe kil kir û qêriyam: “Ha ew e ha, ya ez lê digeriyam! Zilam ji min re got tu tenê dikarî behsa çalakiyên turîstîk bikî! Ez ê jî ji wan re behsa turîstê herî mezin Îsa bikim ku hatiye Meksîkayê!”

Bi lez û bez ketim odîtoryûmê. Lêbelê civînê dest pê kiribû û pastor jî li aliyê pêşî xêrhatina guhdaran dikir. Jina pastor ku li aliyê paş yê odîtoryûmê bû ji min re got: “John, pastor dixwaze tu biçî aliye pêş.”

Ez çûm cem pastor li min nêrî û di guhê min de kir pistepist û got “Xweda ji min dixwaze ji te re bejim ku dîrektîfa daye te tu dikarî pêk bînî.”

Li ser vê derketim ser dikê û min bi vî awayî bangî guhdaran kir: “Hevalino rayedarekî hikumetê berî aniha ji min re got ku tu tenê dikarî behsa çalakiyên turîstîk bikî. Ji ber vê jî ez ê ji we re behsa turîstê herî mezin bikim ku hatiye serdana Meksîkayê, ango ez ê ji we re behsa Îsa bikim.”

Bawermendên di nav qelebelixê de bi kelecan bûn û ji min re li çepikan xistin. Piştî vê bi qasî saetekê min waaza Gotina Xweda da. Di dawiya waazê de min bang kesên ku dixwazin dev ji jiyana xwe ya gunehkar berdin û xwe teslîmî Reb Îsayê Mesîh bikin, min ew anîn ser dike.

Dema gelek kesan berê xwe da ser dikê min di cih de dît ku polîsek ket odîtoryûmê û rasterast berê xwe da pilatformê. Min di dilê xwe de got: “Berî ez werim binçavkirin ji bo xilasiya van kesan divê ez alîkariyê bikim.” Petrûs û Yûhenna hatin bîra min ku dema li “Deriyê Bedew” waaz dan lêbelê berî ku ji mirovan re bejin bê wê çawa Îsa qebûl bikin, hatin binçavkirin. Ji ber vê ji bo kesên pêş ve hatine, min bi lez û bez dua kirin. Piştî ku min bi wan

re dua kirin, min dît ku polîs di ber me re derbas bû û çû aliye paş yê platformê. Êdî di cih de min hîs kir ku ez dikarim xizmetê ji bo wan mirovan bikim.

Pişt re min ji wan xwest ku herin cem kesên alîkar ku dikarin bêtir xizmeta wan bikin. Dema ji pilatformê dadiketin zilamekî seqet bala min kişand. Min seh kir ku Giyanê Pîroz ji dilê min re dibêje: "Kesê ewil ku dixwazim wî baş bikim ev e. Wî bisekinîne û demildest ji bo wî duayan bike."

Tişta ku wî ji min xwest min kir û piştî min ji bo wî dua kirin min jê re wisa got: "Ji kerema xwe re aniha gopalê xwe berde."

Wekî ku bejê ez nikarim berdim li min nêrî lê hinekî din min ew teşwîq kir û wî jî gopalê di destê xwe de berda. Pişt re min destê wî girt û em bi hev re meşiyan. Ewil hêdî bû, lê bera bera bi lez bû û di dawiyê de me bi hev re li ser platformê baz da.

Hemû salon ji kelecanan li binguhê hev ket. Mirov ji her aliyî ve hatin aliyê pêş yê pilatformê û bi sedan kes jî derketin ser pilatformê. Gelek ji van bi hêza Giyanê Pîroz re baş bûn. Ez ê behsa çend kesan ji van bikim. Ji bo jineke ker me dua kirin û Reb guhên wê vekirin. Ji ber ku jinik pir giriya fanêrê wê yê ku rengê wî şînekî vekirî bû reng guherand û bû şînekî tarî. Xweda çavên jinikeke din baş kir û jineke din jî ji penceşêrê xelas bû.

Pişt re me ji bo zarokekî pênc salî dua kirin û zarok baş bû. Ji saetekê zêdetir me xizmeta mirovên li vir kir. Her tişt bêhempa bû û gelekên ji van ji kêfan hêsir dibarandin. Demekê min lê nêrî ku hin kesên ku di destê wan de kamera heye min ferq kir lê min bala xwe pir neda ser wan.

Roja din ji Meksîkayê vegeriyam Amerîkayê. Piştî hefteyekê pastor ji bo min bibîne hat Amerîkayê. Ji min re wisa got: "John, divê ez bihatama û min ev yek rûbirû ji te re bigota." Dest pê kir ku rayedarên hikumetê di wê şevê de du sîxurên xwe şandine wê derê ku eger ez waazan bidim wê min binçav bikirana.

Ew sîxur gava min ji bo zilamê seqet dest bi duayan kiriye hatine. Gava dîtine ku zilam wa ye dimeşe, yekî ji yê din pirsiye: "Tu bawer dikî ku ev rast e?"

Hevalê wî wisa lê vegerandiye: "Nizanim lê em herin nêzikî wî û kontrol bikin." Pastor bi vê axaftina wan hisiya ji ber ku yek ji alîkarên wî guhê xwe dide axaftina wan û li nêzî wan sekiniye.

Her du rayedar hatin bi pêş ve û bûn şahide mûcîzeyan. Gava jinika ker bihîstiye yekî ji hevalê xwe re got: "Bi min ev rast e!"

Dûre bi hêza Xweda başbûna zarokê pênc salî dîtin û ji hevdu re gotin: "Ev rast e!"

Pastor pişt re wisa berdewam kir: "John ew her du zilamê ku ji bo te binçav bikin hatibûn, wê kêliyê hatin pêşiyê û ji te dua xwestin ji bo xwe û wê şevê her du jî xilas bûn."

Hewce nake ku ez bejim; ez û pastor li ofîsa min em pir kêfxweş bûn lê hemû ne ev tenê bû. Pişt re rojnameyeke heremî ku bi xwe re anîbû vekir û gotara ku piştî wê şevê bê çi hatibû gotin nîşanî min da. Li gorî gotarê, rayedarên hikumetê îdîa dikirin ku ez weke sextekarekî ku bi rêyên derqanûn pereyan derdixînim derveyî welêt didîtin lê dianî ziman ku mirov başbûne û rewşeke ku min pere revandine xuya nedibû. Bi awayekî ecêb, min di dilê xwe de hîs kir ku divê ez tu tuştî nedim ser hev û heqê bilêta balafira me jî xizmeta me dabû. Ji van civînan min dolarek jî bi xwe re dernexist derveyî welat.

Giyanê Pîroz çiqas bêhempa ye. Kesek bêyî rêbertiya Wî çawa dikare di demên wisa re derbas bibe? Eger wê rojê li odeya xwe û wê şevê li derveyî odîtoryûmê min bi zimanan dua nekirana, bi dilşikestî û beyî ku min armanca Xweda bigota ez ê ji Meksîkayê biçûma. Pastor wê ji ber gefa rayedarên hikumetê nehişta ez waazan bidim. Lêbelê ji ber ku min bi zimanên nayên zanîn dua kirin, tiştên ku ji bo me weşartî bûn bi daxwaz û zanebûna Xweda derket meydanê. Li gorî daxwaza Xweda ji bo pastor ez bûm

navbeynkar û bi vî awayî pastor dengê Xweda bihîst. Reb ji ber astengiya ku derket hemberî min, ji bo derbas bikim zanebûn da min. Hemû mezinatî ya Wî ye!

Ax, dijmin çiqas bi vê re li dêrê şer kir! Dijmin ji zimanan ditirse ji ber ku ev xeta Xweda ye ku bi pîroziyên xwe re rasterast diaxive û haya cinan jî ji tu tiştî çênabe. Di dilê me de hin tişt hene ku li gorî fêhm û têgihiştina xwe em dikarin şîrove bikin. Lê carina jî em nikarin wan rewş û daxwazan şîrove bikin ji ber vê em hin caran jî hewcedariya alikariya peyvên Giyanê Pîroz in. Ji ber vê Pavlus wisa dibêje: “Îcar ez çi bikim? Ezê bi ruh dua bikim û ezê bi hiş jî dua bikim; ezê bi ruh lavijeyan bêjim û ezê bi hiş jî lavijeyan bêjim” (Korîntî I, 14:15).

## AVAKIRINA MIROVÊ DI DILÊ ME DE

Berî çendakî ji ber sedemên weke mînakên jor min gilî û gazin kirin ji bo gelê Xweda bi Giyanê Pîroz re têkeve nav nêzîkayiyeke hîn mezintir. Bersiva me ya ji banga Xweda re ya ji bo nêzîkayiyê wê hîn bi wate bibe. Bi demê re em ê lê hay bin ku têgihiştina me ya Nivîsên Pîroz ên tenê li cem Ferîsiyan peyda dibe jî têra wê neke. Ne tenê ji bo bê Giyanê Xweda çi gotiye, divê em aniha têbigêhin bê çi dibêje jî. Îsa wisa jiya û wisa got: “Ez nikarim tiştekî ji ber xwe bikim; wek ku ez dibihîzim ez dadbar dikim. Dadbarkirina min rast e, çimkî ez ne li daxwaza xwe, lê li daxwaza yê ku ez şandime digerim” (Yûhenna 5:30). Pirtûka şiroveyê ya Pirtûka Pîroz, vê ayetê hîn bi zelalî wisa rave dike: “Bi tena serê xwe ez nikarim tu tiştî bikim, tenê tiştên Xweda hînî min kirine ez ê bikim û li gorî fermanên Wî ez biryarê didim. Gava dengê Xweda tê min ez ê bidarizînim û wê doza min hekhev be.”

Îsa ewqas girêdayî deng û rêliberxistina Giyanê Pîroz jiya ku girêdana xwe çendîn caran anî ziman û wisa got: “Kur nikare

tiştekî ji ber xwe bike, lê tenê tiştên ku ew dibîne Bav dike, ew jî wan dike. Bav çi bike, Kur jî wisa dike" (Yûhenna 5:19). Û dîsa wisa dibêje: "Gotinên ku ez ji we re dibêjim, ez ji ber xwe nabêjim" (Yûhenna 14:10). Em weke şopînerên Wî bi awayekî eşkere ji me re wisa tê gotin: "Yê ku bêje: Ez bi wî re dimînim, divê wek ku Îsa rêve çûye, ew jî rêve here" (Yûhenna I, 2:6).

Divê em jî wekî Wî li hemberî Giyanê Xweda hestiyar bin. Ya rastî ez wisa bawer dikim ku Xweda dixwaze ji dinyaya xwezayî ku em lê dijîn bêtir, dixwaze em li alema wî hayadar bibin. Duakirina bi zimanan mirovê di dilê me de ava dike ku bi vî awayî em bikaribin bi Giyanê Pîroz re hestiyar bin. Û dîsa ji me re wisa tê gotin:

> "Yê ku bi zimanê din dipeyive, *xwe bi xwe ava dike."*
> (Korîntî I, 14:4, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

Grekiya lêkera "ava dike" ya di ayetê de "oikodomeo" ye. Wateya wê ya temam "avakirin" e. Ji ber ku bedena me parezgehên Giyanê Pîroz e ev rastiyek ecêb e. Pavlûs bi taybetî me wisa pênase dike: "Çimkî em hevparên Xwedê yên xebatê ne, hûn zeviya Xwedê, avahiya Xwedê ne" (Korîntî I, 3:9). Em mala Wî ne. Em ji Wî re bêtir cih didin ku di dilê me de bijî. Ji ber vê dema em bi zimanan duayan dikin, xaniyê Giyanê Pîroz ê di dilê me de em firehtir dikin. Em bêtir cih didin wî ku di dilê me de bijî. Helbet ev ne fizîkî ye, gotineke mecazî ye. Ji ber ku W.E. Vine dibêje ev peyv "rasterast an jî di wateya mecazî de avakirinê pênase dike."

Yanî dema ku em bi zimanan duayan dikin, di jiyana xwe de têgihiştina hebûna Wî û hêza Wî fireh dikin. Em ne bi fikrên xwe yên xwezayî, ji bo em bi awayekî hêsantir bi Giyanê Xweda bên bi rêxistin, em mirovê di dilê xwe de bi hêztir dikin.

Birêz Vine di heman demê de dibêje ku ev peyv bi awayekî mecazî tê vê wateyê jî: "mezinkirina giyanê bawermendan û bi

pêşvebirina geşedana şexsiyeta wan e.” Bi heman fikrê ve Elçî Yehûda di nameya xwe de wisa dibêje:

> “Lê hûn, ey hezkirîno, xwe li ser baweriya xwe ya herî pîroz ava bikin, bi Ruhê Pîroz dua bikin.” (Cihûda 1:20)

Grekiya lêkera “ava dike” ya di ayetê de “oikodomeo” ye. Pênaseya vê peyvê “avakirin” e. Ev peyv tê wateya avakirina berdewamî ya giyanê me. Pavlûs ji bawermendan re digot ku hûn avahiyên Xweda ne û Xweda bi xweşiya xwe wan tîne ber Mesîh û bi vî awayî bingeha wan ava dike. Lê pişt re jî bi awayekî eşkere wisa dibêje: “Bila her kes bala xwe bidiyê ku çawa li ser ava dike” (Korîntî I, 3:10).

Di roja me de ji ber ku gelek bawermendan mirovê di dilê xwe de ava nekiriye giyanê wan qels e. Meseleyan li dewsa çavên dilê xwe bi çavên xwe yê din dibînin. Ji bedêla tiştên ku Giyanê Xweda ji dilê wan re dibêje, ji tiştên ku bi guhê xwe dibihîzin bêtir bawer dikin. Mirovê wan yê derveyî serdestiyê li jiyana wan dike. Mirovê di dilê wan de jî dişibe wî zilamê ku ji sibê heta êvarî li ser kanepeyê rûdinê li televîzyonê temaşe dike û cîpsa petatan dixwe. Ax dibe ku ev di jiyan û xizmetê de bi hewldan bixebitin lê mirovê dilê wan hatiye îhmalkirin. Ev bawermend gelek caran ji min re wisa dibêjin: “Ji ber çi tu dibêjî qey ez Xweda qet nebihîzim?” Sedema vê eşkere ye. Ji ber ku Xweda ne ji hişê me re ji dilê me re diaxive. “Ruhê mirov qendîla Xudan e” (Şîretên Silêman 20:27). Eger mirovê di dilê me de neyê avakirin wê demê em nikarin zelal bibîhîzin.

Pavlûs ji bawermendên Îbranî re got, hîn pir gotinên min hebûn ku bibêjim, lê ji ber guhên wan tevizîne zor e ku ez bînim ziman. (Îbranî 5:11). Ev mirov ne ker bûn lê mirovê dilê wan ji rê derketibû û bi meseleyên giyanî re ne têkildar e. Bi vî awayî di rastiya xwe

de van mirovan tam berevajî avakirinê dikirin. Ji bo bihîstîna Gotina Xweda dilê xwe bêtir sar dikirin. Ev rêgez ji bo hemû kesên ku avakirina mirovê dilê xwe paş guh kirine derbasdar e. Eger mirovekî dilê me yê bihêz nebe, nêzîkayiya me ya li Xweda jî zortir dibe! Ji ber vê Pavlûs bi awayekî wêrek wisa dibêje: "Şikir ji Xwedê re, ez ji we hemûyan bêtir bi zimanên din dipeyivim" (Korîntî I, 14:18). Ji bo Îbraniyan jî wisa berdewam dike:

> "Lê xwarina giran ji bo yên gihîştî ye. Têgihîştina wan bi karanînê hatiye perwerdekirin, da ku qencî û xerabiyê ji hev derxin." (Îbranî 5:14)

Bala xwe bidinê ku behsa sehekan dike: ev ne sehekên derveyî ne, ên hundurî ne. Bala xwe bidinê ku di heman demê de van bi kar tîne an jî bi hîndariyê re dibêje ku em sehekên xwe yên hundurîn bi hêz dikin ku zanibin û ji hev vediqetînin bê çi ji Xweda tê û çi ji nebaşî tê.

Weke pênc heb sehekên me yên xwezayî hene, pênc heb jî sehekên me yên giyanî hene. Nivîsên Pîroz mînakekê didin me. Gava we ayetên li jêr xwendin, ji tiştên ku tên behskirin ji xwe bipirsin bê ma hûn dikarin bi sehekên xwe yên xwezayî bikin an hûn nikarin. Bi vî awayî hûn ê têbigihêjin ku nivîskar ne behsa sehekên xwezayî, behsa yên giyanî dikin:

## TEHMANDIN

> *"Tam bikin û bibînin,* çi qenc e Xudan. Xwezî bi wî zilamî ku xwe spartiye Xudan!" (Zebûr 34:8, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

> "Çiqas bi min şîrîn in peyvên te, Ji devê min re ji hingiv şîrîntir in gotinên te!" (Zebûr 119:103)

"Gotinên te hatin dîtin û wan *xwarim* û gotinên te ji min re bûn kêfxweşî û ji dilê min re bûn şabûn." (Yêremya 15:16, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

## DESTDAN

"Xudan dibêje: Loma ji nav wan derkevin û veqetin, *Dest nedin* tiştê murdar. Hingê ezê we qebûl bikim." (Korîntî II, 6:17, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

"Xwe bidin alî, xwe bidin alî! Ji wê derê derkevin Û *dest nedin* tiştê qirêj. Ya kesên ku taximên Xudan hildigirin! Ji nav wê derê derkevin Û xwe paqij bikin." (Îşaya 52:11, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

## BÊHNKIRIN

"Lê şikir ji wî Xwedayî re ku herdem me bi Mesîh, di rêveçûna serfiraziya serketinê de pêşve dibe û bi destê me *bîhna* xweş a zanîna xwe li her derê belav dike. Çimkî em, hem di nav yên ku xilas dibin û hem jî di nav yên ku helak dibin de, ji Xwedê re bîhna Mesîh a xweş in. Ji bo yên helakbûyî em bîhna ku ji mirinê dibe mirinê ne, ji bo yên xilasbûyî jî em bîhna ku ji jiyanê dibe jiyanê ne. Ma kî têra van tiştan dike?" (Korîntî II, 2:14-16, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

"Çawa ku Mesîh ji me hez kir û ji bo me xwe feda kir û xwe wek pêşkêş û goriyeke *bîhnxweş* pêşkêşî Xwedê kir, hûn jî wisa di hezkirinê de rêve herin." (Efesî 5:2, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

"Min her tişt stand û ez di firehiyê de me. Min ew diyariyên ku we bi destê Êpafrodîtos şandibûn, girtin û tu kêmahiya min nema. Ew diyariya we pêşkêşiyeke *bîhnxweş* û goriyeke ku ji aliyê Xwedê ve hatiye qebûlkirin e û li wî xweş tê." (Filîpî 4:18, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

## DÎTIN

"Çimkî, kaniya jiyanê ji te ye, Ronahiya te ronahiya me ye." (Zebûr 36:9)

*"çavên* dilê we ronahî bibin, da ku hûn bizanin hêviya ku hûn ji bo wê hatine gazîkirin çi ye û dewlemendiya rûmeta mîrasa wî ji bo pîrozan çi ye û mezinahiya hêza wî ya bêsînor a ku ji bo me yên ku bawer dikin, li gor qewet û karîna wî dixebite, çi ye." (Efesî 1:18-19, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

"Te her tişt xist bin lingên wî. Îcar gava ku Xwedê her tişt xist bin lingên wî, tu tiştê ku nexist bin lingên wî nehişt. Lê niha em hê nabînin ku her tişt ketiye bin lingên wî. Lê em Îsayê ku ji ber cefayê mirinê taca rûmet û siyanetê wergirtiye, *dibînin*. Ew ji bo demekê ji milyaketan hat nizimtir kirin, da ku bi kerema Xwedê ji bo her kesî mirinê tam bike." (Îbranî 2:8-9, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

"Çiraya bedenê *çav* e. Eger çavê te qenc be, wê tevahiya bedena te bibe ronahî. Lê eger *çavê* te xerab be, wê tevahiya bedena te di tariyê de be. Îcar, eger ronahiya di dilê te de tarî ye, ew çi tariyeke mezin e!" (Metta 6:22-23, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

## BIHÎSTIN

> "Êlyas ji Ahav re got: Rabe bixwe û vexwe. Çimkî dengê taviya baranê tê. Ahav ji bo xwarin û vexwarinê rabû. Êlyas jî derket ser Çiyayê Karmelê, deverû çû erdê û serê xwe xist nav çokên xwe." (Padîşah I, 18:41-42)

> "Ewê ku guhên wî ji bo bihîstinê hene, bila bibihîze!" (Lûqa 14:35)

> "Ewê ku guhên wî hene, bila bibihîze ku Ruh ji civînan re çi dibêje." (Peyxam 2:7)

Derbarê mirovê dilê me de ku li hemberî Giyanê Xweda bêhest bûye an jî bêhîs bûye, Îsa bi awayekî eşkere wisa got:

> "Ji ber vê yekê ez ji wan re bi meselan dibêjim: Ew dibînin, lê nabînin, ew dibihîzin, lê nabihîzin û fêm nakin. Li ser wan, ev pêxemberîtiya Îşaya tê cih ku dibêje: Hûn çiqas bibihîzin jî, hûn tu caran fêm nakin, Hûn çiqas bibînin jî, hûn tu caran tênagihîjin. Çimkî dilê vî gelî hişk bûye, Guhên wan giran bûne Û wan çavên xwe girtine. Nebe ku ew bi çavên xwe bibînin Û bi guhên xwe bibihîzin Û bi dilê xwe fêm bikin Û vegerin ku ez wan qenc bikim." (Metta 13:13-15)

Ew kesên ku ji aliyê giyanî ve kamil bûne, sehekên xwe yên hundurîn ji bo meseleyên giyanî dabeş bikin bi pêş ve dibin. Hemû tiştên ji Xweda û ne ji wî. Ew pêşvebirin bi perwerdekirin an jî bikaranîna hestan yên bawermend re pêk tê. Em hemû xwediyê hestên xwezayî ne lê hinek ji me bi ceribandinan re ji yên din hîn bêtir bi pêşve diçin. Wekî mînak, hin kesên pispor ku seheka xwe ya tehmandinê ji bo qalîteya şeraban ferq bikin bi

pêşve xistine. Bi rêya ceribandinê re li tehma şerabê dinêre û pê derdixe bê kîjan salê hatiye çêkirin, cureya tirî û berhemiya wê ya dereng an zû ye, baranên ku wê salê bariyane kêm an zede ye, an jî bi bereket e an na û hwd. Van hemûyan dikarin bibêjin.

Hinekan jî ji bo bihayê kevirên bi qîmet çavên xwe perwerde kirine. Ji bo çavên bêperwerde dibe ku kevir bêhempa xuya bibin lê çavên bi perwerde derz, reng, kêmasiyên biçûk an jî mezin yên kevir û asta biriqandina wî dikare ji hev derxe.

Ji bo deng û melodiyan bibihîzin teknîkerên deng, mûzîsyen û bestekarên ku guhê xwe perwerde kirine, hene. Ev dikarin di nav orkestrayekê de enstrumeneke ku notayekê xelet lêdixe tespît bikin. Bi salan e sehekên xwe yên bihîstinê li ser jihevderxistina harmoniyê perwerde kirine.

Kesên hestên xwe yên bêhnkirinê perwerde kirine hene. Ev dikarin asta tîrbûna bêhnê ji hev derxin. Û baharat, kulîlk û aromayên her weke van di nav parfûman de dikarin bi nav bikin.

Van kesan hestên xwe yên xwezayî hêzdar kirine. Ne ku bêtir bi keramet in, biryar dane ku van aliyên xwe yên baş bi pêş bixin û ev pêşxistin bi carekê re çênebû; baldariya xwe li ser vê armancê  hûr kirin.

Heta niha bêguman bê em ê çawa sehekên xwe yên derveyî perwerde bikin hûn li gelek mînakên din fikirîne. Heman rê û rêgez ji bo giyan jî derbasdar e. Dibe ku bi salan e hûn bawermend bin jî û we giyanê xwe bi pêş nexistibe. Nivîsên Pîroz derbarê Yehyayê Waftîzkar de wisa dinivîsîne: “ji aliyê giyan ve bi hêz bûye” (Lûqa 1:80). Pavlûs ji Tîmoteos re got ji bo “herkes bi pêşketina te bibîne” divê tu xwe bidî pêşketina giyanî (Tîmoteos I 4:15). Ez ê mirovê di dilê xwe de çawa ava bikin? Nivîsên Pîroz eşkere dibêjin: Bi alîkariya Gotina Xweda ya nivîskî re (Petrûs I 2:2; Karên Şandiyan 20:32), bi rêya îteata ji Gotina Wî re (Îbranî 5:9) û bi duakirina bi zimanan (Korîntî I 14:4; Cihûda 20).

## GIRINGIYA PÊŞXISTINA GIYANÊ ME

Ji bo çi pêşvebirina sehekên hundurîn giring e? Eger sehekên me yên giyanî pêş ketibin, têkilî danîna bi Giyanê Pîroz re em ê bêtir azad bin. Dikare bi me re di gelek astan de rehettir biaxive. Ji bo ravekirinê em ê dîsa berê xwe bidin mînakên xwezayî. Eger her pênc sehekên we bi temamî neşuxiliyana, têkilî danîna bi we re wê ji min pir zehmet bibûya. Min bikira hawar lê wê deng nehatiya we. Min ê destê xwe bidaya wê lê wê haya we jê çênebibûya. Min rahişta levhayeke nivîsê lê we yê nedîtaya û hwd.

Berî bi çendakî hewcedariya bavê min î heştê salî bi cîhaza bihîstînê çêbû lê nexwest bi kar bîne. Me hemûyan bi hev re xwarin dixwar û gava min li wî nêrî min ferq kir ku hişê wî ne li vir e, li cihekî din bû.  Min bi dengekî bilind got: “Te ev bihîst bavo?” Bi awayekî şaşmayî li min nêrî û weke ku ji min re bêje: “Te çi got?” Ji ber ku seheka wî ya bihîstinê ko bibû wî tu zewq ji axaftina me nedistand. (Aniha dikarim bi kêfxweşî bibêjim ku cîhaza bihistînê bi kar tîne!) Heman tişt ji bo giyan jî derbasdar e. Eger sehekên we ko bibin bi îhtîmaleke mezin hûn ê jî tenê beşek ji sohbetê fêhm bikin! Gelek caran dibihîzim ku hin mirov dibêjin: “Weke ku Xweda di astake nêz de bi min re napeyive.” Ya rastî, îhtîmaleke mezin sehekên wan ên hundurîn bi pêş neketine. Divê em vê meseleyê çareser bikin. Xweda ji daxwaza me ya ku em dixwazin wî bibihîzin bêtir, dixwaze bi me re biaxive. Lê pirî caran weke bawermendên Îbraniyan “guhên we giran bûne” (Îbranî 5:11).

Tiştekî ku hûn bi kar tînin hûn bi hêz dikin û tiştekî ku hûn bi kar nayînin hûn qels dikin. Dema em di bin rêvebiriya Giyan de duayan dikin mirovê di dilê me de jî duayan dike û têgihiştina xwezayî an jî hebûn tê înkarkirin. Ji bo em bi awayekî bê asteng têkevin nava hevkariyê, ev hinekî tê wê wateyê ku em rojiya mantiqa xwezayî digirin. Ne tenê ji bo hûn di bin rêvebiriya Giyan de duayan bikin,

her wekî ji bo wergerê baweriyê bi Xweda bînin û ji bo ku wexta we dua kir ji bo guhdarîkirina xwe jî pêşniyaza min ew e ku hûn xwe perwerde bikin.

Gelek caran serê sibehan ji saetekê zêdetir bi zimanan duayan dikim. Piştî gera li nav fikarên xwe diqedînim, pêşî îlahiya dibêjim û ya dilê xwe bi vî awayî ji Wî re rave dikim, îcar bi vî awayî fikarên xwe bi dest dixim û hîn hêsantir li yên giyanî hûr dibim. Bi piranî hesta nêzikbûna Reb hemû xetereyên xwezayî an jî berpirsiyariyan siviktir dike. Pişt re dibînim ku di van kêliyan de fikar, wehiy û hikmet di hişê min de weke peqpeqonkan bilind dibin. Hîn bûm ku karê herî bi hikmet gava duayan dikim nivîsandina wan e û pişt re Giyanê Pîroz derbasî tiştên din dibe.

Salên ewil gava min di bi rêveberiya Giyan de min dua dikirin, gelek caran hêvî şikestî bûm. Ji ber ku hin caran wexta min bi zimanan dua dikirin hişê min li ser tiştên xwezayî bû. Weke mînak wexta min dua dikirin hezar tişt dihatin hişê min; serenavên pirtûkên nû, daxwaza telefonkirina li hevalên ku gelek wext min dengê wan nebihistîbû, xelatkirina kesekî, pereyên xizmetê ez ê çawa xerc bikim û hwd. Herî dawî ez hîn bûm ku ev hemû îlham û beralîkirina Giyanê Pîroz e. Di demekê kin de min dest bi notgirtina van fikaran kir. Çawa ku min dest bi not girtina van fikaran kir giş ji hişê min dûr ketin û fikarên nû xwe li şûna wan girtin û derketin ser avê. Pişt re min ev di nava tevgerên xwe de bi cih kirin û min bereketa Xweda di hemûyan de dît. Gava ku min bi zimanan dua dikir, min ferq kir ku Giyanê Pîroz ne tenê mirovan an jî neteweyan tîne hişê min, di heman demê de ji bo tiştên ku dixwaze ez bikim rê li ber min dixe. Em dîsa dubare bikin, duakirina bi zimanan rêya têkilîdanîna bi Xweda re ya di asteke pir bilind de ye.

## JIYANA ALEMA LI GIYANÊ PÎROZ

Ez bawer dikim ku Pavlus gelek nameyên xwe wisa dinivîsandin. “Çimkî her çiqas ez bi bedenê ne li ba we bim jî, dîsa bi ruh bi we re me û ez bi dîtina serûberî û baweriya we ya qayîm a bi Mesîh şa dibim” (Kolosî 2:5). Şîroveyên weke vê kirin. Bi çavên serê xwe ev nedidîtin ji ber ku bi eşkere digot weke beden ne li cem wan e. Careke din ji Korîntiniyan re wisa got: “Bi bedenê ez ne li ba we bim jî, bi ruh ez di nav we de me. Wek ku ez di nav we de bim, min bi navê Xudan Îsa ji xwe biryara dîwana wî yê ku weha kiriye, daye” (Korîntî I, 5:3). Pavlûs her çiqasî bi bedena xwe ne li wir be jî çawa tevlî bawermendên Korîntî û Koloseyiyan bû û kirin û gotinên wan dîtin? Divê em bînin bîra xwe ku em hebûnên giyanî ne û di alema Giyanê Xweda de dûrbûn û astengî tunene. Kesên ku giyanê wan ji Reb avabûne, ji tiştên pêk tên bêtir hayadar in. Ji ber vê jî dikarin bêtir duayên bi bandor ji kêsên pêdiviya wan pê heye, bikin an jî xizmetê pêşkêşî wan bikin. Bînin bîra xwe ku di beşa dawî de rêberê dibistana Pirtûka Pîroz yê Avûstralyayî ku di jiyana xwe de ew pastorê Çînî ku qet nedîbû tevî endamên dêrê fotograf kişandibûn, nas kiribû!

Gava Pavlûs bi zimanan dua kirin tiştên li derên cuda ku diqewimîn di giyanê xwe de hîs dikir. Bi vî awayî di nameyên xwe de li ser van pirsgirêkan disekinî û wisa dişandin. Di dema rêwitiyên xwe de gava min bi zimanan dua dikirin, min pirsgirêkên malbata xwe an jî xebatkarên xwe didîtin. Pişt re wexta min telefonî wan dikir bêyî ku ew ji min re tiştekî bibêjin haya min jixwe ji gelek tiştan hebû. Lêbelê ji ber ku min di bin rêvebiriya Giyan de dua dikirin, min zanîbû ez ê çi bibêjim û çawa nêzî wan meseleyan bibim.

Gava ez li Afrîkayê bûm li Kenyayê min zilamekî ku şervanê êlê bû, nas kir. Berî bi salan baweriya xwe bi Îsa anî bû û hê jî di nav

gelê xwe de dijiya ji bo ku xizmeta wan bike. Mesîhî ye û navê wî John e û ji bo xizmetkirinê gelek caran diçe derveyî Afrîkayê. Di rêwîtiya xwe ya dawî de çû Amerîkayê û bû mêvanê malbateke ku ez wan nas dikim. Ew sê hefteyên ku li mala wan derbas kir di derheqê malbata xwe de agahiyên bi rêk û pêk dida. Ew malbat şaş diman jê dipirsîn bê çawa haya wî ji jin û zarokên wî yên li Afrikayê wisa gelekî heye, ji ber ku zanîbûn ku di mala malbata wî de telefon tune ye. Ya rastî li gundê lê diman jî telefon tunebû. Wî li ser vê meseleyê tiştekî wisa got: "Tişta ku Pavlûs derbarê dêrên Asyayê de jî kir ev bû. Ew malbata Pavlûs ya li cem Reb ji ber ku navbeynkariya çêbûna wan ya giyanî kiribû. Û her çiqasî li dûr be jî ji aliyê giyanî ve bi wan re bû û pergala wan didît. Heta di derheqê pirsgirêkên wan de ji wan re dinivîsand. Ez tenê qabîliyeta ku Xweda bi alîkariya hêza Giyanê Pîroz daye her bawermendî, bi kar tînim. Bi vî awayî kirinên malbata xwe dişopînim û kengî ji wan dûr bikevim jî ez vê dikim."

Ji ber ku ahengeke bêhempa di navbera wî û Gotina Xweda de heye, min John weke mînak da. Çima em bi vê şaş bimînin? Pavlûs di Peymana Nû de ne tenê carekê, gelek caran behs kir. Ji bilî li yên Amerikayê li derdora vî zilamê Afrîkî tu kes tuneye ku ji bo Nivîsên Pîroz bibêje ne rast e an jî êdî hukma wê nemaye. Em ji bo çi ji tişta ku Îsa bi bedêlên mezin da ji bo bexşî me bike vekişiyan? Em çima mirovê di dilê xwe de ji bo bibe xizmetkar û zarokekî bi hêz yê Rebê me yê hêja û Rizgarkarê me Îsa, mezin nakin û bi pêş naxînin?

Hê ne dereng e! Hûn deh salî bin û heştê salî bin jî, ferq nake. Hûn di demeke nêz de jî ji nûve çêbibin an jî berî bi salan jî ji nû ve çêbibin dîsa ferq nake. Mirov di dilê xwe de hûn dikarin bi duakirina zimanan re bi pêş bixin û hûn dikarin gava duayan dike wergerê jê bixwazin, bi vî awayî hûn ê bi ser bereketa hevkariya bêhempa ya Giyanê Pîroz vebin. Gelek tiştên ku dixwaze ji we re

rave bike hene, tenê divê hûn mirovê derveyî sakîn bikin û hûn nêzî Kesê ku bi her tiştî dizane di dilê xwe de nêzî Wî bibin. Çi vexwendineke xweş e! Lê neborin!

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Rewşeke we ya ji bo hûn alîkariya xelata zimanan hîn baştir fêhm bikin bê Xweda di jiyana we de çawa dixebite, çêbûye gelo? We serwextbûn, îlham an jî jinûvebûneke çawa bi dest xist?
2. Nivîskar Hizkiya (Îşaya 39:2) weke pastorekî navdar serpêhatiyên xwe weke mînak nîşanî me dide û pêwistiya kehyatiya sirên ku Xweda rave kiriye, parve dike. Ji bo we çiqasî girîng e tiştên ku Xweda ji we re rave kiriye ji bo hûn ji kesên din re rave bikin, hûn li benda keliya rast a Reb bisekinin? Ji bo ku hûn kesên din bikin bin bandora xwe arezûyekê we ya ku divê bê kontrolkirin heye gelo?

BEŞ 13

# EWLEHIYA TAM YA KU BÎR Û BAWERIYÊ AVAKIRIYE

“Xweda bersivê nade pêdiviya me.
Dide bîr û baweriya me!”

Min bi salan gelek kesên bawermend yên ku bi Giyanê Pîroz dagirtî, ji Xweda hez dikim, ji Wî ditirsin û ji gunehê direvin, nas kirin û li wan rast hatim lêbelê ew jî wisa dipirsin: “Ez çima dengê Xweda nabîhîzim an jî hebûna Wî tecrube nakim?” Ez dikarim xeyalşkestina van kesên pîroz ferq bikim ji ber ku çi tiştên pê dizanin, hemûyan dikin lê di dema duakirinê de têkiliyê bi Xweda re nikarin deynin. Gava hinekî mirov bi wan re dipeyive, bi piranî mirov kifş dike bê ji ber çi xwe bi vir de û wir de, dibin. Gelek caran tenê bersivek heye û ev bersiv di ayetên jêr de xuya dibin:

> "Ji bo vê yekê birano, bi xwîna Îsa em dikarin *bi cesaret* bikevin Cihê Herî Pîroz. Em di wê riya nû û jîndar re bikevinê ya ku wî ji bo me di bedena xwe de di perdê de vekiriye. Û li ser mala Xwedê kahînekî me yê mezin heye. Em bi dilê ku bi xwînreşandinê ji wijdana xerab paqij bûyî û bi bedena ku bi ava paqij hatî şuştin, *bi piştrastiya temam a baweriyê,* bi dilekî rastîn nêzîkî Xwedê bibin. Em, hêviya ku em eşkere dikin hişk bigirin; çimkî ew ê ku soz daye ewledar e." (Îbranî 10:19-23, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Pêşî, nivîskar ji me re dibêje ku em dikarin têkevin Cihê Herî Pîroz yê ku hebûna Reb lê ye. Gava di çarmîxê de Îsa giyanê xwe teslîm kir, perdeya li perestgehê ya ku ji jor û ber jêr de qetiya bînin bîra xwe. Xweda derket derve û xwe amade dikir li perestgeha xwe ya nû ango hewl dida xwe di mirovê ji nû ve çêbûye de bi cih bike. Bi vî awayî êdî dema em nêz dibin, li şûna ku em hewl bidin û xeyal bikin ku em dikevin odeyeke textî ya milyon kîlometre ji me dûr e, em di nava xwe de li Wî digerin. Ji ber ku têkiliya ku em di nava xwe de bi Giyanê Xweda re datînin, tê wê wateyê ku em bi Îsa û Bav re li odeya text in.

Bala xwe bidinê ku nivîskar ji mere dibêje ku divê em bi "wêrekî" nêz bibin. Em bi ewlehiyeke wisa çawa dikerin nêz bibin? Bi alîkariya xwîna li ser çarmîxê rijandiye re û ji bo em têkevin hebûna wî, em dikarin di rêya halîhazirî de ya vekiriye re nêz bibin. Êsîrkirina me ya ku guneh bû sedema wê, rakir û aniha em dikarin bi ewlehiyeke tam têkevin hebûna Wî.

Ev ne senaryoyeke çawalêhato ye. Ev heqîqetek e. Xweda dibêje gava em nêzî Wî bûn, wê Ew jî nêzî me bibe! Lêbelê sedema tewşbûna gelek kesan, di vê îfadeyê de ye: "Ewlehiya tam ya ku bîr û baweriyê avakiriye." Divê em bi bîr û baweriyê re bên! Nivîsên Pîroz bi awayekî eşkere wisa dinivîsîne:

> "Û bê bawerî çênabe ku mirov li Xwedê xweş bê, çimkî yê ku nêzîkî Xwedê bibe, divê bawer bike ku Xwedê heye û wan ên ku li wî digerin xelat dike." (Îbranî 11:6)

Li van gotinan guhdar bikin: "Bêyî bîr û baweriyê ne pêkan e ku mirov Xweda kêfxweş bike." Çend deqîqeyan veqetînin û destûrê bidin ku ev peyv xwe berdin nava dilê we.

## EZ LI KESEKÎ KU WÊ BAWER BIKE DIGERIM!

Tenê hîn gava çende sal çêbibûn ku min bawer dikir, ez ê serpêhatiya xwe ya li mala xwe ya li Carolinaya Bakur tu carî ji bîr nekim. Sibehekê gava ez di xewa kûr de bûm, di cih de min dît ku ez ji xew çeng bûme û li ser livînên xwe rûniştîme û ji nava devê min bi dengekî bilind ev gotin derdiketin: "Ez li kesekî ku wê bawer bike digerim!"

Min li saeta li ber serê xwe nêrî û min dît ku saet 4ê sibehê ye. Ji ber ku ez ji xeweke kûr ji nişka ve şiyar bibûm, ji bo ez fêhm bikim bê li kuderê me û berî niha çi qewimiye, divê ez hinekî bihatama ser hişê xwe. Min lempeya li ber serê xwe vêxist û min ferq kir ku çarşefa min ji ber xwêdana canê min şilûpil bûye. Lêbelê ne atêşê min hebû û ne jî nexweşiyeke min. Ez hem matmayî bûm û hem jî tirsiyabûm hinekî ji ber min fêhm kir ku berî niha Xweda ji devê min peyivî lê pişt re ez wisa fikirîm: "Çima ne peyveke kûrtir bû? Min zanîbû ku Xweda li mirovên jê bawer bikin digere." Ez westiyabûm ji ber vê yekê ez di cih de li xewê vegeriyam.

Wê rojê gava şiyar bûm, di seranserê wê sibehê de min ev bihîst: "Ez li kesekî ku wê bawer bike digerim… Ez li kesekî ku wê bawer bike digerim… Ez li kesekî ku wê bawer bike digerim…" Û piştî çend saetan min ji nişka ve ferq kir. Ez xwe bi xwe peyivîm: "Ev gotin kûr e!"

Ji wê kêliyê û şûnde ez li van herdu pirsan fikirîm: Tişta ku Îsa herî pir xemgîn kir çi bû? (Ne tişta ku Ew ji her tiştî bêtir aciz kir, ev helbet Ferîsiyên durû bûn.) Û tişta ku herî pir Ew kêfxweş kir çi bû? Ya pêşî, tiştê ku herî pir Ew xemgîn dikir ew bû ku mirovan ji tiştên ku Wî digotin ez ê bikim, bawer nedikirin! Bi awayekî hêsan -nebaweriya wan. Ya rastî bîr û bawerî ev e: mirov ji tişta ku Xweda qesd dike bibêje û tişta dibêje qesd bike, yeqîniyê pê bîne. Xweda ne mirov e ku derewan bike. Berevajî vê li ser navê xwe li dû Gotina xwe disekine. Ji ber ku di ser navê Wî re tu navekî din yê mezin tuneye, li ser xwe sond dixwe. Ji ber vê gava em ji Wî guman dikin, em heqaretê li dirustbûna Wî dikin.

Ka em çavekî li vê bigerînin. Di ayeta jêr de em li hêvî şikestina Îsa guhdar bikin. Ev di beşa Mettayê ya Încîlê de çend jêgirtin in:

> "... hey kêmîmanno?" (Metta 6:30)

> "Şagirt nêzîkî wî bûn, ew hişyar kirin û gotin: Ya Xudan! Me xilas bike! Em helak dibin! Îsa li wan vegerand: Hey kêmîmanno, hûn çima ditirsin?" (Metta 8:25-26)

> "Îsa di cih de destê xwe dirêj kir, ew girt û jê re got: Ey kêmîmano! Tu çima dudilî bûyî?" (Metta 14:31)

> "Îsa dizanibû ku ew çi dibêjin, îcar wî got: Ey kêmîmanno! Ji ber ku nanê we tune hûn çima di nav xwe de dipeyivin?" (Metta 16:8)

Hûn di van hemû ayetan de hêvîşkestin û xemgîniya di dengê Îsa de dibihîzin? Lêbelê bûyera ku min herî pir matmayî dihêle, ew dema ku xwendekar nikarin cinê di nava zarokekî bi idrê dikeve de, derxînin. Lê guhdar bikin bê Îsa ji xwendekarên xwe re çi dibêje:

"Îsa bersîv da û got: Hey nifşê bêbawer û jirêderketî! Ezê heta kengê bi we re bim, heta kengê ezê li we sebir bikim? Wî bînin vir ba min. Îsa li cin hilat û ew jê derket. Ji wê gavê ve kurik qenc bû." (Metta 17:17-18)

Hestên xwe ebeden di nava xwe de nehiştin. Dengê wî di ser hêvîşkestinê re jî diçe û digihê sînorê acizî û hêrsa pîroz!

Pişt re xwendekarên wî tên û ji Îsa dipirsin bê ji bo çi nikarîbûn bera cin bidin. Îsa bi awayekî hêsan wisa bersiv da:

"Ji ber ku baweriya we kêm e." (Metta 17:20-21)

## XWEDA BERSIVÊ DIDE BÎR Û BAWERIYA ME

Çi tiştên ku em ji Reb digirin bi rêya bîr û baweriyê tên. Gelek mirovên ku di bedena Mesîh de ne û haya wan ji rastiyekê tuneye, min kifş kir. Ev rastî ew e ku Xweda bersivê nade pêdiviyên me, dide bîr û baweriya me! Ka hinekî rawestin û li ser vê hevokê bifikirin. Ez dikarim gelek mînakên ku vê yekê nîşan didin ji Nivîsên Pîroz bidim lê destûrê bidin min ku ez tenê du mînakan bidim. Di mînaka pêşî de Îsa, li malekê hînî gelek rêberan dikir û em wisa dixwînin:

"Hêza Xudan ji bo qenckirina nexweşiyên wan pê re bû." (Lûqa 5:17)

Di vê ayetê de dibêje; hêza Reb ji bo van rêberan rehet bike jî li wê civatê bû ku ez ji vê gotinê hez dikim. Herî kêm yek ji wan rêberên li wir, bêguman pêdiviya gelekan ji wan bi rehetbûnê hebû lê tu kes ji wan rehet nebû. Çima? Ji ber ku tu kes ji wan ne xwediyê wê bîr û baweriyê bû ku başbûnê bipejirînin.

Lêbelê çend kesan rahiştibû zilamekî felçbûyî yê li ser livînên

xwe û hewl didan ku têxin malê. Ji ber ku pir zêde bûn û di xanî de hilnehatin, derketin ser xênî û kiremîtên li wir rakirin û zilam tevlî cihê wî li ber Îsa danîn. Pişt re em wisa dixwînin:

> “Gava *wî baweriya wan dît,* ji yê felcî re got: Ey mirovo! Li gunehên te hat bihûrtin. Şerîetzan û Fêrisiyan dest pê kir, fikirîn û gotin: Ma evê ku çêrî Xwedê dike kî ye? Ma ji Xwedê pê ve, kî dikare li gunehan bibihûre? Îsa bi fikrên wan hesiya, wî bersîv da û ji wan re got: Ma hûn çima tiştên weha di dilê xwe de dibêjin? Ma kîjan hêsanîtir e? Ez bêjim: Gunehên te li te hatin bihûrtin! an ku ez bêjim: ‹Rabe û rêve here!› Lê ji bo ku hûn bizanin desthilatiya Kurê Mirov heye ku li ser erdê li gunehan bibihûre», ji yê felcî re got: Ez ji te re dibêjim, rabe nivînên xwe hilîne û here mala xwe. Ew jî di cih de li pêş wan rabû ser xwe, rahişt wan nivînên ku ew di nav wan de bû, çû mala xwe û pesnê Xwedê da. Hemû li vê yekê heyirî man, pesnê Xwedê dan, dilê wan tije tirs bû û gotin: Îro me tiştên ecêb dîtin.” (Lûqa 5:20-26, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

Îsa bîr û baweriya wan dît. Zilamê felçbûyî û yê ku rahiştibûn wî, zanîbûn ku Gotina Xweda rast e. Haya wan jê hebû ku Xweda berê bi gelê xwe re peyiviye û gotina “Ey canê min, Xudan pîroz ke! Û jibîr neke, hemû qenciyên wî! Yê ku hemû sûcên te dibexşîne, Yê ku ji hemû nexweşînên te re şîfayê tîne” (Zebûr 103:2-3) bêguman zanîbûn ku kiriye. Îcara gava rêberan dît ku zilamê felçbûyî rehet bû, ecêb man û Xweda berz û bala kirin lêbelê yek ji wan jî rehet nebû. Çima? Ji ber ku Xweda xwestibe ku rahijin tiştekî gava bîr û baweriya me tunebe em nikarin rahijinê! Xwesteka Bav ew bû ku wê rojê rêberên nexweş jî rehet bibin lê rehet nebûn! Xweda gava em jê bawer dikin hereket dike û ev bîr û bawerî gava em li ser gotina wî hereket dikin, derdikeve holê.

Di bûyereke din de jinikeke ji gelên din hat cem Îsa. Li ber Îsa geriya ku keçika wê ya cin ketiye nava wê, xelas bike. Îsa ev bersiv da wê:

> "Bihêle ku pêşî zarok têr bibin, çimkî ne rast e ku mirov nanê zarokan bistîne û bavêje ber kûçikan." (Marqos 7:27)

Belê, we rast bihîst. Îsa ji jinikê re got; kûçik. Jinikê dikarîbû ev weke heqaretekê bidîta û ji wir dûr biketa. Lêbelê jinikê bi awayekî haya wê ji şexsiyeta Îsa hebû. Ji ber vê di cih de wisa bersiv dayê:

> "Erê ya Xudan, lê kûçik jî ji hûrikên zarokan ên bin sifrê dixwin." (Marqos 7:28)

Zanîbû ku di huzûra Kurikê Xweda de ye û bawer dikir ku Ew Rebekî baş ku hêza Wî naqede. Jinik li ser a xwe bû ji ber ku tekane tişta ku divê bike, israra di xwesteka xwe de bû û wê demê zanîbû ku wê Îsa wê red neke. Li ser baweriya xwe ma û Îsa ji ber vê jê re wisa got:

> "Ji ber vê gotina te, tu dikarî herî, cin ji keça te derketiye." (Marqos 7:29)

Jinik gava vegeriya malê dît ku keçika wê bi temamî rehet bûye. Careke din diyar bû ku Îsa bersiv neda pêdiviya wê da baweriya wê. Rîcaya pêşî ya jinikê pêdiviya wê diyar dikir lê bersiva da Îsa ji ber bîr û baweriya wê pêk dihat.

## BÎR Û BAWERÎ MIFTEYA BIDESTXISTINA HER TIŞTÎ YE

Ev rêgez li her tiştê Desthilatdariyê dikare bê barkirin. Di esasê xwe de Yaqûb, tîne ziman ku gava em bi duakirinê nêzî Xweda bûn, divê em vê bikin:

> "Lê bila bi bawerî bixwaze û dudilî nebe. Çimkî yê ku dudilî dibe, wek pêla deryayê ye ya ku ba lê dixe û şeqil dide. Mirovekî weha bila nefikire ku ewê tiştekî ji Xudan bistîne." (Aqûb 1:6-7)

Wey tu lê binêre, li van gotinan dîsa guhdar bikin: "...Mirovekî weha bila nefikire ku ewê tiştekî ji Xudan bistîne." Li ser vê gotinê hinekî bifikirin. "Bila nefikire ku ewê tiştekî ji Xudan bistîne." Îfadeyeke teqez ku cihekî wê ya ne diyar an jî dubetiyeke wê tuneye! Xweda dixwaze jê bawer be ku me ev yek teqez fêhm kiriye! Bersivê dide bîr û baweriyê, ne tiştekî din e!

Ha ji ber vê sedemê gelek kesan Giyanê Pîroz bi dest nexistiye. Bi bîr û baweriyê naxwazin. Nivîsên Pîroz ji me re wisa dibêjin:

> "Ez dixwazim tenê vê ji we hîn bibim: Ma we Ruhê Xwedê bi kirina Şerîetê an bi *bihîstin û bawerkirinê* stand?" (Galatî 3:2, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

Ev gotin hema bêje weke gotinên Yaqûb in. Eger hûn bi bîr û baweriyê nêzî Reb nebin, hûn nikarin tu tiştî ji Reb bistînin û bêguman Giyanê Wî jî di nav vê de ye. Ji ber vê gelek caran ez li bawermendên dildar yên ku bi zimanan napeyivin, rast hatim. Dizanim ku ji vê zêdetir heye û lê digerin lêbelê derbarê bi serveçûna Giyanê Pîroz de, piştî ku Gotina Xweda bihîstin ji min re wisa dibêjin: "Carekê ji bo ez rahijêmê min dua kirin û tu tişt

nebû.” An jî ji bo rahijênê gava duayan dikin, vêya bi hewldaneke “belkî” bibe, dikin. Ne xwediyê biryardariya wê jinika li jor in. Bi baweriyeke tam nayên! Bi wêrekî nayên! Xweda dixwaze ku em hemû bi ya dilê Wî zanibin ji ber ku ji me re wisa dibêje: “Loma ne bêaqil bin, lê belê fêm bikin ka daxwaza Xudan çi ye” (Efesî 5:17). Gava em bi xwesteka Xweda zanibin, em bi bîr û bawerî û bi ewlehiyê dixwazin.

Ji bo nêzîkayiya li Xweda heman rêgez derbasdar e. Gelek caran gava bawermend nêzî Reb dibin, bi hêviya ku bi Wî re têkiliyê deynin vê dikin (Ez ne behsa peyva hêviyê ya ku di Pirtûka Pîroz de tê wateya “Hêviyeke biewle” dikim. Ez behsa îfadeya “belkî bibe” ya ku tê wateya hêviyê dikim). Bawermend gelek caran bi hêviya ku wê bên bihîstin gotinan li holê dikin. Ev hewldan ne bîr û bawerî ye û wê negihêje huzûra Xweda. Em dîsa wisa dixwînin: “Û bê bawerî çênabe ku mirov li Xwedê xweş bê, çimkî yê ku nêzîkî Xwedê bibe, divê bawer bike ku Xwedê heye û wan ên ku li wî digerin xelat dike” (Îbranî 11:6). Nivîskar ji bawermendên Îbranî re dibêje, gava nêzî Xweda bûn divê bîr û baweriya xwe pê bînin ku Ew heye. Bi awayekî din, divê bawer bikin ku Ew amade ye, wê bibihîze û wê bersivê bide!

Yaqûb wisa dinivîsîne: “Mirovekî weha bila nefikire ku ewê tiştekî ji Xudan bistîne. Ew mirovekî dudilî û di hemû riyên xwe de bêbiryar e” (Aqûb 1:7-8). Yekî bêbiryar nêzî Xweda dibe lêbelê jê dipirse bê di hebûna Wî de dibe an na. Dibe ku meraq bike bê ma gelo Xweda hatina wî ferq dike an ferq nake.

Diyardeyeke bêbiryariyê ew fikir in ku li binguhê hev dikevin. Ez diyar bikim. Gelek caran piştî waazekê mirov ji bo bi duayê re bên bi rêxistin, gava tên bi pêş de ez ji muzîsyenan dixwazim ku muzîkê qut bikin. Sedema vê ew e ku her çiqasî muzîk enstrumental be jî, ji ber gelek kes bi peyvên stranê dizanin, nikarin li Xweda zîq bibin. Yaqûb wisa dibêje: “Nêzîkî Xwedê bibin, ew jî wê nêzîkî we bibe.

Gunehkarno, destên xwe paqij bikin. Dudilîno, dilê xwe safî bikin" (Aqûb 4:8). Eger hişê me li Reb zîq nebibe em ê çawa li Xweda bigerin? Hûn dikarin xeyal bikin ku bi heman awayî nêzî hevalekî xwe bibin?

Bala mirova zû belawela dibe ji ber ku gava nêz dibin hêvî dikin ku wê bi Xweda re têkiliyê deynin. Na, divê hûn bawer bikin ku heye, divê hûn bawer bikin ku amade ye, divê hûn bawer bikin ku guhdar dike û bersivê dide û wê Ew hemû baldariya we heq bike. Bîr û bawerî, garantiya ku Ew hemû baldariya xwe dide we ava dike ji ber ku hûn bi soza Wî dizanin û Ew derewan nake, eger hûn nêzî Wî bibin wê Ew jî nêzî we bibe. Axx, ji ber kelecanê hema dike dilê min bisekine. Çi Xwedayekî me yê bêhempa heye û em bîr û baweriyê pê tînin! Eger em bi bîr û baweriyê nêzî Wî bibin, wê Ew jî bersivê bide me!

## EM Ê ÇAWA BIGIHÊJIN BÎR Û BAWERIYÊ?

Divê aniha em li ser pirsekê ku gelek caran tê kirin bisekinin: Ez ê çawa bîr û baweriya xwe qewîn bikim? Ev pirs bi sedan salan hat pirsîn, ya rastî dîroka wê diçe heta dema elçiyan:

> "Şandiyan ji Xudan re got: Baweriya me zêde bike. Û Xudan got: Eger baweriya we wek libeke xerdelê jî hebûya, weyê ji vê dara tûyê re bigota: Ji ra ve rabe û xwe di deryayê de biçikilîne! Û wê bi ya we bikira." (Lûqa 17:5-6)

Pêşî bala xwe bidinê ku dibêje "Eger baweriya we wek libeke xerdelê jî hebûya." Toxim pir biçûk e lê di nava wê de hêzeke mezin heye ku dikare bibe dareke pir mezin. Ji ber vê berî ku em li ser bê wê bîr û bawerî çawa bibe dareke mezin ya fêkiyan, bisekinin; divê pêşî em pirsa "em toximê çawa dibînin" bipirsin. Bersiva vê pirsê di ayeta piştî vê de bi awayekî eşkere diyar dibe:

"Îcar bawerî ji *bihîstinê tê û tiştê* bihîstî ji peyva Mesîh e."
(Romayî 10:17, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin)*

Pir hêsan e. Toximê bîr û baweriyê ji bihîstina Gotina Xweda re tê. Carina dibe ku bi carekê re mirov bibihîze çêbibe lê gelek caran toxim bi çend carên bihîstinê re di dilê me de bi cih dibe. Sedema ku gelek bawermendên dildar yên ku gelek caran li peyameke ku Gotina Xweda tê de guhdar dikin an jî dixwînin ev e. Gelek mirovên ku hatine cem min û gotine "Min pirtûkek te pênc caran xwend an jî peyama te ya vîdeoyê çar caran min guhdar kir û cara çaran weke narîncokekê di nava min de teqiya" çêbûne. Ha ew dem dema ku toxim bi cih bûye û kokên xwe berdane erdê!

Ewqasî hêsan e ku em dikarin bi awayekî pir rehet têxin rewşeke pir tevlihev. Toximê bîr û baweriyê bi bihîstina Gotina Xweda ya bi îlhama Giyanê Pîroz ya Xweda re hatiye gotin an jî hatiye nivîsandin, tê. Mixabin di roja me de gelek waaz tên dayîn, gelek pirtûk tên nivîsandin lêbelê Gotina Xweda pir kêm tê gotin. Pirtûka min pêşî nivîsandibû ji aliyê weşanxaneyeke bi nav û deng, bi bahaneye "bêtir weke waazekê ye" neweşandibûn û li min vegerandibûn.

Pir ayet û pir gotinên Xweda dîtin. Ez dibêjim hema ji bo tiştekî ku ji hestên mirov û şexsiyeta wî re baş be, dixwestin vê yekê bibînin.

Mixabin lê gelek xizmetkarên ku di roja me de serî li ber ditewînin ev e. Êdî ji bo kesên ku tevlî wê dibin û pêdiviya wan pê tuneye ku Pirtûka xwe ya Pîroz bînin û dêrên me yên ku "ji kesên baldar re xweş tê" hene. Di nava jiyana wan ya bi lêgerîna zewqê derbas dibe ku wê "axaftineke" alîkariya wan bike an jî wê ji wan re xweş bê, guhdar dikin. Gava li rewşa dêra Rojava difikirim, her tişt bi min îronîk tê ji ber ku xizmeta me di nava du salan de, ji

rêberên dêra binerd ya Çînê ku birçî û mihtacî Gotina Xweda ne, pêncî hezar Pirtûkên Pîroz şand. Li Çînê Pirtûka Pîroz ewqasî kêm tê pêdekirin ku rêber rûpelên Peymana Nû didin yextiyarên dêrê û ji wan dixwazin ku beşên xwe jiber bikin. Bi vî awayî armanc ew e ku eger rayedar dest deynin ser Pirtûka wan ya Pîroz, ji bo her dem karibin bipeyivin. Ev birayên hêja bi qedir û qiymetê Gotina Xweda baş dizanin.

Lêbelê li dêrên me yên Rojava li şûna Gotina Xweda ya ku veguherîna giyanî ava dike û şexsiyetê dikuje em hewl didin ku peyamên kêfxweşiyê dide canê me û şexsiyeta me rehet dike, ava bikin. Dibe ku gava em li van peyaman guhdar bikin em bikenin û dibe ku em bi çîrokeke şewat re hêsiran bibarînin. Lê gava guneh hat û li ber deriyê van kesên baldar sekinî îcar wê çawa bibe? Ji bo li hemberî gunehê bisekinin wê hêzê di xwe de bibînin gelo? Di rewşeke qrîtîk de gava pêdiviya wan pê çêbû ku zanibin bi xwesteka Xweda wê çi bibe? Wê zanibin duayan bikin an jî wê çi bixwazin? Di Peymana Nû de wê karibin bibin xwediyê bîr û baweriya kesên ku bi bîr û baweriyê re hatine sitendin? Dawî li van senaryoyan nayê!

Aniha kêfa min tê ku dîrektorê weşanxaneyê pirtûka min ya pêşî çap nekir. Ji ber ku eger qebûl bikira wê ji edîtoran bixwesta ku peyamê qels bikin û wê bi deh hezaran xwendekarên ku bi alîkariya peyamê re bi hêz bûn, jê bêpar bimana (pirtûk di dawiya dawî de çap bû). Tişta îronîk ew e ku xwediyê weşanxaneyê di dawiya dawî de ew dîrektor ji kar qewirand û zilamekî li gorî dilê Xweda anî şûna wî. Dîrektorê nû ji bo bibîne ku peyamên Xweda li gelê Wî tên belavkirin, kadroyeke xwedî heman arezûyê ava kir. Ev zilamê nû bi min re peyivî û ji bo pirtûka piştî vê em çap bikin, destûr xwest. Di dawiya dawî de ji bo heman weşanxaneyê min pênc pirtûk nivîsandin û çar jê ketin nav lîsteya yên herî baş

tên firotin. Lêbelê di ser vê re jî derbarê jiyan, malbat û dêrên ku Xweda guhertin de, em şahidiyê berdewam dikin. Hemû mezinahî bila ji Xweda re be!

Sedema ku ez vê bi we re parve dikim ew e ku li welat xelayek heye. Ev "ne xelaya nan an jî avê ye, xelaya tîbûna li gotinên REB e" (bnr. Amos 8:11). Li dêrên Amerîkayê bi piranî Gotina Xweda pir kêm waaza wan tê kirin. Ez nabêjim pêyamên me tunene ji ber ku hejmareke pir zêde ya pirtûk, vîdeo û meteryalên bideng hene lê di meseleya Gotina Xweda de kêmasiya me heye. Gava ez diçim welatên Afrîka û Asyayê, nizanim ji ber çi ye her çiqasî ev welat ji Amerîkayiyan kêmtir xwedî çavkaniyan bin jî ez dibînim ku ev mirov bi awayekî rehettir ji Xweda distînin û di jiyana wan de pirtir berhem û bîr û bawerî heye? Hêsan e. Ji ber ku tişta ji kesên baldar re xweş tê ne peyamên birêgez in, rasterast Gotina Xweda dibihîzin!

Min soz da Xweda ku ez ê tu carî sitûyê xwe li şûna peyamên ku Ew pê diaxive li ber tundiya peyamên ku mirovan kêfxweş dike, netewînim. Pavlûs wisa dibêje: "Ma niha ez lê digerim ku li mirovan an li Xwedê xweş bêm? An ez dixebitim ku mirovan dilxweş bikim? Eger min hê bixwesta ku ez mirovan dilxweş bikim, ez nedibûm xulamê Mesîh" (Galatî 1:10). Çend kesan weke xulamê Mesîh dest bi xizmetê kiriye û aniha bûye xulamê civat an jî guhdaran? Êdî xwedêgiravî, rêbertiya kesên ku dikin çi tiştên dixwazin wê tundiyê li wan dikin.

Bîr û bawerî bi bihîstina Gotina Xweda re tê. Ya ku di dilê me de toximê bîr û baweriyê bi cih dike Gotina Xweda ye. Weke rêberan divê em tişta ku Reb ji gelê xwe re weke pêdiviyê dibîne, bidin wan; ne tişta lê difikirin ku weke pêdiviya wan pê heye. Divê em wan bi Gotina Xweda ya ku ew hêz pê re heye ku wan ji aliyê giyanî ve bi pêş bixe û wan bigihîne mîrasê, têr bikin (bnr. Karên Şandiyan 20:32).

Gelek rêberên ku Gotina Xweda ya pak û bêhîle îlan dikin û dîsa vedigerin eniya pêş. Hin ji wan ketin xefka ku mirovan kêfxweş bikin lê aniha azad dibin û rêberên nû jî digihêjin. Bang gelê Xweda dikin ku dîsa li Wî vegerin! Xweda ji ber çi di vê serdemê de nêzîkayiya li Wî tîne ziman? Bersiv hêsan e. Ji bo hûn bi Wî re hevkariyeke şirîn bijîn, dixwaze hûn xwedî bîr û baweriyê bin ji ber ku bê bîr û bawerî hûn nikarin nêzî Wî bin! Ji bo gelê xwe nêzî xwe bike, Gotina xwe di dilê wan de diçîne. Ax, çi xizmeteke bikelecan!

## EM ÇAWA DIKARIN BÎR Û BAWERIYA XWE QEWÎN BIKIN?

Aniha îcar em tên ser pirsa em ê çawa bîr û baweriya xwe qewîn bikin. Îsa ji xwendekarên xwe re wisa got:

> "Û Xudan got: Eger baweriya we wek libeke xerdelê jî hebûya, weyê ji vê dara tûyê re bigota: Ji ra ve rabe û xwe di deryayê de biçikilîne! Û wê bi ya we bikira. Kî ji we, xulamekî wî yê şivan an cotkar hebe, gava ew ji zeviyê vegere malê, wê jê re bêje: Hema were û li ser sifrê rûne? Ma ew di şûna vê de ji wî re nabêje: Rabe, piştа xwe girêde, heta ku ez bixwim û vexwim xizmeta min bike û paşê tu jî bixwe û vexwe? Û ji bo ku wî ew tiştên ku li wî hatibûn emirkirin anîn cih, ma ewê spasiya xulam bike? De îcar hûn jî, çaxê we hemû tiştên ku li we hatine emirkirin anîn cih, bêjin: Em xulamên bêkêr in; me ew karê ku li ser me deyn bû, kir." (Lûqa 17:6-10)

Îsa bîr û baweriyê dişibîne toximê lê axaftina Wî ya ji nişka ya derbarê peywira koleyê li hemberî efendiyê xwe de, ez şaş kirim. Ez difikirîm ku di vir de axaftina Îsa hevdu nagire lê min zanîbû

ku wê ev ne rast be. Piştre rojekê Giyanê Pîroz hişê min anî serê min.

Pêşî dibêje ku bîr û bawerî di awayê toximê de tê ji me re. Toxim pir biçûk in lê di nava wan de hêzeke wan ya ku bibin dareke pir mezin, veşartiye. Ji ber vê ne bes e ku mirov xwedî toximeke bibandor be lê ji bo toxim bigihêjin armanca xwe divê bên mezinkirin. Beşa duyem ya bersivê, di xwe de mifteya toximê bîr û baweriyê ku veguherîne dareke fêkî ya mezin, dihewîne. Bi awayekî din, weke bîr û baweriyeke ku dara tûyê ji binî ve rake û çiyayan bihejîne an jî me derxîne huzûra Xweda!

Koleyek çima ji bo efendiyê xwe cot dike an jî şivantiyê ji pezê wî re dike? Armanca wî ya dawî ew e ku gepek xwarin bi dest bixe. Tişta ku Îsa dibêje ev e: Koleyek piştî ku bi erd û kêrî daket îcar here hundur û xwarinê deyne ser sifreya efendiyê xwe ma xizmeta xwe temam nake? Ji bo serkeftinê divê çi tiştên jê tên xwestin bîne cih. Temamkirina kar, dişebe piştî ku mirov toximek çand, av da û gubre kir, îcar gava dema çinînê hat mirov wê tune bike an jî îhmal bike û bihêle birize.

Îsa, behsa îteata li hemberî Wî dike. Ew efendî ye û em koleyên Wî ne yên li nav erdên Wî dixebitin. Eger em bixwazin bibînin ku toximên me yên bîr û baweriyê mezin bûne û fêkî da ne, divê em di her tiştên ji me tê xwestin de, xizmetkarên bi îteatkar bin. Bala xwe bidin sozên piştî van, “De îcar hûn jî, çaxê we hemû tiştên ku li we hatine emirkirin anîn cih…” Ev gotin bi îteata me re têkildar e û mifteya dîtina qewînbûna bîr û baweriya me ye.

## ÎTEATA NÎVCO BÊÎTEATÎ YE

Bi awayekî nîvco mirov îteatê bike an jî bi îteatê dest pê bike û piştre bi paş de vegere, ne bes e. Di Pirtûka Pîroz de xeteya ku gelek kes ketibûnê ev bû. Mînaka diyar Qiral Saul e. Gotina

Xweda bi awayekî eşkere jê re ferman kir ku hemû Amalekiyan ji binî ve qir bike. Wê jin û zilam, zar û zêç û hemû heywan bikuştana. Çi zindiya ku bêhn distan wê ji ber nefilitiya.

Saul li ser vê fermanê nabêje "Ez ê vê nekim!" Gelek caran em bêîteatiyê hema bêje bi îsyanekê re weke hev dibînin. Lêbelê ev ne rast e. Ya din jî, Saul fikra xwe pêşî qebûl kiriye û dûra neguhertiye. Gelek ji me bi vê cure bêîteatiyê jî dizanin. Saul serê pêşî ev ferman îhmal nekiriye û di dawiya dawî de îhmal an jî ji ber bîrkirinê bêîteatî jî nekiriye. Gelek jê dipejirînin ku ev tevger ne îteat e lê ji ber niyeta wan ya baş, tên bexşandin. Bêguman wê her kes van senaryoyan weke tevgerên bêîteatiyê qebûl bike lê em bala xwe bidin tiştên ku Saul kirine.

Di cih de artêşa xwe dide hev û dest bi êrîşê dike. Her jin û zilam û zarokî dikuje. Bi deh hezaran kes dikevin ber devê şûrê Saul û artêşa wî. Lêbelê Saul dil ji qiralê Amalekê nayê. Çima? Ez bawer dikim ku li gorî çanda wê demê lê diçe. Eger hûn welatekî dagir bikin û pişt re qiralê wî welatî sax bi dest bixin û li saraya xwe bikin kole, wê ev yek bibe qûpaya serkeftinê ya zindî.

Wekî din Saul bi hezaran heywan kuştin. Lêbelê mih, dewar, ga, berxê herî baş û çi tiştên baş yên heye nekuştin û bi armanca ku peywira xwe ya "olî" bîne cih û ji bo qurbanan pêşkêşî Xweda bikin, dan gel. Xeyal bikin bê gel vê çawa dibîne. Dibe ku gava ev heywan ji REB re kirin qurban, wisa fikirîbin: "Çi qiralekî me yê xwedayî heye, her dem Reb dixe dora pêşî."

Lê derbarê vê mijarê de fikreke cuda ya Xweda heye. Samuel gazinan dike: "Ez poşman bûm ku min Şawûl kir padîşah. Çimkî êdî ji pey min vegeriya û gotinên min bi cih neanî. Hêrsa Samûêl rabû û tevahiya şevê hewar û gaziyê xwe bir Xudan" (Samûêl I, 15:11). Saul bi deh hezaran kuştin û tenê kesek bexşand. Peywira ku jê re hatibû fermankirin ji sedî 99.9 anî bi cih. Gelek ji me wî di peywira xwe de weke kesekî bi îteat dibînin lêbelê Xweda

di peywira wî de bêîteatiyê dibîne. Ya rastî piştî çend ayetan ji pêxember re dibêje ev serhildanek e. Ev nîşanî me dide ku îteateke nîvco li gorî Xweda bêîteatiyeke tam e. Ya rastî hema bêje îteateke tam, heta ji sedî 99 îteat weke serhildanekê tê hesibandin. Em vê çiqasî pir dibihîzin: "Çima tu li tiştên ez dikim nanêrî? Tenê tu li tiştekî ku min pir kêm çekiriye, zîq dibî!" Saul teqez dikarîbû wisa bigotaya. Her çiqasî ev nêrîn li gorî mantiqê mirov be jî, ne li gorî Xweda ye!

## NÊZÎKAYÎ BI BÎR Û BAWERIYA ME RE RASTERAST HEVGIRTÎ YE

Eger em li rewşa jiyana Saul temaşe bikin, hûn ê ferq bikin ku her çûye bîr û baweriya wî bi awayekî rêkûpêk qels bûye. Hûn ferq bikin ku her çûye hîn bêtir ji Reb jî dûr ketiye. Asta nêzîkayiyê kêm dibe ji ber ku derfeta me ya ku em bi Xweda re nêzîkayiyê ava bikin, bi bîr û baweriya me re hevgirtiyeke rast e. Derbarê vê de Elçî Yûhenna wisa dinivîsîne:

> "Û bi vê yekê emê bizanin ku em ji rastiyê ne û li ber wî emê dilê xwe rihet bikin. Eger dilê me, me sûcdar derxe, Xwedê ji dilê me mezintir e û ew her tiştî dizane. Hezkirîno, eger dilê me, me sûcdar dernexe, li ber Xwedê cesareta me heye û em her çi bixwazin emê jê bistînin. Çimkî em emrên wî tînin cih û em tiştên ku li wî xweş tên dikin." (Yûhenna I, 3:19-22)

Weke çawa derfeta me ya nêzîkayiya li Xweda bi bîr û baweriya me re hevgirtiyeke rast be, bîr û baweriya me jî bi îteata Wî re hevgirtiye. Aniha ez vê zelal bikim. Hema di piştî wê de ez behsa bêîteatiya tobe û mikurhatinê nakim. Gunehê Dawid ji yê Saul pir mezintir bû lê di cih de tobe kir. Ne bîr û baweriya wî

kêm bû ne jî derfeta hevkariya wî ya bi Reb re zeîf bû. Ji aliyê din ve Saul, tiştên lê difikire ku yê wî ne, ji bo wan biparêze û bi pêş bixe, berjewendiya xwe domand. Dilê wî berevajî yê Dawid ne li gorî dilê Xweda bû.

Mînakeke vê ya baş ya ji jiyana rojane, dibe ku dînamîkên di nava jin û mêrekî de bin. Eger yek jê li berjewendiyê xwe bigere û bi aliyê din ve ne girêdayî be, wê baweriya li hev û nêzîkayî winda bibe. Mêrek dibe ku wisa bibêje: "Binêre, fatûreyan ez didim, te birçî nahêlim, mala te min ava kiriye û ez te tazî nahêlim. Ma qey wê çi bibe ji bilî te ku dostikeke min hebe?" Dibe ku ji jina xwe re bibêje: "Ez ji te hez dikim." Heta dibe ku bibêje ez baş li wê dinêrim lê ji ber ku di cihekî tenê de îteatê nake ez dikarim garantiyê bidim ku wê asta wan nêzîkayiyê bi awayekî pir xurt kêm bibe.

Em jî dikarin ji Reb wisa bipirsin: "Rebê min, ez bi awayekî rêkûpêk tevlî dêrê dibim, ez beşa xwe ya ji dehan yekê didim, Pirtûka xwe ya Pîroz dixwînim û duayan dikim, çima bîr û baweriya min evqasî zeîf e?" Naxwe ez pirsekê ji we bikim: Hûn çawa nêzî hevjîna/ê xwe dibin? Xweda dibêje: "Mêrno, bila bi vî awayî her yek di jiyana bi jina xwe re fêmdar û têgihîştî be, ji jina ku naziktir e re hurmetê bikin, çimkî ew bi xwe jî wêrisên kerema jiyanê ne. Wisa ku ji duayên we re asteng dernekeve" (Petrûs I, 3:7). Gava em di hemû qadan de ne bi îteat bin, wê hevkariya me ya bi Xweda re bê astengkirin. Van gotinên Îsa bînin bîra xwe: "... piştî ku we hemû fermanên li we hatine kirin anîn cih..." Îteateke nîvco tu carî "bîr û baweriya we zêde nake!" Heman rêgez, ji bo tevgerên jinên li hemberî mêrê xwe, zarokên li hemberî dêûbavên xwe û heta ji bo tevgerên dêûbavan yên li hemberî zarokên wan jî derbasdar e.

Pirseke din ya ku dikare bê kirin ev e: Hûn mirovekî ku li ser soza xwe ne? Nivîsên Pîroz ji bo kesên nêzî Xweda re dibêjin: "Bi xesara xwe sond xwaribe jî, venagere ji sondê" (Zebûr 15:4).

Hûn sozan didin û li ser soza xwe nasekinin? Hûn bi zimanên xwe gunehan dikin û îcar pişt re hûn meraq dikin bê ji ber çi bîr û baweriya we kêm e? Ez dikarim bi van pirsan berdewam bikim.

Tişta ez qesta wê dikim, divê em jiyana xwe bi îteateke tam û li gorî Gotina Xweda berdewam bikin! Ji ber ku bi awayekî teqez ji me re wisa tê gotin:

> "Zarokên min ên delal, ez van tiştan ji we re dinivîsim, *da ku hûn guneh nekin."* (Yûhenna I, 2:1, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Gelek kesan an li gunehê bi çavekî biçûk nêrîn an jî ew weke zagonekê dîtin. Kesên ku guneh biçûk dîtin, ji ber em xwedî dilovanî û başiyê ne û hemû li çarmîxê hatine nixumandin, bawer dikin ku wê Gotina Xweda îhlal bikin. Belê, pirsgirêka gunehê li çarmîxê çareser bû lê divê em bînin bîra xwe bê Pavlûs ji bawermendan re çi gotibû: "Ma hûn nizanin ku hûn ji bo xulamtiyê xwe bidin destê kê, hûn xulamên wî ne û hûn bi ya wî dikin? An ji bo mirinê hûn xulamên guneh in, an jî ji bo rastdariyê hûn xulamên guhdanê ne" (Romayî 6:16). Ya din jî wê Îsa wisa bang kesên ku Ew weke Reb qebûl kirine, bike lê dîsa jî guneh ji xwe re kirine tebîet: "Min hûn qet nas nekirin! Ji min dûr kevin, hûn ên ku neheqiyê dikin!" (Metta 7:23).

Kesên ji zagonan bawer dikin, difikirin ku guneh kesekî ji "qulûba pîroziyê" derdixîne. Tişta ku wê me lê germ bike û ji bêîteatiyê dûr bixe divê ne ev be. Lêbelê gava me dît ku wê guneh zerarê bide bîr û baweriya me û ji ber vê wê li ber têkiliya me û Xweda bibe asteng, wê demê em ji gunehê direvin! Çima? Ji ber ku ji her tiştî bêtir em dixwazin bi Wî re nêzî hev bin. Îcar aniha berî ku vexwendina nêzîkbûna li Xweda ya Yaqûb bide û pişt re bê çima wisa gotiye em fêhm dikin:

> *"Loma bi ya Xwedê bikin.* Li hember Îblîs bisekinin, ewê ji we bireve. Nêzîkî Xwedê bibin, ew jî wê nêzîkî we bibe. *Gunehkarno, destên xwe paqij bikin.* Dudilîno, dilê xwe safî bikin." (Aqûb 4:7-8, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Di navedan her tiştî de îteat heye! Çima? Ji bo em bi ewlehiyeke tam nêzî Xweda bibin. Careke din em li ayetên di serê vê beşê de ne binêrin:

> "Ji bo vê yekê birano, bi xwîna Îsa em dikarin *bi cesaret* bikevin Cihê Herî Pîroz. Em di wê riya nû û jîndar re bikevinê ya ku wî ji bo me di bedena xwe de di perdê de vekiriye. Û li ser mala Xwedê kahînekî me yê mezin heye. Em bi dilê ku bi xwînreşandinê ji wijdana xerab paqij bûyî û bi bedena ku bi ava paqij hatî şuştin, bi piştrastiya temam a baweriyê, bi dilekî rastîn nêzîkî Xwedê bibin. Em, hêviya ku em eşkere dikin hişk bigirin; çimkî ew ê ku soz daye ewledar e." (Îbranî 10:19-23, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Baweriya me ya tam an jî pêbaweriya me, ji çavkaniya bîr û baweriya ya ku ji bihîstina Gotina Xweda ye, derdikeve û her ku îteata me berdewam dike, mezin dibe. Eger em gunehê bikin, li ber Bav Parêzerekî me heye û eger em destê xwe li tobeyê sivik bikin, wê demê wê wijdanê me ji bindestiyê dûr be. Ji ber ku xwîna Wî me ji berfê spîtir paqij dike. Lêbelê eger em bi zaneyî gunehan bikin, wê demê wê wijdanê me, me sûcdar bike û Xweda ji wijdanê me mezintir e. Ji ber vê, wê rê li ber me bê girtin ku em bi awayekî ewle nêzî Xweda bibin.

## HÊVÎ

Îcar aniha em vegerin hevoka duduyan ya li jor ku di Nivîsên Pîroz de ye: "Em, hêviya ku em eşkere dikin hişk bigirin." Hêvî

gelek caran xelet tê fêhmkirin, ev ne îfadeya “belkî bibe” ye. Berevajî vê tê wateya “bendewariyeke bi ewle.”

Xweda gava cara pêşî ji Brahîm ve hat xuyakirin, ev soz dayê: “Ez mertalê te me, wê xelata te gelek mezin be” (Destpêk 15:1). Tu “hêviyeke xwezayî” ya Brahîm ji jina xwe ya ku zarok jê re çênedibûn, tunebû. Ji ber vê bersiva da hinekî bêhêvî bû:

> “Lê Avram got: Ya Reb Xudan, tê çi bidî min? Va ye ez bêziret im. Kesê malê min jê re bimîne, ev Êliyezerê Şamî ye. Wî berdewam kir û got: Ji ber ku te zarok nedan min, wê xulamekî nav mala min li ser mîrasa min rûne.” (Destpêk 15:2-3)

Diyar bû ku heviya vî zilamî ya pir kêm bû ya jî qet tunebû. Lê Xweda, zanîbû ku hêviya Brahîm tunebe wê negihêje sozên Wî. Ji ber vê Reb ew êvarî derxist derve û jê re got stêrkên li asîmanan bihejmêre. Ez vê bûyerê wisa xeyal dikim. Gava ku Brahîm stêrkên bêhejmar dihejmartin di xew re çû. Sibeha din î rojê Reb ew bi pirsekê şiyar kir: “Te hemû hejmartin?”

Brahîm got: “Na, pir stêrk hene!”

Haya Xweda ji vê bersivê hebû û piştî vê bersivê ev gotin kir: “Wê ziriyeta te jî evqas zêde be!” (Destpêk 15:5).

Xweda hêviyeke xwedayî xiste nava Brahîm, ango derbarê soza xwe de nêrîneke net bi cih kir: Zarokên dawî li hejmara wan nayê. Kengî gava li stêrkan nêrî, soza Xweda hat bîra wî û zuriyeta wî ya bêhejmar ku jê re dibêje: “Bavo Brahîm, Bavo Brahîm!” hat guhê wî. Bi vê yekê re girêdayî, di Peymana Nû de ji bo Brahîm wisa dibêje:

> “Birahîm di bêhêvîtiyê de bi hêvî bawer kir û bû bavê gelek miletan. Wek ku hatibû gotin: Dûndana te wê weha be.” (Romayî 4:18)

Gotin çi bû? “Wê ziryeta te wisa bibe!” Gava ku hêviya xwezayî tunebû, hêviya xwedayî ji bo tiştên xuyayî di bin siya xwe de bihêle, bi sozê re xuya bû. Hêviya xwedayî di ser tiştên xuyayî re, li alema bi hêviyê ya bi baweriya Xweda tije, nêrî. Brahîm ya xuyayî bi ya xwedayî re guherand û ev hilbijart. Ya rastî Nivîsên Pîroz ji me re “Ew tam piştrast bû, soza ku Xwedê daye ew dikare bike jî” (Romayî 4:21) dibêjin. Soz, bi bîr û baweriya bi hêviyê qewîn bûye, stend. Wisa hatiye nivîsand:

> “Îcar bawerî, ewlebûna tiştên ku hêvî bi wan tê kirin e, piştrastbûniya tiştên ku nayên dîtin e.” (Îbranî 11:1)

Bîr û baweriya me, hêvî an jî sozên Xweda piştrast dike. Weke çawa me Brahîm dît, hêviya xwedayî; vîzyon an jî pêşnûmeya xwesteka Xweda ye ya ku hîn me bi çavên serê xwe nediye. Hêviya xwedayî heta tu bêjî bes girîng e. Ji ber ku hêvî tunebe tiştekî ku wê bîr û bawerî rast bike, tuneye. Gotina Xweda, ne tenê bîr û baweriyê di dilê me de bi cih dike, di heman demê de ji bo bîr û baweriyê hêvî an jî vîzyonê dide me.

Em vê dikarin bişibînin keresteyên înşaatê yên weke tûxla, şibake, texte, çemento, feyans û hwd. Dibe ku em xwediyê van hemû çavkaniyan bin lê pirojeyeke me ya pêşnûma tunebe, wê pêvajoya înşaatê bibe felaketek! Dibe ku hûn wisa bifikirin, bêyî pêşnûmayekê ez dikarim înşaatê lêbikim. Belkî di serê we de pêşnûmayek hebe jî, lê wê dîsa jî pêdiviya we bi pilanekê hebe.

## DERBASBÛNA ÇAVIKA LI PIŞT PERDEYÊ

Derbarê nêzîkayiyê de em careke din li ayetên xwe yên sereke binêrin:

> "Ji bo vê yekê birano, bi xwîna Îsa em dikarin bi cesaret bikevin Cihê Herî Pîroz. Em di wê riya nû û jîndar re bikevinê ya ku wî ji bo me di bedena xwe de di perdê de vekiriye. Û li ser mala Xwedê kahînekî me yê mezin heye. Em bi dilê ku bi xwînreşandinê ji wijdana xerab paqij bûyî û bi bedena ku bi ava paqij hatî şuştin, bi piştrastiya temam a baweriyê, bi dilekî rastîn nêzîkî Xwedê bibin. Em, hêviya ku em eşkere dikin hişk bigirin; çimkî ew ê ku soz daye ewledar e." (Îbranî 10:19-23)

Nivîskar bi awayekî eşkere behsa nêzîkayiya li Reb dike. Careke din li van gotinan binêrin: "Em, hêviya ku em eşkere dikin hişk bigirin." Em bînin bîra xwe ku hêvî; pêşnûmayek, vîzyonek, resmekî xwedayî ye ku em bi çavên serê xwe nikarin bibînin. Em vê di serê xwe de bigirin û bi vî awayî em tiştên li jêr bi baldarî bixwînin:

> "Erê, mirov bi yekî ku ji wan mezintir e, sond dixwin; sond ji bo bawerîanînê dawiya her devjeniyê tîne. Bi vî awayî, çaxê Xwedê xwest ku hê bêtir nîşanî wêrisên sozê bide ku armanca wî nayê guhertin, wî soz da û bi ser de jî sond xwar. Wisa ku bi du tiştên ku nayên guhertin û çênabe ku Xwedê di wan de derewan bike, cesareteke me ya xurt hebe, da ku em vê hêviya ku li ber me hatiye danîn, bigirin. Ev hêviya me wek lengerê can ê saxlem û ewledar e û *derbasî aliyê perdê yê hundir dibe."* (Îbranî 6:16-19, *Xeberên bi herfên cudakirî yên nivîskarin*)

Hûn vê dibînin? Gava em van ayetan datînin ber hev, em vê dibînin:

> … bi ewlebûna tam ya ku bîr.û baweriyê ava kiriye, em bi dilekî pak û paqij nêzî Xweda binin. Em xwe li hêviya ku me bi eşkere pejirandiye, bişidînin. Ji ber ku Xwedayê sozê dide, bi ewle ye… Ev hêviya ji bo canên me ku weke demirê keştiyê saxlem û bi ewle ye, derbasî çavika li pişt perdeyê dibe. (Îbranî 10:22-23; 6:19)

Di Wergera Jiyana Nû de wisa derbas dibe: “Me di nav perdeya bihuştê re derbas dike û dibe çavika hundurîn ya Xweda.” Yê ku nêrîna hêviyeke xwedayî ya zelal da Brahîm, Xweda bû. Gava ku mesele bû nêzîkayî, Giyanê Pîroz ji me re tişta ku çavên me yên niştecih nabînin, ango resmê xwedayî yê Rebê ku li odeya textî ya bihuştê rûniştiye, dide me. Gava em nêz dibin, em li Giyanê Xweda yê di nava me de ye vedigerin û di nav perdeya bedena xwe û ya fikrên xwe yên xwezayî yên bi sînor re derbas dibin û diçin huzûra Wî. Gava em dikevin perestgeha hundurîn ya bihuştê, em li wir bi Îsa û Bav re rastî hev tên. Li vê perestgeha hundurîn bi Rebê Berzûbala re em nêzîkayiyê tecrube dikin!

Gava bawermend duayan dikin, gelek caran xeyal dikin ku ber bi odeyeke text ve dimeşin. Lêbelê bêyî alîkariya Giyanê Pîroz, kirina vî tiştî mirov dikare bişibîne bêyî ku vîzyon hebe têgihiştina Brahîm ya soza Xweda ye. Piştî ku Reb ji Brahîm re resmekî zelal xêz kir û şûnde, sozên Xweda dabûn bi dest xistin. Bêyî Giyanê Pîroz di çavika hundurîn de em nêzîkayiya rast nikarin tecrube bikin. Ew hêviya ku em bi çavên serê xwe nikarin bibînin dide me an jî vîzyona zelal ava dike. Bi vê vîzyonê re û bi wêrekî û ewlebûna tam ya ku bîr û baweriyê daye, em ji bo bereketên ku Îsa bedelên mezin dane û ji bo me bi dest xistine, nêz dibin. Axx

Reb Îsa, ez spasdarê te me ji ber ku ji bo em aniha û heta hetayê bi awayekî ewle derkevin huzûra Xweda, te xwîna xwe ya pîroz ji bo rijand!

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Peyva hêviyê ku di Pirtûka Pîroz de tê wateya sekna biewle, ji hêviya di wateya “belkî bibe” de ku di zimanê me de wisa hatiye bi cihkirin, cuda ye. Bêyî sekneke biewle, we qet xwe bi tevgereke “belkî bibe” ku pevy li hewa belawela kirine û gotiye, dîtiye gelo? Eger bersiva we erê be, ev yek derbarê rewşa bîr û baweriya we de çi dibêje?
2. Ji dema elçîyan ve ji aliyê bawermendan ve du pirs hatina pirsîn. Nivîsandina pirsan pir dişibe hev lêbelê tiştên dipirsin ji aliyê kurahiyê ve cuda ne:
   - Em ê çawa bibin xwediyê bîr û baweriyê?
   - Em ê bîr û baweriya xwe çawa qewîn bikin? Di bin ronahiya tiştên ku em di vê beşê de hîn bûn, hûn ê van pirsan çawa bibersivînin?
3. Gava hûn xwezaya îteatiya Saul bi ya Dawid re didin ber hev, hûn cudahiyên çawa tê de dibînin? Îteatiya wan bandoreke çawa li nêzîkayiya wan ya bi Xweda re kir?
4. Nêzîkayî, qabîliyeta kesekî ku bi wêrekî nêzî Xweda dibe, bandoreke çawa lê dike?

BEŞ 14

# NÊZÎ XWEDA

"Hûn dikarin bi wêrekî nêzî Wî bibin ji ber ku vexwendineke ku nayê guhertin kir!"

Di vê beşa dawî de em ê li ser aliyekî pratîktir yê nêzîkayiya Rebê ku ji me pir hez dike, bisekinin. Lêbelê kirina vî karî mirov dikare bişibîne kesekî ku wê nû bizewice, jê re behsa têkiliya nêz ya li oda razanê bi kitekit bike û talîmatan bidêyê. Tenê heta radeyekê tu dikarî wî hîn bike ji ber ku ya din ji dilê mirov diherike. Û di vir de xweşikbûna nêzîkayiyê veşartiye: Ji dilê mirov rû dide, bi aqil nayê hînkirin.

Gava em nêzî Xweda bibin divê em ji bîr nekin ku em di şibheyê Wî de hatine afirandin. Weke çawa hestên me cuda dibin, yên Wî jî cuda ne. Weke çawa divê ku em li hemberî hestên hevalekî nêz pir hesas bin, divê em li hemberî yên Reb jî hesas bin. Weke mînak, çawa ku wê demên me yên ku em bi îlahiyan

bên huzûra Wî hebin, wê demên me yên ku em ê bi dilekî şikestî jî bên hemberî Wî hebin. Wê demên me yên ku em ê bi wêrekî bên û wê demên me yên ku em ê bi tirsê bêm cem Wî hebin. Demên ku em dikenin, digirîn, demên ku bi alîkariya Wî em li hemberî hêzên tariyê şer dikin û di huzûra Wî ya bêhempa de demên bihuzûr û pir xweş hene.

Ji bo vê weke mînakekê mirov dikare maleke ku di bin gefa eşqiyayan de ye, bide. Bifikirin ku kesên eşqiya zorê li deriyê pişt yê malê dikin û hindik mane têkevin malê. Wê kêliyê xeyal bikin ku xortekî malê ji bavê xwe yê ku li çekê digere re dibêje: “Bavo, li gorî min kes di ser te re tuneye. Te ji bo me her tişt kir, tu zilamakî kêfxweş û bi aqil î…”

Îcar di vê rewşê de wê bav bi kurikê xwe re bixeyide û wê bersiveke wisa bide: “Aniha ne dema ku tu hestên xwe ji min re bibêjî, here rahije darê xwe yê beyzbolê û em bi hev re herin pişt xanî!”

Divê em ji bîr nekin û her dem li bîra me be ku dêra Îsayê Mesîh mala Xweda ye. Dijminên me yên bi rastî hene. Ji ber vê gava ez duayan dikim, demên ku divê Giyanê Pîroz bi awayekî lez şer bike, çêdibin û şêweya Wî ya ku berê min bide şer jî cuda dibe. Gotina Xweda bi axaftinê, di Giyan de bi awayekî hêz duakirin an jî bi hebandina hêz re (artêşên Îsraîl Yehoşafat, bnr. Dîrok II 20:20-24). Divê ne tenê ji atmosferê re em hesas bin, divê di heman demê de, di meseleya bê em ê çawa xwesteka Wî bînin cih de jî em hesas tevbigerin.

Em vegerin mînaka xwe û ji aliyê din ve em lê binêrin. Heman malê xeyal bikin: Her tişt normal e û bav li ber agirê sobê xwe vezilandiye. Vê carê qasqa lawik di serî de û di destê wî de darê beyzbolê dikeve hundur û dibêje: “Bavo, em wan bigirin!”

Bav li wî dinêre û wisa dibêje: “Kurikê min aniha tiştekî xerab naqewime, çima tu li cem min rûnanê, em bi hev re ji xwe re bilîzin.”

Ez bawer im dibe ku hûn li gelek senaryoyên ku em bi nasên xwe re dijîn difikirin. Heta di dema duakirinê de gelek dem û serdem hene. Nivîsên Pîroz piştgiriya her yeka ku min weke lîsteyê li jor dan û zêdetirî wan, dike. Mifte ew e ku wê kêliyê mirov bizanibe çi di dilê Xweda de ye.

## BERJEWENDIYÊN XWEDA

Eger hevalekî we her dem li berjewendiyên xwe bifikiriya û bihata cem we, we yê çi hîs bikira? Bavekî ku kurikê wî her dem bi xwestekên xwe tên cem wî, xwe çawa hîs dike? Hûn ê ji kesên ku tenê li xwe difikirin û hûn dizanin ku ne dilovan in, hûn ê dilê xwe ji wan re vekin? Eger em bixwazin ku dest dilê Reb bidin, divê em bi xwestek û pêdiviyên Wî zanibin. Ax erê, pêdiviyên Wî! Her çiqasî qeweta Wî bigihêje her tiştî û pêdiviya Wî bi tu tiştî tunebe jî, îradeyeke azad daye mirovan û li ser rûyê erdê hin azadiyên bi sînor daye wan. Bi vî awayî xwe hinekî bêparastin hişt. Çawa ku mirovan guneh kir, ji ber dafik, îşkence û jirêderxistinên hêzên tarî, gelek mirovên hewcedar û êşê dikişînin hene. Xweda bêriya ku li ser navê wan hereket bike, dike. Û li benda wan mirovan e ku ji bo wan gilî û gazinan bikin. Ji ber vê hûn ê bibînin, kesên ku bi xweşiya Xweda re alîkariya kesê navbeynkariyê dikin û êşê dikişînin, nêzî Reb in. Îsa li ser kursiya darizandinê wisa dibêje:

> “Çimkî ez birçî bûm, we xwarin da min; ez tî bûm we av da min; ez xerîb bûm we ez hewandim; ez tazî bûm, we ez bi cil kirim; ez nexweş bûm, hûn hatin serdana min; ez di zîndanê de bûm, hûn hatin ba min.” (Metta 25:35-36)

Di vir de em dibînin ku pêdiviya Rebê mezin yê ku hêz û rayedariya erd û ezman di destê Wî de ye, tîne ziman. Pêdiviya Wî, pêdiviyên me ne jî ku em hezkiriyên Wî ne. Ji ber ku wisa

dibêje: "...we çi ji yekî ji van birayên min ên herî biçûk re kiribe, we ew ji min re kiriye" (Metta 25:40). Kesên navbeynkariyê dikin, yên alîkariya fizîkî dikin, yên Gotina azadkar ya Xweda waaz dikin, yên bi hêza Xweda êşan baş dikin û hwd. wê berî her kesî zûtir dilê Wî bi dest bixin.

Gelê Xweda carekê bi hewldanê dihat ber bi Wî ve û derbarê wan de wisa got: "Dîsa jî her roj ew li min digerin Û dilê wan bi zanîna riyên min xweş dibin" (Îşaya 58:2). Lêbelê Reb bersiv nedida wan. Gel lê pirsî bê ji ber çi Xweda nêzî wan nabe. Fêhm nekirin bê ji ber çi bersiv neda duayên wan. Li ser vê Xweda wisa got:

> "Dibêjin: Em rojî digirin, Çima tu nabînî? Me canê xwe nizim kir, Çima tu pê nizanî? Va ye, di roja hûn rojî digirin de, Hûn li pey kêfa xwe ne Û zorê li hemû karkerên xwe dikin. Va ye, hûn bi tenê ji bo şer û pevçûnê, Bi tenê ji bo bi kulma xerabiyê lêxin rojî digirin. Bi vê rojîgirtina wekî îro, Wê li ezmanan dengê we neyê bihîstin." (Îşaya 58:3-4)

Bala xwe bidinê ku hevdu dibin û tînin û heta hevdu didin ber kulman. Em vegerin ayeta sereke ya vê pirtûkê: "Nêzî Xweda bibin wê Ew jî nêzî we bibe." Hûn ê bibînin ku Yaqûb bi van gotinan dest bi vê beşê dike:

> "Şer û pevçûnên di nav we de ji ku derê ne? Ma ev ne ji xwestekên we yên ku di endamên bedena we de şer dikin, tên? Çavê we li tiştekî ye, lê hûn bi dest naxin. Hûn dikujin û çavnebariyê dikin, lê hûn nikarin bigihîjin armanca xwe. Hûn şer û pevçûnê dikin. Hûn bi dest naxin, çimkî hûn ji Xwedê naxwazin. Hûn dixwazin û nastînin, çimkî hûn bi niyeta xerab dixwazin, da ku hûn ji bo kêfên xwe bimezêxin. Hey zînakarno! Ma hûn nizanin ku dostaniya bi dinyayê re, dijminahiya bi

> Xwedê re ye? Loma kî ku bixwaze bibe dostê dinyayê, xwe dike dijminê Xwedê. Ma hûn guman dikin ku Nivîsara Pîroz badîhewa dibêje: Xwedê bi hesûdî ruhê ku daye me dixwaze. Lê keremeke hê mezintir dide. Loma dibêje: Xwedê li hember pozbilindan disekine, Lê keremê li nefsbiçûkan dike. Loma bi ya Xwedê bikin. Li hember Îblîs bisekinin, ewê ji we bireve. Nêzîkî Xwedê bibin, ew jî wê nêzîkî we bibe. Gunehkarno, destên xwe paqij bikin. Dudilîno, dilê xwe safî bikin." (Aqûb 4:1-8)

Ha vaye li pêş we ye. Gava yekem ya herî baş: Divê em ji bo xatirê Xweda û Mizgîniyê di canê xwe de bibihurin. Divê tiştê ku Ew jê hez dike em jî jê hez bikin û yê ku Ew jê nefret dike em jî jê nefret bikin. Tiştên ji bo Wî girîng in divê ji bo me jî girîng bin û tiştên ji bo Wî ne pir girîng in divê ji bo me jî pir ne girîng bin. Divê em xwediyê dilê Wî bin!

Wateya vê ew e ku wê di jiyana me de dema tezebûneke şexsî çênebe qey? Ma wê Xweda gelê xwe ji kêfxweşî û bêhnvedanê mehrûm bike? Bêguman na! Nivîsên Pîroz dibêjin Xweda ev gotiye: "...her tiştî bi zêdehî dide me, ku em pê şa bibin" (Tîmotêyos I, 6:17). Lêbelê gava em didin dû arezûyên xwe û xwestekên Wî îhmal dikin, em têkiliya xwe ji dilê Xweda qut dikin.

Heta ku weke fizîkî em alîkariya feqîran nekin, kesên ku bawer dikin me xwestekên Xweda bi cih neanîne, hene. Lêbelê eger ev rast be, wê demê gava mirov divê ku bi bîyan dakeve, îcar çima Petrûs gotineke wisa dike: "Ne qenc e ku em dev ji peyva Xwedê berdin û xizmeta sifreyan bikin. Loma birano, hûn di nav xwe de, heft mirovên bi Ruhê Pîroz tije û şehreza bibijêrin û em wan deynin ser vî karî. Heçî em in, emê xwe bidin duayê û xizmeta peyvê" (Karên Şandiyan 6:2-4). Petrûs feqîr bi Gotina Xweda têr kirin û zanîbû ku çawa yên pêdiviyên wan bi cih tînin hene, kesên ku pêdiviyên wan yên fizîkî jî bi cih tînin, hene. Lêbelê xaleke van

ya hevpar hebû. Pêdiviya Îsa bi cih tînin, “Ji ber ez birçî bibûm, we xwarin da min…”

Kesên di dilê wan de berjewendiyên Xweda hene, wê hîn hêsantir bên nêzî Wî. Mûsa zilamekî wisa bû ji ber ku gava şivantiya gelê Xweda dikir, di dilê wî de berjewendiyên Reb hebûn. Li hemberî dilê Xweda hesas bû û bi Wî re xwediyê hevkariyeke dewlemend bû.

Xweda ji bo Yoşiya ku ew bi xwe qiralekî baş bû, wisa got: “Doza zebûn û xizan dît; wê gavê qenc bû. Ma nas kirina min ne ew e? XUDAN dibêje” (Yêremya 22:16).

Tu dixwazî bila alîkarî be, bila rêvebirin be, hînkirin, îdarekirin, dayîn û hwd. çi be bila be, kesên ku xizmeta xwe baş tînin cih ji kesên ku jiyan heta xizmeta xwe bi rojeva xwe dadigirin wê hîn hêsantir nêzî Xweda bibin. Ji ber ku Reb bi xwe wisa dibêje: “Ma naskirina min ne ev e?”

## JI BO HÛN GUHDAR BIKIN NÊZ BIBIN

Şîreteke piratîk ji bo kesên ku dixwazin nêzî Efendî bibin, di ayetên jêr de derbas dibe:

> “Dema ku tu diçî Mala Xwedê, hay ji gavên xwe hebe. Çêtir e ku tu ji bo guhdarîkirinê nêzîk bibî, ne ku tu qurbana bêaqilan pêşkêş bikî. Çimkî ew nizanin ku xerabiyê dikin. Bi devê xwe nelezîne, Ne jî bila dilê te li ber Xwedê ji peyivînê re bilezîne. Çimkî Xwedê li ezmanan e, lê tu li erdê yî, Loma bila gotinên te hindik bin. Xema zêde dibe xewn, Gotina zêde jî bêaqiliyê tîne.” (Waiz 5:1-3)

Em parçeyên pêşî yên van ayetan veqetînin. Em wisa dixwînin: “...ne weke ehmeqan ji bo mirov qurbanan pêşkêş bike, ji bo guhdarkirinê nêz bibe.” Ez gelek mirovên ku her dem dipeyivin

û nêzî Xweda dibin an jî îlahiyan dixwînin û nêzî Xweda dibin, dibînim. Ev bêguman rast e. Lêbelê berî ez bi awayekî bêdeng nêzî Wî bibim û gotinekê an jî îlahiyeke hebandinê jê re bêjim, min ji guhdarîkirina Wî pir bereket bi dest xist.

Berî bi çendakî ez bi pastorê dêreke pir mezin û bi hêz re bûm. Li ser xwarinê ji min re wisa got: “John ez hatim cihekî ku ez bi vî awayî bangî Xweda dikim, ‘Ez westiyam ji ber ku ez her sibeh dikevim vî hundurî û tu bersivê nastînim û tenê li dengê xwe guhdar dikim. Ji ber vê heta tu bi min re bipeyivî, ez ê her sibeh bêm vir û tenê guhdar bikim.’”

Ev rewş gelek sibehan berdewam kir ji ber ku Reb ya dilê wî diceriband lê sibehekê ket odeya xwe û ji nişka ve Giyanê Pîroz pê re peyivî. Di vê serdemê de Xweda, wehiyên herî bi hêz yên heta wê demê dane wî û pastor ev wehiy bi hefteyan ji civata xwe re gotin. Di jiyana duayan de şoreşek çêbibû.

Min rêyeke bi hêz ya çûyîna huzûra Xweda kifş kir ku bi xwendina parçeyekî (bi taybetî ji Zebûr an jî Peymana Nû) ji Pirtûka Pîroz pêk tê. Ne zêde, belkî ayetek û carina ez nêviyê ayetekê dixwînim û li ser kûr kûr difikirim û piştî wê ez yeka din dixwînim û di dawiya dawî de wê hebûna Reb xuya bibe. Pişt re ez dev ji xwendinê berdidim û li Wî zîq dibim û ez destûrê didim ku min hîn bike û tiştên wê bibin nîşanî min bide.

Berî axaftinê ji bo guhdarkirinê mirov têkeve huzûra Wî her dem bi piranî pir bi bandor e. Berê gava ez tev li êvarên hebandinê dibûm, ji bo ez xwestek an jî hestên Xweda hîs bikim min aqlê xwe dianî serê xwe û min li Giyanê Xweda yê di nava xwe de dinêrî carcaran. Piştî vê ez dest bi îlahiyan dikim. Lê ev her dem ne rast e ji ber ku hin deman ez bi spasiya ji dilê min diherike, bi pesindayînê an jî bi bi kêfxweşiyê nêzî Wî dibim. Tu dibêjî qey Giyanê Xweda dibêje: “Heydê em herin!” Ji ber ku Pirtûka Pîroz wisa dibêje:

> "Em bi spasî derkevin pêşberî wî, Em lavijên şahiyê bêjin ji bo wî!" (Zebûr 95:2)

Û bi heman awayî,

> "Bi şahî biperizinê, Bi lavijên şahî derkevin pêşberî wî!" (Zebûr 100:2)

Di van ayetan de ji bo em bi spasdarî û newayan derkevin huzûra Reb, em tên teşwîqkirin lê di metna pêşiya van de ji bo guhdarîkirinê ji me re dibêje nêz bibin. Her tişt bi awayekî hesas ve bi Wî ve girêdayiye! Çawa ku hûn nikarin ji zilamekî re bibêjin bê wê çawa bi jina xwe re gav bi gav şa bibe, nêzîbûna me ya li Rebê me jî eynî weke vê ye.

Hûn dikarin xeyal bikin ku lîsteyeke nivîsandî li ber zilamekî ye bê wê şeva pêşî ya zewicandinê gav bi gav çi bike? Ji lîsteyê dixwîne, gava pêşî: Jê re bibêje bê tu çi xweşik î. Gava duduyan: Bi porê wê bilîze. Gava sisêyan: Lempeyê vemirîne. Gava çaran: (hoop, ez nikarim vê bixwînim, divê fenereke destan hebe). Kenê mirov pê tê! Lêbelê hinekan jê hema bêje duakirin jî anîne asteke wisa ku kenê mirov pê tê. Ew hestên xwe yên ku dest bidin dilê Xweda û dil Wî hîs bikin, ji holê rakirine. Ax min xelet fêhm nekin, ji Nivîsên Pîroz dîrektîfên sereke yên ku divê em wan bişopînin hene lê miheqeq divê em bi alîkariya Giyanê Pîroz re bên ji ber ku Nivîsên Pîroz bi awayekî eşkere vê ji me re dibêjin: "Çimkî herf dikuje, lê belê Ruh vedijîne" (Korîntî II, 3:6). Bi vî awayî Giyanê Xweda dikare berê me bide navbeyvkariyê, gotina îlahiyan, deng bilindkirinê, bêdengiyê û hwd.

Tiştekî din ku ji me tê xwestin ew e ku em di xwestek an jî gotinên xwe de eceleyê nekin. Têkiliyên me yên xwezayî jî vê nîşan didin. Kesek gava pir bi derewan dipeyive, em êdî hew bi baldarî lê guhdar dikin. Lêbelê gava kesek peyvên xwe bi zanebûn

hildibijêre, eger pir bipeyive jî mirov bi baldarî lê guhdar dike. Ji ber vê piraniya dema min ya bi duakirinê bêtir an di bêdengiyê de, an bi axaftina zimanan re an jî bi Gotina Xweda re derbas dibe.

Gava ez bi zimanan dipeyivim, ez dizanim ku divê ji xwesteka Xweda ya bêqusûr re duayan bikim. Giyanê Pîroz, ji bo ez ji Bavê xwe re bibêjim li ser navê Îsa gotinan dide min. Di bin rêvebiriya Giyan de ez nikarim duayên xelet an jî gotinên bi derewan bikim! Gava ez Gotinên Wî yên nivîskî dibêjim, ez dibînim ku hemû hebûna min bi pêş dikeve û helbet ev yek hişê min jî di xwe de dihewîne. Ji ber vê duakirina di hişê xwe de jî pir girîng e.

Lêbelê gava ez zanibim ku di huzûra Wî de me û gava li Wî guhdar dikim; wehiy, têgihiştin û zanebûnê bi xwe re tîne. Tiştekî pir girîng e ku mirov demê bide Reb ji bo bi mirov re bipeyive. Hûn dikarin kesekî ku her cara tê cem we bênavber dipeyive û nahêle ku hûn peyvekê tenê jî bipeyivin, xeyal bikin? Li gorî min carina Giyanê Pîroz gava bi me re ye xwe wisa hîs dike. Bi qasî ku em dipeyivin divê em guhdar jî bikin. Ji bîr nekin, dua ne monolog e, diyalog e!

## RÊYÊN RAGIHANDINÊ YÊN CURBICUR

Gava Xweda nêzî me dibe, ji bilî xwe rêyên xwe jî ji me re vedike. Tiştên pir mezin û tiştên ku hişê me nagihêje wan ji me re radigihîne (Yermeya 33:3). Mifteya têgihiştina vê ew e ku em fêhm bikin ku wê bi rêyên cuda ji me re agahiyê ragihîne. Carina em axaftina Wî dibihîzin. Dibe ku di dilê me de dengekî bi hêz hebe û carina tiştên em bi guhên xwe yên fizîkî dibihîzin dibe ku em bi dengê tê bihîstin re tevlihev bikin an jî dibe ku dengekî kêm, sakîn yê di kurahiya dilê me de be. Weke hemû rêyên din, her dem huzûra Wî ya hundurîn bi vî dengî re hevaltiyê

dike û ev yek bi Nivîsên Pîroz re li hev dike. Carina bi alîkariya bawermendekî din an jî rêberekî re têkiliyê datîne, gava ew bi hev re dipeyivin an jî gava em nivîsên Wî dixwînin, di dilê me de teqînek pêk tê. Dibe ku bi rêya xewn an jî tiştekî din re bi me re bipeyive. Di demên din de weke min her car tecrube kir, dibe ku em hînî tiştên ku berê me bi wan nizanîbû, em hîn bibin. Ya din jî pirî caran em Gotina Wî dixin nava xwe û heta em nepeyivin peyv dernakeve ser avê. Gava em devê xwe vekin û bipeyivin wê ronahî derkeve holê.

Di Roja Pentîkostê de wisa li Petrûs hatibû. Berî ku Giyanê Xweda xwe li ser deyne, wehiya ku Îsa weke Mesîh dibîne ne tê de, derbarê Gotina Xweda de tenê agahiyeke wî ya hişî heye (Meta 16). Ji bilî wê wehiyê, ji bo derbarê mijarên giyanî de bipeyive kengî devê xwe veke bi awayekî xeletî dikir. Gava li Odeya jor bû ji bo li şûna Yehûda yekî din bê hilbijartin, hewl da ku îradeyeke giyanî pêşkêş bike. Ji berhema derket holê diyar dibû ku hîn negihîştiye ji ber ku careke din ji zilamê tê hilbijartin deng nema derdikeve û pişt re Pavlûs xwe şiband “zarokekî ne di wextê xwe de çêbûye” (Korîntî I 15:8). Ji bo cihê Yehûda bigire, kesê ku Xweda hilbijartiye ne ew hewldana nelihevkirî ya ku Petrûs bi rêya pişkê kiriye, tê dîtin ku ew kes Pavlûs e.

Bi kurtasî, ji aliyê giyanî ve Petrûs her dem ne li hevhatî bû. Lêbelê gava Xweda nêzî wî bû, hema bêje di nava saniyan de, ji Yoel û Zebûrê peyameke bi hêz û kûr parve kir û dest pê kir bê çi bi 120 kesan hatiye. Berî ku girse bigihêjin ser hev, nabe ku berî vê bi çend deqîqeyan peyameke wisa hînker xebitîbe. Îcar aniha, hema bêje xwediyê agahiyên ku berê tu carî ne xwediyê wan bû. Ne tenê Petrûs lê hemû kesên din piştî ku Giyanê Pîroz nizilî ser wan bi çend saniyeyan behsa “karê Xweda yên mezin” kirin (Karên Şandiyan 2:11).

Ji ber vê eger em kurtasiya wê bikin, gava Xweda nêzî me dibe

ji bo agahiyê bide gelek rêyan diceribîne lê tiştekî teqez heye, ji her kêliya ku nêzî me dibe û şûnde em qet nikarin heman kesê berê bin.

## GOTINA DAWÎ

Weke di beşa pêşî ya vê pirtûkê de hat diyarkirin, ev peyam ne peyama "çawa çê dibe?" ye. Ji ber ku nêzîkayî ne pêvajoyeke gav bi gav e. Armanc ew e ku weke nexşeyeke xezîneyê me bibe ber bi dilê Xweda ve. Ez bawer dikim ku ev, ji bo her yekî ji me ku Xweda bi arezû û hezkirinê dixwaze û bangeke ku ji dilê Wî bilind dibe û peyameke pêxemberiyê ye. Ji bo temaşekirina nexşeya Gotina Xweda ya di vê pirtûkê de berçav bûye, eger em enerjî û demê bidin vê, bêguman em ê hebûn û dilê Xweda bi dest bixin. Eger em bi bîr bînin gava ku pêşî em nêzî Wî bibin, ev ne senaryoyeke çawalêhato ya soza ku wê bi awayekî şexsî nêzî me bibe. Berevajî vê soza Wî ew soz e ku wê her dem me bi rûmet bike û wê tu carî bi paş de gav navêje.

Destûrê bidin ku ez vê pirtûkê bi çend ayetên ku wê îlhamê bidin we ji bo hûn nêzî Wî bibin, bi dawî bikim:

> "Çimkî mirovê hîlekar li ber Xudan kirêt e, Lê Xudan bi dilrastan dişêwire." (Şîretên Silêman 3:32)
>
> "Belê nêzikbûna Xwedê ji bo min qenc e." (Zebûr 73:28)
>
> "Xudan nêzikî wan hemûyan e, ku bang dikinê, Ew yên ku, ji dil bang dikinê. Ew, daxwaza yên ku jê ditirsin tîne cih, Feryada wan dibihîze û wan rizgar dike. Xudan, hemû yên ku jê hez dikin diparêze, Û hemû xeraban tune dike." (Zebûr 145:18-20)
>
> "Ez ê wî nêzîk bikim û dê nêzîk min bibe; ji ber ma kî

> dikare ku di biha canê xwe de nêzîkî min bibe? XUDAN dibêje." (Yêremya 30:21)

Dibe ku hûn bi ceger bin ji bo hûn nêzî Wî bibin ji ber ku vexwendina xwe ya bi demê re negirêdayî li we kiriye. Ji ber vê xwe weke kesekî ku di huzûra Wî de dijî, feda bikin. Ew li benda we ye, hûn li benda çi ne? Nêzî Xweda bibin!

> "Xilaskarê me Xwedayê tenê, dikare we ji ketinê biparêze û bi şahiyeke mezin, bêleke we derxe ber rûmeta xwe; bila ji beriya deman ve, niha û her û her, bi destê Xudanê me Îsa Mesîh rûmet, mezinahî, karîn û desthilatî jê re be. Amîn." (Cihûda 1:24-25)

## PIRSÊN XEBATÊ

1. Berî hûn vê beşê bixwînin, hûn hîç lê fikirîbûn ku "pêdiviyên" Xweda hene gelo? Em van pêdiviyan bi kîjan awayî bi dest dixin?

2. Guhdarkirina axaftina Giyanê Pîroz ji bo çiqasî girîng e? Her çiqasî li ber destên we îlahiyên pesindayîn û hebandinê hebin jî û/an jî pirtûkên bi Giyan dagirtî hebin jî, we ceribandiye ji bo hûn di bêdengiyê de nêzî Xweda bibin? Vê ceribandinê ji dilê safî bifikirin û tiştên hûn jê hîn bûn not bistînin û bi kesên din re parve bikin.

3. Di beşa pêşî de, nivîskar ev pirtûk ji bo nêzî Xweda bibe, ne weke peyama gav bi gav bê "çawa çê dibe" lê weke nexşeyeke xezineya ku mirov ber bi dilê Xweda ve dibe, pênase dike. Gava hûn li ser tiştên hîn bûne fikirîn, we xezîneyên çawa kifş kirin? Çi xezîneyên din hene ku hîn hûn ê derxînin holê?

PÊVEK A

# PÊWISTIYA ME YA BI XELASKEREKÎ

Du standartên jiyanê hene; yek ji aliyê civakê ve tê vesazkirin û ya din jî ji aliyê Xweda ve. Dibe ku çanda me li gorî parametreyên xwe te “baş” bibîne lê ma gelo fikra Xweda çi ye? Nivîsên Pîroz dibêjin ku her kes ji standarta rastdariyê ya Xweda dûr ketiye: “Çawa ku hatiye nivîsîn: Tu kesê rast tune, tenê yek jî tune” (Romayî 3:10) û dîsa “Hemûyan guneh kir û ji rûmeta Xwedê bêpar man” (Romayî 3:23).

Guneh dike ku mirov xwe ji standartên Xweda bêrî bike. Mirov ji bo ku gunehan bike nehatiye afirandin. Berevajî vê Adem bi viyana xwe ya azad ev rê ji xwe re hilbijart. Xweda mirovê yekem Adem li cîhaneke ku nexweşî, xizanî û bobelatên sirûştî lê nînin bi cih kir. Tirs, nefret, hesûdî şer û pevçûn hwd. nebûn. Xweda navê Baxçeyê Adenê li vir kir.

Adem ji xwe re hilbijart ku guh nede emir û fermanên Xweda. Her çiqasî ew ji aliyê fizîkî ve bi sedan salan nemire be jî wî tecrubeyeke mirina giyanî ya ji nişka ve jiya. Tarî ket dilê wî û mirina giyanî ji mirina fizîkî cudatir e. Ji ber ku bi mirina fizîkî hebûna bedenê bi dawî dibe. Lêbelê mirina giyanî weke veqetandin û dûrketina ji Xwedayê ku çavkaniya hemû jiyanê ye tê pênasekirin.

Guneh ketibû afirandina Adem û zarokên Adem ku xwedî vê sirûştê ne çêbûbûn: "Gava Adem sed û sî salî bû, kurekî wî yê mîna wî û di sûretê wî de çêbû. Wî navê wî Şêt danî" (Destpêk 5:3).

Weke bavekî zarokên ku jê re çêbûn di sirûşta wî de bûn û ji wê deqê ve her mirov bi rêya dê û bavên xwe di dilqê wanên gunehkerî de çêdibûn. Adem xwe û zuriyeta xwe radestî efendiyekî nû, yanî radestî Şeytan kir. Û bi vê dîlgirtinê cîhana xwezayî li ser heman şopê çû. Êdî efendiyekî zordest li ser afirandina xoşevîst a Xweda bûbû xwedî mafekî qanûnî. Ev ayetên jêr vê rewşê bi awayekî zelal derdixînin holê: "Îblîs ew derxist bilindahiyekê û di bîhnekê de wî hemû padîşahiyên dinyayê nîşanî wî dan û jê re got: Ezê hemû vê desthilatiyê û rûmeta van padîşahiyan bidim te; çimkî ew ji min re hatiye dayîn û ez dikarim wê bidim wî yê ku ez dixwazim" (Lûqa 4:5-6)

Bala xwe bidinê ku ev radestî wî kirine. Kengî? Bersiv di baxçe de ye. Ji ber ku yekem car Xweda desthilatdariya erdê (cîhanê) da destên mirov. (Bnr. Destpêk 1:26-27). Adem her tiştên xwe wenda kirin. Ev wî û hemû zuriyeta wî ya li seranserê hemû qirinan vedihewîne nava xwe. Em dîsa wisa dixwînin: "Em dizanin ku em ji Xwedê ne û tevahiya dinyayê di bin desthilatiya Yê Xerab de ye" (Yûhenna I 5:19).

Berî Xweda Adem ji baxçe biqewirîne, sozek da. Felatkerek wê derkeve û dîlbûn û esîrbûna mirovahiyê ji holê rakîne.

Ev ê felatker piştî çar hezar sal ji keçeke ku navê wê

Meryemayê re çêbû. Divê ew keçik bûna, ji ber ku Meryem ji aliyê Giyanê Pîroz ve bi halekî ma. Heke Îsa ji dê û bavekî xwezayî hatibûna dinyayê, ew ê di bin dîlbûn û esareta Adem de çêbibûya.

Bavê wî Xweda bû dayîka wî mirov bû. Ji loma ew bi giştî Xweda bû û ew bi giştî mirov bû. Ji bo ew azadiya me bi fidyeyê bikire divê ew mirov bûya. Ji ber vê sedemê Îsa herdem xwe weke "mirov" da nasandin. Her çend ji destpêkê ve ew bi Bav re bû jî, wî xwe ji îmtîyazên Xwedayî bêpar kir û ji bo ew weke derpêşiya gunehan bibe qurbanî ew bû mirov.

Dema ew çû çarmîxê, ji bo me ji dîlbûnê rizgar bike wî cezayê gunehên me hilgirt ser milên xwe. Nivîsên Pîroz wisa radigihînin: "Wî li ser xaçê, gunehên me di bedena xwe de hilgirtin, da ku em li hember gunehan mirî bin û ji bo rastdariyê bijîn. We bi birînên wî şîfa dît" (Petrûs I 2:24).

Ev pir baş e: Mirov li pêşberî Xweda guneh kirin. Lêbelê Xweda (yê ku di bedenê de xuya dibe) berdêla xeletiya kujer a mirov dide. Lê dîsa jî em wisa dixwînin: "Îcar wek ku Xwedê bi devê me hêvî dike, em ji bo Mesîh qasidiyê dikin. Em ji bo Mesîh lava dikin: «Bi Xwedê re li hev werin.» Xwedê ewê ku guneh nedizanî ji bo me kir guneh, da ku em di şexsê wî de bibin rastdariya Xwedê" (Korintî II 5:20-21).

Bala xwe bidinê ku em rastdariya Xweda ne. Heta em ji dil bawer nekin ku Îsa ji ber gunehên me mir û ji mirinê vejiya û heta em Wî weke Rebê xwe qebûl nekin em ê negihijîn wê azadiya xwe ya ku Wî di berê de gelek berdêl daye. Ango divê ew bibe felatkerê me yê şexsî. Weke ku di Nivîsên Pîroz de jî dibêje: "Lê hemûyên ku ew qebûl kirin û bawerî bi navê wî anîn, wî desthilatî da wan ku bibin zarokên Xwedê. Ew ne ji xwînê, ne ji xwestina bedenê û ne jî ji xwestina mirov çêbûn, lê ew ji Xwedê çêbûn" (Yûhenna 1:12-13).

Wexta me Îsa Mesîh weke Rebê xwe û felatkerê xwe qebûl

kir, em dimirin û ji aliyê giyanî ve ji nû ve çêdibin. Em ji xulamtî û koletiya qiraltiya Şeytan re dimirin û em weke zarokên nû yên di bin Serweriya Xweda de çêdibin. Ev çawa pêk tê? Hêsan e. Wexta ku em di dilê xwe de ji vê bawer bikin tişta ku em bikin ew e ku bi awayekî aşkere bibêjin Îsa Rebê me ye û wî wextî em ji nû ve çêdibin. Nivîsên Pîroz vê piştrast dikin: “Eger tu bi devê xwe eşkere bikî ku Îsa Xudan e û di dilê xwe de bawer bikî ku Xwedê ew ji nav miriyan rakiriye, tê xilas bibî. Çimkî ji bo rastdariyê bi dil tê bawerkirin û ji bo xilasbûnê jî bi dev tê eşkerekirin” (Romayî 10:9-10).

Evqasî hêsan e! Em bi karên xwe yên baş rizgar nebûn. Karên me yên baş tu carî cihekî di Desthilatdariya Wî de ji me re bi dest naxînin. Ji ber ku eger ev rast bûya, mirina Mesîh wê belasebeb bûya. Em bi kerema Wî rizgar bûn. Ev diyariyeke bêbersiv e ku tu carî em heq nekin. Ji bo em vê wergirin tişta ku tenê divê em bikin divê em red bikin ku em ji bo xwe bijîn. Û em jiyana xwe ji Reb Îsa re û ji Efendiyê xwe yê berzûbala re terxan bikin. “Ew ji bo hemûyan mir, da ku yên dijîn êdî ne ji bo xwe, lê belê ji bo wî yê ku ji bo wan mir û hat rakirin, bijîn” (Korintî II 5:15).

Bi vî awayî eger hûn bawer bikin ku Mesîh ji bo we miriye û êdî ne ji bo xwe, ji bo Mesîh eger hûn bi xwestek bin ku jiyana xwe fedayî Wî bikin, em dikarin duaya li jêr bi hev re bikin û wê demê hûn ê bibin zarokekî Xweda:

*Xwedayê min î li jor, ez qebûl dikin ku ez gunehkarek im û di bin xwestekên te de me. Ji ber gunehê min, ez heq dikim ku heta hetayê mehkûm bim. Ji ber te ez di vê rewşê de nehiştim, ez spasdarê Te me ji ber ku ez bawer dikim, Te kurikê tekane Îsa Mesîhê ku ji Meryema bakîre re çêbû ji bo min mir û ji bo cezayê min li çarmîxê ragire ser pişta xwe, Te şand. Ez bawer dikim ku roja sisêyan ji mirinê şiyar bû û aniha weke Reb û Xelaskerê min li aliyê*

*Te yê rastê rûniştiye. Ji ber vê îro ..., 20 .... di vê dîrokê de ez jiyana xwe bi temamî bi destê Îsa ve berdidim. Îsa, ez Te weke Reb û Xelaskerê xwe bi nav dikim. Bi giyanê xwe re were têkeve jiyana min û min weke zarokekî Xweda biguherîne. Ez karê tariyê yê ku wextekî min xwe pê ve digird, red dikim û ji vê rojê û şûnde êdî ne ji bo xwe, ji bo ku heta hetayê ez bijîm ku xwe ji bo min feda kiriye ango ji bo Te ez ê bijîm. Spasdar im Reb, jiyan û dilê min êdî di nava destê te de ye û ez Gotina te qet ji bîr nekim.*

Aniha hûn xelas bûn, hûn zarokekî Xweda ne. Ferîşteyên li asîmanan aniha bi we re kêfxweş dibin! Hûn bi xêr hatin nava malbatê!

PÊVEK B

# DAGIRTINA BI GIYANÊ PÎROZ

Wergirtina dagirtina bi Giyanê Pîroz weke hûn Îsa Rebê xwe û felatkerê xwe qebûl bikin hêsan e. Hinek mirov hewl didin, hêvîşkestî dibin û berî ku bixwazin gelek caran tawîrên bingehîn ên Nivîsên Pîroz îhmal dikin û bi Giyanê Pîroz nayên dagirtin. Berî ku ez ji yên ku dixwazin dagirtinê wergirin re dua bikim ez fêr bûm ku ya herî baş ew e ku divê ez pêşî Gotina Xweda nîşanî wan bidim. Ji ber ku bi saya vê baweriya wan wê qewîn û mezin bibe. Ji loma berî ku ez we ji bo Dagirtina bi Giyanê Pîroz berhêliya duayê bikim, destûrê bidine min ku ez Gotina Xweda bi we re parve bikim. (Nîşe: Berî ku em zêde bi pêş bikevin girîng e ku hûn beşa 11an bixwînîn û biqedînin.)

Berî her tiştî, halîhazir divê we Îsayê Mesîh weke Rebê xwe û Felatkerê xwe qebûl kiribe. (Binerin li Yûhanne 14:17).

Nabe ku di jiyana we de tevgereke bêîtaetiyê domdar hebe. Tê gotin ku Xweda Giyanê xwe dide “yên ku guhên xwe didin gotina Wî.” “Em şahidên van tiştan in û Ruhê Pîrozê ku Xwedê daye wan ên ku bi ya wî dikin jî, şahid e” (Karên Şandiyan 5:32). Ez ji tecrubeyên xwe têgihiştim ku bi taybetî ev qada nebexşandinê vedihewîne nava xwe. Min gelek caran di civînên me de dîtiye ku bi sedan mirov bi Giyanê Pîroz hatin dagirtin û ew di wê kêliyê de bi zimanên din axivîne. Lê yek an du duzîne ji van bi sedan kesan li wir di cihê xwe de bi awayekî şaşwaz radiwestin. Çi cara ku ez bi van çend dûzîneyan re rû bi rû mam min dît ku Xweda berê min dide ku ez bi dilmayîna wan re eleqedar bibim. Çi wextê ku şexsan bexşand di heman kêlîyêde bi Giyan hatin dagirtin û bi zimanan dest bi axaftinê kirin. Ji loma berî ku em berdewam bikin em bi hevdu re dua bikin:

> Bavo, ez hêvî dikim tu li dilê min vekolînî û ez hêvî dikim tu nîşanî min bidî gelo di dilê min de bêîtaetî heye an tune ye. Ez lava dikim heke kesekî ku min ji dil ew ne bexşandî hebe nîşanî min bide. Çi tişta ku tu ji min re bibêjî ez amade me ku îtaetê bikim û bibexşînim. Ez vê bi navê Îsa hêvî dikim û ez gelekî spasiya te dikim.

Ji bo em Giyanê Pîroz werbigirin tişta ku divê em bikin tenê xwestin e! Îsa tenê vê dibêje: “Ka di nav we de bavek heye ku kurê wî masiyekî jê bixwaze û ew di şûna masî de marekî bide wî? An ku ew hêkekê bixwaze û ew dûpişkekî bide wî? Bi ser ku hûn xerab in jî, hûn dizanin diyariyên qenc bidin zarokên xwe. Îcar Bavê ezmanî hê çiqas bêtir wê Ruhê Pîroz bide wan ên ku ji wî dixwazin” (Lûqa 11:11–13). Li vir Îsa dibêje, tiştên ku em ê siberojê bixwazin bidin wan îcar gava ji me dixwazin em ê

nikaribin tiştekî nebaş û cuda bidin zarokên xwe. Bi heman awayî eger hûn ji Bav Giyanê Wî bixwazin, wê giyanekî nebaş nede we. Hemû tiştê ku divê hûn bikin ew e ku hûn li ser navê Îsa ji Bav bixwazin û wê demê hûn ê Giyanê Pîroz bi dest bixin.

Divê hûn bi bawerî bixwazin. Peymana Nû dibêje ku heke bawerî nebe ne pêkan e ku em ji Xweda werbigirin. Di Yaqûb 1:6-7an de wisa dibêje: "Lê bila bi bawerî bixwaze û dudilî nebe. Çimkî yê ku dudilî dibe, wek pêla deryayê ye ya ku ba lê dixe û şeqil dide. Mirovekî weha bila nefikire ku ewê tiştekî ji Xudan bistîne" (Aqûb 1:6-7). Wî wextî naxwe ji xwe bipirsin. "Ez ê kengî werbigirim? Gava ez bi zimanên din axivîm an çi wextê ku ez bixwazim?" Divê bersiva we di çi wextê ez bixwazim de be! Ji ber ku di Desthilatdariyê de pêşî em bawer dikin û pişt re em werdigirin. Yên ku baweriya wan tuneye wisa dibêjin: "Nîşanî min bide ez bawer bikim." Lêbelê Îsa wisa dibêje: "Ji ber vê yekê ez ji we re dibêjim: Her tiştê ku hûn bi duakirinê bixwazin, bawer bikin ku we standiye û wê ji we re bibe" (Marqos 11:24). Bala xwe bidinê ku divê em pêşî bawer bikin û pişt re daxwaza me pêk tê.

Karên Şandiyan 2:4 wisa dibêje: "Hemû bi Ruhê Pîroz tije bûn û bi gotina ku Ruhê Pîroz dabû wan, dest pê kirin bi zimanên din peyivîn" (Karên Şandiyan 2:4). Bala xwe bidinê ku bi zimanên din axivîne. Yê ku bi zimanan axiviye ne Giyanê Pîroz bû. Çiqasî giyan peyv bidana ew neçar bûn ku biaxivin. Yanî di vir de sertewandinek heye! Dibe ku ez di nava çemekî xurt de li ser piyan bim, lê heke ez lingên xwe ranekim û serê xwe li ber herikîna çêm netewînim ez ê pê re neherikim. Wî wextî sê qad hêne ku divê em bejna xwe li ber bitewînin: Pêşî lêvên me. Heke ez lêvên xwe nelebitînim, tu dixwazî bila bi Îngîlîzî be, an tu dixwazî bi zimanekî biyanî an jî zimanekî asîmanî be ew ê peyv dernekevin. Ya duyemîn zimanê me ye. Heke ez zimanê xwe nelebitînim ez ê nikaribim biaxivim. Ya sêyemîn têlên dengên min

in. Heke ez serê têlên dengên xwe li ber pişikê (cegere spî, pişa spî, kezeba spî) nedim tewandin, ez ê nikaribim biaxivim.

Di vê deqê de dibe ku tu bifikirî ku ez tinazker (henekpêker, qerfok) im. Lêbelê ne wisa ye. Piştî ku min dît mirov bi salan hewl didin, ez fêr bûm gelek kes ji wan difikirin ku Giyanê Pîroz wê lêvên wan, zimanên wan û têlên dengên wan bi dest bixîne û wan bide axaftin. Na, ew çiqasî axaftinê bide em diaxivin an jî serê xwe li berê ditewînin. Îsa wisa dibêje: “Yê ku baweriyê bi min bîne, wek ku di Nivîsara Pîroz de hatiye gotin: Wê ji dilê wî çemên ava ku jiyanê didin biherikin. Îsa ev peyv li ser wî Ruhê Pîroz got, ku wan ên bawerî bi wî dianîn wê bistandana. Çimkî Ruh hê nehatibû dayîn, ji ber ku hê Îsa nehatibû birûmetkirin” (Yuhanna 7:38–39). Wexta hûn dixwazin bi Giyanê Pîroz bên dagirtin dibe ku di hişê we de kîteyeke weke belbelîskê bilind dibe, hebe. Heke hûn vê bi bawerî bibêjin hûn ê bibin weke ku we devikê bendavê vekiriye û ew ê hingî ziman derkeve holê. Ez vê dişibînim gulokeke ta ya di nava me de û serê ta bi serê zimanê me ve hatiye girêdan. Çiqasî mirov bikişîne (biaxive) tayên din jî wê derkeve derve. Hin kes difikirin ku hemû ziman di hişên wan de ye û ew ê pişt re biaxivin. Na, divê em bi bawerî biaxivin.

Tê bîra min wexta jina min ji bo wergirtina Giyanê Pîroz dua dikir ji bo demekê ew bi tu zimanan neaxivîbû. Pişt re wê û çend hevalên wê piştî çend heftiyan dua dikirin û wan dest bi axaftina zimanan kirin. Pişt re wê ji min re wisa got: “Ew kîte ev çend hefteyên dawî wexta min dua dikir di hişê min de diçû û dihat, lê heta vê êvarê min serî jê re netewand.” Ez bawer dikim ku ji bo gelek kesan rewş wisa ye. Dixwazin, werdigirin lê serê xwe jê re natewînin.

Nivîsên Pîroz wisa radigihînin: “Û ruhê pêxemberan bi ya pêxemberan dike” (Korîntî I 14:32). Ev ayet ji me re vedibêje yê ku diaxive em bi xwe ne û Giyanê Pîroz wê me nede zorê.

Tê bîra min piştî ku ez bi Giyanê Pîroz hatim dagirtin bi rojekê min nizanîbû ku ez ê çawa biaxivim. Min ji birayekî li Salona Jîmnastikê pirsî: “Gelo ez ê vê çawa dîsa bikim?” Ji min re got: “John, tenê bike!” Pişt re ez derketim bazdanekê û wexta ez dibezîm ji nû ve min dest bi axaftina bi zimanan kir. Dilê min bi şahî û şengiyê hat dagirtin. Divê em bînîn bîra xwe ku Giyanê Pîroz her ji bo tevgerê amade ye; yê ku divê serê xwe bitewîne em in. Ev weke vexwartina avekê ye. Av her dem li wir e. Tenê tişta divê em bikin ew e em misliqê vekin ku av biherike derve. Ji loma her û her bi zimanan dua bikin!

Êdî wekî we ji Nivîsên Pîroz tawîrnameyên bingehîn wergirtine, heke hûn li ya we wergirtî bawer dikin em dikarin bi hevdu re dua bikin. Tiştekî din ê dawî, hûn di heman demê de nikarin hem bi kurdî û hem jî bi îngîlîzî biaxivin. Ji loma bawer bikin û serê xwe bitewînin! Em duayan bikin:

*Bavo, li ser navê Îsa weke zarokekî Te ez têm ber bi Te ve. Te got; eger tu Giyanê Pîroz bixwazî, Ez ê bidim te. Îcar aniha ez bi kêfxweşî û baweriyê dixwazim. Ji kerema xwe re aniha min bi Giyanê Pîroz waftîz bike û bi ser ve bibe. Ez radihêjim her bereketa te ji bo min xwest û xelata Te ya axaftina bi zimanan jî. Wê demê aniha bi bîr û baweriyê ez ê bi zimanekî nû bipeyivim! Amîn!*

# HEQÊ QEDIR

*Qewata vê qencîya bîrkirî eşkere bikin*




Tu mesîhîyek naxweze Xwedê bide sînorkirinê, lê gelekên ji me, bi nezanî, şuxulkarîya Wî, ya nava jîyana meda, didine sînorkirinê, çimkî ew prînsîpeke ruhanî, ya qirarkir, Qedir, hesab hilnadin.

Qedir femdarîke usa ye, yê ku bi piranî nava kûltûra me da unda bûye, lê hûnê nava rûpelên vê kitêbê de bibînin, ku rola wê ya girîng nava hemû govekên jîyana me da çi cûreyî ye, bona ku wan goveka bikine bin tesîra padişatîya Xwedê.


Kitêba “Heqê qedir” de xudanê kitêba, yê bi nav û deng, Con Bîvêr, dide kifşê ku wextê ku hûn bersiva banga qedirgirtinê didin, hûn wî çaxî sîstêma Xwedê ya qîmetîya qebûl dikin û li ser tabîke usa disekinin, wekî hûn dikarin wî hemû tiştî bistînin çi ku Xwedê bona we qirar kirîye.

Bi yekkirina prînsîpên xwedêtîyê, yên kûr, tevî serpêhatîyên praktîke hukumdar, kitêbê ji nûva vê qencîya bîrkirî raberî we bike, û ew hemû tiştê diha girîng wê nava we da cedandinê pêşda bîne, kîjanê hûnê bikine nava her govekeke emirê xwe.

Divê malperî de heye: **MessengerX**


# MessengerX

*Ji bo her kesî û li deverî rêwitiya ku xwendekarekî ava bike*




- **Ji 120 zimanan zêdetir bêpere ye.**
- Weke sepanê û weke online mirov dikare pêde bike.
- Çavkaniyên ji bo hûn xwe bi pêş bixin.
- Paşeroja xwe û rêwitiya xwendekariya xwe bişopînin.






Ji bo hûn di hemû cîhazan de temaşe bikin, bixwînin an jî guhdar bikin; e-pirtûk, pirtûkên bideng, kurte fîlm, vîdeo, Pirtûkên Pîroz û hin tiştên ji van zêdetir ku di pirtûkxaneya çavkaniya xwendekaran ya Messenger'ê de cih digire, ji bo hûn xwe bigihînin wan serdana wê bikin.

**MessengerX.com**

Daxîne ji ser App Store

Werbigire ji ser Google Play

Li temamîya dinîyayê li «App Store»-ê û «Google Play»-da

John Bevere bi pirtûka xwe ya *Nêzî Xweda* re, bêyî naskirina Xweda bang we dike ku hûn qîma xwe tenê bi hin agahiyên pûç yên Xirîstiyaniyê yên derbarê Xweda de neyînin. Vexwendina bêhempa ya ku Afirînerê Gerdûnê bang we dike, ne tenê ew e ku bi gotin û merasîmên ji dûr ve tên gotin hûn Wî bihebînin, ev vexwendin ew e ku hûn dilê Wî nas bikin û pê re têkevin nava têkiliyeke nêz.

**Dibe ku soza Pirtûka Pîroz ya herî bêhempa ev be... Xweda bêriya ku hûn Wî ji nêz ve nas bikin, dike.**



JOHN BEVERE weke kesekî biceger ku nêzî Gotina Xweda dibe û di vî warî de tawîzê nade, tê nasîn. Ew di heman demê de axaftvanekî navneteweyî ye û yek ji wan nivîskaran e ku pirtûkên wî pir tên firotin. John û hevjîna wî Lisa damezrînerên Messengera Navneteweyî ya xizmetê ne ku weke şopînerên Mesîh tawîzê nadin û jiyana me diguherînin. Gava ku John li mala xwe ya li Koloradayê ye, dibe hûn bibînin ku bi malbata xwe re bi lîstikeke qelemaçan re dilîze an jî hewl dide ku xanima xwe Lisa bibe lîstika golfê.

MessengerX

Ji bo hûn belaş meteryalan daxînin û vîdeoyan temaşe bikin, serdana navnîşana **MessengerX.com** bikin.

Hûn diha zêde dixwezin?
Şikil pêlkin:

Messenger INTERNATIONAL

Ev pirtûk xelata nivîskar e û nayê firotin.